

CON BÎVÊR

XUDANÊ NIVÎSARAYÎ NAVDAR, ANEGORÎ KOVARA «*USA TODAY*»-Ê



QEWATA JI ALÎYÊ XWEDÊ
DA DAYÎ ÇENDBARE BIKE

Hevalê Hizkirî,

Ji me her kes îşê destê Wî ye, yê ku nava Îsa Mesîh da bona karên qenc hatîye çêkirinê. Hûn careke mayîn bi pêşkêşa bi keremê dayî hatine dinîyayê, bona ku bibine lawê Xwedê, û hema bi wê keremê jî we qewat bona armanca mexsûs standîye. Hûn fem dikin wekî nava weda qewata ecêb heye, ya bi cûrê pêşkêş û karebûnên ji Xwedê da dayî, bona ku wî meremî mîyaser bikin.

Ew pêşkêş, talant û karebûn, yên ku bona we hatine dayînê, bona we nehatine têradîtinê: ew gerekê bi destî we bona merivên başqe bêne dayînê. Nava weda ew tişt heye, çî ku Xwedê dixweze ku li cem merivên başqe hebe. Ji me her kes gerekê pêşkêşên xwe nas bike, bi helalî serwêriya wan bike û bona kara merivên başqe û belavkirina Padişatîyê bide xebatê.

Ew meriv bextewar û duakirî ye, yê ku pêşkêşên xwe zane û bi wana dişuxule. Ew meriv bêbext û bin tesîrêda ye, yê ku dicêribîne bi pêşkêşên merivekî başqe bişuxule. Bi aminbûn û hevkarîya tevî kerema Xwedê, bin rûnkirina Wî da, em gerekê hewl bidin pêşkêşên xwe çendbare bikin, ne ku ji tabîya şerkarîyê, lê ji ya hêsbûnê.

Hûn bi kerem û rûnkirina Wî va qewatbûyîne. Werin mêrkîmî pêşda herin, ku bona Xwedê karên mezin bikin.

Bi hevra, tevî we,



MessengerX.com

Con Bîvêr
JohnBevere@gmail.com



MESSENGER
INTERNATIONAL
MessengerInternational.org



CON BÎVÊR

XUDANÊ NIVÎSARAYÎ NAVDAR, ANEGORÎ KOVARA «*USA TODAY*»-Ê



**QEWATA JI ALÎYÊ XWEDÊ
DA DAYÎ ÇENDBARE BIKE**

X: Multiply Your God-Given Potential by John Bevere, Kurdish Latin

© 2021 Messenger International

MessengerInternational.org

Originally published in English as X: Multiply Your God-Given Potential

Additional resources in Kurdish Latin by John and Lisa Bevere are available for free download and video streaming at: **MessengerX.com** and on the **MessengerX App**.

To contact the author: JohnBevere@ymail.com

This book is a gift from Messenger International and is
NOT FOR SALE

“X: Qewata ji alîyê Xwedê da dayî çendbare bike”, Con Bîvêr, kurmancî /herfên latîni/

© 2021 Messenger International

MessengerInternational.org

Pêşda bi zimanê inglîzî hatîye çapkirinê, bi sernivîsara

«X: Multiply Your God-Given Potential»

Matêriyalên zêdeye kurmancî, yên bona barkirinê û weşandinê malperên

MessengerX.com-ê û **MessengerX** -da hene.

Bona îzbatkirina tevgirêdana tevî xudanê kitêbê: JohnBevere@ymail.com

Ev kitêb ji alîyê qulixdarîya “Messenger International”-da pêşkêşe û

BONA FIROTANÊ NÎNE



App Store nîşana Apple Inc-ye, ya ku li ŞAY û li welatên mayîn hatîye rêgîstrasîyakirinê.
Google Play û Google Play-ê nîşanên Google LLC-ne.

Pêşkêşî jinên baş, yê kurên me tê kirinê...

Ez û Lîza bi kûrayî we hiz dikin. Li cem we her kesî ew cudatî û tiştên hê zêdeye baş hene, yê ku min li jêrê dane rêzê, yê ku nava jîyana weda gelekî kifşin:

Cûlîanna

25-ê cotmeha sala 2009-a Êdîson stendîye.

Tu bedew û aqilî.

Tê her dem keça mine ewlinbî.

Cêsîka

24-ê îlona sala 2018-a Ostîn stendîye.

Tu qenc û bedewî.

Her cîhekî ku tu qu lê diqesidî bi şabûnêva tijî dibe.

Krîşçên

18-ê mijdara sala 2018-a Ardên stendîye.

Tu merîfetî û dilê te nazike.

Tu gelekî nazik kurê me hiz dikî.

Dergîstî Alêk Bîvêr

Dilê min hîvîyêye ku keça xweye pêşerojê bibîne.

Ez îdî bi kûrayî te hiz dikim.

Ji we her kes şabûnê pêşkêşî Lîzayê û min dike.

Em spas dikin bona mezinkirina malbeta me.

Keçên meye heta-hetayê.

SERECEM

Derheqa vê kitêbêda IX

1. Şikilê tomerî 1
2. Karebûnên derbazkirî 13
3. Bi zelaî xwe qîmet bikin 27
 4. Cabdar 37
 5. Aminayî 53
6. Xebathizî û çendbarekirin 69
7. Çendbarebûna mezin 83
8. Fikirên stratêcî 97
9. Învêstîsiya 111
10. Alîkar 127
11. Çav bidine min 141
12. Dijwarîyên çendbarekirinê A 157
13. Dijwarîyên çendbarekirinê B 169
14. Pêşkêşên xwe eşkere bikin û pêş bixin 181
 15. Rûnkirin 197
 - Zêdekirî 207
 - Xeberên 209

DERHEQA VÊ KITÊBÊDA


Nava rûpelên vê kitêbêda hûnê fikir û stratêçiyayên Încîlê bibînin, yê ku wê alî we bikin ku hûn armanca xwe eşkere bikin, aktîvîya xwe gurkin û qewata xwe bidine xebatê. Her serîkî kitêbêda usa jî pirsên bona fikirmîşbûnê hene, yê ku wê alî we bikin, bidine kifşê ku hûn çî hîn dibin.

Heger hûn dixwezin derheqa çendbarekirinêda diha zêde bizanibin, min matêrîyalên zêde jî hazir kirine, dikevîna nava kîjana dersên vîdyoyê, kitêba rênîşa û matêrîyalên bi întêrnêtê, kîjana dikarin bi xwe, yan jî komên biçûkda bidine xebatê. Hûn dikarin van matêrîyala, usa jî temamiya imbara matêrîyalên min, yê bona hînbûnê têradîti, malpera **www.MessengerX.com**-da bistînin. Bi mîliyona meriva matêrîyalên me xebitandine û armanca me ew e, ku wana bighînine we, nenihêrî wê yekê ku hûn li kîderêne, çî zimanî xeber didin û halê weyî êkonomîkî çî cûreyî ye /derheqa vê yekêda hûnê vê kitêbêda bixwînin/. Deqekê başqe bikin, werine malpera me û bighîjine hevaltîya mizgîndarên meye hemdinyayî.

Heger pirsên we hene, bêyî fikirmîşbûn min û koma qulixdarîya “Mêsîncêr întêrnêşînilê”-ra binivîsin.

Ez şame ku em tevayîne,

Con



“Xofa Xwedê bingehê serwaxtîyê ye...
Serwaxtî wê rojên te çendbare bike û wê salên
jîyana te zêde bike. Heger tu serwaxtbî, tê ji wê
yekê karê bistînî”.

–Gotinên Silêman 9:10-12, NLT

1

Şikilê tomerî

Ev serpêhatî sala 2012-a qewimî. Min gerekê li Los Ancêlêse, wextê berevbûnên dawîya hevtê, li civînekê qulixa xwe derbaz bikira. Her dem ez bi teyarê roja şemîyê dighîjime cîh, êvara şemîyê û şebeqa yekşemê qulix dikim û yekşemê roj paşda vedigerime malê. Vê carê gerekê ew qeyde bihata guhartinê.

Hevalkarekî meyî qulixê /ezê wî çawa Stên nav bikim/, bi zanebûna wê yekê, wekî min gerekê li Los Ancêlêse terîf bikira, minra têlefon kir û pirsî, ku gelo minê bixwesta li deşta lîstikê, ya klûba “Rîvyêrayê”-ye eyan golf bilîsta, yan na? Hewcetî tunebû ku ez dirêj bifikiriyama, çimkî min zûva dixwest li wir bilîsta. Min bi şabûn bersiva wî da:

-Bêguman, bi hizkirina mezin.

Îzinê bidin ku ez tiştêkî biçûk dubarekim. Wextê qulixa mine ji 35 sala zêdetir, wextê seferên min û terîfkirina Xebera Xwedê, ez car-carina nava xebardanên xweda derheqa hizkirina xweye hindava lîstika golfê dibêjim. Bi sala ser hev ev yek progiramkirî nîbûye, lê encamên wê usa bûne, wekî min ji çend klûbên dinyayê here baş teglîfkin stendine ku li wan dera golfê bilfizim. Ev jî bûyara wî cûreyîye bi sirê bû.

Ev teglîfkin *gelekî cuda* bû. “Rîvyêraya” klûbeke cuda û derdadaî ye, û çûyîna li wir gelekî diware. Hersal li vê deşta lîstikê teşkîldarîya bi navê “Cênêsis învîtêyşinil”-ê, ya “Hevkarîya lîstikçiyên golfa profesîyonal” tê derbazkirinê /berê çawa “Leca Los Ancêlêseye vekirî” dihate navkirinê/. Li wê deştê usa jî lehçên mezin, yê bi navê “ŞAY-e vekirî”, û “Hevkarîya lîstikçiyên golfa profesîyonal, “ŞAY-e ne profesîyonal” lehçên başqeye eyan hatine derbazkirinê.

Şebeqa roja şemîyê, bi avtomaşîna Stên, em çûne li wê deştê ku xiyala xwe mîyaserkin. Ew roj bi wê menîyê gelekî baş bû, wekî hevalekî minî nêzik, Aharon Bêdlî, salekê pêşda li wê deştê gihîştibû serkeftinê, wextê “Lehca Los Ancêlêseye vekirî”. Ez hîvîya wê lîstikê bûm, ez bi fikira xwe çûm gihîştîme wê demê û çend derbên wîye balkêş hatine ber çavê min, bi kîjana ew wextê lehca sala 2011-a gihîştibû serkeftinê.

Min çar çelên ewlin hildan, lê min ew beşa listikê bi du qalava hindik ser hevda anî. Min û Stên, me wedekî baş derbaz kir: ew roj bi rastî rojeke bîranînêye eyan bû.

Wextê ku em vedigerîyane mêvanxanê, ya ku li merkeza Los Ancêlêse bû, Stên ji min pirsî:

-Con, ez dikarim pirsêkê bidime te, derheqa kîjanêda ez hinek wede fikirîme?

- Ser çava.

Ewî bi bêqelpî û dilê vekirî got:

-Con, nava 20 salên dawîda ez bi kel û ced xebitîme û min gelek wede daye çêkirina îdarên xwe. Kapîtala mine şexsî gihîştîye neh mîlîyon dolara. Xebata min tevî bikirçiyên min berdegame, nasekine. Nava encamê xebata bi kel û cede pirsaleda, jîyana jin û zarokên min bi finansî hatîye çareserkirinê.

Paşê ewî pirsî xwe da:

-Ez îdî ji 50-î salî derbaptir bûme. Gelo bona çî ez gerekê dîsa bi wan qewata bixebitim? Gelo bona çî ez gerekê bixebitim, ku kapîtala îdarên xwe nava deh salên pêşîya meda bighînimê 35 mîlînon dolarî?

Ruhê Pîroz carekêra serwaxtî da min ku ez bersivê bidim:

-Ezê vî cûreyî bersivê bidim, -min got. -Bîne ber çavê xwe ku ez dibêjim: Stên, ez bi sala ser hev bi kel û ced xebitîme û min 17 kitêb nivîsîne, yên ku niha bi 80 zimana hatine wergerandinê, yên ku bi mîlîyona mesela hatine çapkirinê. Nava 25 salên dawîda ez ji 16 mîlîyon kîlomêtirî zêdetir bi teyara firîme, li cîhên dinîyayêye cuda-cuda qesidîme, rastî çand û kûltûrayên cûre-cûre hatime, xwerinên cûre-cûre min cêribandine û li mêvanxanên biçûk mame, bona ku bikaribim bi Mizgînîyê li temamiya dinîyayê qulix bikim. Qulixa min nava halekî başdane û finans jî qewînin. Lîza û zarokên min jî bi finansî çareserkirîne. Bona çî ez gerekê dîsa bi wan qewata bixebitim?

Hemû tişt baş hate stendinê. Ew bin pozê xweda kenîya û bersiv da:

-Wî çaxî minê nexwesta dewsa te bûma, wextê ku tu rastî Îsa bihatayî.

Min carekêra got:

-Stên, hinekî pêşda te hema ew yek derheqa şuxulê xweda gote min.

Kenê wî carekêra unda bû. Ew tevîhev bû, berê xwe ji rê vegerand û li min nihêrî. Ewî bawariya xwe li gotina min neanî û ji min pirsî:

-Bo çî tu usa difikirî?

Stên, Xwedê her lawekî Xwe pêşkêş kirîye. Ewî pêşkêş dane me bo ku em padişatiya Wî çê bikin. Feqet, em êkonomîstên wan pêşkêşane û her deqe em dikarin wana bi sê cûra bidine xebatê:

Em dikarin wan pêşkêşa bidine xebatê, bona ku padişatiya Xwedê çê bikin.

Em dikarin wan pêşkêşa bidine xebatê, bona ku jîyana xwe çê bikin.

Û em dikarin wan pêşkêşa tu cara hesab hilnedin.

Stên guhdarîya min dikir û min jî xeberdana xwe berdewam kir:

-Nava pêşkêşên mine eyanda nivîsar û terîfkirin e. Pêşkêşên te bîznêsê û pêşkêşkirinava girêdayîne. Diqewime mînaka ku ez dibêjim, bona te ya pêkenînê bû, lê pirsra te hema xût derheqa wê yekêda bû. Pêşkêşên te hema awqasî jî bona çêkirina padişatîya Xwedê girîngin, çiqasî pêşkêşên minin. Bi rastî, pêşkêşên te dikarin diha zêde girîng bin, tu awqasî şikilê tomerî nabînî.

Me qîsa xweye derheqa wê yekêda berdewam kir. Tiştêkî gelekî baş bû, wextê ku min didît ku fikir û nêzîkbûna Stên wextê qîsa me dihatine guhartinê.

Piştî şeş meha, min Stênra tîlefon kir bona ku pêbihesîyama ku ew çawa bû. Qîseke bîrnekirinê dîsa hîvîya min bû.

-Selam, Stên, tu çawanî?

-Tu dixwezî ez zelalbim?, - ez hîvîya bersiva wî cûreyî nîbûm.

-Belê, bêguman.

-Çi ku te şeş meh pêşda gote min, bi fikira baş dibêjim, wekî rihetî nedida min.

-Û tu hazir dibî çî bikî?

Ewî bi ken got:

-Ez ji çermê xwe derdikevim, bona ku kapîtala bîznêsa xwe bighînim 35 mîlîyon dolara, bona çêkirina padişatîya Xwedê.

-Tu her bijîyî!

Stên ew rastî qebûl kiribû, wekî ew bi xwe nava belavbûna padişatîya Xwedêda dîtindar nîne, lê tevûyekî girîng e. Ewî ew yek qebûl kiribû, ya ku li cem geleka tune, wekî karebûnên wî bi qîmetê heta-hetayêne. Ewî tam fem kiribû, wekî armanca pêşkêşa wî diha mezin bû, ne ku çareserkirina xwe û malbata xwe. Ez awqasî razîme, wekî ew usa zelal û şikestîye. Ev cudatî alî wî kirin, bo ku wê rastîye qebûlke, ya ku wê jîyana wî bida guhartinê. Û bi saya şedetîya wî, ew yek wê ne tenê jîyana wî, lê wê jîyana geleka biguharta.

Bi saya ronahîbûna xwe, Stên berbi çendbarebûnê cedand, û mînaka wî hema armanca vê kitêbêye sereke dide kifşê. Mixabin, bi sala ser hev, wextê seferên xwe, ez rastî gelek bawarmenda hatime û dikarim bêjim, wekî ji wana gelek wî cûreyî difikirin, çawa ku Stên difikirî. Bi rastî, heger ji min derheqa wê yekêda bipirsîyana, minê bigota, wekî piranîya bawarmenda vî cûreyî difikire. Neniherî wê yekê, wekî gelek vî cûreyî xwe mikur nayên, çawa ku Stên dibêje, wextê qîsa fikirdarîya wan eşkere dibe.

Heger hûn bi fikirên wî cûreyî navê jîyana xwe dikine bin şikberîyê, wî çaxî ez gelekî şame wekî ev kitêb ketîye destê we. Ez bi bêqelpî hêvîdarim, wekî fikirdarîya we wê wî cûreyî bê guhartinê.

Mînanî Stên, tevî xwe zelal bin, bêqelp bin: ewê alî we bike ku hûn şikilê tomerî bibîn. Hûnê bi bêqelpî û şikestî eşkerekî û li ser xwe guman bawar bikin, wekî hûn dikarin bona çêkirina padişatîya Xwedê pêşkêşên xwe çendbare bikin. Hûn jî ji Xwedê da hatine gazîkirinê, çawa ku serwêrê we ye, yan jî ezim. Navê we jî wî cûreyî ye, çawa yê Billî Grêhêm e, yan jî navê qulixçiyê eyan e.

Emê derheqa wê yekêda xeberdin, ku çawa pêşkêşên xwe eşkerekî, bi-dine pêşxistinê û çendbare bikin. Beşên vê kitêbêye ji Încîlê û serpêhatî wê bawarîya we çê bikin, bi saya çî kardarîya we wê gelekî zêde îşbe. Ez bi xwe dikarim şedetîya derheqa vê yekêda bidim: ev yek rastî min hatîye, wextê ku min ev kitêb dinivîsî û rêdaktorî lê dikir.

BI MEREM JI DAYÎKBÛYÎ, BONA MEREMÊ MEXSÛS

Werin em destpêkin, beşeke ji Încêlêye eyan lêkolîn bikin:

“Çimkî bi *keremê* hûn xilazbûyîne, pê bawarîyê û ev yek ne ji weye, lê *dayîna Xwedê* ye. Ev yek ne ji kirinaye, wekî yek payê xwe bide” /Efesî 2:8, 9/.

Ev herdu gotin jî derheqa *kerema Xwedê* da nin. Li ber çeva ye wekî em bi keremêva xilazbûyîne û eva pêşkêşa Xwedê ye. Sedsala 21-ê da civînê bi cûrê herî baş ev rastî derbaz kirîye. Em tu cara nikarin awqasî bi kel û ced bixebitin, jîyaneke awqasî pîroz derbazkin û awqasî bikine qurban, bona ku em bikaribin bighîjine derbazkirina heta-hetayêye tevî Efrandarê me. Ev beşa nivîsarê hema fikireke vê rastîyê ye here sereke ye, dikare bibe ya here sereke. Lê belê, ew çî ku piştî vê yekê hatîye nivîsarê, nehatîye hesabhildanê:

“Çimkî em çêkirîyên Wî ne, yekîtîya Mesîh Îsada xuliqî, bona kirinên qenc, yên ku Xwedê pêşda hazir kirin, ku ew wanda *bimînin*” /Efesî 2:10/.

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî piştî gotina 9-a xebera “çimkî” tê. Ev xeber herdu cumila hevva dide girêdanê. Bi gilîkî mayîn gotî, herdu xeberên pêşda destpêka fikira derbazkirinêne û fikira cuda nînin. Xebera “çimkî” dide kifşê “rûyê vê yekêda”, bo wê yekê jî, bi raberkirina gotinên 8-a û 9-a, gotina 10-a gerekê bê hesabhildanê. Heger usa nîbe, hûnê fikira ku tê derbazkirinê fem nekin.

Nava gotina 10-a da nivîsar e, wekî em karê destê Wî ne, bona armanca mexsûs hatine çêkirinê, bona ku karên qenc bikin. Dêmek, Pawlos nava van hersê gotinada vê yekê dibêje:

“Em bi kerema Xwedê xilazbûyîne, *berê ewlin bona bûyîna lawê Xwedê*, û hema wê keremê weke hev qewat daye me hemûya, *bona ku em bişuxulin*”.

Em tu cara gerekê rastîkê kîsî hesabildana ya mayîn nedine kifşê. Feqet, îzinê bidin pêşda bêjim, wekî heyîna meye nava Îsa Mesîhda diha zêde girînge, ne ku karên me, çimkî *hemû karên me gerekê ji heyîna me bixulî-qin*. Gelekî hêsa ye wextê ku meriv ji dewa şuxulkarîyê xwe dûr dixê, çimkî em bi wê yekê xwe ji her hukumekî aza dikin, girêdayî wê yekêra, wekî em gerekê tiştêkî bikin, bona ku padişatîya Xwedê çê bikin. Lê belê, rastî ewe wekî hema karên me qewatê didine me. Îsa dibêje: “Xwerina Min ewe, ku Ez xwestina Yê ku Ez şandime bikim û şuxulên Wî bînime sêrî” /Yûhenna 4:34/. Ew usa jî dibêje: “Çawa ku Bavê Ez şandim, usa jî Ez we dişînim” /Yûhenna 20:21/. Bi yekkirina van herdu gotina, em zelal dibînin, wekî xwerina me ewe, ku em xwestina Îsa, Yê ku me dişîne, mîyaser bikin û serhevda bînin. Xwerin ewe, çî ku qewatê dide me. Heger em xwerinê nestînin, emê zeyîfbin û bona hindik tiştî emê bikaribin bixebitin.

Niha em vê yekê jîyana xweye ruhanîva girêdin. Heger em xwestina Îsayê ku me dişîne mîyaser nekin, emê zeyîf bibin û bona ji rîya xwe derketinê bibine hedef.

Piştî pevgirêdanên ji 40 salî zêdetir, yên tevî Îsa, min dîtîye wekî menîke sereke, ya dûrketina ji bawarîyê, tunebûna xebata ye. Meriv hindava navê xwe dibine xweranedîtî û bêkar û texmîn nakin ku çawa dikevîna nava bêesilîyê, yan jî guhdarîya xwe didine li ser hewaskarîyên usa, yên ku wana paşda vedigerînine li ser qeydê vê dinîyayê. Ew qewata xweye ruhanî unda dikin. Bi serhevdaanîna vê yekê, meriv dikare bêje:

Ew çî ku em dikin, me dide qewatkirinê

Îzinê bidin ku ez rastîya van hersê gotinên ji Încîlê biwekilînim. Hûn careke mayîn bi kerema ji Xwedê dayî, ji dayîkbûne, bona ku bibine lawê Xwedê û we bi wê keremê qewat standîye bona ku bişuxulin. Încîl dibêje, wekî Xwedê pêşda hemû şuxulên me progiram kirine.

Dawid dibêje:

“Te pêşîya jidayîkbûna min ez dîtîm. Her rojeke jîyana min kitêba Te da nivîsar bû. Her deqeke min progiramkirî bû, wextê ku te rojeke min hê nehatibû” /Zebûr 139:16, NLT/.

Hetanî bûyîna we, Xwedê bona we şuxul hazir kirine. Û Ewî kitêbeke cudada ew nivîsîne. Meriv tenê dikare bîne ber çavê xwe ku ew kitêb çiqasî mezine, çimkî her deqeke jîyana me têda hatîye nivîsarê. Ew şuxul, yên ku Ewî bona me progiram kirine, derheqa çêkirina padişatîya Wî da nin. Xwestina Wî ewe, ku em wî hemû tiştî bikin, çî ku Ewî bona jîyana me progiram kirîye, lê garantîya tune ku emê wê yekê bikin. Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî Efesî 2:10-da nivîsare, “ku nava wanda em *bikin*”. Nava vê xeberêda nivîsare «û emê nava wanda *bikin*», lê ne ku “wekî nava wanda *bikin*”. Xwestina me aza ye: Ewî pêşda bona me şuxul hazir kirine, lê em qirar

dikin, ku emê anegorî progirama Wî bişuxulin, yan na?

Ez li ser wê fikirême, wekî emê li dîwana bawarmenda li ber Îsa bisekinin /li kîderê emê heqê bona karên xweye kirî bistînin, çawa mesîhî, yan jî emê zyanêkevin heger kêmasiyên me hebûne". Ewê kitêbê veke û wê bêje: "Were em himberî hev bikin ku jîyana te bi çiqasîva anegorî wê progiramê bûye, ya ku Bavê Min û Min pêşda bona te hazir kirine"/ Çi ku derheqa dîwanêdane, nava herdu gotinên Încîlêda nivîsare, wekî "kitêb vebûn": bixwînin Danîyêl 7:10 û Eyantî 20:12. Ez bawarim, wekî Xwedê ev kitêbên derheqa jîyana meda hetanî bûyîna me nivîsîne. Çi ku derheqa navê meyî mexsûsdane, emê anegorî wan şuxula neyêne cezakirinê, yên ku me kirine, lê bona wan şuxula, bona mîyaserkirna kîjana ew hatine gazîkirinê. Eva fikira hişyarkirinê ye.

Diqewime niha hûn hinekî bitirsîn. Hewcetîya wê yekê tune. Sê tiştên girîng hene, kîjana gerekê hesab hildin. Yê ewlin, Xwedê diha zêde divedine, lê ne ku hûn, ku hûn wê yekê bikin, bona çi Ewî gazî we kirîye. Ew diha zêde dixweze ku hûn navê xwe eşkere bikin. Yê duem, bona ku hûn nava navê xweda bi temamî bişuxulin, pêşkeftin lazime, lê ne ku bûyareke yekcare: bo wê yekê jî dijî bêsebiriyê derbikevin. Ya sêem, vê kitêbêda hûnê şewirên kardar him ji Încîlê, him jî ji cêribandina jîyanê bibînin, bona eşkerekirin û pêşxistina navê xwe.

Awa mînakeke wî cûreyî bona şirovekirina vî hemû tiştî. Bînin ber çavê xwe, wekî ez serokê komîtêya bajarçêkirinême û ez dixwezim li merkeza bajêr komplêksa jîyînê, hêsbûnê û kirîn- frotanêye baş çê bikim. Çawa serokê komîtêya bajarçêkirinê, ez arxîtêktorê serekeme, û ez projeya wê komplêksêye sereke tevî çêkiriyên avahîya û arxîtêktorên profesîyonal hazir dikim. Ez dixwezim, wekî nava wê komplêksêda cîhên listikê, karûsêl, deştên sportê, baxçe, cîhê bona hêsbûnê û gerê hebin. Ez usa jî dixwezim ku li qatên ewlin, yên avahiyên jîyînêda, dikan, rêstoran, sînema û tiştên mayîn hebin, bona ku komplêksa me bi başbûna xwe cuda bibe.

Çawa ku proje hazir dibe, ez qîrar dikim ku hevaltîyên çawa gerekê beşên projeyêye sereke çê bikin. Ez çend hevaltîya kirê dikim û wedê kirina xebatê didime wan. Proje bona destpêkirinê hazire.

Heger hemû hevaltîyên kirêkirî wê yekê rast bikin, çi ku ez hîvî dikim, wî çaxî ew projeya berfireh wê rihet û bêyî rawestandî bê çêkirinê û bixebite. Feqet, wê çi bibe heger ji wan hevaltîya çend heb wê projeyê çawa gava ewline sereke hesab nekin? Lê wê çi bibe, heger ew yek wê yekê qebûl bikin, lê profesîyonalîzma xwe bona xebatên başqe bidine xebatê? Wê çi bibe, heger ew herine mesîgirtinê, golfê bilîzin, yan jî herine klûbên sportê û xebatê hesab hilnedin? Wê çi bibe, heger yên mayîn xweranedîtîbin û bi cûrê rast nêzîkî karê xwe nebin? Heger ez bi temamî van hevaltîyava girêdayîbin projeyê wededa neyê mîyaserkirinê. Meriv dikare bêje, wekî ewê usa jî ser hevda neyê.

Hevaltî bi xwe qîrar dikin ku çi cûreyî wedê xwe kifş bikin û xebatkarên xwe bidine xebatê. Feqet, çawa serokê komîtêya bajarçêkirinê, ezê wê yekê

qebûl nekim. Dewsa wê yekê ezê hevaltîyên başqe bînim, bona ku nava wedê kifşkirîda xebat bê kirinê û ser hevda bê.

Nava encamda wê çi bibe? Hevaltîyên ewlin wê heqê xwe nestînin, bi wê fikirê, wekî ewê nebine endamên vê koma baş, ya ku ew komplêksa bedew çê kir. Ewê nikaribin nîşanî zarokên xwe, nebîyên xwe û hevalên xwe bidin ku li vê beşa bajêre bedew xebateke çawa kirine. Zarokên wana wê nikaribin gilîkin ku dê û bavên wan tevî xebateke çawa bûne. Ewê jî heqê xwe undakin, bi wê fikirê, wekî wê bona xebata kifşkirî heq nestînin.

Hûn dikarin bibînin wekî hema ew prînsîb nava temamîya Încîlêda çawa mînak tê xebitandinê. Progirameke Xwedê, ya bona çêkirina padişatîya Wî, heye. Lê belê, nava dîrokêda Xwedê mecbûr bûye tevî merivên usa bişuxule, kîjana xwestinên Wî nekirine. Ew mecbûr bûye progirama Xweye destpêkê biguhêre, û ez fikirdarîyên merivatîyê didime xebatê: Xwedê dawîyê ji destpêkê zane, çimkî Ew wedeva sînorkirî nîne. Dêmek, “guhartina” programê bona Wî tiştêkî nişkêva nîbû. Ewî pêşda derheqa qirarên merivên ku qulixî Wî dikirin zanibû û îdî guhartina wan jî hazir kiribû.

Ezê çend mînaka ji gelek mînaka bînim ber çava, yên ku Kitêba Pîrozda hene. Ev yek hate serê bavê Abram Têrah /van axirîya kurê meyî biçûk Ardên derheqa wê rastîyêda anî bîra min/. Ji me gelek meriv zanin, wekî Abram li bajarê Êrê hatibû dinîyayê û mezin bibû, hetanî ku Xwedê gazî wî kir ku ew here welatê Kenanê. Ev yek jî awqasî eyan nîne: heger guhdarîyê bidine ser bavê wî Têrah, hûnê eşkerekin, wekî ew bi texmîn bona wê yekê hatibû gazîkirinê.

Nivîsare:

“Û Têrah kurê xwe Abram, nebîyê xwe Lûtê kurê Haran û bûka xwe Saraya jina kurê xwe Abram hildan, rabûn ji bajarê Ûra Kildanîya çûne *berbi welatê kenanîya*, ew gihîştine Haranê û li wir cîhwar bûn. Têrah 250 salî emir kir û Têrah Haranêda mir” /Destpêbûn 11:31, 32/.

Du tişt hene, kîjana em gerekê hesab hildin. Yê ewlin, bona çi kesek, bêyî tu menîkî, gerekê temamîya malbeta xwe hilda ji Êrê derketa û ji hezar kîlômêtrî zêdetir biçûya û ew jî berbi welatê Kenanê? Rêwîtiya bi deva gelekî hêdî û girane. Wê yekê, tevî jina û zaroka, bi texmîn çend meha kişand. Çetin Têrah dikaribû bi întêrnêtê wêneyên Kenanê bidîtana û miqalên derheqa wîda bixwendana, wekî Kenan welatekî bona jîyînê û xebatê welatekî başe. Ew derheqa wê yekêda usa jî ji nivîsarên torên sosiyalî pê nehesîya. Menîya vê cîguhastina dûr gerekê hebûya.

Yê duem: heger ew diçû Kenanê, bona çi ew li Haranê ma? Bona çi ewî rîya xwe ser hevda neanî û negihîşte cîhê meremê xwe? Diqewime Têrah rûyê serhevdaanîna rîya xwe xalîfî? Diqewime xwestinên wîye usa hebûn, ku dijarî pêşda dianîn, wekî ew rastî dijarîya hatibû, wekî endamekî malbeta wî rêva westîyayî bû, yan jî menîyên başqe hebûn? Diqewime ewî gelek

derfet li Haranê dîtin û nexwest rûyê gotineke Xwedêye stendîda berbi rîskê here?

Bi hesabildana vê yekê, em dikarin bifikirin wekî Têrah ji alîyê Xwedêda hatibû bijartinê, bona ku bibûya “bavê gelek mileta”? Meriv dikare bêje wekî hema pêşda ew gerekê bibûya “bavê bawarîyê”, nenihêrî wê yekê, wekî ew nav yê Abrame /bixwînin Romayî 4:16, 17/.

Têrah qîrar kir ku hetanî dawîyê here: ew li Haranê ma. Ez bawarim, ku heger ew li ser pêşdaçûyîna xwe bima, îro meyê derheqa serhatîyên wî û peymanî wî tevî Xwedê morkirî bixwenda. Ez bawarim, wekî cimeta Îsrayêlê wê ew çawa bavê xwe hesab bikira, û wekî ewê Îsa çawa “lawê Têrah” nav bikirana, lê ne ku “lawê Abram” /bixwînin Galatî 3:16/.

Mînaeke guhartina progirama Xwedê hema hakim û serekahîn Hêgî bû. Ew û peyhatîyên wî çawa kahîn hatibûne kifşkirinê, yên ku gerekê bona cimete nêzîkî Xwedê bûna. Lê belê, pêxemberekî şandî got:

“Xudan Xwedêyê Îsrayêlê dibêje: “Min soz da, ku bera ji eşîra Gêvî gerekê li ber Min her dem kahîntîyê bike. Lê Ezê qedirê wana bigrim, yên ku qedirê Min digrin, û Ezê wana bêqedir bikim, yên ku Min bêqedir dikin. Wede tê, wextê ku ezê dawîya malbeta te daynim, û ewê îdî tu cara li ber Min kahîntîyê neke” /A Padişatî 2:30, 31, NLT/.

Gurênekirina Hêgî him hukumî ser wî û him jî hukumî li ser peyhatîyên wî kir. Heger Hêgî li ber Xudan bi qedir bişuxulîya, wî çaxî eşîra wî wê kahîntî xweyî bikira.

Dîsa mînaeke wî cûreyî meriv dikare ya hemû padişayên Îsrayêlê hesabke. Yê ewlin kurê Dawid Silêman bû. Xwedê gote wî: “Te peymanî Min xweyî nekir û te gura temîyên Min nekir, bo wê yekê Ezê padişatîyê ji te bistînim û bidime xulamê te” /G Padişatî 11:11, NLT/.

Heger Silêman bi helalî bima, padişatîya wî wê tu cara ji kurê wî nehata stendî. Pirañiya padişatîyê bona Hêrobovam hate dayînê, lê paşê ew jî amin nema. Xwedê gote wî:

“Tu ji cêrgên merivên sade bûyî û Min pêşkeftin da te û Min tu kirî mîrê cimeta Xweye Îsrayêlê. Min padişatî ji malbeta Dawid stend û ew da te. Lê tu mînanî xulamê Min Dawid nîbûyî, yê ku gura temîyên Min dikir û bi temamiya dilê xwe peyî Min dihat û her dem ew yek fikir, çî ku Min dixwest... Te piştî xwe da Min, Ezê qezîyayê bînim serê padişatîya te” /G Padişatî 14:7-10, NLT/.

Padişatîya Hêrobovam wê bima, heger ewî tabîya xwe û pêşkêşên xwe bona berjewardîyên xweye şexsî nedana xebatê, lê ew bona berjewardîya padişatîya Xwedê bidana xebatê. Temîya wî cûreyî usa jî padişê Îsrayêlê

Baasa stend /bixwînin G Padişatî 16:1-7/, usa jî ewên mayîn, yên ku padişatî stendibûn.

Gotina min eve: gelek cara bêaminîya meye hindava Banga Xwedê ne tenê hukumî li ser me, lê usa jî hukumî li ser nisiletên me dike. Nava mînaka Têrahda ew yek neqewimî, lê mînakên wî cûreyî gelek bûn.

Halê wî cûreyî usa jî em nava jîyana pêxemberada dibînin. Yêlîsê qulixî Îlyas kir û rûnkirina wîye dubare stend. Piştî çend sala, Gêhêzê xulamê Yêlîsê, yê ku gerekê sirîya xweda pêşkêşa pêxembertîyê qebûl bikira, guhdarîya xwe neda ser tiştê girîng û ji navê xwe miqûf ma. Ew kotî bû û dest ji qulixa xwe berda, bona kîjanê ew pêşda hatibû gazîkirinê /bixwînin D Padişatî 5:20-27/. Dewsa wî xulamêkî nû cîhê xwe girt /navê kîjanî kifşkirî nîne/, bona ku alî Yêlîsê bikira.

Nava Peymana Nûda ev yek hate serê Cihûdayê ji Îsxeryotîyê. Ewî navê xwe û pêşkêşên xwe bona wî meremî nedane xebatê, dewsa wî gerekê yekî mayîn bibûya. Petrûs gote şagirtên li Mala Jorin berevbûyî /derheqa vê yekêda kitêba Zebûrada nivîsare/: “Bila yekî mayîn dewsa wî cîhê xwe bigre”. Em niha gerekê dewsa Cihûda yekî mayîn bibijêrin /bixwînin Karên Şandîya 1:20, 21, NLT/.

Gelo çiqasî tiştêkî bi êşe, û çiqasî tragîke. Fikira derheqa wan merivada dikare me hişyar bike, yên ku wê poşmanbin, çimkî wana nav û pêşkêşên xwe bi cûrê layîq nedane xebatê.

Niha em derbazî alîyê baş bibin: hûn, xwendevanê giranbiha, bi armanc, bona armanca mexsûs hatine dinîyayê. Qîmetê jîyana we bona çêkirina heta-hetayê mezine. Ê ev yek xwestina mêr yan jineke sade nîne, lê ji alîyê Xwedêda hatîye qirarkirinê.

HÛN KARDARÎYA XWE QIRAR DIKIN

Ew çî ku ezê bêjim dikare bona we tiştêkî nişkêvabe. Kardarîya we ne ku Xwedê, lê hûn qirar dikin. Ev gotin dikare ya bê tirs be, heger hûn bawar dikin wekî hemû destanînên jîyana we tenê encamên serwêriya Xwedê ne. Lê belê, ez didime bawarkirinê, wekî ev gotin ne ya bêtirse, ne jî serwêriya Xwedêye here bilind dide biçûkkirinê. Ew şedetîyê dide, wekî Ew aminaya xwe li me tîne û dixweze ku law û keçên Wî ewê xwestina aza bidine xebatê, ya ku Ewî daye me.

Em careke mayîn veqerine li ser beşa ji Kitêba Pîroz, bi kîjanê me ev serê kitêbê destpê kir:

“Serwaxtî wê rojên te çendbareke û wê salên jîyana te zêdeke. Heger tu serwaxtbî, tê ji wê yekê karê bistîn”.

– Gotinên Silêman 9:10-12, NLT

Ev rastî çiqasî ya piştgirîyê û hukumdare. Gelo “rojên te wê çendbareke”, çî dide kifşê. Ew yek nikare bide kifşê, wekî jîyanê dirêjbe, çimkî gotina “û wê salên

jîyana te zêdeke” îdî derheqa wê yekêda dibêje. Fikira tek-tenê, ya ku dikare hebe, her roj zêdekirina kardarîya weye. Bi gilîkî mayîn gotî, hûnê ji her rojekî diha zêde bistînin, lê ne ku ew meriv, li cem kîjana serwaxtîya Xwedê tune.

Çawa jî hebe, we ev gotin bihîstîye: “Heger balte ko ye û meriv wî tûj nake, ewê diha zêde qewatê bide xebatê, lê serwaxtî açixiyê dîne” /Zanebûn 10:10, NKJV/. Ew yek derheqa serwaxtîyêdane. Hûnê bi baltê ko kardar nîbin /heger serwaxtî kême/. Wekî mayîn jî rastîye: hûnê bikaribin diha zêde dara bi baltê tûjkirî bibirin /bi jîyîna bi serwaxtîyê/. Hûnê kardarîya xwe çendbare bikin, heger hûn dîsa wê qewatê bidine xebatê.

Serwaxtîya Xwedê gelekî girînge. Vê kitêbêda, diha dereng, ezê serpêhatîke derheqa hevalekî xweda gilîkim, yê ku bi deha sala ser hev bawarmendekî nekardar bû, lê paşê ew ji wî halî westîya. Tiştê herî pêşin, çî ku ewî kir, bi kel û ced xwendina Încîlê bû. Bi saya wê yekê, ewî serwaxtî stend, bona ku diha kardarbe, û hûnê zendegirtî bimînin, heger hûn serpêhatîya jîyana wî bixwînin.

Încîl ne tenê bona hevalê min dibêje, lê bona hemûya: “Stendina serwaxtîyê tiştê herî girînge ku dikarî bikî” /Gotinên Silêman 4:7, GNT/. Ev gotin li min xweş tê. Çawa ku hûn bawarîya xwe li van xebera bînin, hûnê wede û qewatên xwe bona stendina serwaxtîyê bidine xebatê. Feqet, rastîya Gotinên Silêman 9:11, 12-aye here girîng eve: “Çawa ku hûn serwaxtîyê bistînin, *hûnê karê ji wê yekê bistînin*”.

Serwaxtîya Xwedê, bi kîjanê ez vê kitêbêda tevî we pareve dibim, min nava encamê gera bi salên dirêj û guhdarkirinê stendîye û ew yek bi cêribandinên him baş, him jî xirab, hatîye rêberkirinê. Feqet, çawa ku we dît, ne tenê ez, lê usa jî gelek meriv, rastî kîjana ez hatime, bi serwaxtî şuxulîne û encamê baş dane. Ez tenê dikarim hêvîdarbim, wekî hûnê nava wedekî kurtda wê yekê bistînin, bona kîjanê salên dirêj ji min hatine xwestinê û wekî hûnê bi vê serwaxtîyê diha dûr herin, ne ku çawa ez çûm. Eva karê Padişatîya meye, bi kîjanê em hemû yekin: heger hûn karê bistînin, ezê jî karê bistînim. Heger hûn diha zêde pêşda herin, ne ku ez, ewê karê bide min jî, çimkî em hemû jî yekin. Em hemû jî bona armancekê û rûmeta Padişayekî dişuxulin.


SUR

Em bi vê pirsê derbazî serê kitêbêyî mayîn bibin. Weyê bixwesta surek bizanibûya, derheqa kîjanêda gelek meriv haj pê tunene û bi saya kîjanê karêbûnên we wê berfirehbin, wê diha zêdebin, wê ji wî hemû tiştî zêdetirbin, çî ku we nava jîyana xweda dîtîye?

Bi fikira min usaye. Gilî derheqa wê yekêdane, wekî bi rastî, sura wî cûreyî heye. Û zûtirekê hûnê wê rastîyê eşkere bikin.

BIFIKIRIN

1. Anegorî Efesî 2:10, hetanî bûyîna we Xwedê îdî ew hemû tişt program kirine, çi ku nava jîyana weda gerekê bibe. Gelo we xwestîye ku hûn wan program bizanibin? Çi îzin nedaye ku hûn wana eşkere bikin?
2. Hûn bi armancakê hatine dinîyayê, bona armanceke mexsûs. Bi fikirmîşbûna derheqa serpehatîya Stênda, hûn li pêşkêş û karebûnên xwe çawa dinihêrin? Gelo hûn hesab dikin wekî ew bona çêkirina padişatîya Xwedê girîngin, yan hûn jî mînanî Stên şikilê tomerî nabînin?
3. Mîyaserkiririna xwestina Xwedê qewatê dide me. Gelo ew çi ku hûn niha dikin qewatê dide we? Hûn xebata xweye niha hiz dikin? Heger usa nîne, bona çi hûn razîbûnê texmîn nakin?



“Heger pêşkêşên meye cûre-cûre hene,
anegorî wê keremê, ya ku mera hatîye dayînê,
werin em wana bidine xebatê”

– Romayî 12:6, NKJV

Karebûnên derbazkirî

Hevalekî min heye, navê kîjanî Cîm e, yê ku 18 sala ser hev telîmkirê koma keçên dersxanên bilinde baskêbolê bûye. Nava temamiya wî wedeyîda ew nava lehca ştatêda nikaribû ser biketa. Hersal koma wî yan nava lîstikên nehîyêye finalêda bin diket, yan jî dighîşte lehca ştatê û hema êtapa ewlinda jî bin diket.

Cîm minra gilî dikir:

-Min hêvîdarîya xwe unda kiribû û ez hazir dibûm teslîm bûma, lê hema wî çaxî jî min qewata kerema Xwedê eşkere kir.

Cîm biryara zelal kir, wekî wê îdî tu cara telîmkirin bi qewatên xwe derbaz nekira, çawa ku ewî 17 sala ser hev kiribû, lê ewê bi temami gumana xwe bida ser *kerema Xwedê*. Ewî ji Xudan pirsî, ku ew çî gerekê bike, û Xwedê bersiva wî da: "Cûrên telîmkira biguhêre. Dewsa telîmkirên 90 deqê, 45 deqên ewlin li cîhê kincguhartinê derbazkin, Încîlê bixwînin, dua bikin, lê 45 deqên mayîn jî xwe telîm bikin".

Cîm minra gilî dikir:

-Con, ew yek tê bêjî kardar nîbû. Em gerekê li ser profêsîyonalîzm û stratêciya lîstikê bixebitîyana: her deqeke 90 deqên telîma minra lazim bûn. Feqet, min zanibû, ku min ji Xwedê çî bihîstibû.

Ewî xeberdana xwe berdewam kir:

-Min stratêciya xweye nû rabeirî keçika kir. Ew fikirîn wekî ew yek hinekî tiştê ruhanîye û wekî tiştêkî bêfikire. Hinek jî carekêra aciz bûn, dema ku cara ewlin ew yek bihîstin, lê piştî wê yekê, dema ku min diha bi hûrgilî derheqa biriyara xweda gilî kir, ew qayîl bûn.

Ew kenîya û got:

-Wê salê em cara ewlin nava lehca ştatêye baskêbolêda ser ketin. Tê bêjî ew yek bes nîbû û sala mayîn jî em serketin.

Ewî axaftina xwe berdewam kir û derheqa lehca duemda gilî kir:

Ew yek tiştê bawarkirinê nîbû, çimkî me listika dawîda hemû derbên duqalê tê berdan. Piştî awqas têberdana em gerekê serneketana. Feqet, piştî lênihêrandina hemû tiştî, me fem kir wekî me nava wê listikêda bi derbehên sêqalê rêkord lêxistibû. Derbehên sêqalê dewsa têberdanên me girtibûn û em gîhandibûne hesabê serkeftinê.

HÊZ

Cîm serwaxtîya xwedêtîyê stend, hema ew serwaxtî, ya ku Pawlosê şandî eşkere kir, û yê ku anegorî lênihêrandinê ji alîyê 90 selefê civîna sedsala 21-êda nehatîye hesabhildanê. Ew yek eve: *kerema* xwedêtîyê ne tenê pêşkêşa xilazbûna Xwedê ye, lê *qewata Wî* ya jî bona jîyana me. Wê yekê bixwînin çî ku Pawlos dinivîse, lê bîra xweda xweykin, wekî eva gotina raste ji devê Xwedê ye: “*Kerema Min* ew hemû tşte, çî ku te lazime, çimkî *qewata Min* tiştê herî blinde, wextê ku tu *zeyîf*” /B Korintî 12:9, GNT/.

Nava vê xeberêda tiştên nezelaal tunene. Xwedê raste-rast dibêje, wekî *kerema Wî qewata Wî* ye. Xebera “*zeyîf*” nava vê gotinêda çawa “bêcare” dide kifşê. Xudan Pawlosra, usa jî min û wera, eyan dike: “*Kerema Min* nava halên usada dişuxule, yên ku ji karebûna weye sade bilindtirin”.

Cîm 18 sala bi kel û ced xebitîbû, bi temamîya qewatên xweva cêribandibû keçên koma xwe bighîne lehca ştatê, û gelo nava encamê wê yekêda çî qewimî? Tu tişt jî nebû, xêncî bêaçixiyên 18 sala. Lê belê, hêja bû wan bêçixîya û gelek acizîyara boy wê serwaxtîyê derbaz bûna, ya ku Cîm eşkere kir: *kerema Xwedê qewatê dide me bona ku em ji karebûnên xweye sade derbaztir bibin.*

Nameke mayînda Pawlos tiştêkî wa dibêje: “Ez diha gelekî xebitîm, lê ne ku şandîkî mayîn”. Gelo ewî bi rastî tiştêkî usa nivîsîye? Bifikirin ku ew derheqa kêda dibêje: Petrûs, Aqûb, Yûhenna, Barnabas, Apolos û cêrge qulixçiyên mayîne

berbiçev. Eva tê bêjî hinekî tiştêkî baş nîne. Lê belê, heger hûn berdewama gotina wî bixwînin, hûnê fem bikin ku ew yek usa nîne:

“Ez diha zêde xebitîm, ne ku şandîkî mayîn, lê bi rastî ew xebata min nîbû, lê *kerema Xwedê* bû ku minda dişuxulî” /A Korintî 15:10, GNT/.

Pawlos bi qewata Xwedêva firnax dibû, lê ne k bi karebûna xweva: dêmek, nava gotinên wîda ewî pesinê xwe nedida. Ewî gumana xwe dida li ser keremê, bona ku mîsîya xweye xwedêtîyê biqedanda. Piştî acizbûnên bi sala û piştî stendina ronahîyê, Cîm nava xweda gumana xwe dide li ser kerema Xwedê, bona ku karebûnên xwe derbaztirbe. Ewî destpê kirîye vê

serwaxtîyê nava hemû govekên jîyana xweda bide xebatê: baltê wî tûj bûye.

Bi xweykirina vê yekê, bîra xweda xweykin ku em paşda vegerine berbi mîsîya xweye şexsî. Careke mayîn, Xebera Xwedê eyan dike: “Belê, em çêkirçiyên Wî ne, yektîya Mesîh Îsada xuliqî, bona kirinên qenc, bona kîjana Xwedê pêşda hazir kir /yan jî yên ku Xwedê pêşda bona me hazir kirin/, ku em wanda bimînin” /Efesî 2:10/. Xwedê bi Xwe, heya bûyîna we programa we hazir kirîye. Û ew navê mexsûs ewe, yê ku wê razîbûna rast bide we, yê ku nikare xebat yan jî mijûlîke başqe bide. Ew armanca weye û bi mezinaya xwe balkêşe. Bi rastî, rastîke girîng derheqa mîyaserkirina wêda heye, kîjanê hûn gerekê bizanibin:

*Ew navê ku Xwedê bona we hazir kirîye,
ji karebûna we ya sade bilindtir e.*

Ezê vê yekê gelekî zelal şirove bikim. Ew yek tiştê bûyîne nîne, ku em bi karebûna xwe bikaribin tiştê ku Xwedê bona me hazir kirîye, mîyaserkin. Ez derheqa vê yekêda ji kîderê zanim? Çimkî Xwedê bêşikberî elam dike, wekî Ewê rûmeta Xwe nede tu kesî /bixwînin Îşaya 48:11/. Heger ji me kesek bikaribûya bi karebûna xwe navê xweyî xwedêtîyê biqedanda, wî çaxî Xwedê wê mecbûr bûya, bi rûmeta Xwe tevî me nivî bûya, lê Ewê wê yekê neke. Xwedê bi zanebûn usa kirîye, wekî navê we ji karebûnên weye sade bilindtirbe, bona ku hûn mecbûr bibin, gumana xwe bidine li ser *kerema* Wî ku hûn wê yekê biqedînin.

KAREBÛNÊN MEXSÛS

Ya mayîn, em gerekê pirskin ku gelo karebûn yan jî pêşkêşên mexsûs hene yan na? Bi gilîkî mayîn gotî, çawa ku kerem qewatê dide me bona ku em bijîn û ji karebûnên xweye sade bilindtirbin, gelo pêşkêşên ji Xwedêda dayî hene, yên ku hema wî cûreyî jî qewatê didine me ku em mîsîya xweye mexsûs biqedînin?

Îzinê bidin bi çend meseleva ez bersivê bidim. Rocêr Fêdêrêr

wê nebûya tînîstêkî dinîyayêyî bi nav û deng, heger top û darê tînîsê tunebûna. Li tu bajarekî wê profesîyonalîzma darçêkirina pêşezaneke wê eşkere nebûya, heger hacetêş wî tunebûna. Hûnê tu cara derheqa Mîkêlancêlo-da pê nehesîyana, heger hacetên wîye şikilkişandinê tunebûna. Gelo ev yek dîsa derheqa navên xwedêtîyêdane?

Du serpehatîyên kurt wê alî me bikin, ku em bersiva vê pirsê bidin. Dema ku ez ji nûva nava qulixêda bûm, min nasîya xwe da rêberekî cuda. Ew hê nîveka salên 1900-î rêber bûye û bi nav û deng bûye. Ew mizgîndar salên

1970-î wefat bibû, lê paşê qulixa xwe destpê kiribû.

Ew salên 1980-yî gelek cara hatibû civîna me û gelek cara min bi qedir li wî dinihêrî û guhdarîya wî dikir: ew merivekî bi keremê bû. Ew sazbandên ku min zanibûn, gelek hindik meriv dikaribûn mînanî wî pîyanoyê xistana, û tê bêjî ewî ew yek, bêyî xebitandina tu cedandina, dikir. Nava çend deqada ewî dikaribû usa bikira, ku 3500 meriv rabûna ser pîya, bireqisîyana û bistirana. Dema ku ewî pesinê Xwedê dida, atmosferê dor-bera dihate guhartinê, hazirîya Xwedê li wandera tijî dibû.

Çend carên dawî, wextê ku ew bona qulixê dihate cem me, îzina min hebû ku min rêberîya wî bikira. Ez tevî wî bûm, min pirs didane wî, çimkî min dixwest derheqa karebûnên wîye xwedêtîyêda pê bihesîyama. Ez pê hesîyam, wekî dayîka wî, ya ku jineke xwedêparêz bû, herroj, bi seheta ser hev dua dikir. Ewî got:

- Con, dema ku ez zikê dayîka xweda bûm, rojekê mêrek /dayîka wî difikirî ew milyaket bû/ hate mala me. Wî merivî, yê ku dayîka min tu cara nedîtîbû, gotîye: "Kurê te wê nava hazirîya Xwedêda rêberîya cimeta bike û wê bi profesîyonalî, ji zarotîyêda destpêkirî, pîyanoyêxe".

Berdewama serpêhatîya wî ez zendegirtî hiştim û ez nikarim wê yekê tu cara bîr bikim. Carekê, dema ku ew zaroka biçûk bûye, ew rûniştîye li ber pîyanoya dê û bavê xwe û bêyî pêşda hînbûnê û cêribandinê, gelekî baş pîyanoyê xistîye. Ewî usa pîyanoyê xistîye, wekî wî cûreyî tenê xwendikarên beşa pîyanoyêye profesîyonal dikaribûn wî cûreyî bikirana. Bêguman, ewî ew yek bêyî nota dikir.

Ji wê rojêda destpêkirî, ewî bêyî xwendina nota pîyanoyê xist. Hemû miqam ewî bi guhdarîya xwe diqedandin. Ewî dikaribû guhdarîya miqamekî bikira û piştî wê yekê ew miqam biqedanda.

Qulixa wî ji yaşê biçûk destpê bûye: ewî wextê berevbûnên civîna bajarê xwe sazbandî dikir. Paşê, pêşkêşa wî bona wî derî vekir, bona ku ewî nava qulixa mizgîndarîyêda ew yek bikira.

Li ber çeva ye, wekî pêşkêşa wî hebû, karebûna xwedêtîyê.

Şexsekî eyan jî Akîyanê Kramarîke, yê ku bêyî dersên şikilkêşîyê, çarsalîyêda destpê kir şikila bikişîne. Şeşsalîyêda ewî tiştên çetin dikişandin. Heyştalîyêda ewî şikilê eyan, yê bi navê "Mîrê aşîtîyê" kişand. Kopîya wî şikilî dîwarê ofîsa minva dardakirî ye.

Li ber çava ye wekî pêşkêşa wî heye, karebûna xwedêtîyê.

Bona çî tenê hinek meriv pêşkêşa distînin? Gelo ew yek bi rastî usa ye?

Em gerekê vê pirsê bidin. Gelo ji lawên Xwedê hinek meriv, yan gelek, yan hemû meriv pêşkêşa distînin? Em careke mayîn xebera vekirina vî serê

kitêbê bixwînin, “Ji tercima sax ya nû”.

“Xwedê bi *kerema Xwe pêşkêşên* cûre-cûre dane me, bona ku em hinek îşa bi kardarî mîyaserkin”

– Romayî 12:6, NLT

Nava vê gotina xwedêtîyêda em du xeberên bêhesab girîng dibînin. Ya ewlin, ya ku me îdî gotûbêj kirîye, *kerem e*, xebera yûnanîye “*xarîs*”e. Heger em herfên “*ma*” li ser “*xarîs*” ê zêde bikin, wî çaxî emê xebera yûnanîye “*xarîzma*” ê bistînin, ya ku nava gotina meda xebera “*pêşkêş*” e. Niha emê derheqa vê xeberêda xeberdin.

Bi sala ser hev, bi lêkolînkirina xebernamên yûnanî û ew hemû tişt ku hemtêkstêda, kîjanada xebera “*xarîzma*” nava peymanê Nûda hatîye xebitandinê, min şirovekirina vê xeberê hazir kirîye:

Xarîzma -kerema mexsûs yan jî pêşkêş, ya ku qewatê dide mêriv, karebûna mexsûs dide.

Gilî derheqa karebûna xwedêtîyêdane, ya ku bona mêriv tê dayînê û ew yek her dem jî karebûna sade zêdetir e. Hinek pêşkêş eşkere gelekî qewatin. Yên mayîn tê bêjî anegoî karebûna mêrive sadene, lê bi rastî ew yên nebînayîne. Hinek pêşkêş jî roja bûyînêda tên dayînê, lê yên mayîn nava jîyanêda, bi Qirara Xudan.

XARÎZMA NIVÎSARÊ

Îzinê bidin ku ez bi mînakên jîyana xweva lêkolîna meye derheqa *xarîzmayêda* destpê bikim /min bi cûrê kurt serpêhatîyên xweye ji kitêbeke xweye pêşda raber kirîye, ya ku tê navkirinê “*Ewên ku heta-hetayêva dilivin*”/.

Xarîzmake jîyana min jî nivîsare. Heger hûn bi sala ser hev dîna xwe nadinê qulixa me, usaye hûn nizanin ku pêşkeftina mine hindava zimanê înglîzî, nivîsara min û zimanê bîyanî, li mektebê li ser dereca nimiz bûye. Carina ez difikirim, wekî dersdarên zimanê înglîzî ez cîguhastî dersxana mayîn dikirim, bona ku mecbûr nîbin dîsa salekê li ber min ber xwe bidin.

Dema ku li mektebê nivîsareke yekperê yan jî duperê teslîm dikirin, bona wê yekê minra çend sehet lazimbûn ku min ew yek bikira. Min cumlek, yan jî du cumle dinivîsîn, çend deqa min li nivîsara xwe dinihêrî û min acizî texmîn dikir ku nivîsara çiqasî nerast û bêfikir bû. Min ew kaxez diqerçimand û ji nûva destpê dikir. Paşê dîsa min ew yek diwekiland, gelek kaxaz, wede û qewatên fikirên xwe xerc dikirin. Bûyarên usa tên bîra min, dema ku min sehetekî dinivîsî û min hê nikaribû du abzas hazir bikirana.

Heger hûn nava xweqîmetkirina minda şikberin, ezê qîmetê têsta xweye

Standartîzasîyakirî wera bêjim. Çawa ku hûn zanin, ev qîmet bona ku mêriv li ûnîvêrsîtêya û îstîtûya qebûlkin, tiştêkî borcdarî ye. Wî çaxî, dema ku ez wê yekêra derbaz bûm, întamên hîmlî *matematîka* û *înglîzî* bûn. *Înglîzîya xeberdanê*, bi texmîn întama zimanê înglîzî bû, wextê kîjanê karebûnên xwendinê û nivîsarê dihatine kontrolkirinê. Qîmetê herî bilind 800 qal bû. Qîmetê min, yê ji *înglîzîya xeberdanê* 370 bû. Heger hûn bi selefa himberî hev bikin, ew yek gelekî xirab bû: ew 42 selef bû û gelekî nimiz bû. Nava van 30-î salên dawîda, wextê wan hemû seferên xwe ez tenê rastî merivekî hatime, yê ku ji întama *înglîzîya xeberdanê* qîmetê ji min nimiztir stendibû.

Werin em pêşda herin, herin berbi wî wedeyî, dema ku ez îdî ji 30-î salî derbaztir bûm. Rojêke havînêye sala 1991-ê, li cîhekî dûr, dema ku min dua dikir, Xwedê gote min: “Kurê min, Ez dixwezim ku tu binivîsî”.

Ez dilê xweda kenîyam: “Xwedê, awqas kur û keçên Te li ser vê dinîyayê hene, diqewime tu me şaş dikî. Çetin Tu bixwzî ku ez binivîsim: dikarî derheqa wê yekêda ji dersdarên mekteba meye zimanê înglîzî bipirsî”.

Min tu bersivek nestend: bêdengî bû.

Min hesab kir wekî bêdengî nîşana qayîlîyê ye. Ez hatime ser wê fikirê wekî hemû tişt xilaz bû, çimkî Ewî tu tişt negot. Feqet, min dilê xweda zanibû ku usa nîbû.

Piştî deh meha, ji ştatên cuda, bi firqîya du hevtîya, du jin hatine cem min û eynî wî cûreyî gotine min: “Con Bîvêr, heger tu wê yekê nenivîsî, çî ku Xwedê dide te, Ewê van tiştê bide merivekî mayîn, lê tê jî bona cabdarîya wê yekê bêyî gazîkirinê”.

Dema ku jina duem ya ji ştata Têxasê, hema bi rastî wî cûreyî gote min, çawa ku jina ewline ji ştata Florîdayê gotibû min, xofa Xwedê peyayî li ser min bû, û ez derbazî kar bûm. Hê sala 1992-a bû, û wî çaxî «iPad» tunebûn, tuenê kaxez û qelem bûn. Min kaxezek hilda û destpêkêda bi herfên mezine tarîkirî nivîsî: “**PEYMAN**”, lê paşê min ev nivîsî:

“Bavo, ez nikarim binivîsim. Bona ku ez gura Te da bim, ez hewcê kerema Te me. Heger ezê binivîsim, ez hîvî dikim, ku her xeberek bi Ruhê Te va ruhdarkirîbe û bi rûnkirina teva tijîbûyîbe. Ez hîvî dikim, wekî ew yek mêra, jina, zaroka, civîna, bajara û welata biguhêre. Ez pêşda sond dixum, ku ezê temamîya qedir, pesinê û rûmetê û razîbûnê bidime Te. Ez vê peymanê tevî Te, bi navê Îsayê qewat mor dikim. Kurê Te û xulamê Te: Con Bîvêr”.

Ji wê rojêda heya niha îdî 30-î sal derbaz bûne. Nava wî wedeyîda min ji 20-î zêdetir kitêb nivîsîne, yên ku bi deha mîlîyon meselava hatine çapkirinê.

Piranîya wan kitêba ketine nava navnîşa kitêbên Ştatên Amêrikayêye Yekbûyî, û usa jî kitêbên navnetewîye tomerî û mesîhîtiyêye bi nav û deng. Ew kitêb hatine welgerandinê li ser ji sedî zêdetir zimana û li temamiya dinîyayê tîn xwendinê, lê li çend welata jî ew dikevîne nava cêrga kitêbên ku gelekî tîn çapkirinê.

Min pêşda 20-30-î selefê sercemên wan kitêba ne *guhdar kirîye, ne xwendîye* û ne *jî li ber xwe derxistîye*. Min ew yek wî çaxî stendîye, wextê ku min têkst îdî bi herfa berev kirîye. Tê bîra min, dema ku ez li kabînetê xweye li malê bûme, yan jî li odeke mêvanxanê bûme û ez bi wê yekêva ruhdarkirî bûme, çî ku min nivîsîye. Ez çend cara bi şabûn banzdame û min kirîye gazî: “Ev yek gelekî başe!”.

Diqewime hûn bipirsîn: “Te çawa dikaribû ew yek bigota? Ew yek kubarî ye”.

Bersiva min ev e. Ez zanim, ku ew matêriyal ji kîderê ye, û ew ji min nîne. Ez bi temami bawarim, wekî navê min li ser kitêba nivîsar e, çimkî li ser vê dinîyayê ez merivê ewlinim, yê ku ew xwendine. Ez zanim, wekî ew matêriyal ji nivîsara Ruhê Pîroz tîn. Gotina min ji gotinên Pawlosê şandî gelekî cuda nabin, yê ku tê bêjî hinekî kubarî dida kifşê û dinivîsî: “Ez diha zêde bi kel û ced dixebitîm, ne ku şandîkî mayîn”. Diqewime ev xeber li ber çavê mêriv çawa yên merivê xwehiz tîn texmînkirinê. Feqet, em ji kitêba Pîroz zanin, wekî Pawlos bi pêşkêşa kerema Xwedêva firnax dibû, lê ne ku bi karebûna xweva.

Ez hêvîdarim, wekî dema ku Xwedê wê rojê ew yek gote min, wî çaxî Ewî *xarîzma* nivîsarê *da* min. Feqet, ew yek nava jîyana mînda hate xebitandinê, dema ku min birîyar kir ku ez gura Wî da bim. Hene meriv, yên ku wê vê gotinêra qayîl nîbin û îzinê bidin, ku ez carekêra bêjim, wekî ev yek awqasî girîngu nîne ku hevraqayîlnebûnê pêşda bînin. Ez fem dikim, wekî fikirên mine derheqa wê yekêda dikarin şaşbin: dêmek îzinê bidin ez wê hevraqayîlnebûnê raber bikim, kîjana hinek meriv dikarin pêşda bikişînin. Hinek meriv wê qayîl nebin wekî ew pêşkêş sala 1979-a minra hatibû dayînê, hema wî çaxî, dema ku ez careke mayîn xuliqîm. Ez nikarim bersiva vê yekê, li ser hîmê cêribandina xwe bidim, çimkî min necêribandîye ji sala 1979-ada heya sala 1992-a binivîsim, dema ku min peymanê xwe nivîsî. Ez bi hêvîdarî dikarim tiştêkî bêjim: ez bi wê pêşkêşêva nebûme, mînanî wî merivî, yê ku pîyanoyê dixist, derheqa kîjanîda min êmekî pêşda gilî kir. Feqet, ew serpehatî dide kifşê, wekî hinek pêşkêş heya bûyîna mêriv tîn dayînê. Mînak, em ji kitêba Pîroz zanin, wekî Yûhennayê Nixumdar ji zikê dîya xwe bi Ruhê Pîrozva /bi Wîva, Yê ku pêşkêşa dide/ tijî bû, çimkî ewî Mesîhê saxî ku zikê Meryemêda bû nas kir, wextê ku ew zikê dayîka xwe

Yêlîzabêtêda bû /bixwînin Lûqa 1:41/. Piştî 30-î salî, hema ew pêşkêşa dilê Yûhennada bû ku Îsa nas kir / berî her kesî/, dema ku Ew bona nixumbûnê hat /bixwînin Yûhenna 1:29/.

Feqet, hinek pêşkêş diha dereng tên dayîne. Şaûlê kurê Kîs jîyana xwe bi pêxembertîyêva destpê kir. Ew yek neqewimî, çimkî ew hê ji alîyê Samûêlêda çawa padişê Îsrayêlêyî ewlin nehatibû rûnkirinê. Samûêl got, wekî piştî hinek wede Şaûlê komeke meriva bidîta, yên ku wê îstrûmêntê sazbandîyê xistana û bibûna pêxember. Ezê xeberên Samûêl bînim ber çeva: “Wî çaxî Ruhê Xudan bi cûrekî zor wê bê ser te û piştî wê yekê tê bibî pêxember”. Tê bêyî guhartinê, bibî merivekî başqe” /A Padişatî 10:6, NLT/.

Bi lênihêrandina ev herdu şedetîyên ji kitêba Pîroz, em zelal dibînin, wekî hinek pêşkêş hema ji zikê dayîkên wan meriva tên dayîne, lê yên mayîn ew paşê distînin.

XARÎZMA DANNASÎNKIRINÊ

Nava jîyana minda *xarîzma* jî xebra belavkirinê ye. Serpêhatîya min, ya derheqa vê pêşkêşêda, wê alî me bike ku vê tîmayê diha baş fem bikin.

Bûyara ewlin, dema ku jina min, Lîzayê bihîst ku min çî cûreyî Xebra Xwedê dannasîn dikir, tiştê layîqî bîranînê bû. Bi cûrê nerm gotî, ew yek teribandineke mezin bû ez serda zêde nakim. Nava pênc deqên ewlinda ew xewra çû û hema usa radiza û paşê hişyar dibû. Tişteki gelekî nebaş bû. Hevala wêye here baş, Êmî, ya ku li rex Lîzayê rûniştîbû, usa kûr raza bû, wekî min didît ku devê wê fireh vebibû û şirik jê diçû, dema ku ew dinîya xewnada bû. Bi rastî gotî, ez xeberdankirekî nebaş bûm.

Wî çaxî min li civîna xweye cîh qulix dikir û ez çawa alîkarê serwêrê civînê û jina wî bûm /civîna me li Ştatên Yekbûyî gelekî hukumdar bû û teşkîla wê dighîşte ji 400-î zêdetir merivî/. Xebata min ew bû, ku min bona pirsên malbeta serwêrê xwe qulix bikira, usa jî bona wan hemû qulixçîya, yên ku bi mêvandarî dihatine civîna me. Borcdarîyên min, yên nava padişatîya Xwedêda kifş bûn. Ew yek pêşkêşa xeberê nîbû, lê qulixa piş perdêda bû /ezê derheqa wê yekêda serîkî mayînda zêde bêjim/.

Feqet, min dicêriband qulixa xwe destpê bikira, çimkî Xwedê nîşanî min dabû ku ez gerekê Xebra Wî bona mileta dannasîn bikim. Şaşîya min ew bû, wekî min ew yek bi qewatên xwe dikir. Û ez hê wê êtapêda bûm, wextê ku hîmlî qulixa merivekî başqeda bûm û gerekê “nava tiştên başda amin” bûma /bixwînin Lûqa 16:12/. Min temamiya wedê xweyî aza bona hazirkirina bangên xwe, pêçan û firotanê dida xebatê /wê diha baştir bûya, heger min ew wede bona qulixa bo jina xwe bida xebatê û bibûma malxwêkî baş bona

wê, lê carina em mecbûr dibin ji şaşîyên xwe hînbin/.

Bi kurtayî gotî, min “qulixa Îsmayêl” pêşda dianî. Bona çi ez wî cûreyî nav dikim? Încîlêda derheqa wê kirina mine wî cûreyî nivîsare. Xwedê Abramra xeberda, dema ku ew 75 salî bû, soz da wî û gotê, wekî bi destî wî kurî ewê bibe bavê mileta. Piştî wî sozî deh sal derbaz bibûn, ku zaroka wî tunebû û ew îdî 85 salî bû. Dêmek Abram û jina wî Sarayê progiram çê kirin ku “alî bikirana” ku Xwedê sozê Xwe biqedanda. Ji wê cêribandina merivatîyê Îsmayêl xuliqî. Bo wê yekê jî ez însîyatîva wî cûreyî çawa “qulixa Îsmayêl” nav dikim.

Dijware bawar bikin, wekî hinek meriva pêşkêş didane min. Min matêrîyalên xwe difrotin, ku min mîsîya xwe mîyaser bikira, ya ku çawa “Qulixdarîya Bîvêr” dihate navkirinê. Fikira me ev bû: “Bi ronaya Wî ye ecêb bigîjine dinîyayê”. Niha, dema ku ez van xeta dinivîsim, ez li ser negihîştîbûna xwe dikenim. Kampanîya me, ya Îsmayêle ewlin, ya ku ji çar kasêta bû, nava kîjanada bû ew banga min, wextê kîjanê jina min û hevala wêye here baş razabûn. Gelo çiqaş meriv usa kûr razabûn, wekî ji devê wan jî şirik dikişîya, dema ku guhdarîya wan kasêta dikirin! Saw minda diçe, wextê ku ez derheqa wê yekêda difikirim.

Hûn bawar dikin, yan na, wî çaxî hemû tişt diha xirab bû. Wî çaxî merivê bona min bi nav û deng mizgîndar Tî Êl Osborn bû, yê ku niha li Ezmanaye. Ew û jina wî nava jîyana xweda rêberîya ji 50-î mîlîyon merivî zêdetir berbi xilazbûnê kirine. Min dixwest mînanî wî dannasîn bikira. Min bi seheta guhdarîya wî fikir, mînanî akila dengê wî dixwend, dersên wî hîn dibûm, gotinên wî û henekên wî jî diwekilandin. Ez ne tenê terîfkirekî xirab, lê usa jî kopîya merivekî mayînî xirab bûm.

Tî Êl hostatîke mezin dannasîn dikir. Wextê ku ewî li civîna me dixwend, meriva her xebereke wî digirtin. Carekê ewî gilî dikir ku çawa, wextê berevbûneke mizgîndarîye pîrmerivêye li Afrîkayê, Xwedê şuxulî bû. Wextê gilîkirinê ew usa ji ecêbên kifş ruhdar bû, wekî bi şabûn kire gazî.

-“Vaû!”.

Ewî xeberdana xwe da sekinandinê: civînê bi guhdarîke mezin dîna xwe didayê. Lê ewî destê xwe hejand û got:

-Xebereke hewaskar e: heger wekî mayîn bixwînî dîsa dibe ew xeber: “vaû!”.

Hemû kenîyan: ew henek li wî hat.

Rûyê negihîştina minda, min destpê kir mînanî wî her dem bêjim “vaû!”.

Min ew xeber usa digot, çawa ku Tî Êl wê carê got. Pîrsgirêka tek-tenê ew bû, wekî tu kes nedikenîya, lê belê, min ew yek fem nedikir.

Û dîsa ser hev ez rastî bêçixîya dihatim û min dicedand tişteki biguhêrim. Paşê min qirar kir terka cêribandinên xwe bidim. Wî çaxî guhartineke ecêb qewimî. Min careke mayîn destpê kir wê qulixa xwe mîyaserkim, ya ku min pêşda dikir. Min destpê kir wedê xweyî aza bidime malbet û hevalên xwe. Peyî wê yekêra, şerkarîya min îdî li pişt min mabû, jîyana min diha tijî bû, gulveda û xweş bû. Bi dîtina razîbûna rast, min fem kir, wekî hemû cedandinên min badîhewa bûn, û min bi hêsanî terka “Qulixdarîya Bîvêr” da. Min zanibû, wekî rojekê Xwedê wê ew yek mîyaser bikira, çî ku soz dabû, lê ew yek wê bi înisîyatîva min nebûya.

Hûn dikarin tê derxin ku çî qewimî, wextê ku ez ketime di navbera edilayê û rihetîyê: piştî çend meha pêşkeftina Xwedê hat. Pêşniyarî min kirin, ku ez bibim serwêrê qulixdarîya cahila, ya civîneke ŞAY-ye ku lez pêşda diçû.

Ezê tu cara roja yekşemêye ewlin bîr nekim. Serwêrê civîna me li temamiya dinîyayê bi nav û deng bû. Wî çaxî, her yekşem meriv ji sehetekê zêdetir bin tavêda disekinîn, ku li cêrgên serayêye ewlin rûniştana, ya ku wextê her qulixekî tijî dibû. Her dem ji Ştatên Amêrikayêye cuda û ji welatên mayîn mêvan dihatine li cem me û wextê qulixa hazir dibûn.

Qulix bi kel û ced pêşda diçû. Hebandin gelekî baş bû. Serwêr nêzikî dikê bû û carekêra derheqa serwêrê koma cahilaye nûda, derheqa minda, elam kir. Paşê, ewî ji min hîvî kir ku ez nêzikbim û bi çend deqa berbirî cimeta li wir berevbûyî bim. Piştî qulixê ez pê hesiyam, wekî wî çaxî jina min tirsîya bû, û diqewime ez jî bitirsîyama, heger wedê fikirmîşbûnê hebûya. Tişteki ecêb bû. Hîvî ji min kirin, ku ez bi xeberê berbirî 2800 merivî bim. Lîzayê bi tirs derheqa encamên wêda fikirîbû: wextê ku ewê bûyarên pêşda bîr anîbûn, û ewê zanibû ku wê çî bibûya. Gelo emê çawa bikaribûna ji wê qezîyayê xilazbûna? Diqewime ew merivên li avayê civînê cara dawî guhdarîya min bikirana, çimkî bêyî şikberî, piştî wê yekê wê hîvî min nekirana, ku min qulixa civînê terîf bikira. Ev hemû tirs li ser wê giran bibûn, dema ku ez nêzikî dikê dibûm. Piştî qulixê Lîzayê minra gilî kir, ku ewê çawa bi nerihetî dua dikir ku min nişkêva nexwesta mînanî Tî Êl Osborn nekira, bi taybetî heneka ku wî kiribû.

Dema ku ez nêzikî dikê bûm, serwêrê me mîkrofon da min. Piştî deqekê temamiya civînê li ser pîya bû: hemû bi şabûn destên xwe li hev dixistin û hemû bi gotinên min ruhdarbûyî dikirine gazî. Min ji çara hetanî pênc deqa xeberda, û nava wî wedeyîda 2800 merivên li wir li ser pîya man. Paşê min mîkrofon da destê serwêrê xwe û ez paşda vegeirîyame cîhê xwe. Wextê pênc deqên mayîn ez bi şabûn ji adrenaline, yan jî ji hazirîya Xwedê, dilerizîm.

Jina min zendegirtî mabû û bawarîya xwe li çevên xwe nedianî. Piştî qulixê ewê minra got:

-Con, ez difikirîm: “*Kî ketîye bedena malwxê min?*”.

Em li ştata Têxasê diman, dema ku min ji nûva, cara ewlin cîhê xwe li ser tabîya qulixa xweye ewlin girt, lê civîna meye nû li ştata Florîdayê bû. Bi sala ser hev, jina min vî cûreyî ew yek raberî wan meriva dikir, yên ku derheqa meda dipirsîn: “Dema ku em sînorê Florîdayêra derbaz bûn, Con wî çaxî bû merivekî başqe”. Gotineke wî cûreyî derheqa Şaûlda hatîye nivîsarê, wî çaxî wextê ku pêşkêşa Xwedê hate nava jîyana wî /bixwînin A Padişatî 10:6/.

Ji wî çaxîda destpêkirî, min dannasîn kirîye, hîn kirîye û li ber meriva xeberdaye, û bi piranî min ew yek bi hêsanî kirîye /derheqa wedê xweyî giranda ezê serîkî kitêbêyî mayînda bêjim/. Bona wê yekê min îdî cedandinên mezin nedidane xebatê. Ew tevîhevbûn îdî tunebû, ya ku min rojên Îsmayêlîda texmîn dikir. Firqîya kardaîyna êtapên Îsmayêlê min û Îshaqda awqasî mezin bû çawa şev û roj.

Werin em 8-10 sala paşda herin, piştî yekşema ewline li Florîdayê. Wî çaxî qulixdarîya “Mêsîncêr Întêrnêyşînil”-ê îdî dîşuxulî. Me destpêka biharê garaja xwe paqij dikir. Dema ku qutî û teşt didane ser hev, me kopîyayên kasêtên min dîtin, li ser kîjana ew dannasînkirin bûn, wextê kîjanê Lîza û hevala wêye here baş razayî bûn. Bêyî fikirmîşbûn, ez vegeyîyam ku wana biavêjim. Nişkêva min dengê Ruhê Pîroz bihîst: “Kurê min, wana nebêje”.

Ez zû ber gilîyê Wî da hatim: “Bona çi? Ew gelekî xirabin: tu kesê îdî guhdarîya vê bangê neke. Ew gerekê bê tunekirinê.

Min careke mayîn bihîst: “Wê yekê neke”.

Min bi temamî fem dikir ku min guhdarîya Xwedê dikir, lê ez ber gotina Wîda hatim: “Bo çi?”.

Xudan gelekî zelal dilê minda got: “Eva bona te parastin e”.

“Parastin?”.

Wî çaxî min serwaxtî stend: “Kurê min, Ez dixwezim ku tu her dem bîr bînî ku bêyî Min dannasînkirina te gelekî xirab e”.

Hersal ez diha zêde fem dikim, ku faktora vê “parastinê” çî ye. Nava 30-î salên derbazbûyîda vê pêşkêşê bi hukumdarî kar kirîye û rezên baş dane. Nava gelek halên cûre-cûreda ez bûme şedê guhartina atmosferayê, dîtina gelek merivên xilazbûyî û gelek ecêba. Geleka şedetîya guhartina jîyanên xwe û usa jî civîna dane. Bi heyîna vî rezî, wê diha hêsa bûya bifikirinyana, wekî heleqetîke mine tevî wê yekê heye, lê ez dikarim bi bêqelpî derheqa Pawlosê şandîda bêjim: “Feqet ew ez nîbûm, lê Xwedê bû, wekî bi kerema Xwe, bi destî min, dşuxulî” /A Korintî 15:10, NLT/. Nava van salada min bîr nekirîye, ku bêyî *xarîzma* Xwedê ez çiqasî bêkêr bûme.

PÊŞKÊŞÊN WE HENE?

Min ji wan pêşkêşa dudu raber kirin, yên ku Xwedê dane min, ku bona meriva qulixkim û çê bikim. Hûn wan şerkarîyara nasin, yên ku nava jîyana minda hebûn? Diqewime we mecalên wî cûreyî nedane xebatê, ku hûn *xarîzma* jîyana xwe bidine eşkerekirinê? Yan jî, diqewime hûn van serpêhatîya dixwînin û ber xwe dikevin, difikirin: “*Pêşkêşên min tunene*”? Ez we didime bawarkirinê, wekî pêşkêşên we hene û ew yek wê nava herdu serên kitêbêye mayînda bê eşkerekirinê.

Min soz da bersiva vê pirsê bidim: “Gelo ji lawên Xwedê hinek, yan jî gelek, yan jî hemû, pêşkêşa distînin?”. Bersiva min ewe, ku hemû jî distînin. Zûtîrekê ezê wê yekê bona we ji Xebera Xwedê bidime kifşê. Ezê ne tenê bi hûrgilî vê pirsê lê binihêrim, lê heya dawîya kitêbê hûnê bi îzbatî pê bihesin, ku çawa *xarîzma* xwe bidine eşkerekirinê, pêşxistinê û xebitandinê, bi çendbarekirina kardarîya xweye nava çêkirina padişatîya Xwedê da.

BIFIKIRIN

1. Kerema xwedêtîyê ne tenê pêşkêşa Xwedêye xilazbûnê ye, lê qewata Wî ya bona jîyana me ye. Gelo we kerema Xwedê çi cûreyî lê nihêrîye? Fikira weye derheqa keremêda, ya piştî xwendina vî serê kitêbê, çawa hate guhartinê?
2. Ew navê ku Xwedê bona we hazir kirîye ji karebûna weye sade bilindtir e. Bona çi Xwedê usa kirîye? Hûn çawa dikarin kerema Xwedêye qewatdar bistînin, ya ku bi merdanî bona we tê dayînê?
3. Gelo ji lawên Xwedê hinek, gelek, yan hemû, pêşkêşa distînin? We pêşkêş û karebûnên çawa stendine? Hûn dikarin bêjin, ku ew pêşkêş çi cûreyî karê didin mêriv?



“Nava xweqîmetkirinêda zelal bin”

– Romayî 13:3, NLT

Bi zelalî xwe qîmet bikin

Min gilî kir ku min çawa bona eşkerekirina *xarîzma* jîyana xwe û şuxulkirina nava wêda şerkarî dikir. Niha ez dixwezim bi kurtayî derheqa wan tiştada xebirdim, nava kîjanada ez zîrek *nînim*.

Hazirkirina navnîşa wê yekê wê nebûya: hene gelek tiştên usa, bi kîjana ez zîrek nînim. Tiştên ewlinî nava vê navnîşêda stiranbêjî û lêxistina înstîrûmêntên mûzîkayê ye. Her car, dema ku ez li malême, jina min û zarokên min bi maqûlî ji min hîvî dikin, ku ez nava fikira xweda bistirêm.

Li mekteba bilind min tenê carekê stiraye, ew jî li sera sportê, li cîhê kincguhartinê, dema ku piştî telîmên atlêtîkayê me av li xwe dikir. Bersiva wê yekê gelekî berk bû: ji wan xorta çend kesa bi hevra kirine qîrîn, ku ez bêdeng bûma: yekî jî şûşê şampûnê avîte alîyê min.

Dê û bavê min hemû zarokên malbeta Bîvêra dibrine dersên pîyanoyê. Mamosteya min, ya pîyanoyê, profêsîyonal bû û nava bajarê meda gelekî eyan bû. Dayîna dersên pîyanoyê pêşkêşa wê jinê bû û nava wêda ew gelekî açix bû. Feqet, piştî dersên çarsaleye giran, ew nêzîkî dê û bavê min bû û reca kir ku min jî neşînine dersên pîyanoyê, çimkî ew hemû tişt gelekî xirab bû.

Piştî hinek wede ez fikirîm, wekî li cem min lêxistina pîyanoyê nehate stendîne û piştî çend sala min cêriband înstîrûmênteke başqe hîn bibim. Paşê me gîtareke kilasîk kirî û me mamostayekî eyan dît. Ew gelekî bi sebir bû û tevî min dixebitî: min hemû qewatên xwe didane xebatê, bi kel û ced ew ders dikirin, lê bona min dijwar bû. Ez sal û nîvekê hîn bûm, paşê ez xwemîkur hatim, wekî karebûnên mine sazbandîyê tunene.

Piştî wê yekê çi qewimî? Ez dikarim bêjim, wekî nava salada tu tişt usa jî nehate guhartinê. Ev govek mînanî serpêhatîya nivîsara min nîbû. Karebûnên sazbandîyê usa jî nava jîyana mînda nişkêva nehatine eşkerekirinê.

XWEQÎMETKIRIN

Ez dikarim ser hev wan goveka bidime rêzê, nava kîjanada ez zîrek nînim, lê we fem kir ku ez çî dixwezim bêjim. Meriv dikare bêje, wekî hemû kes jî zanin, ku li cem me çî baş nayê stendinê. Carina minê bixwesta ku birîyarkirina pêşkêşên me awqasî hêsa bûya, çiqasî nîşandayîna wan e, nava çîda em zîrek nînin.

Bi hesabildana vê yekê, em diha zêde ji xeberên Pawlos bixwînin:

“Ez bi wê kerema ku Xwedê da min, eşaretîyê didime we her kesî: nefikirin wekî hûn yên diha başin, ne ku bi rastî çawanin. Nava xweqîmetkirinêda zelalbin, bi wê bawariyê ya ku Xwedê daye me. Çawa qalibên meda gelek endamên bedenê hene, û her endamek tiştêkî dike, usa jî bedena Mesîhe. Em her parçên bedenekîne û her kes ji me dighîjine hev. Xwedê bi kerema Xwe pêşkêşên cuda dane me, bona ku hinek îşên başqe bi kardarî bîn kirinê” /Romayî 12:3-6, NLT/.

Pawlos bi wê gotinêva destpê dike, wekî ewê derheqa çîda binivîse, ew eşaretî ye. Îzinê bidin ku ez eşaretîya wî cuda bikim: “Nefikirin wekî hûn yên diha başin, ne ku bi rastî çawanin. Nava xweqîmetkirinêda zelalbin”. Ev gotin, temîyê dide me, ku em bi zelalî xwe qîmet bikin. Gelo nava kîjan pirsêda? Nava wan pêşkêşada, yên ku Xwedê *nîha* dane me.

Bona çî min xebera “*nîha*” da xebatê? Sedema vê yekê gelekî zelal e. Derheqa wê mînaka Încîlê da bifikirin, derheqa kîjanêda min pêşda got. Qîmetkirina Şaûle bêqelp, hetanî rasthatina tevî Samûêl, wê vî cûreyî bûya: “Ez nikarim bibime pêxember”. Ev qîmetkirin wê hema wî çaxî rast bûya. Lê belê, piştî wê yekê, dema ku Ewî Samûêl dît, û pêşkêşa Xwedê hate nava jîyana wî, qîmetkirina wî ya bêqelp hate guhartinê: “Nîha ez dikarim bibime pêxember.

Xwezî min diha bi guhdarî ev gotin bixwenda, dema ku min dicêriband qulixa xweye Îsmayêl pêşda bikişanda. Heger ez zelal bûma, minê fem bikira, wekî wî çaxî ez ji axaftina li ber cimetê gelekî dûr bûm, lê pêşkêşa min ew bû, ku min bona serwêrê xwe qulix bikira. Bi karebûna xweye sade, min dicêriband qewat bida tiştêkî, çî ku *gerekê biqewimîya*, çî ku pêşda minra hatibû gotinê, nava dua da hatibû eyankirinê û derheqa çîda min ji rêbera pêxembertî stendibû. *Ew wede* hê nehatibû, û li ber çava bû, ku heger min bi guhdarî dîna xwe bida li vê temîya Încîlê û min xwe bi zelalî qîmet bikira, xwe mikur bihatama, ku ez hê hazir nînim, minê gelek wede, mecal û qewat paş bêxista. Ezê usa jî nava wê yekêda kardar bûma, nava çîda ez wî çaxî zîrek bûm.

Pawlos derheqa pêşkêşên cûre-cûreda zelal dibêje: “Çawa qalibên meda gelek endamên bedenê hene, û her endamek tiştêkî dike, usa jî bedena Mesîh e” /Romayî 12:4, NLT/. Ev gotin zelal e û gelek tiştî eşkere dike, heger hûn li bedena xwe binihêrin. Derheqa wê yekêda bifikirin: pêçiyên me dikarin wê yekê bikin, çî ku pozê me dikare bike. Pozê me dikare wê yekê bike, çî ku guhên me nikarin bikin. Guhên me dikarin wê yekê bikin, çî ku mada me nikare bike. Mada me dikare wê yekê bike, çî ku cegera me nikare û tiştên mayîn. Bi vî cûreyî ev yek dide kifşê:

Ew meriv bextewar û duakirî ye, yê ku
pêşkêşên xwe zane û bi wana dişuxule.
Ew meriv bêbext û feqîr e, yê ku
dicêribîne bi pêşkêşên merivekî başqe bişuxule.

Gelo wê tiştêkî ecêb nîbûya, heger rojekê hûn hişyar bûna û pêçiya weye mezin bigota:” Bes e. Devo tu eva îdî çend salin ku xeber didî. Îro ezê xeberdim”. Ew yek tiştê nêzîkî aqila nîne: pêçiya mezin nikare xeberde, wê yekê devê mêriv dike. Feqet, pêçiya mezin dikare tiştên usa bike, çî ku dev dikare bike? Bînin ber çavê xwe, wekî devê mêriv bigota: “Îro ezê bi kompyûtêrê bixebitim”. Dîsa ev yek dûrî aqila ye.

Pirsa girînge mayîn ev e. Bona çî em awqasî “pêşkêşên dikê” didine dîyarkirinê? Bona çî em qulixçiya dîyar dikin, yên ku terîf dikin û rêberên hebandinê, yên ku li civînê rûmetkirinê derbaz dikin, çawa pêşkêşên here girîng. Pawlos derheqa vê yekêda civîna Korintîyara dinivîse: “Hinek parçên bedenê, yên ku tê bêjî yên here zeyîfîn û kêm girîngin, bi rastî, yên here pêwîstin” /A Korintî 12:22, NLT/. Îzinê bidin ez mînakekî bînim ber çava. Carina we texmîn kirîye, wekî ling guhdarîyê dikişînin li ser xwe. Mînak, meriv dibêjin: “Lingên vê jinê çiqasî bedewin”, yan jî “Lingên vî mêrî gelekî qewatin”.

Tiştêkî tê bîra min, dema ku ez xort bûm. Bavê min, yê ku gelekî edet diparastin, merivekî terbe û milahîm bû, tiştêkî usa kir, çî ku dûrî xeysetê wî bû. Ewî tu cara usa nedikir, ku guhdarî bikişanda li ser xwe. Lê carekê ewî got:

-Kurê min, lingên te gelekî qewatin.

Min zendegirtî li wî nihêrî, bersiva wî neda, û ez kenîyam, difikirîm ku ewî çî dixwest bigota. Ewî gotina xwe berdewam kir:

-Zanî bona çî dibêjim? Lingên min jî qewatin: ew yek ji min derbazî te bûye.

Min nizanibû ez ji kena biketama erdê, yan jî wîra qayîl bûma, çimkî goti-

na wî ji xeysetê wî dûr bû. Ez kenîyam û min got:

-Bavo, spas bona wê yekê wekî te lingên qewat dane min.

Rast e wekî ling guhdarîyê dikişînin li ser xwe. Feqet hûn qet fikirîne, wekî meriv dikarin bêyî ling bijîn? Ez merivekî nas dikim, yê ku rûyê qezîya avtomaşînêda lingekî xwe unda kirîye, lê ew dîsa bi jîyana sadeva dijî.

Ceger tiştêkî mayîn e, tu kes bêyî cegerê nikare bijî. Ew bêhesab girîng e, diha zêde girîng e, ne ku ling. Feqet we bihîstîye, wekî kesek bêje?: “Cegera te gelekî bedew e”. Çetin tiştê usa bibe.

Dêmek, careke mayîn xeberên Pawlos bixwînin: “Hinek parçên bedenê, yên ku tê bêjî yên here zeyîfin û kêr girîngin, bi rastî, yên here pêwîstin”.

Ez dixwezim careke mayîn bipirsim: bona çî em awqasî “pêşkêşên dikê” didine dîyarkirinê? Ew parçên bedenêye ber çevane û yên pêwîstin, lê angorî Xebera Xwedê, ew yên here girîng nînin.

Pêşkêşên Stênê hevalê min /derheqa kîjanîda min serê kitêbêyî ewlinda got/ îzbatkirina pêwandîyên tevî merivên dinîya bîznêsê, qazanckirina pera û paravekirina wane. Pêşkêşa wî tê bêjî hindikî girînge, ne ku “pêşkêşên dikê”: eva fikira kûltûra meye civînêye bêdenge. Gelo fikira civînê çî cûreyî bûye?

“Ewên ku hatine bijartinê merivên li piş dikêne: ewin, navên kîjanaye rast hene”.

Derheqa wê yekêda bifikirin. Dema ku kesek dibêje: “Nava jîyana filan kesîda pêşkêş heye”, wî çaxî hemû difikirin, wekî ew merivê bibe serwêr, rêberê hebandinê, serwêrê qulixa genca, nivîskarê mesîhî, mîsîyonêr û tiştên mayîn. Bi guhdarkirina van xebera, hindik meriv difikirin: “Ev meriv bona goveka doxtirîyê hatîye gazîkirinê û ew mecalên nû bona qenckirina penceşêrê eşkere dike”, “Ew nava hukumatêdane û qanûna qebûl dike, yên ku pêşkeftina padişatîya Xwedê diparêzin”, “Ew nava goveka perwerdêda dixebite û zanebûn, serwaxtîya Xwedê nava fikirên gencda belav dike”, yan jî “Ew hatîye gazîkirinê, ku nava goveka bîznêsêda bighîje merivên undabûyî û çêkirina padişatîya Xwedê bide finanşekirinê”.

Encamên fikirdarîya derheqa pêşkêşada ber çevane: Stên bi sala ser hev civînêda bûye, fem nekirîye, wekî ew hema awqasî “gazîkirîye”, çiqasî ez hatime gazîkirinê. Nenihêrî wê yekê, wekî karebûnên wîye ji Xwedêda dayî dişuxulîn, lê ew awqasî girîng nedihatine hesabkirinê, wekî pêşkêşên “civînê” diha gelekî girîngin, ne ku yên mayîn. Ev fikirdarî gerekê bê guhartinê. Em hemû jî gazîkirîne û pêşkêşên meye cuda hene, yên ku bona wê yekê pêwîstin, bona ku nava padişatîya Xwedêda em xebata xwe mîya-serkin.

Awa ew beş, kîjanêda Pawlos derheqa wê yekêda gote civîna Korintîya:

“Gelek parçên bedenên me hene, û Xwedê her parçek hema li wir danîye, li kîderê Ew dixweze. Bedenê çiqasî ecêb bûya, heger tenê parçek hebûya! Belê, gele parçe hene, lê tenê bedeneke. Çev nikare bêje destê mêriv: “Tu lazimî min nînî”. Serî nikare bêje linga: “Hûn lazimî min nînin”. Bi rastî, hinek endamên bedenê, yên ku tê bêjî yên here zeyîfîn û ew hindikî girîngin, usa dertê, wekî ew yên here pêwîstîn. Ew endamên bedenê kîjana em hesab dikin çawa yên hindik girîng, em bi cûrekî mayîn nêzikî wan dibin. Dêmek, em wan endamên bedenê diparêzin, yên ku gerekê neyêne dîtînê, lê endamên bedenêye diha bi qedir bêyî hewcetîya xweyîkirina vî cûreyîne. Xwedê usa beden kirîye yek, wekî xweyîkirina diha zêde hindava wan endamên bedenê hebe, qedirê kîjana diha hindike. Ev yek usa hatîye çêkirinê, bona ku hemû endamên bedenê miqatîya hev bikin» /A Korintî 12:18-25, NLT/.

Diqewime em qedirê pêşkêşên civînêva girêdayî diha zêde digrin, ne ku yên mayîn, çimkî em gotinên Pawlos bi atmosferê civînêva didine sînorkirinê. Li ber çavaye, wekî hewcetîya pêşkêşên bona terîfkirin û hînkirina li wan cîha diha zêdeye. Feqet xebata padişatya Xwedê li her dera tê kirinê û eva jî fikireke wî cûreyîye, ya ku gerekê ji kokêva bê guhartinê. Nava zimanê yûnanîda xebera “civîn”, xebera “êklêsîya” ye, fikira kîjanê «yê gazîkirî» ye. Şirovekrina ferhenga yûnanî vî cûreyî ye: “Merivên gazîkirî, yan jî ewên ku bona pirsên dewleta azaye civakî berevbûyîne, bedena welatîyên aza, bi hevra gazîkirî”.

Gelo em tenê wî çaxî civînin, dema ku em hundurê avayîda gazîkirîne? Gelo em tenê wî çaxî civînin, dema ku em tevayî bona duakirinê, hebandinê, terîfkirinê yan jî qulixkirinê berev dibin? Rûyê vê fikira hişkda meriv li wî cîhî cûrekî mayîn xwe xweyî dikin, lê wextê vedigerine nava civakê, xwe cûrekî mayîn xweyî dikin. Emin civîn, û mera pêşkêş hatine dayînê bona ku em padişatîya Xwedê çêkin, nenihêrî wê yekê, ku em rojê 24 seheta, nava hevtêda hevt roja û nava salêda 365 roja li kîderêne.

Van axirîya ez rastî merivekî gelekî dewletî hatim. Ewî seferek derbaz dikir, ya ku ewî çawa “Rêwîtiya Xwedêtiyê» nav kiribû. Ew tevî koma xwe bi teyarê diçû bajarên cuda-cuda, diçû civîna û tevî hemcivîna dibû, rastî cêrge qulixçîya dihat. Armanca wî ew bû, wekî pênc pêşkêşên qulixê zêde bihatana tûjkirinê û wî nava karê wîda diha bidana sîlihkirinê. Hevdîtina tevî wî ji alîyê hevalekî başda pêşda hatibû progiramkirinê. Ew hevdîtina li bajarê Dallasê, wextê hemcivînekê derbaz bû, li kîderê min terîf dikir. Me tevayî xwerin xwer, ya ku sê seheta kişand û ez ji wir çûm, dema ku min texmîn kir ku min diha zêde stend, lê ne ku ewî.

Ewî gilî kir, wekî destpêka şuxulkarîya xweda ew nava dinîya bîznêsêda rastî dijwarîyên mezin dihat, lê rojek hat, dema ku çavên wî vebûn. Ronahîbûna wî ji wê pirsê destpê bû, ku bona çi padişatîya Xwedê tenê li civîna, yan jî li hemcivîna tê kifşê?: bona çi li her dera nayê kifşê? Ewî zanibû, wekî ew bona goveka bîznêsê hatibû gazîkirinê, lê bona çi ew li wan dera usa xwe xweyî dikir, çawa ku bêbawera ew yek dikir? Tu tişt ew ji vê dinîyayê nedida cudakirinê.

Ewî birîyar kir wekî wê nava goveka bîznêsêda “Tevî Xwedê bişuxulîya” û wê guhdarîya dengê Ruhê Pîroz bikira, mînanî qulixçiyê li ber dikê sekinî. Bi texmîn, ew rastî pirsê navê xwe hat û qirar kir, wekî ew hema wî cûreyî ji Xwedêda hatîye gazîkirinê, çawa ku her serwêrek hatîye gazîkirinê. Piştî wê yekê ewî pêşkêşên ji Xwedê dayî eşkere kir û qirar kir, ku hema nava wanda bişuxule. Ewî dengê Xwedê li her dera dibihîst, usa jî wextê hevdîtînen nava bîznêsêda. Bêguman, Xwedê xeberên zanebûnê û serwaxtîyêye nava karê wîda dida wî.

Encam li ber çava bûn: roja îroyîn dijwarîyên wî tunene. Ewî derheqa xeberên ji Xwedê stendî gilî kir, yên ku gelek cara tê bêjî girîng nînin. Lê belê, ewî qirar kiribû, gurêda bibe, nenihêrî wê yekê, wekî temîyên ji alîyê Xwedêda stendî, tê bêjî nava bîznêsêda yên wekî mayîn bûn û tê bêjî yên ne anegor bûn. Ewî gilî kir, wekî ew ji alîyê bikirçiyên xwe û endamên koma xweda rastî hevraqayîlnebûna, ecêbmayînê, xemgînîya û dijîderketinê dihat. Feqet, xeberên ji Xwedêda stendî rezên mîlîyard dolara bûn. Ewî cêrge serpêhatî minra gilî kirin, ji kîjana ez zendegirtî mabûm.

MILETA HÎN BIKIN

Gelo wê çi bibe, heger em bikaribin li civîna wedê niha fikirdarîya derheqa pêşkêşada biguhêrin? Gelo wê çi bibe ku heger bi cûrê femdarî wan merivara şirove bikin, yên ku bangên me dibihên, wekî her merivek bona çêkirina padişatîya Xwedê *gazîkirî ye* û *qîmetlû ye*? Wî çaxî her kesê destpêke bi meremê Bîllî Grêhêm, Oral Roberts, Dayîka Têrêzayê û Pawlosê şandî bixebite. Min ew yek li cem wî merivê dewletî, wextê hevdîtina me, dît. Ewî zanibû ku mîsîya wî kîjan bû û Xwedê pêşkêşên çawa dabûne wî bona ku ewî ew yek mîyaser bikira.

Li cem me gerekê fikirdarîya vî cûreyî hebe, bona ku em mileta hînkîn. Em hinekî zêde bona hînkirina mileta bêjin. Îsa dibêje: “Ewên ku tînen civîna hînkîn bikin”. Ew temîyê dide me: “*Mileta hîn bikin*” /bixwînin Metta 28:19/. Nava zimanê yûnanîda xebera “milet” “*êtnos*”e?, şirovekirina kîjanê ev e: “bedena ji meriva çêkirî, bi pêwandîyên mîletîyê, kûltûrayê û edetên tomerîva yekbûyî”. Bêyî şikberî, ev şirovekirin derheqa mîletên rast, eşîra,

usa jî axê û komên êtnîkîdane. Dikevine nava wê yekê usa jî ew meriv, karê kîjana tomerî ye, mînak artîst, doxtir, bîznêsmên, pîlot, hiqûqzan, xebatkarên dewletê, sportsmên û komên merivaye mayîne bêhesab. Em gerekê nava govekên jîyanêye cudada jin û mêra hîn bikin.

Lê werin em gavekê pêşda herin. Îsa nabêje: “Meriva nava miletada hînkîn. Ew dibêje: “Mileta hînkîn”. Gelekî girîng e ku vê firqiyê texmînkîn: em gerekê bi Xebera Xwedê şuxulkarîya hemû govekên jîyanê biguhêrin. Bêguman, ew wî çaxî diqewime, dema ku pêşda dighîjî merivên nava wan govekada. Lê belê, gotina Wî diha kûr e. Em gerekê ne tenê meriva binuxumin, lê usa jî cûrê şuxulkarîya wane nava rêyên Bavê, Kur û Ruhê Pîroz da. Çawa mînak, meriv dikare piştgiriyê bide merivên nava goveka bîznêşêda bona ku fikirdarîya wan bê guhartinê, çawa ku ew yek nava jîyana wî merivê dewletîda qewimî. Eva serê çiyayê bûz e.

Derheqa Zakêosda bifikirin. Ew nava bacberevkirinêda yê *sereke* bû, bêyî şikberî, li wê herêmê ew yê herî baş bû. Bi texmîn, ew serkarê mafîya li wê derê bû. Bi texmîn, meriva ew hiz nedikirin, çimkî ewî ew yek dikir, çî ku piranîya bacberevkîra dikir, tabîya xwe bona berjewardîya xwe dida xebatê. Meriv dikare bifikire, wekî ewî welatî talan dikirin, pere ji wana distendin, dixapandin, dida tirsandinê û hukumî li ser wan dikir. Ew merivekî nebaş, lê hukumdar bû û hemû bindestîyên wî gerekê dîna xwe bidana mesela wî.

Li çend welata ez bûme şedê wê yekê, li kîderê ez wextê rêwîtîyê qesidîme. Serokê welêt ruşetxur bû û ewî ji bindestîyên xwe dew dikir, ku bona xweyîkirina qulixên xwe ew gerekê pere bidana wî. Û hemû bindestîyên wî ew yek dikirin. Heya wekîlê qulixdarîya mîgrasîyone li fregehê jî gerekê ruşet bistenda, çimkî heger ruşet nedidanê, ewî dokûmênt îzbat nedikirin ku bikaribûna ji welêt derbiketana.

Em paşda bên berbi Zakêos. Îsa bi navê wî gazî kir, û tiştêkî hewaskar e, wekî tenê gote wî: “Zakêos... zû bike, dakeve. Îro Ezê li mala te bibime mêvanê te”.

Zakêos li ber Xudan sekinî û got: “Ezê nîvê hebûna xwe bidime kesîba, Xudan, û heger wextê bacberevkirinê min meriv xapandine, ezê çar cara zêde paşda vegeînime wan /Lûqa 19:5-8, NLT/.

Gelo nava goveka bacberevkirina li wê nehîyê çî qewimî? Mêtodên şuxulkarîya bacberevkirinêye serekeye tarî, mêtodên vê dinîyayê, bi mêtodên padişatîya Xwedêva hatibûne guhartinê. Niha ew kontrola goveka vê dinîyayê diha nêzîkî qanûnên ezmana bû. Nava civakêda guhartin qewimî. Ew guhartin wextê berevbûna civînê neqewimî, û ne jî wî çaxî qewimî, wextê ku Îsa hemcivînekêda dannasîn dikir, gote Zakêos ku ew bibe peyîhatîyê Wî. Ew yek li merkeza bajêr qewimî. Zakêos rastî Îsa hat û cûrê şuxulkarîya wî

nişkêva hate guhartinê. Ev yek gerekê her car biqewime, dema ku meriv me dibînin, nava miletên meda /nava doranên wî hukumîda, nava kîjanada em gazîkirîne/, çimkî Îsa nava meda dijî.

Niha ez tevî lîstikçîkî berê, yê “Lîga rêgbîyêye miletîyê», dixebitim, rûpelên kîjanî nava mêdîya sosîyalîda hukumekî mezin li ser cêrge meriva dihêlin. Ew usa dibêje wan meriva, wekî kûltûra padişatîya Ezmana dikeve nava wî miletî /koma “*êtnos*”-ê/, nenihêrî wê yekê ku peyîhatîyên wî Îsa çawa Xudanê xwe qebûl kirine, yan na? Cûrê berbirîbûna wîye berbi wan meriva, rê û mêtodên padişatîya Xwedê dide kifşê.


Pêşkêşên me tenê bona berevbûnên pîroza têra nehatine dîtînê, nenihêrî wê yekê, wekî ew rast e û girîng e: ez tu cara naxwezim rola berevbûnên me bidime kêmkirinê. Armanca min ew e, ku em deşta xweye dîtindarîyê, ya şuxulkarîya pêşkêşên Xwedê, bidine berfirehkirinê. Heger em ji civînê der hatine gazîkirinê, çî ku derheqa piranîya bawarmendadane, em hatine gazîkirinê ku bi qewata nebînayî, nava dorana hukumê xweda, nava koma “*êtnosa*” xweda bişuxulin.

Heger hûn firqîya di navbera merivê vê dinîyayê û yê pîrozda dibînin, wî çaxî ew fikirdarî gerekê bê guhartinê. Dema ku hûn dikevîne cîhekî, li hemû dera, li wê oda nexweşa, li kîderê hûn doxtirin, li wê oda dera, li kîderê hûn dersdarin, li wê fabrîkayê, li kîderê hûn li ser dezgeh dixebitin û gelek cîhên mayîn, hûn hatine gazîkirinê ku hûn pîrozîyê bînin nava wê atmosferayê û wê yekê bi navê Bavê, Kur û Ruhê Pîroz hîn bikin. Bi gilîkî mayîn gotî, nava jîyana weda piştgirî û serwêrtîya Xwedêtiyê heye, bona peyakirina Ezmanaye li ser vê dinîyayê, çawa ku Îsa nava jîyanên Zakêos û merivên başqeda kir. Hûn hatine gazîkirinê, ku cûrê şuxulkarîya padişatîya Xwedê bidine çendbarekirinê, û wê yekê nava dorana hukumê xweda bidine zelalkirinê.

Gelo ev yek çûyîna li xebatê, yan jî dera, diha zêde nake bi cûrê mexsûs?

BIFIKIRIN

1. Încîl eşaretîyê dide, wekî em bi bêqelpî xwe qîmet bikin. Qîmetkirina me gerekê anegorî wan pêşkêşabe, yên ku *nîha* hene. Min ev serpêhatîya derheqa wê yekêda wera gilî kir, wekî min ji wede zûtir dicêriband qulix destpê bikira. Hûn çawa dikarin ji kirina wê şaşîyê dûr bimînin? Bona çi hûn nava jîyana xweda hatine gazîkirinê?
2. Ew meriv bextewar û duakirî ye, yê ku pêşkêşên xwe zane û bi wana dişuxule. Bêbext û feqîr e ew meriv, yê ku dicêribîne bi pêşkêşên merivên mayîn bişuxule. Li cem we tiştê usa hebûye, ku hûn berbi pêşkêşekî bicedînin, bona kîjanî hûn gazîkirî nînin? Heger usa ye, bona çi?
3. Pêşkêşên me tenê bona berevbûnên pîroza nehatine têradîtinê, lê usa jî bona wê doranê hatine têradîtinê, li kîderê hukumê we heye. Hûn dikarin jîyana xweye herroje çawa beşeke girîng, ya bona çêkirina padişatîya Xwedê hesabkin? Hûn çi cûreyî dikarin pêşkêşên xweye pêşezanîyê bona padişatya Xwedê bidine xebatê?



“Awa gerekê meriv me usa hesabkin,
çawa berdestîyên Mesîh û wekîlên surên Xwedê”

– A Korintî 4:1

Cabdar

Me xeberên “kerem” û “pêşkêş” lêkolîn kirin: niha em derheqa “malhebûnê” da xeberdin. Piştî femkirina derheqa vê xeberê, em dikarin van hersê xeberên ji Încîlê bikin yek, bona ku zelal fem bikin ku em mîsîya jîyana xwe çawa eşkere bikin.

Ferhenga “Mêryam-Wêbstêr”-ê xebera “malhebûn” vî cûreyî şirove dike: “Dema ku tiştêkî teslîmî kesekî dikin ku ew bi cabdarî serwêrtîyê lê bike”. Lêkolînkirina şirovekirinên xeberên kilîte bi zimanê yûnanî gaveke aqil-mendîye, çimkî tercime gelek cara fikira xeberêye rast raber nake. Lê belê, ev yek derheqa malhebûnêda nîne, şirovekirinên kîjanêye bi zimanê yûnanî û zimanê me mînanî hevin. Nava gotina dîyarkîrîda, xebera “malhebûn” bi zimanê yûnanî xebera “oykonomos”-e, şirovekirina kîjanê ev e: “ew meriv e, cabdarî yan jî serwêrtîya kîjanî bona tiştêkî heye: ewê ku serwêrtîyê dike, ewê ku cabdar e: serwêr”.

Sê alîyên malhebûnê hene, yên k ji van herdu şirovekirina tên.

Cabdar:

- Wê yekê kontrol dike, çi ku yê merivekî mayîn e.
- Serwêrtîya wî merivî heye ku serkarîya wê yekê bike, çi ku lê amin bûne.
- Cabdar e: ewê hesab bide xudî.

Xwedê hemû tişt efirandîye û hemû tişt yê Wî ye. Zebûr 24:1 dibêje: “Erd, xêr û xiznêva yê Xudan e, usa jî dinîya binelîyên wêva”. Ev yek dide kifşê, wekî em cabdarên temamiya dinîyayêne. Em gerekê serwêrtîyê li dinîyayê: erdê, avê, hewayê, rêşûrsên tebyetî, heywana, mesîya û teyreda bikin. Em gerekê usa jî derheqa merivada bifikirin: bi ruhanî, bi fikirdarî û bi fizîkî. Bona mîyaserkirina vî hemû tiştî, zanebûnên xwedêparêz û kardar, serwaxtî û femdarî pêwîstî. Min dikaribû berdeyam bikira, lê çawa tê kifşê, em li ser vê dinîyayê bona hemû tiştî cabdarin, him tiştên ku tên dîtîne, him jî tiştên ku nayêne dîtîne.

Lê em binihêrin, ku Pawlos bi kîjan fikirê nava gotina xweda xebera “malhebûn” dide xebatê. Ew derheqa bûyîna “Cabdarên şewirên Xwedê” da dinivîse. Nava “Tercima zindîye nû”-da nivîsare, wekî em “bona şirovekirina şewirên Xwedê hatine kifşkirinê”. Ji *xarîzmayên* jîyana Pawlos yek jî eyantî bû, ya ku dide kifşê, ku şewira sura şirove bikin, yên ku eyankirî nînin. Bo wê yekê jî ev *malhebûn*, derheqa kîjdanêda ew dibêje, ne derheqa serwêrîkirina pera, wede, yan jî rêşûrsên tebyetîdane /nenihêrî wê yekê ku lazime vî hemû tiştî bi êkonomî bikin/ lê derheqa serwêrîkirina *xarîzma* jîyana wîdane. Gelo ev yek usa jî derheqa medane?

Petrûs dinivîse: “Çawa ku her kesî *pêşkêş* qebûl kirîye, qulixî hevdu bikin, çawa *wekîlên kerema* Xwedêye pircûreye qenc” /A Petrûs 4:10, NKJV/. Nava vê gotinêda hemû xeberên ji alîyê meda dîyarkirî hene /*pêşkêş*: “*xarîzma*”, kerem: “*xarîs*”, û wekîl: “*oykonomos*”/. Petrûs hema wî cûreyî mînanî Pawlos dibêje, wekî em gerekê serwêrîyê li *xarîzma* ku li me amin bûne bikin. Ev gotin gelek tiştî eyan dike: em gerekê bi guhdarî wê yekê lêkolîn bikin.

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî bi gotina Petrûs, “her kesî” *pêşkêş* qebûl kirîye. Ji serê sêrîda girînge bidine kifşê, wekî ewî negot: “her qulix-çîk”, “her serwêrek”, “her serwêrekî hebandinê”, yan jî her *pêşkêşke* mayîne derheqa qulixa xeberêda, lê got “her kesî”. Heger hûn xuliqîne, usaye *pêşkêş* yan jî *pêşkêşên* we hene, yên ku wera hatine dayînê, û ew li we amin bûne. Eva bersiva wê pirsê Încîlêye, derheqa kîjanêda me *pêşda* nava serê kitêbêye mayînda got. *Pêşkêş yan jî pêşkêşên we hene, û çawa wekilandin, ew karebûnên keremêye mexsûsin, yên ku qewatê didine mêriv, karebûna mexsûs didin.*

Bona nîşandayîna girîngîya *pêşkêşên* we em nêzîkbûna Pawlos lê binihêrin. Ew bi cûrekî başqe nêzîkî malhebûna xwe dibû, diha rast, bi cûrê diha berk. Piştî çend beşa, ew nama xweda Korintîyara dinivîse:

“Belê, ez nikarim pesinê xwe bidim, heger ez Mizgînîyê dannasîn bikim, çimkî deynê stûyê min e. *Wey li min*, heger ez Mizgînîyê dannasîn nekim. Û heger min ev yek bi hemdî xwe bikira, hingê xelata minê hebûya, lê ez vê yekê ne bi hemdî xwe dikim, çimkî eva qulixeke, *ya ku li min hatîye spartinê*” /A Korintî 9:16, 17/.

Guhdarîya min carekêra çû ser gotina “*wey li min*”. Ew gelekî berke, diha berke, lê ne ku ji me gelek dikarin wê yekê fem bikin. Nava zimanê yûnanîda xebera “*wey*” xebera “*oûay*”-e, şirovekirina kîjanê “qezîya, tirs”-e. Ferhengeke mayîn jî fikireke başqe serda zêde dike: “Nîşandayîna êşê, yan jî hêrsê, tevlihevûnê”. Her xebitandineke vê xeberêye nava peymanê Nûda dîwaneke gelekî bi tirsê tîne ber çeva, ya ku hîvîya wane. Westê ku Pawlos

dibêje “wey li min”, ew mînanî wê yekêye ku nifir li ser wîda tê. Ev gotin gerekê guhdarîyê carekêra bikişîne li ser xwe. Hesabhilnedana pêşkêşên ji alîyê Xwedêda mera dayî kirineke gelekî girane.

Pawlos zanibû, wekî Xwedê tişekî qîmetlû spartibû li wî. Rastîya hişyarkirinê ew e, wekî heger ewî bi cûrê anegor serwêrtîya pêşkêşa xwe nekira, yên mayîn wê ji wê yekê kar nestendana, û serbara serda wê zyanê biketana û wê ew yek nestendana, çî ku Xwedê bona wana têra dîtibû. Pawlos zanibû, wekî pêşkêşa wî bona wî nîbû: ew *bi destî* wî *bona* merivên başqe hatibû dayînê. Bi gilîkî mayîn gotî, li cem wî ew tişt hebû, çî ku Xwedê dixwest bida merivên başqe û hema ev e menî, wekî ewî wextê hesabhilnedana cabdarîya xwe kire gazî “wey”.

Em vê yekê hildine ser we û min. Em gerekê du fikirên hewaskar bidine dîyarkirinê. Ya ewlin, pêşkêşa Pawlos “dihate kifşê”. Bîr bînin, wekî Xwedê qîrar kir, wekî pêşkêşên ku nayêne kifşê, gerekê layîqî qedirê diha mezinbin, ne ku pêşkêşên ku tîn kifşê. Heger Pawlos bi cûrêkî usa berk nêzikî pêşkêşa xwe dibû, ya ku dihate kifşê, em gerekê wê pêşkêşê bêqîmet nekin, ya ku Xwedê danîye nava jîyana me, bi taybetî heger ew nayê kifşê.

Fikira duem diha girînge. Ew pêşkêş, yên ku Xwedê dane we, bona we nînin: ew *bona* wan meriva hatine têradîtinê, yên ku gerekê *bi destî* we karê bistînin. Pêşkêşa min, ya nivîsarê, bona min nîne, lê bona we ye. Pêşkêşa min, ya dannasînkirinê, bona min nîne, lê bona wan meriva ye, berbirî kîjana ez dibim. Pêşkêşa min ya rêberkirinê bona min nîne, lê bona wan meriva ye, rêberîya kîjana ez dikim û tiştên mayîn.

EM QIRAR DIKIN KU EM PÊŞKÊŞA XWE ÇAWA BIDINE XEBATÊ

Em dikarin pêşkêşên xwe bi kardarî, yan jî wana bona tiştên xirab, bidine xebatê: bijartin ya me ye. Pêşkêş dikare bişuxule, usa jî wî çaxî wextê ku ew bona armanca xwedêtiyêye pêşin nayê xebitandinê, bona çêkirina padişatîya Xwedê. Adolf Hîtlêr rêber bû û ewî nikaribû rêberîya welatê xwe usa bikira ku kar bida bi mîlîyona almana, cuhîya, rûsa, fransîza, brîtanîya û yên mayîn. Gelo ewî ew pêşkêş bona rûmeta Xwedê da xebatê, yan bona xwe û wan meriva, yên ku layîqî begemîya wî bibûn? Em dikarin bêjin wekî ewî pêşkêşa xwe bona tunekirinê da xebatê, ku bêhesab cihû û mîletên mayîn hatine talankirinê, hatine zêrandinê û bêyî tu menî hatine cezakirinê? Bersivên van pîrsa hewcê gotûbêjîkirinê nînin: evana ber çavane.

Encamê serwêrtîya Adolf Hîtlêr li ber çawa ye, lê îzînê bidin ez dîsa derheqa du merivên eyanda xeberdim, encamên wekîltîya kîjana dibek awqasî

jî li ber çeva nînin. Ya ewlin, Wîtnî Hyûston dengbêj e, dengê kîjanê gelekî bedew bû, min tu cara dengê usa nebihîstîye. Nava jîyana wêda pêşkêşa Xwedê li ber çava bû. Dema ku Wîtnîyê distira, guhdarvanên wê bi kûrayî ber xwe diketin. Dengê wê yê weşanê bû: ew tê bêjî dengê milyaketa bû û gelekî hukumdar bû.

Yê duem Frêdî Mêrkûrî ye, vokalîstê koma “Kwîn”-ê bû. Ewî dikaribû bi pêşkêşên xweye stiranê û kompozîtorîyê hukumî li ser temamiya stadîyona bikira. Karebûna wî ji ya sade bilindtir bû û hinek meriva digotin, wekî ew karebûn ya nebînayî bû. Ewî dikaribû nava her halekîda elaletê mezîna li peyî xwe bibira. Piştî wefatbûna wî, piştî gelek sala, stiranên wî hê distirên.

Gelo Wîtnî û Frêdî pêşkêşên xwe bi kardarî dane xebatê? Bêyî şikberî, gelekê bêjin ku usa ye. Feqet, werin em vê pirsê bin gotinên Îsa da lê binihêrin:

“Serwaxtî bi *encamên* xweva çawa ya heq tê hesabê” /Metta 11:19, NLT/
û careke mayîn:

“Serwaxtî bi *jîyana wan merivava* çawa ya heq tê hesabê, *yên ku peyî wê diçin*” /Lûqa 7:35, NLT/.

Niha em rezê van herdu meriva lê binihêrin, *encamên serwêrtîya wane wededirêj*, yan jî kurt. Gelo Wîtnîyê pêşkêşa xwe bona birina merivaye nava hazirîya Xwedê da dida xebatê? Gelo guhdarvanên wê, piştî guhdarkirina wê, dibûne xwedêparêz? Stiranên wê peymanî zewacê didane qewînkirinê, yan nerazîbûn pêşda dianîn, bi sazîkirina hêvîyên romantîke ne anegorî rastîyê? Gelo Frêdî pêşkêşa xwe bona rêberkirina heqîttîyê dida xebatê? Gelo ew ber dilê merivada dihat ku qedirê Efrandarê xwe bigirtana? Wîtnî û Frêdî ji vê dinîyayê çawa dûr ketin? Mîrata wan ya mayînêye, yan derbazbûnêye? Ewê heta-hetayê bimîne, yan wê tevî vê dinîyayê unda bibe?

Îsa temîyê dide, ku em *encamê jîyana mêriv gotûbêj* bikin û ezê îzîne bidim ku hûn bi xwe feydayên wekîltîya Wîtnî û Frêdî qirarkin. Feqet, wedê lênihêrandina dawî wê wextê hazirîya Efrandarê me bê. Her kes wê wextê Dîwanê hesab bide.

Ez fem dikim ku heger hûn piştgirên Wîtnîyê, yan jî Frêdîne, û diqewime ev fikir li we xweş neyên. Lê belê, îzîne bidim ez pîrsekê bidim, ya ku wê gelek ronahîyê li ser wê yekê belav bike, ku wextê Dîwanê wekîltîya wan wê çawa bê qîmetkirinê. Werin em mîrata wan bi pêrspêktîva deh mîlîyon sala lê binihêrin. Wîtnî û Frêdî çi dikarin bêjin, dema ku derheqa wê yekêda xebardin, ku pêşkêşên ji alîyê Xwedê da wanra dayî çi cûreyî hatine xebitandinê? Lênihêrandina bi pêrspêktîva heta-hetayê dikare fikira weye pêşin biguhêre.

Nava jîyanêda hemû tişt pêspêktîvêa girêdaîye. Heger em jîyanê nava dorana 80 salîda lê binihêrin, wî çaxî emê hemû tiştî

cûrekî mayîn bibînin. Lê belê, heger em jîyanê bi pêspêktîva heta-hetayê lê binihêrin, wî çaxî hemû tiştê li ber çavê we cûrekî mayînbe.

Niha tiştêkî bînin ber çavê xwe. We bona şivê teglîfî qawexwenekê dikin. Hûn perê kifşkirî didin û hûn dikarin çî bixwezin bixun. Li ser sivirekê tenê salatên xweşin. Heger hûn bi pêspêktîva rojekê li wê sivirê binihêrin, hûnê çî bikin? Bi texmîn, hûnê hemû tiştên xweş bixun. Gelo wê çî bibe, heger hûn bi pêspêktîva salekê li wê sivirê binihêrin? Çawa ku tê texmînkirinê, hûnê tenê yekê bixun, yan jî tu tiştî nexun? Bo çî? Hûnê nexwezin ku mada we rojtira mayîn biêşe, hûnê nexwezin ku donê ser bedena we bi çar kilogirama heya hevtîya mayîn zêdebe û hûnê nexwezin zyanê bidine saxlemîya xwe.

Bi lênihêrandina rezê Wîtnîyê û Frêdî, bi prêspêktîva heta-hetayê, li ber çava ye, ku bi çiqasîva dikarin malhebûna wan çawa ya serwaxt hesab bikin.

Bona me xeberdana derheqa Adolf Hîtlêr, yan jî Frêdî Mêrkûrî û Wîtnî Hyûstonê bêqezîya ye. Feqet rastîya hişyarkirinê heye: hûn û ez, emê te-vayî bona pêşkêşên spartî hesab bidin, dema ku em li ber Hakim bisekinin. Pêşkêşên me wê bi pêspêktîva heta-hetayê, lê ne ku ya 80 sala bêne lêni-hêrandinê. Pêşkêşên me wê bin ronaya Xebera Xwedêye heta-hetayê bêne kontrolkirinê, ya ku teslîmî me dike ku em padişatîya Wî çêkin. Gelo mîrata me wê bimîne, yan ewê tevî sistêma vê dinîyayê derbaz bibe?

ŞIROVEKIRINA MENÎYA

Îzinê bidin ez derheqa wê yekêda biwekilînim, derheqa çida me serê kitêbêyî ewlinda xeberda. Hûn dikarin bi van sê cûra serwêrtîya pêşkêşa xwe bikin:

- Hûn dikarin wê yekê bona çêkirina padişatîya Xwedê bidine xebatê.
- Hûn dikarin wê yekê bona çêkirina jîyana xwe bidine xebatê.
- Hûn dikarin wê yekê qet hesab hilnedin.

Ew yek girînge derheqa xala duemda bêjin, ya ku dikare çawa ya xapînok-be. Gelek meriv difikirin, ku ew bona merivên başqe, yan jî bona padişatîya Xwedê çê dikin, lê ew wê yekê bona kara xweye şexsî dikin.

Ez bi nezanî ketibûme teleke wî cûreyî. Çend sal pêşda, destpêka qulixa minda, min her dem gotinên qenc û xweş digotine endamên koma me, civînê û wan meriva, yên ku min nas dikirin. Min heya wan merivara jî tiştên qenc digotin, dema ku gotinên min jî nerast bûn. Min dibihîst wekî meriv min hesab dikirin çawa merivekî qenc û hizkirî. Ew qîmetkirin diha zêde pişt-girî didane kirên min.

Carekê, wextê duakirinê, Xwedê gote min: “Meriv dibêjin, ku tu merivekî hizkirî, qenc û rehmî, usa ye yan na?”.

Heger usa nîbûya, minê gotina Wî çawa îzbatî qebûl bikira, lê heger Ruhê Pîroz çî cûreyî gote min, dida kifşê, wekî gotina Wî tiştêkî mayîn bû. Wî çaxî min fesal bersiva Wî da: “Belê, usa dibêjin”.

Ewî carekêra got: “Tu zanî ku tu bona çî tenê tiştên xweş dibêjî meriva?”.

Min diha fesal bersiv da: “Bo çî?”.

“Çimkî tu ditirsî, ku tê ji aliyê wanda bêyî înkarkirinê, - Ewî got-dêmek, merkeza hizkirina teda tuyî yan ewin?”

Bi femkirina wê yekê, wekî menîyên min bi temamî hatibûne eşkerekirinê, min qebûl kir ku Ew rast bû.

Ewî gotina xwe berdewam kir: “Heger te bi rastî meriv hiz bikirana, teyê rastî bigota wana, heger ewana te înkâr bikirana jî”.

Ev rastkirin bona nêzîkbûna min ya hindava meriva da bû. Feqet, ez gerekê girêdayî tîma mera vê pirsê bidim. Gelo em dikarin pêşkêşa Xwedê vî cûreyî bidine xebatê? Bi gilîkî mayîn gotî, merivara dikare bê kifşê ku em pêşkêşa xwe bona çêkirina padişatîya Xwedê didine xebatê, lê bi rastî ew bona menîyên xwehizîyê tê xebitandinê. Bi rastî usaye û ezê dîsa mînakekî ji jîyana xwe bînim ber çava, paşê ezê bi mînakên nivîsarên pîroz wê yekê îzbatkim.

Her dem, ez ji Xudan derheqa wê yekêda carekêra xeberê nastînim ku ezê wextê hemcivînê yan jî qulixa li civînê dannasîn bikim, lê ez her dem dilê xwe bona rêberîya Ruhê Pîroz vekirî dihêlim. Lê belê, bûyarek hebû, dema ku hetanî dannasînkirinê xebera ji Xudan hebû.

Min gerekê wextê hemcivîneke li Rojavaya Ştatên Amêrîkayêye Yekbûyîye Navîn qulix bikira. Wextê ku ez ewê rojê li oda xweye mêvanxwenê hişyar bûm, wextê ku min gerekê dannasîn bikira, min zela dengê Ruhê Pîroz bi-hîst: “Ez dixwezim wekî wextê qulixa xweye îroyîn tu bi tîma “*Tela şeytan*” dannasîn bikî”. /Min ew kitêb sala 1994-a nivîsîye: ew derheqa altkirina bêhurmetkirina û merivên ku me diêşînin û baxşandina wandane/.

Temamîya rojê min tevî gotinên Wî şerkarî kir. Banga “*Tela şeytan*” îdî çend sal bûn ku belav bibû. Ew kitêb îdî eyan bû. Wedekî dirêj bû, ku min ew bang li temamîa Ştatên Amêrîkayêye Yekbûyî dannasîn dikir û geleka îdî ew bihsîtibûn. Bona min diha dijwar bû ku peyî rêberîya Ruhê Pîroz biçûma, çimkî ez li ser kitêbeke nû dixebitîm. Wextê ku bi meha ser hev hinek rastîya dinivîsin, wî çaxî ew dilê wêda diha qewîn û tezene. Û tiştê herî girîng bi rastî ew bû, ku min dixwest banga diha kevin dannasîn bikira, lê min temîya Ruhê Pîroze zela stand.

Wê êvarê, wextê ku ez gihîştîme sera hemcivînê, minra gotin, wekî meriv ji cîhên gelekî dûr hatibûn ku guhdarîya min bikirana. Sizû mînda çû: ez fikirîm, wekî ew meriv wê banga ku tê wekilandinê guhdar bikirana û diqewime îdî kitêba “Tela şeytan” xwendibûna.

Dema ku ez ketime serayê, min dît wekî atmosferê li wir bi şabûnêva tijî bû. Hêvîdarîya meriva ber çeva bû. Wî çaxî temîya ku min şebeqê standibû, diha gelekî min çetin hat. Tê bêjî min nedixwest meriv bixapandana. Min li ber wî hukumî ber xwe da û min qîrar kir, ku ez banga xweye “nû” dannasîn bikim, û dannasînkirina min li min xweş hat. Ew gelekî hukumdar bû û meriva bi şabûn bersiv dan. Çend meriv jî rabûne ser pîya û fikirên mine sereke îzbat kirin. Tê bêjî ez “bêyî ceza mam”, yan jî diqewime min wê şebeqê guhdarîya Xwedê nekiribû. Çi jî hebe, ez şa bûm. Piştî berevbûnê, hemû kesên li oda qulixçîya ruhdarbûyî bûn û bona wê bangê ji min razîbûn.

Her dem ji wî bajarî, li kîderê ez dannasîn dikim, ez bi razîbûn û şabûnê diçim, tê bêjî Xwedê dilê mînda dikene. Rojtira mayîn ez cûrekî mayîn bûm. Dema ku ez hişyar bûm, tê bêjî giranî li ser min hebû: tê bêjî qewata min tunebû û min wê yekêra şerkarî dikir. Min carekêra menîya wê yekê fem kir: min gura Xwedê nekiribû. Wê şebeqê min çok da, tobe kir, baxşandin hîvî kir û reca kir, ku xwîna Îsa ez paqij bikirama.

Feqet, min sivikayî texmîn nekir. Min ew giranî û zehîfî temamîya rojê li ser xwe bir, wextê ku ez li mêvanxwenê bûm, wextê ku ez diçûme firegehê, wextê ku li firegehê ez hîvîya teyarê bûm û wextê temamîya seferê. Beşera nexweş, giranî û ew zeyîfî gelekî xirab bûn. Lê belê, wextê ku teyare îdî li San Dîyêgoyê peîya dibû, ew hemû tişt ji min hate hildanê.

“ Bavo, - min pirs da, - min îro şebeqê tobe kir û baxşandin hîvî kir. Te bona çî şabûn, edîlayî û razîbûna min hetanî niha neda dasekinandinê?”

Û min dengê Xudan bihîst: “Min îzin da, ku tu giranîya gurênekirinê li ser xwe bibî, bona ku fem bikî ku ew çiqasî girîng bû. Êvara derbazbûyî, wextê qulixkirinê, serwêrek li wir hazîrbû, yê ku gerekê banga “Tela şeytan” guhdar bikira, ya ku Min spartibû te. Jîyana wîye şexsî û qulixa wî nava êtapeke cudadanin. Te gura Min nekir, lê encamên gurênekirinê hene. Ew giranîya ku te texmîn kir, eşaretîyê dide ku tu îzinê nedî ew careke mayîn biwekile. Niha tu li bajarekî mayînî: gura Min bike”.

Bi bîranîna êvara derbazbûyî, min dikaribû bigota ku hazîrên li wir, koma hemcivînê û teşkîldar gelekî şa bûn. Min careke mayîn teglîfî li wir kirin û paşê min serbara serda, girêdayî wê qulixêra, şedetî bihîstin. Eyane, wekî pêşkêşa Xwedê wê êvarê bi destî min şuxulî, lê ew ne anegorî armanca xwedêtîyê dihate xebitandinê.

Diqewime hûn bipirsîn: “Gelo hûn li ser xwe gumanin, wekî tiştêkî usa

dikare biqewime?”. Werin em çend serpêhatîyên ji kitêba Pîroz lê binihêrin, kîjanada derheqa xebitandina pêşkêşa xwedêtîyêye ne bi meremda tê raberkirinê. Em ji Mûsa destpêkin. Ew hatibû gazîkirinê, bona ku rêberîya Îsrayêlêye berbi welatê Sozdayî bikira û karebûna wîye kirina ecêba wîra hatibû dayînê ku ewî ew mîsîya xwe mîyaser bikira.

Carekê Xwedê gote Mûsa ku zinarra bêje ku av derê bona ku cimeté vexwera. Lê Mûsa rûyê hêrsêda zinar xist, feqet wî çaxî ewî gura rêberîya xwedêtîyê nekir. Raste, av hat û bi mîlîyona meriva ew av vexwerin. Nava navnîşa Mûsada ew ecêbeke ber çava bû. Lê belê, piştî hinek wede, wextê ku “hemcvîn” ser hevda hat, Mûsa bona hesabdayînê hate gazîkirinê, bona wê yekê ku ewî pêşkêşa xwe bi rêberîya Xwedê neda xebitandinê. Rûyê wê yekêda îzin nedane wî ku ew bikeve welatê Sozdayî. Ew tiştê hişyarkirinê ye, wextê ku hûn derheqa wê yekêda difikirin.

Mînaka mayîn ya Bilam e. Ew bona Îsrayêlê bû pêxember, û gotinên wî hetanî roja îroyîn Încîlêda nivîsarin. Şedetîke mezin e!: pêxembertîya we nava xebera Xwedêye heta-hetayêda. Feqet, nava vê serpêhatîyêda tişteki hê zêde heye. Xwedê mexsûs temî dabû wî ku ew neçe, wê yekê neke çî ku ji wî dixwestin. Lê belê, Bilam pêşkêşa li wî spartî da xebatê, nenihêrî wê yekê, wekî Xwedê zelal gotibû wî: “Tu gerekê tevî wan neçî” /Jimar 22:12, NKJV/. Li vir jî careke mayîn pêşkêş ji armanca xwedêtîyê der hate xebitandinê.

Çawa şirovekirin, Xwedê pêşkêşên ku spartine me ji alîyê Xwe da hûre-hûr serkarîyê li wan nake. Heger Ewî wî cûreyî kontrol bikira, emê nebûna wekîl, çimkî serwêrtîya wekîl heye bona ku ew serwêrîyê li wê yekê bike, çî ku spartine wî, bêyî kontrolkirin. Mînaka vê gotinê hema serhatîya Îsa ye, ya derheqa merivekîdane:

“Merivekî dewletî hebû, wekîlxercê wî hebû. Rojekê gilî gihîşte wî, yan çîye wekîlxercê wî hebûka wî pûç dike. Ewî jî gazî wî kir û gotê: “Ev çî yeke ku ez bona te dibihêm? Heq-hesabê wekîlxercîya xwe bide, çimkî tu îdî nikarî wekîlxercîyê bikî” /Lûqa 16:1, 2/.

Çawa ku nava rojên wî zemanîda wekîltî gelekî belavbûyî bû, ne ku îro, em nikarin nava vê serpêhatîyêda tişteki girîng nebînin. Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî nava wedekîda ew merivê dewletî haj wê yekê tunebû: ewî her roj dîna xwe nedida îşên wî wekîlxercî. Usa hate stendinê, wekî merivekî başqe eşaretî da wî, ku ewî guhdarî bida ser wê yekê, ku wedekî dirêj serwêrîya bi kêmasîya hatibû kirinê.

Em careke mayîn vê yekê nava serhatîya Ûsvîda dibînin, kitêba Dest-pêbûnêda. Dema ku ew hate Misirê, ew pêşda xulamê mala Potîfar bû, lê

paşê pêşda çû û bi temamî bû *wekîlê* mala wî. Nivîsare: “Û çî wî hebû, hemû destê Ûsivda hişt û ew haj tiştêkî mala xwe tunebû, xêncî nanê ku ewî dixwer” /Destpêbûna 39:6/. Potîfar hûre-hûr xebata Ûsiv kontrol nedikir. Ewî malhebûna xwe spartibû Ûsiv.

Pêşkêşên Xwedê wî cûreyî mera tên dayînê. Petrûsê şandî temîyê dide me, ku em bibine *wekîlên* kerema *pircûreye* ji Xwedêda dayî, *xarîzma* qenc.

PÊŞKÊŞÊN HETA-HETAYÊYE NE EŞKERE

Werin em berdewam bikin. Berê ewlin em xeberên Petrûs bîr bînin: “Çawa ku her kesî pêşkêş qebûl kirîye, *qulixî hevdu bikin*, çawa *wekîlên* kerema Xwedêye *pircûreye* qenc”. Çawa *wekîl*, cabdar, ji me tê xwestinê, ku em *qulixkin*, yan jî pêşkêşên xwe bidine xebatê. Diwekilînim, ew bona me nînin, lê bona merivên dor-berên xwene. Xebera “*qulixkirin*” nava zimanê yûnanîda xebera “*dîyakonêo*” ye, ya ku dide kifşê “*qulixkin*, wî îşî yan karî bighînine dawîyê”. Em gerekê her dem amedebin ku bi pêşkêşên xweva *qulix* bikin. Pêşkêşên me bêyî belaş mera hatine dayînê û em gerekê bi amadebûyî wana bona çêkirina jîyanên meriva bidine xebatê.

Em gerekê “*bi pêşkêşên ku spartine me qulixî hevdu bikin*, çawa *wekîlê* kerema Xwedêye qence *pircûre*”. Nava vê gotinêda xebera “*pircûre*” dide kifşê “*cûre-cûre*”. Wê gelek rûpel pêwîstbin ku wan pêşkêşên *pircûre* bidine rêzê, kîjan Xwedê dane cimeta Xwe. Bi rastî, diqewime hazirkirina navnîşa wî cûreyî tiştê bûyînê nîne. Tevgirêdana hinek pêşkêşaye bona çêkirina padişatîya Xwedê eşkere li ber çavaye. Lê belê, tevgirêdana gelek pêşkêşên mayîne *pircûre* diha çetin wê bê dîtinê. Awa mînakek.

Van axirîya min guhdarîya serwêrekî eyan kir, yê ku gilî dikir ku pêşîya hemcivîna wîye hersale axaftineke hewaskar derbaz bibû. Ew berevbûna hersale gelekî eyan e û gelek meriv tevî wê dibin. Dema ku koma wî sera civînê hazir dikir, wî serwêrî dît ku doxtirekî, yê ku endamê civînê ye, bona tevbûyên hemcivînê byûlêtênên înfomasîyon li ser kursîya diatanîn.

Serwêr nêzîkî doxtir bû û ji wî baxşandin xwest:

-Doktor, tu gerekê wê yekê nekî. Alîkarên me û rezedilvan wê ewê xebatê bikin.

Bi gotina serwêr, wî doxtirî bi cûrê gelekî berk, lê bi maqûlî, ber gilîyê serwêrda hat:

-Hersal, ez lez ji cîhê xebata xwe rojên hêsbûnê hildidim, bona ku tevî vê hemcivînê bibim. Bona min eva hevtîya salêye here giranbiha ye, çimkî ez bona çêkirina padişatîya Xwedê tiştêkî dikim.

Bi guhdarkirina serpêhatîya vî serwêrî, yê ku hevalê min e, ez bona wî dox-

tirî ber xwe ketim. Min fem kir, wekî ewî şikilên tomerî nedidîtin û nava çêkirina padişatîya Xwedê da qîmetê pêşkêşa xwe fem nedikir. Dîsa diwekilînim, wekî hinek pêşkêş carekêra çêkirina padişatîya Xwedêva girêdayîne, lê yên mayîn raste-rast pêva girêdayî nînin, lê ji wana her yek jî girîng e.

Wî doxtirî wî cûreyî difikirî, çawa ku Stên serê kitêbêyî ewlinda difikirî. Gelo wê çawa bûya, heger doxtir tunebûna û heger merivên ku bona çêkirina padişatîya Xwedê hatine gazîkirinê, û nava govekên mayîndanin, nexweş biketana. Gelek meriv wê ji wede zûtir wefatbûna, bêyî alîkarîya doxtirîyê.

Awa mînakeke li ber xwe derxistî, ya ku wê vê pêwandîyê bide kifşê. Doxtirêk pêşkêşa xwe dide xebatê, alî jinekê dike ku tendurustîya wê bê dasekinandinê. Nava encamê wê yekêda, çawa ku ew jina nexweş nava cîhada nîne û wê ji wede zûtir wefat nebe, ew pêşkêşa xwe dide xebatê û zarokên xwedêparêz terbyet dike. Zarokeke wê nava goveka dîzaynêdane, û dayîka wê piştgirîyê didê. Ew zarok, keça wê, nava goveka çareserkirina progirâmên kompyûtêryêda xwendina bilind distîne û li hevaltîke çêkirina progirama dixebite. Dema ku ew îdî mezin e, dema ku ew pêşkêşa xwe bi temamî dide xebatê, ew keç mecala tevgirêdanaye nû hazir dike, ya ku diha kardar e, ne ku ew hemû tiştên ku li sûkê hene. Feqet, mecala wêye nû bêyî hevalkarê wêyî li beşa rêklamê nikare belav bibe. Ew xort jî pêşkêşa xwe dide xebatê bona ku elamî bikirçîya bike û nasîya wan bide mecalên wê progirama nû.

Ji bikirçîya yek jî hevaltîke bîznêsmênekî profêsiyonal e, ya ku vê progirâmê dest tîne. Koma wî ya firotanê heye û endamekî wê komê pêşkêşa xwe dide xebatê, bona ku wê progirâmê bifroşîne qulixdarîkê, ya ku bona hînkirina merivên hemû mileta hatîye gazîkirinê.

Nava wê qulixêda progirâmîstekî bi kerema anegor heye, yê ku mecalên wê progirâmê dibîne û pêşniyar dike ku wê progirâmê dest bînin. Ew jî wê progirâmê derbazî ser kompyûtêra xwe dike.

Bi saya wê progirâmê, ew qulixdarî dikare bi kardarî li ser serwêr û rêberên li temamiya dinîyayê tesîra xwe bihêle. Çawa encam, gelek jin û mêr bona xilazbûnê tîn û bi saya programa bona wê tevgirêdanê hînbûnê distînin.

Li ber textê Dîwanê Îsayê gelek merivên milletên cuda-cuda nîşanî wî doxtirî bike, yê ku ew jin qenc kir, piştgirîya kîjana ewî kirîye. Em dikarin bînin ber çevê xwe ku ewê çî cûreyî biqewime: “Na xêr, ew yek ne tiştê bûyîneye wekî min ew yek kiribe. Ez neçûme nava wan mileta”.

Îsayê nîşanî wî bide, wekî ew anegorî pêşkêşa xwe şuxulîye û bi saya wê yekê rêaksîya hevva girêdayî qewimîye, nava encamê kîjanêda bêhesab meriv xilaz bûne û nava temamiya dinîyayêda gelek bawarmend îzbat bûne. Bi texmîn, Îsayê bêje wî doxtirî: “Tu bi hazirîya mezin çawa doxtir dixebitî û

tê bêjî te bona Xudan kar dikir, ne ku bona meriva, û rezê te li ber çavaye. Geleka rûyê gurêdabûna teda hukumê Ezmîn li ser xwe birin. Tu her bijîyî, xulamê qenc û helal”.

Diqewime hûn bipirsin: “*Gelo Încîl piştgirîyê dide vê fikirê?*”. Vê gotinê bixwînin:

“Wê xebatê bi cûrê herî baş bikin, ya ku ya we ye. Usa bixebitin, ku tê bêjî hûn bona Xudan dikin, ne ku bona meriva. Bîr nekin, wekî hûnê heqê xwe ji Xudan bistînin” /Kolosî 3:23, 24, NCV/.

Eva varîyanteke vî cûreyî bû. Feqet, tevgirêdanên vî cûreyî, yan jî rêaksîyayên vî cûreyî, bêhesab hene.

Em paşda veqerine li ser wê serpêhatîyê, ya ku hevalê minî serwêr minra gilî kir. Gelo wê çi biqewimîya, heger ew doxtir ji wê yekê biwestîya, yê ku nava salêda tenê hevtêkê razîbûnê distîne /ew rûyê wê yekêda razî nîbû, çimkî ewî girîngîya pêşkêşa xwe fem nedikir?/ Bi texmîn, ewê ji doxtirîyê dûrbiketa û wê bicêribanda nava salêda 52 hevtîya razîbûn texmîn bikira. Em bînin ber çavê xwe, ku ewê li civînê derbazî ser xebatê bûya, çawa dersdar û hazirkirê dersên şagirta. Wî çaxî, li ber textê Dîwanê wê çi biqewimîya? Gelo ewê heqê wî cûreyî bistenda? Wî çaxî ewê pêşkêşa xwe berda, ya ku spartîbûnê wî.

Mixabin, min gelek cara him mêr, him jî jin dîtine, yên ku nenihêrî wê yekê ku bi miaşa tam qulixên xweda bi dijwarî dixebitîn, lê ji wê xebatê dûr nediketin, çimkî fem nedikirin, wekî pêşkêşên wan ji govekên civînê der gerekê pêşda biçûna.

Pêwîst e zanebûnên mêriv hebin, gihîştîbûna ruhanî hebe, bona ku tabîyên qulixkirina neşkere, yên bona çêkirina padişatîya Xwedê, bêne dîtîne.

Rastî ew e, wekî pêşkêşa weye nava goveka saxlemîxweykirinê, perwerdê, serkarîkirinê, sportê, bîznêsê, edebyetê, mêdîyayê, malhebûna malê, yan jî her govekeke mayînda, çêkirina padişatîya Xwedêva girêdayî ye. Arxîtektorê Sereke hemû tişt wî cûreyî program kirîye.

Usa jî diqewime, wekî ew açixîya ku ji gurêdabûna me tê, emê nebînin hetanî em li ber textê Dîwana Îsa nesekin. Çawa ku Pawlos dinivîse: “Hema ew jî derheqa wan karên qencdane: heger ew destpêkêda eyan nînin, ewê dawîyê eyanbin û bêne zanîne /A Tîmotêyo 5:25, TPT/.

Dêmek, nenihêrî wê yekê, pêşkêşa we eşkere ye, yan na, we ev temî stendîye: “Çawa Xwedê gazî her kesî kir, bila weke wê yekê bijî” /A Korintî 7:17/.

MENÎ BÊHESAB GIRÎNG E

Em vegerine berbi gotinên Pawlos, kîjana em bona malhebûna xwe çawa nimûne didine xebatê.

“Çimkî ev deynê stûyê min e. Wey li min, heger ez Mizgînîyê dannasîn nekim. Çimkî heger min ev yeka *bi hemdî xwe* bikira, hingê *xelata* min wê hebûya /A Korintî 9:16, 17/.

Rastîya mayîn, kîjanê gerekê bidine dîyarkirinê ewe, wekî “xelata” hema “rezedilîya” meva girêdaîye, yan jî bi fikira tomerî, “nêzîkbûna” meva girêdaîye. Bi gilîkî zelal gotî, heger nêzîkbûna me ya *xwepêşkêşkirinêye*, emê heq bistînin: heger nêzîkbûn ya *xwehizîyêye*, emê heq nestînin.

Menîyên *xwepêşkêşkirinê* û *xwehizîyê* dikarin awqasî zefbin, ku meriv nikaribe wana hesabke. Werin em çend himberîhevkirina raberkin. Nêzîkbûna *xwepêşkêşkirinê* dikare vî cûreyîbe: “*Bi karebûnên ku spartine min qulixkirina bona meriva tişteki çawaye!*”. Menîya *xwehizîyê* dikare vî cûreyîbe: “*Gelo ezê ji karebûna xwe çi bistînim?*”. Bi texmîn, ya ewlin dibêje: “*Ez çi dikarim bona te bikim*”, lê ya duem/: “*Ezê ji wê yekê çi bistînim?*”.

Nêzîkbûna bi cûrê *xwepêşkêşkirinê* dikare vî cûreyîbe: “*Ezê tiştê herî baş bikim, nenihêrî wê yekê ku ezê bona wê yekê çi bistînim*”, lê menîya *xwehizîyê* vî cûreyîbe: “*Bona çi ez gerekê vî cûreyî bixebitim, heger ezê gelek tiştî ji vê yekê nestînim?*”.

Dîsa menîke *xwepêşkêşkirinê*: “*Ez gerekê dîsa bixebitim: gelek meriv hene, nava jîyana kîjanada gerekê hukum bihêlin*”. Lê menîya *xwehizîyê* wê vî cûreyîbe: “*Ez gihîştîme açixîyê û dikarim îdî hêsbim*”.

Pawlos derheqa girîngîya *nêzîkbûnê*, yan jî *menîyêda* dinivîse: “Bila her kes me çawa nevsên û... *wekîlên* Mesîh hesabke”, û piştî vê gotinê dîsa gotina xwe berdewam dike:

“Çi ku derheqa mindane, ew yek hindik girînge ku ezê çawa ji alîyê her serkarîkirineke merivatîyê bême qîmetkirinê. Nava vê pirsêda ez aminaya xwe li fikirdarîya xwe jî naynim. Wijdanê min paqije, lê ew yek nade kifşê ku ez rastim. Xudan bi xwe wê lê binihêre û qirarke. Dêmek derheqa tu kesîda ji wede zûtir qîmet nedin, hetanî vegera Xudan, çimkî Ewê *surên meye here tarî* ronahî bike û wê her *menîke* meye *şexsî* bide eyankirinê. Wî çaxî Xwedê wê *pesinê* her kesî, yê layîqî wî, bide /A Korintî 4:3-5, NLT/.

Pawlos bi qîmetkirinên bi fikira hevalên xwe, rexnekira, yan jî her serka-

rekî xwe-xwe kifşkirîye başqe û hetanî fikira xwe jî xemgîn nîbû. Ev qîmetkirin himberî wê yekê bê fikirin, rastî kîjana emê bèn, û wê layîqî lênihêrandina xwedêtîyê bibin. Ya girîng ewe, ku *Îsayê* malhebûna me çawa qîmet bike.

Li ser xwe gumanbin, wekî *karên* gurêkirî wê wextê Dîwanê girîngbin. Îsa zelal dibêje: «Vaye, Ezê zûtirekê bêm, û xelata Min destê Minda ye, wekî anegorî kirinên her yekî bidime wî” /Eyantî 22:12/. Dîwanê bi prînsîpa “yan yek, yan jî yê mayîn” derbaz nebe, lê wê bi prînsîpa “him yek û him yê mayîn” derbazbe. Him menî, û him jî karên kirî wê wextê dîwanê bêne lênihêrandinê.

Hinek meriv dikarin bifikirin, wekî nava vê beşêda Pawlos derheqa dîwana bêbawarada dibêje, derheqa dîwana textê sipîye Mezin, wextê kîjanê bêbawar, yên ku kerema Îsa Mesîhe xilazbûnê qebûl nekirine, wê bona gunehên xwe hesab bidin. Gilî derheqa wê yekêda nîne, ku wextê dîwana textê sipîye Mezin tu kesê ji Xwedê “pesin” nestîne, çawa ku Pawlos nava vê beşêda dinivîse.

Ew yek girîng e ku hemtêksta van gotina xweykin. Pawlos derheqa *wekîltîyêda* xeber dide û şikberî tune ku gilî derheqa kêdane. Wextê Dîwanê wê “zanebûnên meye here tarî” û menîyên şexsî, yên nava serkarîkirina pêşkêşên meda, wê eyanbin. Ev yek bala me dikişîne ser xwe.

Îzinê bidin ku vê yekê ez bi mesela serpêhatîya xweye pêşin şirove bikim, dema ku min nava wê yekêda gura Xudan nekir, wekî min gerekê dannasîn bikira. Bi texmîn, merivên ku wextê wê berevbûnê hazir bûne, dibek hetanî roja îroyîn bawar kirine ku ez gura Xwedêda bûme, dema ku min ew banga “nû” dannasîn kirîye, lê ez gurêda nîbûme. Diqewime wextê Dîwanê ewê derheqa gurênekirina minda pê bihesin, çimkî Îsa dibêje:

“Ew wede tê, wextê ku ew hemû tişt, çi ku veşartîye, wê eyanbe, û ew hemû sur wê bêne zanînê. Ew hemû tiştê ku we nava tarîyêda gotîye, [menî û surên meye veşartî] wê nava ronahîyêda bê guhdarkirinê, û ew hemû tişt, çi ku we li piş derên girtî gotine, wê ji li ser banên avahîya hemûyara bê elamkirinê” /Lûqa 12:2, 3, NLT, şirovekirina nava xetên çargoşeda ya mine/.

Diqewime ez bême gazîkirinê li ber textê Dîwanê, bona ku baxşandinê ji wî serwêrê ku hemcivîn teşkil kiribû û ji yên mayîn bixwezim, yên ku wê êvarê banga kitêba “Tela şeytan” nestendin.


ÇI PÊŞÎYA ME YE?

Me da zelalkirinê, wekî bi çiqasîva girînge ku rola wekîl fem bikin. Niha pirsê here sereke e: "Gelo ji me hîvîya çine?". Bi gilîkî mayîn gotî, gelo wextê Dîwanê Îsayê dîna xwe bide feydayên çawa, wextê ku lê binihêre ku me pêşkêşên ku Ewî spartine me çawa dane xebatê? Gelo em dikarin derheqê wê yekêda bizanibin? Bêguman, çimkî Îsa got ku dîwana me wê bê kirinê "Rojê Dîwanê, bi wê rastîyê, ya ku Ewî gotîye" /Yûhenna 12:48, NLT/.

Emê evê lêkolîna ku eşkere dike û ruhdar dike ji serê kitêbêyî mayînda destpêkî, ya ku hema armanca vê kitêbêye sereke ye.

BIFIKIRIN

1. Hetanî xwendina vî serê kitêbê, hûn xwe çawa wekîl dibînin? Heger erê, bona çî û heger na bona çî.
2. Ew pêşkêşên ku Xwedê dane we bona we nînin: ew bi destî we gerekê bighîjine merivên başqe. Bi gilîkî mayîn gotî, hûn wê yekê li ser xwe dibin, çî ku Xwedê dixweze ku merivên başqe bistînin. Bi femkirina vê yekê, bona çî ew yek girînge ku hûn bi helalî pêşkêşên xwe bidine xebatê? Çî dikare biqewime, heger hûn wê yekê hesab hilnedin?
3. Her dem hûn dikarin birîyarkin, ku hûn pêşkêşên xwe bi van her sê cûra bidine xebatê: hûn dikarin wana bona çêkirina padişatîya Xwedê bidine xebatê. Hûn dikarin wana bona çêkirina jîyana xwe bidine xebatê. Hûn dikarin wana qet nedine xebatê. Hûn pêşkêşên xwe çawa didine xebatê? Hûn gerekê nava xebitandina pêşkêşên ji alîyê Xwedêda dayî çî guhartina bikin?



*“Awa gerekê meriv me usa hesabkin, çawa
berdestîyên Mesîh û wekîlên surên Xwedê.
Ji wekîl jî dikeve ku ew aminbe”.*

– A Korintî 4:1, 2

Aminayî

Pawlosê şandî xwe û Apolos çawa *berdestiyên* Îsa Mesîh û *wekîlên* surên Wî nav dike. Serê kitêbêyî derbazbûyîda em pê hesîyan, wekî wekîl ne tenê derheqa van herdu pîrozadane, û ne tenê rêberên civînêdane, lê derheqa her bawarmendekîdane. Em jî berdestiyên Îsa Mesîhin, û mecalâ sereke, bi kîjanê vê rolê em diqedînin, bûyîna wekîlê pêşkêşên wîye ku li me hatine saprtinê.

Niha guhdariyê bidin ser wê yekê, ku ji wekîl çî tê xwestinê. Nava gotina jorgotîda tenê derheqa *aminayêda* hatîye dîyarkirinê. Heya berdewamkirinê, werin em derheqa wê yekêda bifikirin, wekî li vir du yan jî sê, yan jî diha zêde, cudatî nehatine navkirinê. Pawlos dikaribû bigota, wekî ji wekîl tê xwestinê ku ew şabûnê bide kifşê, qewatbe, bi hostatî Încîlê bizanibe, rehmbê yan jî cudatîke xwedêhiziyê ya başqe hebe. Bêguman ez bi wê fikirê nabêjim wekî ev hemû cudatî girîng nînin. Lê belê, ez dibêjim wekî tenê cudatîke ku tê *xwestinê*, hatîye dîyarkirinê. Dêmek, ew yek gelekî girînge ku guhdariyê bidine ser vê yekê, heger armanca me ewe, ku em gerekê bibin wekîlên qenc, û rojekê emê ji Xudan vê xeberê bibihên: “Bijî”.

ŞIROVEKIRINA AMINAYÊ

Mecalâ min hebûye, ku ez li temamiya dinîyayê bona komên rêberkirinê dannasîn bikim /ne tenê komên qulixê, nenihêrî wê yekê ku min bi piranî bona komên qulixkirinê dannasîn kirîye/, diketine nava kîjana komên korporatîv, serkarîkirinê, bîznêsê, perwerdê û sportê. Çend cara min hîvî jî endamên wan koma kirîye, ku xebera *aminayî* bi xeberekê şirove bikin. Çawa rêber, ewana bi hazirî digotin. Li her cîha min şirovekirinên usa bihîstine û paşê min qîrar kir navnişa bersivên here belavbûyî hazir bikim:

- qewîn
- paşverû

- bawerdar
- amindar
- xwepêşkêşkirî
- pêşkêşkirî
- layîqî bawarîyê
- bêqelp
- rast
- dîyarkir
- gurêdabûn

Gelek şirovekirin hebûne, lê ev xeber diha gelekî tên xebitandinê. Ew yek diha girîng e wekî ev hemû bersiv anegorî ferhengên şirorvekirinê û sînonîmane.

Lê belê, xebera girîng heye, ya ku qet carekê jî wextê tu berevbûnekê min nebihîstîye, û ew xeber “çendbarekirin” e.

Hûn dikarin carekêra bifikirin: *“Çendbarekirin? “Ev xeber şirovekirina aminayê nîne”.* Hûn dikarin usa jî zanebûnên mine zimanra qayîl nebin, çawa ku dersdarên mekteba min, yên zimanê înglîzî. Lê belê, ez didime bawarkirinê, wekî hetanî dawîya vî serê kitêbê, hûnê ne tenê minra qayîlbin, lê hûnê bi texmîn vê xeberê hesabkin çawa şirovekirina aminayêye here girîng.

METELOKA TALANTA

Bona raberkirina fikira çendbarekirinê, em meteloka Îsaye derheqa talantada bixwînin. Hîvî dikim, ku hûn vê metelokê bi guhdarî bixwînin, nenihêrî wê yekê ku dibek we berê gelek cara xwendîye.

“Padişatîya Ezmana meriv dikare bi serhatîya merivekî ku rêke dirêj diçe, şirove bike. Ewî gazî hemû xulamên xwe kirin û perên xwe bi tamamî, wextê ku ew li cîhekî mayîn bû, sparte wan” /Metta 25:14, NLT/.

Ya ewlin, ev serpehatî metelok e, dêmek ew sembolîk e. Usa dertê, wekî em gerekê vê yekê bin ronahiya wê zanebûna Încîlê, yan jî anegorî şêwira Xebera Xwedê ya tam, şirove bikin. Merivê ku nava rêwîtiyêda bû sembola Îsa ye. Wekîl sembola her xulamêkî Wî ye, dêmek hûn û ez.

Ya duem, guhdariyê bidine ser wê yekê, wekî rê dirêj e, û ew yek bi du sedetîya îzbat dibe. Berê ewlin, îdî 2000 sal derbaz bûne ku Îsa cabdarî daye me, ku em padişatîya Wî çê bikin, bona kîjanê Ew wefat bûye. Û eşkere ye, wekî Ew hê paşda venegerîyaye, nenihêrî wê yekê, wekî bi dîrokî wedekî dirêj derbaz bûye.

Ya sêem, ev metelok careke mayîn dide kifşê, wekî malhebûn hûre-hûr

nayê serkarîkirinê. Nava vê metelokêda merivê ku hatîye dîyarkirinê diçû: ewê her meh paşda venegerîya ku şuxulkarîya wekîlên xwe kontrol bikira. Anegorî vê metelokê, ewê xebata wan hetanî paşdahatina xwe kontrol nekira.

Em serpêhatîya Wî berdewam bikin:

“Ewî pênc torbe zîv dane yekî, du torbe zîv dane yekî mayîn, û torbek zîv da yê dawî, ew hemû pere anegorî karebûnên wan pareve kirin. Piştî wê yekê, ew rê ket, çû” /Metta 25:15, NLT/.

Nava vê serhatîyêda pere spartine wan. Pirnîya tercimên Încîlê xebera “*talant*” didine xebatê, ya ku tercima xebera yûnanîye “*talanton*” e here rast e. Talant çapa giranîyê ye, ya ku hîmlî bona zêr û zîv tê xebitandinê. Talantek nêzîkî 34 kîlogirama ye. Piranîya pêşezana talantek zîv çawa 18 hezar dolarên amêrîkî qîmet dike /ev qîmet dikare bê guhartinê/. Hemû pêşezan wê fikirêra qayîlin, wekî anegorî peymanana Nû, talant çapa peraye mezin e. 34 kîlogiram zîv perê hûr nîne.

Bi hesabhildana fikira niha, ez nafikirim, wekî nava şirovekirina vê metelokêda çapa peraye rast girîng e. Lê belê, em dikarin li ser xwe guman bifikirin, wekî talantek sembola cabdarîya kifş bû.

Ez nafikirim, wekî Îsa derheqa perada digot, nenihêrî wê yekê ku bi prînsîpî vê yekê meriv dikare derheqa perada bêje. Nava metelokên xweda Îsa hindik cara hema wê yekê çawa mesele dide xebatê, çî ku fikira wîdane. Genim sîmbola merivên xwedêparêz e, gîhayê bêkêr sembola merivên xirabe, toxim sîmvola xeberaye, stirûn dijarîyên vê jîyanêne, dirûn dawîya vê dinîyayê ye, yê didrûn milyaketin, û vî cûreyî ser hev. Bi tomerî hildayî, bi lênihêrandina peymanana Nû, eşkere dibe, wekî talant sîmvola *xarîzmayêne*, yan jî pêşkêşên spartîne.

Nava vê serpêhatîyêda tişteki girîng ew e wekî hemû xulam wekehev nestendin. Hinekî dereng, emê bi hûrgilî derheqa wê yekêda xebardin, lê hema ew e menî, wekî min îdî çend cara ew tişt çawa “pêşkêş” nav kirine, çî ku spartine min. Hinek meriv pêşkêşekê distînin, yê mayîn du pêşkêşa, lê hinekên başqe jî diha zêde.

Çapên cûre-cûre jî dikarin sembola hukumê pêşkêşên me bidine kifşê. Werin em bêqelpbîn: hene meriv pêşkêşên kîjana diha zêde hukumdarin, lê ne ku pêşkêşên merivên mayîn. Li cem geleka pêşkêşa stiranbêjîyê heye, ya ku guhdarvanên wan ruhdar dike. Feqet hemû stiranbêj nînin ku pêşkêşa wan li ser derecekê ye, mesele Sêlîn Dîyon û Andrêya Boçêllî. Wê diha rastbe bêjin, wekî her talantek pêşkêşekê raber dike, û ew pêşkêşên ne li ser dere-

cekêne. Werin em berdewam bikin:

“Ew xulamê ku pênc torbe zîv stendin, destpê kir wan pera bide xebatê û dîsa pênc torbe zîv qazanc kirin. Ew xulamê ku du torbe zîv stendin, dîsa kar kir û dîsa du zîv qazanc kirin. Feqet, ew xulamê ku torbek stend, çel kola û perê axayê xwe nava axêda veşart” /Metta 25: 16-18, NLT/.

Îzinê bidin ku ez vê serhatîyê bikime ya şexsî û nava daynim ser wan xulama. Navê xulamê ewlin em daynin Êlîson, yê mayîn daynin Robêrt, lê yê sêem daynin Lêrî. Êlîson bi 5-a destpêkir û ew *çendbare kir*, çi ku dabûne wî û nava encamê wê yekêda li cem wî bû 10. Robêrt dudê xwe *çendbare kir* û nava encamê wê yekêda çar stend. Lêrî ew *çendbare* nekir, û ew çi ku spartibûne wî, *xweyî kir*. Werin van encama em bînin ber çava.

Êlîson: $5 \times 2 = 10$

Robêrt: $2 \times 2 = 4$

Lêrî: $1 = 1$

Bi berdewamkirina vê serpehatîyê, ezê van xulama bi navên ji alîyê xwe-da dayî nav bikim.

DÎWAN

Em careke mayîn bêjin, wekî girîng e bidine kifşê, wekî Îsa nava vê metelokêda xebera “*dirêj*” dide xebatê. Ev serpehatî bi şirovekirina rêwîtîya wededirêjva destpê dibe û em careke mayîn bêjin. Ew dibêje: “Piştî *wedekî dirêj* axayê wan ji rêwîtîyê paşda vegeyîya û gazî wan kir bona ku *hesab bida-na*, ku perên wî çawa dabûne xebatê” /Metta 25:19, NLT/. Hesabê ku ji wekîl tê xwestinê sembola wê dîwanê ye, li ber kîjanê ji me her kes wê bona wê yekê bisekine, ku çawa ew pêşkêşên ku spartine me dane xebatê. Em pêşda derheqa dîwana Êlîsonda bixwînin:

“*Elîsonê* ku pênc torbe zîv spartibûne wî, bi pênc torbava serda zêde pêşda hat û got: “Xudan, te pênc torbe zîv dane min ku ez wana bidime xebatê, û min dîsa pênc qazanc kirin””.

Niha qirara axayê wî guhdar bikin:

“Axayê wî destpê kir pesinê wî bide: “Eferim, xulamê minî qenc û amin! Nava xebitandina van perada *tu amin bûyî*: dêmek ezê niha tiştên hê mezin bispêrme te. Bikeve şaya axayê xwe!” /Metta 25:20, 21, NLT/.

Em gerekê wê gotina gelekî girîng tê bernedin, ya ku axayê wan got: “Tu amin bûyî”. Hûn dikarin bersiva wî usa raberkin çawa ku hûn dixwezîn, lê şirovekirineke mayîn tune: Îsa *aminaya wî çendbarekirinê*va dide girêdanê. Careke mayîn bi guhdarî gotinên axayê wan xulama bixwînin: ewî derheqa tu kirineke Êlîsonda negot. Ewî usa jî negot, wekî Êlîson merivekî qewîn, xwepêşkêşkirî, yan jî rast bû, û şirovekirineke başqe neda xebera “amin”. Min şaş fem nekin: ev hemû tişt xeberên derheqa aminayêdanin, lê li vir ew nayêne kifşkirinê, dîyarkirinê. Xêncî wê yekê, ewî tu tiştêkî mayîn derheqa kirinên wîda negotin, lê tenê got, wekî Êlîson malhebûn çendbare kiribû. Bi vî cûreyî, ewî *aminayî çendbarekirinê* va da girêdanê.

Ew yek usa jî derheqa Robêrtane. Bi guhdarî derheqa dîwana wîda jî bixwînin:

“Robêrtê ku du torbe zîv stendibûn, pêşda hat û got: “Xudan, Te du torbe zîv dane min ku ez bidime xebatê, û min dudu jî serda qazanc kirine””.

Careke mayîn qirara axayê wî guhdarkin:

“Xudan got: “Eferim, xulamê minî qenc û amin!” Nava xebitandina van perada *tu amin bûyî*: dêmek ezê niha tiştên hê mezin bispêrme te. Bikeve şaya axayê xwe!” /Metta 25:22, 23, NLT/.

Em careke mayîn bêjin, wekî Îsa dîsa *aminaya wî raste-rast çendbarekirinê*va dide girêdanê. Li vir jî derheqa şuxulkarîya wî merivîda, encamê xebata wîda tu tişt nehatîye gotinê. Îsa naxweze ku gotina axayê wan xulama sistbe, zeyîfbe. Meriv dikare tenê fikirekê pêşda bikişîne: Robêrt ew hemû tişt çendbarekir, çî ku spartibûne wî, û ew yek çawa aminayî hate hesabê.

Robêrt jî dîsa ew pesin stend, çî ku Êlîson xeber bi xeber stend. Ev yek dide kifşê, wekî roja Dîwanê çendbarekirina me wê anegorî xebata meye kirî bê qîmetkirinê. Îsayê weke hev ji me razîbe, nenihêrî wê yekê ku hejmar û mezinaya pêşkêşên me çiqas bûne. Ya girîng wê tenê tiştêkbe, ku gelo me ew tiştên ku me stendine, çendbare kirîye, yan na?

Çawa mesele, kevanîya malekê, ya ku kardarîya xwe çendbare kirîye, wê dîsa wî pesinî bistîne, çî ku wî bîznêsmênî stendîye, yê ku karê xwe û pêşkêşên bona padişatîya Xwedê çendbare kirine.

Niha em guhdarîya xwe bibin ser Lêrî:

“Paşê Lêrî hat, torbekî zêr dêstda, û got: “Xudan, min zanibû ku tu merivekî berkî: tu wî rezî didûryî, yê ku te nereşandîye, û tu wî rezî

berev dikî, yê ku te bêcer nekirîye. Ez tirsîyam, wekî minê perên te unda bikirana û min ew pere nava erdêda veşartin. Vaye perên te, ez wana paşda vedigerînim” /Metta 25:24, 25, NLT/.

Hetanî xebardana derheqa dîwana Lêrî, em hinek tiştên girîng bidine kifşê. Lêrî ew çî ku dabûne wî çendbare nekir: ewî talantên ku spartibûne wî xweyî kirin. Guhdarîyê usa jî bidine ser wê yekê ku bona çî ewî ew yek kir. Ya ewlin, ewî xeysetê axayê xwe nizanibû û bi şaşî difikirî, wekî axayê wî merivekî gelekî berk bû.

Min, bi sala ser hev, bona merivên li parçên dinîyayêye cûre-cûre û wekîlên govekên civakêye cûre-cûre qulix kirîye, û min dîtîye wekî dijwarîya sereke, ya bona zêdayê, nasnekirina xeysetê Xwedê ye /derheqa vê yekêda ezê serîkî kitêbêyî mayînda bi hûrgilî bêjim/.

Wextê ku fikira meye derheqa Xwedê da şaşê, dilê meda ew yek pêşda tê, çî ku bona çendbarekirinê dijwarîyê pêşda tîne, ew *tirs* e. Tirs, şermkirin, yan jî xof, nava jîyana meda pêşkêşên Xwedê nadine xebatê. Eva tiştêkî awqasî girînge wekî meriv nikare bêhesab bide kifşê. Ez bi xwe derheqa wê yekêda zanim, çimkî min bi sala ser hev hukumê tirsê li ser xwe dîtîye /derheqa wê yekêda ezê bi hûrgilî serîkî kitêbêyî mayînda bêjim/.

Niha em dîwana Lêrî binihêrin:

“Lê axayê wî gotê: “Xulamê *xirab* û *xweranedîtî!*” /Metta 25:26, NLT/.

Gelo eva bersiveke çiqasî berk e! Hetanî berdewamkirina gotina xwe, em vê gotinê lêkolîn bikin. Bîr nekin, wekî her sê jî *xulam* bûn, ne tenê Êlîson û Robêrt, lê usa jî Lêrî: ew *merivên ji der* nîbûn. Û ewê ku xebata wan qîmet dikir, *axayê* wan bû. Lêrî xeberên “Eferim, xulamê minî qenc û amin!” nebihîstin, çawa ku yên mayîn bihîstin. Dewsa wê yekê ew dibihê: “Xulamê *xirab* û *xweranedîtî!*”. Bêyî şikberî, eva gotineke gelekî berk û balkêş e. Nava vê meselêda Îsa derheqa xilazbûnêda nabêje: Ew derheqa wê dîwanêda dibêje, kîjanêda emê bona serkarîkirina pêşkêşên xwe hesab bidin: “Yan emê bona xebata xwe heq bistînin, yan jî emê zyanê bibînin.

Bi guhdarî xeberên axayê wan cabdara lê binihêrin. Emê ji xebera diha sivik destpêkin. Zimanê yûnanîda xebera “*xweranedîtî*” xebera “*oknêros*” e, şirovekirina kîjanê “paşdaêxistin, merivê ku hêdî dilive, ne aktîv e, *xweranedîtî*” ye. Ferhengeke mayîn vê xeberê vî cûreyî şirove dike: “Ji tevbûna îşekî layîq xwe paşda digrin, bi texmîn rûyê kêmasîya xebathiziyêda”.

Hevalê min, Rîk Rênnêr, yê ku pêşezanê zimanê yûnanî ye, derheqa “*oknêros*” da wa dibêje: “Ew fikir derheqa şexsekî usadane, nêzîkbûna kîjanîye

hindava jîyanê ya bêxebatîyê, neaktîv, medekirî, bêyî pêwandî ye". Bi saya van hersê kanîya, şirovekirina vê xebera yûnanî fikirdarîya me dide berfirehkirinê û fikirdarîya diha zelal dide me.

Heger hûn tirsonekin, wî çaxî hûnê ji karekî usa xwe dûr bigrin, yê ku gerekê bê kirinê û dikare bê kirinê. Heger hûn xebathiz nînin, cedandina weye bona serhevdaanîna wê xebatê wê tunebe. Heger hûn bêyî pêwandîne, hûnê awqasî nefikirin ku tiştêkî bikin. Ev xebera yûnanî hemû fikira dide kifşê, lê xulamê sisîya xwe mikur hat: "Ez tirsîyam". Nava jîyana wîda alîyên xweranedîtina wîye mayîn jî dikaribûn bihatana kifşê, lê faktora sereke ewe, wekî rûyê tirsêda ewî ew yek nekir.

Usa bûye ku we texmîn kirîye ku hûn dixwezin tiştêkî bikin, yê ku we nika-ribûye ji xwe dûrxin, bi taybetî nava duakirinêda, lê wedekî dirêj we tiştêkî nekirîye, hûn tirsîyane, lê paşê we dîtîye, wekî merivekî başqe wê yekê dike? Hûn fikirîne: "*Min ew fikir stendibû û min gerekê ew yek bikira*". Aaw ku Îsa derheqa wî xulamîda çi dibêje. Ew dudilî bû, ne ku carekê, yan jî du cara, lê nava temamiya malhebûna xweda. Dudilîbûn carekê, yan du cara tiştê qebûlkirinêye, çimkî em dighîjin û wî halî alt dikin. Feqet, heger em wedekî dirêj dudilîbin, wî çaxî ewê bibe xeyset û emê îdî neşuxulin, bibin cabdarên bêrez.

Dema ku Xudan cara ewlin hîvî ji min kir ku ez binivîsim, nava deh mehada ez dudilî bûm. Ez ditirsîyam ku min binivîsîya. Ez li mektebê gelek cara teribî bûm. Li ûnîvêrsîtêtê hevaleyê min bona karebûna nivîsara min li ber hemûya ez rexne kiribûm. Wextê kirina xebatekê, me gerekê xebatên nivîsar bixwendana, û wî çaxî ewî li ber hemûya derheqa xebata minda gote profêsorê me. Ez xwendikarê tek-tenê bûm, yê ku layîqî rexnekirina wî xwendikarî bûm.

Tirsa nivîsara min li ser hîmê qewîn bû: nivîsarên min nebaş bûn, fikira dersdaraye derheqa wê yekêda xirab bû, qîmetên min nimiz bûn û pêra jî xwendikarê hevalê min ez rexne kirim: paşeroja min piştgirîya min nedikir. Ev hemû tişt bi hevra şikberîya min îzbat dikirin. Nivîsara kitêbê gelek wede dixwest, lê wede jî qirarkir bû. Ewê karên mine başqe bida sînorkirinê, armanca kîjana mezinkirina qulixdarîya meye cahil bû. Min gerekê ev tirsên hukumdar û xemgînî dianîna alîkî, bona ku gura Wî da bimama.

Wê çi biqewimîya, heger ez diha zêde dudilî bûma û gura Wî nekira? Encamê wê yekê wê ew bûya, çi ku Xwedê bi destî wan herdu jina gotibû, derheqa kîjanada min pêşda bîr anîbû. Ewê ew talant bida şexsekî mayîn, "Êlîsonêkî" mayîn, yê ku wê ew mîsîya biqedanda. Ewê xebata min bistenda. Lê gelo îro ezê li kîderê bûma? Diqewime wekî dawîya jîyana xweda ez li ber textê Dîwanê çawa "xweranedîtî" bihatama navkirinê.

Min fem nedikir, wekî navê min nava nivîsarêda hatibû xweykirinê. Heger hetanî 30-î salîyê we minra bigota: “Con, Xwedê wê bi destî kitêbên te, te bişîne berbi mileta”, ezê usa li we bikenîyama, wekî hûnê mecbûr bûna dûrbiketana! Minê bigota te, tu dîn bûyî! Ez nikarim xebateke sêrûpelê binivîsim. Feqet, îro kitêbên min li Amêrikayê û li temamiya dinîyayê eyanin: ew ji sedî zêdetir zimana hatine tercimekirinê û bi çend deh mîlyon mesela hatine çapkirinê. Gelo wê çi bûya, heger min gura Wî nekira? Wê çi bûya, heger min îzin bida ku tirs ez paşda bigirtama? Sizû bedena minra derbaz dibe, dema ku ez difikirim, ku minê çiqas tişt unda bikirana!

Niha em derheqa xebera diha giranda bêjin, ya ku axa gote xulamê sisyaya. Xebera “*xirab*” dikare gelekî berk bê texmînkirinê, lê Îsa tu cara xebera badîhewa nade xebatê. Zimanê yûnanîda xebera “*xirab*”, xebera “*ponêros*” e, şirovekirina kîjanê eve: “Merivê bi kêmasîya û çawa encam ew dibe bêkêr”.

Ev şirovekirin anegorî wê yekêye, ku Lêrî çawa pêşkêşa xwe dabû xebatê. Eva hema ew yeke, çi ku Pawlos nava wan gotinada da kifşê, “Wey li min”, heger ew hindava pêşkêşa jîyana xweda amin nîbûya, ya ku Xwedê dabû wî. Fikira Lêrîye şaşê derheqa xeysetê axayê xweda kêmasîke mezin bû, rûyê çida li cem wî tirs pêşda hat. Nava xebitandina pêşkêşa spartîda ew bû yekî bêkêr. Ev gotin gelekî berkin: lê belê, werin em gotinên Pawlos, yên derheqa nexebitandina pêşkêşêda û kirina Lêrîda himberî hev bikin, ew anegorî hevin.

Îzinê bidin ku ez zelal bidime kifşê, wekî ev yek derheqa xilazbûna meda nîne, lê derheqa wê yekêdane, ku em çawa pêşkêşên li me spartî didine xebatê. Fikira Xwedê ev e:

Ewên ku çendbare dikin, qenc û aminin,
Ewên ku xweyî dikin bi kêmasîyên mezinin,
bêkêr û xweranedîtîne.

Diqewime fikira meye derheqa aminayêda ya tam nîne? Derheqa vê meselêda bifikirin. Bîznêsmênekî bînin ber çavê xwe, yê ku li nehîke nava malhebûneke ku berfireh dibe dijî. Xebata wî dikanêke biçûk e, ya ku ewî ji bavê xwe stendîye, kara dikanê heye, lê pêşda naçe. Mecalên wî hebûne, ku ew çiqên dikanêye nû li beşên bajêre cuda-cuda veke, lê nenihêrî pêşkêşa wîye bîznêsmênîyê, ewî qirar kiribû bi “jîyaneke anegorî xwestina xwe” derbaz bike.

Niha ez vê meselê bin ronahîya meteloka me lê binihêrim. Bi himberîhevkirina tevî dîwana Lêrî, em du pirsên girîng bidin. Meriv dikare bêje,

wekî vî merivî gerekê pêşkêşa xwe bida xebatê, bona ku dikanên nû vekirana û ew biketa sûkên başqe, bona çêkirina padişatîya Xwedê? Gelo xwestina wîye bona jîyana wî cûreyî dîsa ew yek nîne, çi ku xulamê bêamin kir?

Gelo me ew normên aminayê dane xebatê, yên ku Îsa dide xebatê? Neni-hêrî wê yekê, wekî ew bîznêsmên ji jîyana çareserkirî dijîya, em gerekê vê pirsra tomerîkir bidin: “Ew çendbare dike, yan pêşkêşên xwe xweyî dike?”. Werin em nava qîmetkirina xweda bêqelpbin. Gelo em aminayê tenê ji alîyê gumanêda lê dinihêrin, yan ji alîyê qewînbûnêda, lê ne bona berfirehbûnê, ne bona çendbarebûnê? Gelo me fikira tomerîye derheqa aminayêda hesab hilnedaye, ku wan pêşkêşa çendbare bikin, yên ku me stendine?

Dema ku Xwedê meriv li ser vê dinîyayê çêkir, çawa mêr û jin, temîya wîye ewlin ev bû: “Şînbîn û li hev zêdebin” /Destpêbûn 1:28/. Bêguman armanca Wî ew bû, ku zarokên me hebûna û me ev dinîya bida jîyankirinê. Lê usa jî û bi fikira diha berfireh ev temî dide kifşê: “*Em gerekê wî hemû tiştî çendbarekirî vegehrînine Xwedê, çi ku Ew dispêre me*”. “Em gerekê bi rêya çendbarebûnê li hev zêdebin”. Nava mesela talantada Îsa vê temîya destpêka kitêba “Destpêbûn”e himberî pêşkêşên ku spartine me, dike.

NEKAREBÛNA WE

Gelo hûn xwe ne anegorî xwestina xwe texmîn dikin? Diqewime usa ye, lê bîr nekin wekî tenê kerema Xwedê wera lazim e. Ji we nayê xwestinê ku hûn qewatên xweva bişuxulin, lê bi *xarîsa*, yan jî *xarîzma* Xwedê. Min ev bang bona wê yekê nenivîsîye ku hûn gumana xwe undakin, lê min nivîsîye, ku hûn femdarîya xwe bona qewata ji Xwedê dayî bidine hişyarkirinê û nîşan bidin, ku hûn çawa bawarîya xweye hindava kerema Xwedê û hindava pêşkêşên wera dayî bidine zêdekirinê. Meremê min tune ku ez barekî giran daynim ser we, kîjanî hûnê nikaribin bilind bikin. Pawlos sê cara berê xwe da Xwedê û kire qîrîn ku barê wî bê sivikkirinê, lê awa Xudan çi got: “Kerema Min ew hemû tişt e, çi ku tera lazim e. Qewata min bi cûrê herî baş nava zêfîyêda dişuxule”. Awa ezê bi dilekî şa halê zeyîfyên xweda bifirim, bona ku qewata Mesîh nava mindabe. Awa bona çi sistayên min li min *xweş tîn*” /B Korintî 12:9, 10, NLT/.

Fikireke xebera “*sistayî*” nava zimanê yûnanîda “*sînorkirin*”e. Hûn û ez merivên tek-tenê nînin, yên ku xwe bin barê giranda texmîn dikin. Li cem me hemûya jî sînorkirin dibin: hetanî li cem Pawlosê şandî jî sînorkirin hebûn. Nava hemtêksta vê gotinêda ewî derheqa wê dijîderketinê, opozîsiyayê û hetanî derheqa zêrandinên fîzîkîda jî digot, rastî kîjana ew li hemû bajara dihat /bixwînin serê 11-a/. Lê belê, ev rastî usa jî derheqa sînorkirinada bû, yan jî tiştên nebînayîda bû, rastî kîjana em tîn, dema ku em texmîn dikin ku

xebata me tiştê kirinê nîne. Neniherî wê yekê ku em nava çî halîdanin, bêyî şikberî ew yek gerekê me usa bike ku em bawarîya xwe li qewata Wî bînin. Dewsa fikira xweda *guhdarkirina* derheqa sînorkirinada, *bawarîya xwe* li sozên Xwedê *bînin*. Diqewime hûn diha gelekî guhdarîya fikirên xwe dikin, lê dewsa wê yekê gerekê em bi xwe xwera xeberdin?

Pawlos sê cara hîvî ji Xwedê kir ku tevbe, lê her car Xwedê derheqa *xarîsêda* anî bîra Pawlos. Piştî bîranîna sisîya Pawlos fem kir. Ewî fem kir, wekî hukumkirinên wî gerekê usa bikirana, ku ew diha zêde bawarîya xwe li kerem û pêşkêşên Xwedê bianîya, yên ku nava jîyana wîda bûn. Bo wê yekê jî gotina wî hate guhartinê. Ewî îdî negot: “Xwedê, vê yekê hilde”, û destpêkir bêje: “Sînorkirinên min, li min *xwş tên*”. Gelo xebera “*xweş*” ewî bi rastî da xebatê? Belê! Ewî ev yek fem kir: bi çiqasîva ew tiştên li pêşîya wî çawa ne yên kirinê dihatine texmînkirinê, awqasî zêde qewata Xwedê nava jîyana wîda dihatê kifşê, *heger ewî bawar bikira*.

Rastîke girîng heye: *ew kerema, hewcê kîjanêne em, bona çendbarekirinê, meriv dikare tenê bi bawarîyê bistîne*. Pawlos dinivîse: “Me bi *bawarîyê* mecal dît tevî wê keremêbin” /Romayî 5:2, NKJV /.

Bi vî cûreyî bînin ber çavê xwe: bawarî ew lûleye, bi kîjanê ew kerem, ya ku bona çendbarekirina me pêwîste, dighîje dilê me. Dema ku em vê bangê dibihên, bawarîya me, yan jî ew lûle gerekê firehbe, lê ne ku tengbe. Feqet, hûn bi xwe wê yekê qirar dikin. Nivîsar e: “Lê belê, ew Mizgînîya ku wana bihîstin, *kar neda wan*, çimkî ew yek bawarîyêva girênedan. Lê em, bawar mend, *dikevine nava wê rihetîyê*” /Îbranî 4:2, 3, NKJV/.

Bêyî stendina karê, vê kitêbê nexwînin: ew çî ku hûn bixwînin, bawarîyêva bidine girêdanê. Xebera ji Xwedê hatî bona zarên Îsrayêl du encamên cûre-cûre dan. Ew bona Mûsa, Hêşû û Kalêb *kardar* bû: ew qewat bûn, çimkî ew yek qebûl kirin. Feqet, hema ew Xeber bona hemû îsrayêlên mayîn *kardar nîbû*, çimkî wana ew yek înkâr kirin. Eve firqîya di navbera bawarîyê û bêbawarîyêda.

Bawar bikin wekî Xwedê hûn dane sîlihkirinê, bona ku hûn li ser karebûnên xwera bin. Ewî qewat û zorayî bona stendina cûrekî mayîn nedaye we, ku hûn xêncî wê yekê gumana xwe bidine ser kerema Wî. Dema ku hûn gumana xwe bidine ser kerema Wî, hûnê *bikevine nava hêsabûna rast*: hûnê gumana xwe nedine ser cedandinên xwe û hûnê şerkarîyê nekin ku bighîjine encama. Gelo ev *rihetî* çîyê? Ew dide kifşê, ku hûn cerekê tevî karebûna Xwedê hevkarîyê bikin bona ku hûn mîsîya xwe mîyaserkin. Wextê ku hûn *bikevine nava wê rihetîyê*, Xwedê wê rêberîya weye berbi çendrebûnê bike. Eva menîke ji wan menîya bû, wekî Dawid çawa “Merivê himberî dilê Xwedê” dihatê navkirinê. Ewî gumana xwe dida ser qewata

Xwedê, lê ne ku ser qewatên xwe. Ewî her dem digot: “Xudan zoraya jîyana mine” /Zebûr 27:1/. Nava hemû kirên wîda tiştêkî tomerî hebû:” Ewî gumanana xwe dida ser karebûna Xwedê, ya ku dilê wîda û bi destî wî dişuxulî. Bo vê yekê jî Pawlos kurê xweyî ruhanî Tîmotêyora dinivîse, wekî ewî dijî tirsê û xofê şerkarî dikir:

“Awa lawê min, *bi wê kerema* meye ku yektîya Mesîh Îsada ye, *qewatbe*” /B Tîmotêyo 2:1/.

Awa bona çî min serên vê kitêbêye duda û sisîya peşkêşî “*xarîs*” ê û “*xarîzma*” ê kir, ku nava meda ev femdarî îzbatbin, hetanî ku em bighîjine gotûbêjkirina mesela Îsaye derheqa talantada. Fikira derheqa wê yekêda, wekî gerekê bi qewatên xweva malhebûna xwe mîyaserkin, dikare him bi hukumbe û him jî gumanê bide undakirinê.

Ez hîvî dikim, ku tu cara bîr nekin: navê we diha zêdeye, ne ku karebûna weye tebyetî. Diqewime hema eve menî, ku Încîl dibêje:

“Dîna xwe bidinê, xwîşk-birano, hûn kî bûne ku Xwedêda hatine gazîkirinê: alîyê dinêda ji we gelek neserwaxt bûne, ji we gelek dinêda nezor bûne û ne jî ji we gelek alêd rengînda bûne. Lê Xwedê bêhişên din bijartin, wekî serwaxta bide şermê û sistên dinê bijartin wekî yên qewat bide şermê û Xwedê yên dine bêxebere bêrûmet û yên ne tu tişt bijartin, ku heynên berbiçev retke, here, wekî tu qûl-bende li ber Xwedê nefire” /A Korintî 1:26-29/.

Bona çî usaye? Bona çî nava gazîkirîyada yên serwaxt û qewat hindikin? Diqewime wekî merivên ku bi tebyetî tiştê dikarin bikin, bi hêsanî, bi qewatên xwe “dighîjine açixîyê”? Bi rastî, ew merivên ne serwaxtin. Ew xwe himberî merivên başqe dikin û hesab dikin, wekî ew ser ketine, dewsa wê yekê ku bin ronahîya wî navîda binihêrin, yê ku wana ji Efrandarê xwe stendîye.

Pawlos cûrekî mayîn bû. Neniherî wê yekê, wekî ew himberî merivên wedê xwe serwaxt bû hetanî xilazbûnê, demeke usa hat, wextê ku ewî hemû karebûnên xwe çawa “zibil” hesab kir, bona ku qewata Mesîh bistenda. Ew ji wan merivên kêmjimar bû, yên ku usa dikirin: ewî fem kiribû, wekî neniherî wê yekê ku ew bi tebyetî ji geleka serwaxtir bû, lê himberî serwaxtîya Xwedê ew serwaxt nîbû /bixwînin Filîpî 3:4-11/.

SOSÎYALÎSTÎ, YAN KAPÎTALÎSTÎ?

Em mesela Îsa dîsa lêkolîn bikin. Diqewime usa neyê texmînkirinê, lê hûnê bibînin, wekî berdewama wê diha bi hukum û ya ecêb e.

“Û ewî emir kir: “Pera ji vî xulamî hildin û bidine wî xulamî, ewê ku deh torbe zîvê wî hene”” /Metta 25:28, NLT/.

Niha sebirkin! Gelo me rast xwend? Bi gilîkî, ewî emir kir, ku wî torbê zîv /talant/ ji Lêrî hildin û bidine Êlîson. Em careke mayîn, encamên wê yekê bînin ber çeva.

Êlîson $5 \times 2 = 10 + 1$ /ji Lêrî/= 11

Lêrî: $1 - 1$ / Êlîsonra/ = 0

Torbên zîva li cem Êlîson bûne 11, lê li cem Lêrî bû sifir.

Sibehekê, wextê duakirinê, ez ji wê yekê ecêbmayî bûm, çî ku min dilê xweda bihîst. Îzinê bidin ku ez derheqa wê yekêda gilîkim. Bi rastî, ez hinek wede derheqa mesela talantada nefikirîbûm. Wê şebeqê min bihîst ku çawa Ruhê Xwedê got: “Kurê min, Ez, bi fikirdarîya Xwe, diha kapîtalîstîme, ne ku sosîyalîstî”.

Çî? Ez bi şikberî nêzîkî gotinên Wî bûm, lê ez gelekî dirêj tevî Xwedê nava pêwandîyada bûme, bo ku fem bikim, ku Ew kengê wê yekê mera eyan dike, çî ku em nizanin. Gelek cara ew yek tê bêjî dijî fikirdarîya ruhanî, yan jî ya sadeye, lê carina jî tê bêjî tiştekî bêfikire. Vê carê, wextê min guhdarîya wî kir, ew yek tê bêjî tiştekî bêfikir bû. Min serwaxtî hîvî kir, çimkî min her dem texmîn dikir ku Xwedê diha gelekî bi cûrê sosîyalîstî dişuxule.

Wê şebeqê Ewî rêberîya min kir, bire berbi wê meselê, da kifşê, ku heger fikirdarîya Wî ya sosîyalîstî bûya, wê ev mesele bi cûrekî mayîn gilî bikira. Dîrokê vî cûreyî destpê bûya: hersê xulam jî wê weke hev talant bistendana:

Êlîson: 3

Robêrt: 3

Lêrî: 3

Elîson û Robêrt wê amin bimana /çendbare bikirana/, lê Lêrî rûyê xwer-anedîtin û bêkêrîya xweda, wê bi cûrê xweyî mexsûs bikira. Encamê wê yekê wê bi vî cûreyî bûya:

Elîson: $3 \times 2 = 6$

Robêrt: $3 \times 2 = 6$

Lêrî: $3 = 3$

Heger bi cûrê sosiyalîstî bûya Xwedê wê vî cûreyî bikira:

Êlîson: 6-1=5

Robêrt: 6-1=5

Lêrî: 3+1 /ji Êlîson/

+1 /ji Rorbêrt/ =5

Dawîyê li cem hemû kesî wê pênc talant hebûna. Feqet usa nebû. Xwedê ew torbê zîv ji Lêrî stend û da yê mayîn, li cem kîjanî deh torbe hebûn. Îsa şirove dike ku bona çî usa kir:

“Çimkî kê ku tiştê ku dane wî bi kardarî dide xebatê /çendbare dike/ bona wî wê *hê zêde bê dayînê*, û li cem wan wê *zêdayî* hebe. Ewên ku tu tiştî nakin /*xweyî dikin*/ wê ji wan bê stendinê, çî ku cem wan heye” /Metta 25:29, NLT/.

Ez nabêjim, wekî Xwedê kapîtalîste. Na xêr, tu cara usa nabêjim. Awqasî nava vê meselêda fikirdarî û cûrê şuxulkaîya Wî diha zêde anegorî kapîtalîzmê ye, ne ku sosiyalîzmê. Li cem ciwanên meye sedsala 21-ê, li Amêrikayê û li welatên mayîn, fikirdarîya sosiyalîstî hatîye reşandinê. Sosiyalîzm nêzîkî xwedêhizîyê ye û kardar nîne:bi rastî, ew dîrek, raste-rast dijî Xwedê ye. Ew ruhê dijî Mesîh e, yê ku bin perda gulvedana hemtomerîda veşartî ye, yê ku dixweze heq bide xweranedîtinê û xebathizîyê, açixîyê û zêdayê bide cezakinê.

Xwedê diha zêde heq dide wana, yên ku çendbare dikin, û Ew dijî wê yekê nîne ku zêdayî hebe. Em careke mayîn biwekilînin, Îsa dibêje: “*Zêdaya wan wê hebe*”.

Xwedê dixweze ku zêdaya me hebe, *heger em bi dil dicedînin padişatîya Wî çê bikin û zêdaya xwe bona merivên başqe bidine xebatê*.

Diqewime we ev gotin bihîstibe: “*Xwedê dijî zêdayê nîne: Ew dijî wê yekê ye, wextê ku zêdayî nava jîyana meda serwêrîyê dike*”. Ev gotin gelekî rast e. Ew merivên ku dilên wan bi xwestina Xwedê dişuxulin, wê razî nîbin ku hebûnê berevkin. Ewê wî çaxî razîbin, wextê ku tevî Xwedê bişuxulin û wê zêdayê bidine xebatê, ya ku Ewî daye wan, bona çêkirina padişatîya Wî. Ew zêdayê çawa hacet qebûl dikin, ku jîyana meriva bê çêkirinê. Û bêyî şikberî, heger em serwaxtin, emê li ser wan haceta bengî nebin.

Em qasekê bisekinin û guhdarîya xwe bidine ser rastîke girîng: em gerekê derheqa kesîbada bifikirin, derheqa wan merivada, yên ku nikarin bixebitin û wan meriva, bo kîjana alîkarîya destpêkê lazime. Pawlos dinivîse: “*Hizkirin qewatê dide me, ku em qanûna Wî biqedînin, derheqa tengasîyên hevdu*

bifikirin. Heger hûn difikirin ku hûn diha zêde girîngin ku qûzbin û alî yekî mayîn bikin, usaye hûn nava xapandinêda dijîn” /Galatî 6:2, 3, TPT/.

Dema ku rêberên civîna Ewlin rastî hevdu hatin, wana eyan kir, wekî mîsîyayên wan cûre-cûre bûn, û hevraqayîlnebûn nava hinek pirsada pêşda hatin. Lê belê, ew bi hevra qayîl bûn, wekî ew borcdar bûn alî wan meriva bikirana, yê ku nava tengasîyêda bûn.

“Wana tenê ji min hîvî kir, ku min belengaz û feqîr bîr bianîyana, yê ku ew bare, kîjan îdî dilê mînda bû”/Galatî 2:10, TPT/.

Lê belê, girînge wê yekê qirarkin, ku meriv *feqîr* e, yan *xweranedîtî* ye? Anegorî nêzîkbûna sosîyalîstî, yê xweranedîtî û kesîb gerekê wekehev alîkarîyê bistînin. Heger em alîkarîyê bidine “xweranedîtîya”, emê tenê girêdana wane meva bidine zêdekirinê. Meremê me ewe, ku em her dem rêberîya meriva bikin berbi pêşkêşên ji alîyê Xwedêda dayî, bona ku ew jî bikaribin gulvedin û padişatîya Xwedê çêkin.

XEBITANDINA PRAKTÎK


Çi jî hebe, ya girîng ew e wekî pêşkêş spartine me, û em gerekê wana bona çendbarekirinê bidine xebatê. Heger hûn Xwedê hiz dîkin, hûnê bi kel û ced bixwezin pêşkêşên xwe bona rûmeta Wî bidine xebatê. Meremê minî sereke ew e ku ez xwestina dilê we û qewata we bidime hişyarkirinê. Hûn bi merem, bona meremê mexsûs hatine çêkirinê. Karebûnên weye lazim hene, bona ku hûn wê yekê çendbare bikin, çî ku bona rûmeta Padişê me wera hatîye dayînê. Nava vî serê kitêbêda fikira here sereke ev e.

Niha, bi femkirina mesela talanta, em hazirin derbazî pirsên praktîk bibin. Meriv çawa wê yekê dikare bide xebatê? Ev prînsîp nava jîyana meye îroyînda çî cûreyî dişuxulin?

Derheqa wê yekêda emê serê kitêbêyî mayînda xeberdin.

BIFIKIRIN

1. Tenê cudatîk heye, ya ku aminaya cabdar zelal dide kifşê. Fikira weye derheqa aminayêda çi cûreyî ye? Fikirdarîya we, piştî xwendina vî serê kitêbê, çawa hate guhartinê?
2. Çendbarekirina heta-hetayê bi qewatên meva nayê destanînê. Ew yek encamê hevkarîya tevî kerema Xwedê ye. Gelo hûn dicêribînin pêşkêşên xwe bi qewatên xweva bidine çendbarekirinê? Hûn çi cûreyî dikarin wana ne ku bi şerkarîyê, lê ji tabîya rihet çendbare bikin?
3. Xwedê dijî zêdayê nîne: Ew dijî wê yekê ye, dema ku zêdayî nava jîyana meda serwêryê dike. Bi fikira we, bona çi Xwedê wê yekê girîng hesab dike, ku hûn pêşkêşên xwe çendbare bikin? Bi çi cûreyî çendbarekirina pêşkêşên we dikare diha zêde qedirê Xwedê bigre û hukumî li ser jîyanên merivên başqe bike?



“Ewê ku bi aminayî û bi helalî serwêrîya wî tiştê
hindik dike, yê ku wîra hatîye dayînê,
ewê pêşda here, û borcdarîyên diha mezin
wê li wî bêne spartinê”.

– Lûqa 16:10, TPT

Xebathizî û çendbarekirin

Anegorî gotinên Îsa, heger em bi helalî bijîn, qewînbin, aminbin û xebathizbin, û wî hemû tiştî çendbare bikin, çi ku niha em serwêrîyê lê dikin, wî çaxî borcdarîyên li me spartî wê diha zêdebin. Bi cûrê zelal gotî, *wextê ku em bi helalî hebûna xwe çendbare bikin, Xwedê wê diha zêde tiştî bispêre me.* Ewê pêşketinê bide me. Eva qanûneke padişatîya Wî ye.

Nêzîkbûna xwe lê binihêrin. Gelo fikirdarîya weye çendbarekirinê heye, yan fikirdarîya we diha gelekî ya xweyîkirinêye? Gelo diqewime wekî hûn pişt wê yekê sekinîne, wextê ku hûn gihîştine dereca açixîyêye usa, kîjanê hûn diha bilind hesab dikin, ne ku piranîya destanînên meriva, diha zêde ne ku jîyana dê û bavên we, yan jî hûn hesab dikin bona jîyana anegor xwestina we îdî bese?

Nava qîmetkirina xweda zelalbin. Heger hûn diha zêde yên xweyîkirinêne, ne ku çendbarekirinê, usaye behseke baş heye: hûn hê li vê dinîyayê dijîn û wede heye ku hûn bêne guhartinê, çendbare bikin û diha zêde borcdarîya bistînin.

DU ENCAMÊN CUDA

Nava salên zarotîya minda jî bona min çetin nîbû derheqa van herdu fikirdarîyên dijî hev bifikirîyama, derheqa xweyîkirinê û çendbarekirinêda. Herdu kalikên min bona min meselên van herdu fikirdarîya bûn. Ji wana yek 65 salîya xweda xebat hişt û derbazî hêsbûnê bû. Hersal ew bi du hevtîya dihate cem me, min her roj didît ku ewî bi praktîkî tu tişt nedikir. Ew bin dara gûzaye hewşa meda rûdinişt û cigare dikişand. Wextê ku em diçûne mala wî, dîsa wî cûreyî bû. Mixabin, nava salên jîyana wîye dawîyêda tê bêjî ewî dewsa jîyanê xwe yole dibir.

Kalikê minî mayîn 62 salîya xweda xebat hişt û derbazî hêsbûnê bû û ew tişt destpê kir, kîjanê meriv dikare çawa jîyana wîye duda nav bike. Ew ji 60 salîyê derbaztir bû û li “Ûnîvêrsîteta Ratsêrsê” hate qebûlîkirinê û destpêkir

malhebûna gundîtîyê lêkolîn bike. Nava du dehsalîyên bi sirêda ewî du kitêb nivîsîn, baxçekî mezin çê kir û bêcer kir, heywan xweyî kirin, alî kir ku li kenarê Florîdayê bona merivên yaşê xweda mezin avayên jîyînê çêkin, usa jî tevî cêrge projeyên bîznêsê bû. Ewî her dem alî merivên nava hewcetîyêda dikir.

Dema ku ew li me diqesidî, yan jî em diçûne mala wî, bona me ew qewi-mandineke cuda bû, em her dem hîvîya wê yekê bûn. Ewî progiramên sefera mesîgirtinê hazir dikirin, çûyîna li parkên hêsbûnê û seferên beribi Nyû York Sîtîyê teşkîl dikirin. Ewî tevî me lîstik dilîstin, em dibirine malên cînara, alî bîznêsmênên cî li dikanên wanda dikir û her êvar bona me xwerinên xweş çê dikirin. Kalikê minî mayîn aspêjxanêda jî alî nedikir.

Kalikekî min 75 salîya xweda wefat bû, lê yê mayîn 91 salîyêda. Hûn dikarin bêjin ku kî zêde jîyana xwe derbaz kir? Belê, ewê ku çendbare dikir. Awa tiştêkî hewaskar: ewî tenê 89 salîya xweda xilazbûn stand. Feqet, hetanî wî çaxî ewî bi prînsîpên Xwedê jîyana xwe derbaz dikir, anegorî qanûnên padişatîya Wî, û bi zêdayê ew rûnkirî bû.

Hetanî wê rojê, wextê ku mecala min hebû ku min rêberîya wîye berbi Îsa bikira, kalikê min bona fikirên min qerf li min dikirin. Ewî qerfê xwe li bawarîya min dikir, dema ku me bi hevra xeber dida. Piştî gelek cêribandîna, bona ku bo wî min dannasîn bikira, ewî got ku dixweze Îsa çawa Xudan qebûlke û ez hindik mabû li cîhê xweyî sekinî biketama. Ew roj, rojeke gelekî baş bû.

Piştî wê xebardana me mehek derbaz bibû û ez careke mayîn çûme cem wî. Ew teze ji mala xweye li Dêytonayê cîguhastî merkeza Ormondêye mexsûse bona xweykirina merivên yaşê xweda mezin bibû. Ji mala me hetanî wê merkezê bi avtomaşînê rêya sehetekê bû. Wê carê ewî minra got:

-Con, tu dixwezî derheqa kirina minda bizanibî: derheqa wê yekêda ku ez gerekê li ser vê dinîyayê çî bikim?

Ez zendegirtî mam, wekî merivê wî yaşîda tezexilazbûyî wî cûreyî difikirî. Feqet, dewsa nîşandayîna metelmayîna xwe, min bersiva wî da:

-Belê, kalo, kirê te kîjane?

Ew kenîya û got:

-Ruhê Pîroz gote min ku ez li virim, bona ku van hemû merivara derheqa Îsa Mesîhda gilî bikim /li wê merkezê çend sed meriv diman/.

Piştî du sala dayîka min û birayê wê ew cîguhastî Oklahomayê kirin, ku ew diha nêzîkî kurê xwe bûya. Piştî hevtêkê ew temamîya şevê raneza û serhatîya jîyana xwe wê jinêra gilî kir, kîjanê ew xweyî dikir. Şebeqê, berî derketina royê, ewî gote wê jinê: "Wedê çûyîna teye malêye. Bêje kurê min

ku bona min kêyfekî teşkîl bike". Piştî wan gotina ew ji bedena xwe dûrket û gihîşte malbeta Ezmana.

Dayîka min xemgîn bibû: ew fikir rihetî nedida wê, wekî wana hukumî ser wî kiribû û ew ji Florîdayê cîguhastî Oklahomayê kiribûn. Dema ku ewê ew yek got, min lez ew dane bawarkirinê, wekî wana zyan negîhandibûne wî:

-Dayê, dema ku kalo 89 salî bû, ewî gote min wekî Xwedê nîşanî wî daye, ku ewê dîsa du sala li Ormondê bijî ku xebata xwe mîyaserke. Eva îdî hevtêke ku ew li Oklahomayêye: ewî xebata xwe îdî kirîye.

Dayîka min gotina min him qebûl kir û him jî zendegirtî ma.

Nenihêrî wê yekê, wekî kalikê min xilazbyî nîbû, nava jîyana wîda prînsîpên xwedêtîyêye xebathizîyê û aminayê hebûn. Bi dîtina firqîya di navbera jîyanên herdu kalikên xwe, usa jî hetanî ku ez bûme bawarmend, min qirar kiribû, wekî ez gerekê mînanî wî kalikê xwe bijîm, yê ku hebûna xwe çendbare kir û hetanî dawîya jîyana xwe wî cûreyî derbaz kir.

Feqet îzinê bidin ku ez zelal bim. Gelek cara min jî xwe şaş kirîye ku jîyana hêsa bibijêrim. Lazime ku em fikirên xwe kontrol bikin, bona ku em xwe nedine cûrê jîyana merivê ku "xweyî dike", çimkî ew diha hêsaye.

Wextê menîyên xweranedîtîne, dudilîyê û xemsarîyê çendbarekirin wê neyê kifşê. Pawlosê şandî mera dibêje:

"Tu cara xweranedîtî nîbin, lê *bi kel û ced bixebitin* û *bi dilê şa* qulixî Xudan bikin" /Romayî 12:11, NLT/.

Berî her tiştî, wê yekê fem bikin, wekî eva ne temîye, ne jî pêşnîyare. Bi guhdarî gotina "*bi kel û ced bixebitin*" lê binihêrin. Eva cudatîke pêşine, kîjanê hûn gerekê bona çendbarekirinê bidine kifşê. Hûn gerekê ne tenê *bi kel û ced bixebitin*, lê gerekê *bi şabûn* îşê xwe bikin. Min şaş fem nekin: sê faktorên çendbarekirinêye girîng evin: bawarî, eyantî û heta-hetayî. Feqet ew bêfaydene, heger hûn bi kel û ced nexebitin.

Ez û Lîza, em tevayî ji roja bawarmendîya me destpêkirî, bi kel û ced xebitîne. Ev yek dilê meda hatîye danînê û Xwedê ew cudatî dide her bawarendekî. Şabûna me tiştên dervava girêdayî nîbû, lê bi cedandina kûrva, ya ku ji du kanîya dikişe: ji hizkirina meye raste hindava Îsa û hizkirina meye raste hindava cimeta Wî. Ev cedandin li ser qirara qewîn û bi dil hatîye hîmdanînê û ew xwestina meye çêkirina padişatîya Wî dilê meda diha dide gurkirinê. Ew bêhesab girînge, çimkî her dem nîne, wekî ruh-darbûna wî cûreyî dibe. Bi rastî wedê usa wê hebin, dema ku hûn tu tiştî texmîn nekin.

Xebera "*şabûn*" zimanê yûnanîda xebera "*êntêos*" e, ya ku dide kifşê

“Nava Xwedê da”. Xebathizîya me gerekê ji hazirîya Wî bikişê, lê ne ku ji texmînkirina, yan jî ji bûyarên der.

YÊN MERIVÊN BAŞQE ÇENDBARE BIKIN

Piştî zewaca me, ez û Lîza diçûne civîneke bajarê Dallasê li ştata Têxasê. Ew civîn, civîneke Ştatên Amêrikayêye Yekbûyê eyan bû, û çend sed xebatkarên wê hebûn. Çawa rezedilvan, em her dem hazir bûn me ew hemû tişt bikira, çî ku lazim pêwîst bû, destpê kir qulixdarîya qeyde û qanûnêda qulixkim û ez nava qulixdarîya hebsada bûme rezedilvan. Min li hebsa qulix dikir, diçûme malên bona merivên yaşê xweda mezin, alî hemcivîna dikir, bona xebatkarên civînê xebatên biçûk dikir û usa jî dersên tênisê didane zarokên serwêrê me. Tu qulixdarîkêra min tu cara nedigot “na”, çî jî hebûya, û tevî wî hemû tiştî nava hevtêda ez 40 sehetî, çawa înjênêr, li hevaltîya “Rokfêl Întêrnêşinil”-ê dixebitîm.

Dêmek, bi dîtina xebat û xwestina mine nava qulixdarîyêda, jina serwêrê meyî sereke /ya ku dîsa serwêra civînê bû/, ji min pirsî ku gelo ezê bixwezim bi wedê tam bighîjime teşkîla xebatkarên civînê. Wextê qisa fermî ewê gote min:

- Con ez nafikirim, wekî em dikarin anegorî wê yekê heq bidine te.
- Çî jî hebe, ez qayîlim, - min got.

Bona min hewaskar nîbû ku ewê çiqas heq bidana min. Ez bona her xebatekê, çî miaş jî hebûya, hazir bûm. Piştî wê qisê, ewê pêşniyarî min kir, ku ez bibûma alîkarê koma şuxulkir. Hewcetî tunebû ku min û Lîzayê bi kel û ced me dua bikira bona wê yekê, çimkî me zanibû, wekî ew yek xwestina Xwedê bû. Min ew pêşniyar qebûl kir, bi miaşa salê 18 hezar dolara, ya ku bona me çawa kurtkirina kara salê bû, lê me ew yek çawa pêşkeftin hesab kir. Me zanibû, wekî bona me dayîna nebînayî wê lazimbûya, bona ku me bikaribûya bi wê miaşa nû bijîta, lê wê yekê em xemgîn nedikirin. Me gav avît, çimkî me bi dil bawar dikir, wekî ew yek navê jîyana me bû.

Wê qulixêda ez alîkarê serwêrên xwe, malbetên wan û mêvana bûm. Min bi sê menîyên sereke xebata xwe dikir. Ya ewlin, min bona wana usa qulix dikir, tê bêjî min qulixî Îsa dikir. Ya duem, her dem min pêşîya xwe dinihêrî, bi femkirina wê yekê, wekî ew hewcê çine û min ew yek gerekê bikira, hetanî ku wana bona wê yekê hîvî li min bikirana. Ya dawiyê tu cara, wextê ku min xebat distend, paşda venedigerîyam û min nedigot, ku ew xebat ya kirinê nîne. Min her dem mecal didîtin, ku ew xebat min bi duakirinê bikira, bi çêkirinê û xebata bi kel û ced bikira. Û heger tiştek nedihate stendinê /tiştên usa hindik diqewimîn/, min her dem helkirina bi rêyeke başqe pêşniyar dikir,

û gelek cara ew diha kardar dibû, ne ku cûrê ku min pêşda stendibû.

Dema ku ez ketime wê qulixê zarokên me tunebûn. Nava hevtêda xebata me ya peşeroje bû û hîmlî ji 50 hetanî 70 sehetî bû. Em herdu jî li ser wê fikirê bûn, wekî ew yek girîng bû, ku her hukumekî nava jîyana serwêrê meda me bida dûrxistinê. Me dixwest wekî wana tamamîya guhdarîya xwe bida li ser rêberkirina civînê.

Ez dikarim gelek serhatîya gilîkim, kîjana menîyên me didane kifşê, lê ezê tenê yekê raber bikim. Mêvanekî serwêrê me hebû, yê ku endamê koma dannasînkirekî eyanî rehetî bû. Ewî dixwest diha zêde derheqa dannasînkirê rehetîda bizanibûya û carekê hetanî şeva dereng mêvanê xwera qise kir. Têlefona min şev seheta 1-ê zengil xist. Yê ku têlefona dikir serwêrê min bû. Ewî hîvî kir, ku ez herime mala wî /ji mala me hetanî li wir bi avtomaşînê rîya 25 deqa bû/ û mêvanê wî bibim hotêlê.

-Ez îdî têm, - min bersiva wî da.

Ez çûme mala wî, hîvîyê sekinîm, hetanî ku wana xatir ji hev xwestin, û min mêvan bire hotêlê. Ez şev seheta 2:00 çûm razam.

Serwêrê min nizanibû, wekî ez gerekê biçûma firegehê pêşîya mêvanekî mayîn, yê ku gerekê êvara rojtira mayîn li civîna me dannasîn bikira. Mêvan gerekê şev ji adên Havayê bi teyarê bihata û teyara wî gerekê şebeqê 5 û nîva peîya bûya. Ez mecbûr bûm şebeqê seheta 4:30 deqe hişyar bûma, bona ku bighîştama firegehê. Min usa jî negote serwêrê xwe, wekî ez wê şevê qet sê seheta jî ranezabûm. Min qîrar kiribû her xwestineke wan biqêdanda û her dem min dianî bîra xwe, wekî qulixkirin derfeteke cuda ye.

Piştî qulixkirina çar sala, bona serwêrê xwe û jina wî, carekê, wextê ku ez tevî wan tenê bûm, min gote wan:

-Ez dua dikim û hîvî ji Xwedê dikim, wekî ew merivê ku wê qulixa minda cîhê xwe bigre, dubare baş bixebite, ne ku ez.

Min dixwest ku ez hema wî cûreyî dûrketama û min dixwest wekî qulixa min diha zêde kardar bûya.

-Ew yek tiştê bûyîne nîne, - wana got. -Te xebata xwe gelekî baş kirîye.

Wê begemîyê ez ruhdar kirim. Bi saya gotinên wan, ew tamamîya xebata bi kel û ced ku min kiribû, gelekî hêsa hate ber çevê min, lê min dixwest pêşkeftin bistenda. Paşê, qulixa minda du meriv kifş kirin. Serwêrê min bi duakirinê ez berdama ku min li civîneke mayîne eyan ya li Florîdayê çawa serwêrê qulixdarîya cahila qulix bikira, derheqa çida min serê kitêbêyî duemda bîr anîbû.

Dema ku min li Flordayê qulixa xweda cîhê xwe girt, min acizî texmîn dikir, çimkî em nedighîştine gelek cahila. Nîveka salên 1980-yê ez serwêrê qulix-

darîya cahila bûm, wextê derfeta temaşekirinêye tek-tenê têtêvîzîyon bû. Kompyûtêr, planşet û smartfon tunebûn. Weşana bi torên sosiyalî tunebû. Bi gilîkî gotî, mecala here baş, ya wî çaxîye bona gihîştina meriva, têtêvîzîyon bû.

Piştî kirina hinek lêkolîna ez pê hesiyam, wekî nava wedê kanaleke Florîdayêye têtêvîzîyonêye here mezinda, eva şemîyê, seheta 22:00, cîhê weşanêyî vala hebû. Ez derheqa bahê wê weşana 30-î deqê pê hesiyam, ew perekî mezin bû.

Ez nêzîkî serwêrê mezin bûm û min jê pirsî ku gelo em dikarin wî wedê weşana têtêvîzîyonê bona bernamên cahilaye mizgîndarîyê bikin.

-Con, ew yek ne anegorî byûcêya civînê ye, - ewî got.

Min jê pirsî:

-Hûnê dijî wê yekê nîbin, ku em pêşnîyarî cahilên qulixdarîya me bikin ku her meh pêşkêşkirina bikin bona ku em heqê wê weşanê bidin.

-Bêguman, ew dikarin îzina wê yekê bidine xwe, - ewî got. Bi fikira min, ewî bawar nedikir, wekî cahilara wê ew yek li hev bihata.

Wextê berevbûna ciwana min derheqa eyantîya xweye derheqa gihîştina undabûyada gilî kir. Wî çaxî gelek ciwan rojên şemîya, êvarê, têtêvîzîyon temaşe dikirin. Wextê wê programê meyê Xebera Xwedê dannasîn bikira, paşê meyê temaşevanên têtêvîzîyonê teglîfî civînê û qulixdarîya ciwana bikira. Min bangî ciwanên qulixdarîya me kir, bo ku bona wî meremî kîsî xwe pêşkêşkirin bikirana, ji xebatên piştî mektebê kirî, yan jî ji xebatên nehertimî. Bi hesabkirina sozên finansî, ez û alîkarê min, yê qulixdarîya ciwana, em ecêbmayî bûn: perên berevbûyî têra kirîna weşanê dikirin.

Serwêrê min jî diha zêde zendegirtî ma. Ewî destûr da min ku ez wê programê destpêkim, ya ku di hate navkirinê "Cahiltîya agir". Me her meh perên weşanê dida û tiştê ruhdarkirinê ew bû, wekî gelek ciwanên ku nedîçûne civînê, destpê kirin tevî qulixdarîyên ciwana bibin û Îsa qebûl kirin. Ji 20 salî zêdetir derbaz bibûn û meriv nêzîkî min bûne, gotine min, wekî salên 1980-yî wana programê bi sernavê "Cahiltîya agir" temaşe dikirin û wê programê hukumekî mezin nava jîyana wanda hiştîye.

Dema ku min qulixa serwêrê qulixdarîya ciwana hişt, me ew qulixdarî paraveyî ser sê beşa kir. Ew qulixdarî, rêberîya kîjanê me dikir, teslîmî sê qulixçîya bibû. Careke mayîn bêjim, kerema Xwedê, gurêkirin û xebata bi kel û ced çendbarekirin anîn.

Îsa dibêje:

"Heger hûn nav tiştê xerîbda amin nîbin, ya we kê wê bide?"
/Lûqa 16:12/.

Werin em xebera Wî anegorî mesela derheqa talantada şirove bikin:

“Heger we ya yekî mayîn çendbare nekirîye, kê wê bide we ku hûn ya xwe çendbare bikin?”. Serwêrê wê civînêyî mezin bernama Xwedêye, bona min û Lîzayê elam kir, û ew yek sazkirina qulixdarîya “Mêsîncêr întêrnêşinil”-ê bû. Ew yê ewlin bû ku ew fikir da me, lê ne ku em bûn. Bi destpêkirina xebata xwe, çawa serwêrê qulixdarîya ciwana, min gotibû: “Serwêr, ezê li vir bimînîm, hetanî kö Îsa paşda bê, yan jî hetanî ku Xwedê him nîşanî te û him jî nîşanî min bide ku em gerekê herin”. Heger Xwedê nava duakirinêda nîşan neda, ku em gerekê derbazî qulixa mayîn bûna, ez ne li ser wê fikirême ku gelo minê xwe aza texmîn bikira, wextê ku ez ji wê civînê dûrketama? Hetanî roja îroyîn ez bawarim, wekî hema ew bû menî, wekî Xwedê cara ewlin derheqa wê qulixêda nîşanî wî da.

BÛYÎNA “MÊSÎNCÊR ÎNTÊRNÊŞINIL” Ê

Piştî dûrketina ji wê civîna Florîdayê, piştî hinek wede, me li bajarê ştata Karolîna Başûre Kolûmbîyayê qulix dikir. Şebeqekê, min cîyekî başqe bona duakirinê dîtibû. Xwedê minra got: “Kurê min, tê ji wan toximên aminayê rezekî mezin bistînî, kîjan te nava hevt salên dawîda direşandin, wextê ku tu nava qulixdarîyên merivên başqeda bûyî. Ewê carekêra despêbe û nava salên pêşîyêda wê berdewambe”.

Niha, bi nihêrandina li piş xwe, ez rûyê wê dirûnêda xofê texmîn dikim.

Piştî wê yekê, wextê ku em ji civîna xwe hatine şandinê, bona ku jîyanê bidine qulixdarîya “Mêsîncêr întêrnêşinil”-ê, xebathizî dîsa faktora çendbarekirinêye kilît bû. Me, ez û Lîza, gelek êvarî derbaz dikirin, xebatên cuda-cuda dikirin, mesele, me qeytanên dengnivîsarê kopî dikirin, êtikêtkê hazir dikirin û cêrga dannasînkirinê hazir dikir. Çend hevalên me li me diqesidîn, bona ku duruşm li ser pakêta xistana, bona şandina bi postê, yan jî nava pirsên başqeda alî me dikirin. Min tevî Lîzayê name dinivîsîn, çêk diavîttine li ser hesabê bankê, hesabên finansî me tevayî dikirin û zivira dokûmêntaye pêwîst bi temamî dikir. Me xebatên kompyûtêrê mîyaser dikirin, postêra dixebitîn û çareserkirina matêriyalên xebata xwe me dikir û ev hemû tişt hemû borcdarîyên me nîbûn. Me xebata xwe piştî duayê şebeqê destpê dikir û gelek cara em hetanî êvarê seheta 21:00, yan jî hetanî şev dixebitîn.

Em bi şabûn dixebitîn û ew yek me çawa tiştêkî cuda hesab dikir. Menîya me hema ji dilê me dikişîya û berdewam dikir, nava gelek acizîya û wedê zîhara derbaz dibû. Ez gumanim, wekî qewata me hebû ku em bêyî acizbûn pêşda biçûna, çimkî her şebeq me wede bona duakirinê başqe dikir. Em bi rîya kenarê Rojavayêyî sereke “I-95” r’a, bi avtomaşîna xweye “Honda Sîvîk”-ê diçûne jor û jêr.

Herdu kurên meye biçûk bi kursîyên zaroka li piş me rûniştîbûn. Me li civînên biçûke ji 80-100 endamî dannasîn dikir. Berevbûna meye ewlin li civînekê bû, ya ku li avayê byûroya definkirinê berev dibû: destpêkeke çiqasî başe!

Me kasêtên xweye guhdarkirinê difrotin û kara ji wan kasêta stendî me bona berfirehkirina qulixdarîya xwe dida xebatê. Me qirar kiribû, wekî ew pere bona miaşa me nîbûn: girîng bû, ku me “Mêsîncêr” berfireh û çendbare bikira. Hebû wede wextê ku me mecalên şexsîye lazim hema wê rojê distendin, wextê ku ew mera lazim bûn. Li ser hesabê “Frotana kasêta” mecal hebûn, lê me qirar kiribû wana nedine xebatê. Piştî sal nîveke xebata bi kel û ced bû, wekî min derheqa nivîsarêda ji Xwedê bihîst. Ez gelekî xemgîn bûm, wekî nava rojêda wê wedê anegor tunebûya, ku min binivîsîya û borcdarîyên mayîn biqedandana. Qebûlkirina qirara wî cûreyî tê bêjî ya rîskê bû, lê bona nivîsara kitêba mine ewlin gelek wede hate xwestinê. Neniherî wê yekê, wekî ez hîvîya wê yekê nîbûm, lê çend cahila bi rezedilîya xwe alî me kirin û ew xebatên duem dikirin, kîjana wê wedê nivîsara kitêba ji min bistendana. Wan ciwana ew rol hildane ser xwe, çî ku me bona serwêrê xweyî li Dallasê dikir û dixebitîn. Wana ew hewcetî dît, ya ku nava jîyana meda bû û hatin bo alîkirina me, neniherî wê yekê, wekî me ji wan hîvî nekiribû ku ew alî me bikin.

Min destnivîsara kitêba “Serkeftina li qûmistanê” piştî xebata bi kel û cede salekê xilaz kir. Min pirînsîpeke girîng fem kir: *em gerekê nava pêşkêşên jîyana xweda pêşda herin. Ji me gelek meriv destpêkêda nagihîjine encamên usa. Petrûs dinivîse: “Nava kerem û zanebûna Xudan û Xilazkirê me Îsa Mesîhda bighîjin” /B Petrûs 3:18/.*

Niha karebûna nivîsara min diha gelekî pêş ketîye, ne ku wî çaxî, wextê ku min kitêba xweye ewlin dinivîsî.

Me, ez û Lîza, ew destnivîsar raberî rêdaktorekî gelekî navdar kir. Ez zengirtî mam, wextê ku ewî bi cûrê hişk rexne kir û got, wekî ez gelekî ciwan û necêribandîme, ku banga wî cûreyî bidime bedena Mesîh.

Piştî wê derba înkarkirinê, me destpê kir rêdaktorekî mayîn bigerin. Me rêdaktorek dît, û ewî temamiya destnivîsarê xirab kir. Em gelekî aciz bûn, wextê ku me ew destnivîsar paşda stend. Ewî dengê min û hukumê serecema kitêbê unda kiribû, û ya here xirab ew bû, wekî ew bi temami bêfikir bibû. Bi gilîkî gotî, ewî hemû tişt tevlihev kiribû. Gelo piştî wê derbê meye çî bikira? Îdî ji salekê zêdetir wede derbaz bibû.

Em teslîm nebûn. Me rêdaktoreke mayîn jî dît û piştî xwendinê ew qayîl bû, wekî destnivîsara ewlin hatibû tevlihevîkirinê.

-Con û Lîza, - ewê jinê got, -çawa qanûn, hêja nîne ku ew xebata nebaş

kirî careke mayîn rastkin. Zÿana wan pera, ya ku wî rêdaktorî daye we, hesab hilnedin û careke mayîn destpêkin.

Wê jinê pêşniyar kir, wekî Lîza ew destnivîsara pêşin lê binihêriya û paşê wêra bişanda.

Me gura wê rêdaktorê kir, û Lîzayê, bi seheta wedê xwe li ser xwendina destnivîsara pêşin derbaz kir. Rêdaktora nû, xebata ku Lîzayê lê nihêribû hilda û derbazî ser îşê xwe bû. Ewê xebateke baş kir û me texmîn kir, wekî bi kutasî destnivîsareke baş hate stendinê.

Min ew destnivîsar raberî du çapxanên eyan kir. Ji wana yek usa jî meva nehate girêdanê, lê ya mayîn bersiva me da. Wana gote min, wekî kitêba min bêhesab ya “dannasînkirinê”-ye û çawa ku ez ne qulixçikî navdar bûm, wana qîrar kir kitêba min çap nekin. Min cêriband li çend çapxanên mayîn jî kitêbê raberkim, lê tu kesî hewaskariya xwe neda kifşê.

Hûn dikarin bînin ber çevê xwe, ku ez çiqasî aciz bibûm? Piştî xebata ji salekê zêdetir û wedekî usa, tê bêjî em ketibûne nava hesarê. Ez tevlîhev bibûm, lê min nedixwest teslîm bûma.

Xweçapkirin wî çaxî tiştê usa bû, ku tu kesî nebihîstibû. Tu xudaneke nivîsarayî açix jî nikaribû wê yekêva mijûlbûya, lê hevalekî min pêşniyar kir, ku ez wê yekê bikim. Em pê hesîyan, wekî 12.000 dolar lazim bûn, bona ku me çend hezar kitêb, nenihêrî xercên bona dîzaynê û berevkirina têksta, kitêb çap bikira, lê me îdî pere dabûne du rêdaktora.

Ew pere bona me perekî mezin bû. Sala 1990-î, bi tomerî hildayî, kara “Mêsîncêr întêrnêşinil”-ê 40.000 dolar bû. Me sala sêem, ya qulixdariya xwe, destpê dikir û kara me himberî sala ewlin zêde nebibû. Tê bîra min ku dawîya sala duem ez çiqasî şa bibûm, wextê ku me kompyûtêra ewlin kirî, ya ku çend sed dolar bû. Nava qewilên wî cûreyîda 12.000 dolar bona me gelekî tişteki mezin bû. Ecêbek lazim bû ku me ew pere bistendana.

Me nasîya xwe da jinekê, ya ku pêşezana berevkirina têkstaye bi kompyûtêrê bû û ew çapxaneke biçûkda dixebitî, ya ku kitêb derheqa lîstikên sportêye derva çap dikirin. Ewê bihîstibû, wekî min derheqa nivîsarêda digot, û ew nêzîkî Lîzayê bû, pêşniyar kir ku bêpere dîzayna kitêbê û berevkirina têksta bona çapkirina kitêba me bike. Em gelekî şa bûn, wekî em mecbûr nîbûn bona wê qulixê bi hezara dolar bida.

Xwedê bi cûrekî ecêb perên mayîn da, yê ku bona bi xwe çapkirinê pêwîst bû û me 5.000 heb kitêba “*Serkeftina li qûmistanê*” çap kir /ya ku niha bi sernavekî mayîne û tê navkirinê “*Xwedê, tu li kîderêyî?*”/.

Şabûna meye destpêkêda dirêj nekişand, çimkî me fem kir, wekî rêyên belavkirina kitêbê tunebûn. Xebatkarên firotanê û dikanên kitêba derheqa meda nizanibûn, û wî çaxî hevaltiyên wî cûreyî tenê ji çapxanên eyan kitêb

dikirîn. Hewaskariya tu kesî hindava kitêba bi xwe çapkirî tunebû.

Me destpê kir kitêba xwe tevî berevokên kasêtên aûdîyo, li ser sivira xweye frotanê bifroşin li wir, li kîderê me qulix dikir Dema ku min derheqa qûmistanêda dannasîn dikir, me meselên hemû kitêbên anî difrotin. Ew bang li meriva xweş dihat, lê belavkirina kitêbê bi wê yekêva dihate sînorkirinê.

Wextê duakirinê, Xwedê gote min ku ez kitêbekê jî binivîsim: bo wê yekê jî min dîsa neh meh wede başqe kir û min kitêba "*Dengê gazîkir*" nivîsî. Careke mayîn tu çapxanek hewaskariya xwe hindava kitêbêda neda kifşê, û me careke mayîn sala 1993-a bi xwe çap kir. Vê carê jî li ser sivira firotanê du kitêb hebûn, yên ku kitêbxanada tunebûn.

DERÊ MECALÊYÎ VEKIRÎ

Piştî salekê, hevalekî min minra têlêfon kir û teglîf kir ku em tevayî xwerinê bixun:

-Ez dixwezim ku tu nasîya xwe bidî hevalê min, -ewî got.

Min dewatkirina wî qebûl kir. Ez pê hesiyam, wekî hevalê wî serokê wê çapxanêyî nû bû, ya ku çend sal pêşda ez înkâr kiribûm. Hevdîtina me baş derbaz bû, û ewî hewaskariya xwe hindava şuxulkarîya min û Lîzayê da kifşê.

-Hûn niha kîjan bangê dannasîn dikin?, - ewî pirsî.

Min destpêkir derheqa wê têmayêda xebêrdim, ya ku ya here qewat bû, ya ku dilê mînda dişuxulî. Ew bang derheqa altkirina bêhurmetkirina û baxşandina wan merivada bû, yên ku em êşandine. Ewî pirs dane min û min derheqa wê bangêda diha zêde gilî kir. Piştî 15 deqa ewî gote min:

-Con, tu zanî, em nikarin vê banga te çapkin, çimkî ez salê tenê ji 22-a hetanî 24 kitêbên xudanên nivîsaraye eyan û usa jî qulixçiya çap dikim.

Min bi ecêbmayî li wî nihêrî û gote wî:

-Min nedicêriband we bînime ser wê qirarê, ku hûn banga min çapkin: we bi xwe ji min pirsî ku ez derheqa çida niha dannasîn dikim.

Ewî fem kir û kenîya:

-Rast e: em xebêrdana xwe berdewamkin.

Min dîsa gilî kir û piştî 15 deqa ewî careke mayîn navbirî da xebêrdana min:

-Hûn dikarin destnivîsara wê kitêbê nava sê mehada minra bişînin?

Ez ecêbmayî bûm û min bersiva wî da:

-Bi fikira min, we got ku hûn nikarin kitêba min çap bikin.

-Min fikira xwe guhart, - ewî got. -Ev bang gerekê li temamiya dinîyayê belav bibe.

Wê çapxanê kitêba *"Tela şeytan"* hezîrana sala 1994-a çap kir. Ez bêhesab şa bibûm. Xwedê derîk vekir, yê ku min bi xwe nikaribû vekira. Ez bi cûrekî baş difikirîm, wekî ewê carekêra bibe kitêbeke eyan û wê baş bê firotanê. Feqet, nava hevt mehên ewlinda ew yek neqewimî. Bi meha ser hev min ji çapxanê înfomasîyayên derheqa firotanêda dibhîstin û ew ne yên baş bûn. Dilê xweda min bawar dikir, wekî ev bang bona elaleta têra hatibû dîtîne û hetanî bona mileta jî. Min gumana xwe unda nedikir, lê hemû tişt didane kifşê, wekî derbeke acizbûnêye mayîn jî hîvîya min bû.

Piştî çend meha, endamekî koma wê çapxanêye markêtingê minra têtêfon kir û got:

-Con, şouyeke navnetewî dixweze 16-ê çileyê sala 1995-a we bi mêvandarî tevî bernama xwe bike. Ewê 20 deqeyî bidine we, feqet, ew hîmlî dixwezî derheqa qulixa we, Lîzayê, çar kurên weda xebirdin. Lê belê, ewê îzinê bidin, ku hûn derheqa kitêba xweda bîr bînin. Eva destpêke, bi vî cûreyî gotî, mînanî wê yekêye ku çawa derî hinekî vedikî. Hûn dixwezî ku em wê dewatkirinê bona we qebûlkin?

-Bêguman, belê!

Ez çûm û tevî wê bernamê bûm, ya ku mêr û jineke eyan derbaz dikirin. Piştî silavkirina min, mêrê wê jinê carekêra kitêba *"Tela şeytan"* hilda û ji min pirsî:

-Tela şeytan kîjane? Ev bang derheqa çidane?

Ez zendegirtî mam, wekî ewî hema destpêkêda derheqa kitêbêda xebirda, lê ne ku derheqa malbeta minda, lê min carekêra destpêkir banga kitêbê raber bikim. Tê bêjî li wê stûdîyayê hemû tişt sekinî. Minra gotibûn ku ez bi guhdarî dîna xwe bidime teşkîldara şikilkişandinê, jinekê, ya ku nivîsar destê xweda nîşanî min dida ku bide kifşê, ku wedê hevpeyvînê çiqas maye. Wana pêşda minra got, wekî bi tomerî hildayî 20 deqeyî didine min. Teşkîldarê destê xweda nivîsar nîşan neda. Pêşkêşvanên bernamê bi guhdarîke mezin guhdarîya xeberdana min dikirin: wana navbirî neda xeberdana min û bi tomerî hildayî tu tişt negotine min. Pêşkêşvan û ez tevî wan man, me texmîn nekir ku wede çawa diçe û paşê em pê hesîyan, wekî min 40 deqe, bêyî navbirî, xeberdabû.

Pêşkêşvanê bernamê, ji wê bangê bi kûrayî ketibû bin hukum. Ewî li Ştatên Amêrîkayêye Yekbûyî hemcivîneke mezinda berevbûn didane derbazkirinê. Tiştê ewlin ku ewî kir ew bû, ku ewî ez dewat kirim, bo ku min bi wê têtayê hemcivîna wanda dannasîn bikira. Piştî du roja, ji çapxanê têtêfon kirin û gotine min, wekî kitêbên *"Tela şeytan"* li hemû dikanên kitêbaya li Ştatên Amêrîkayêye Yekbûyî xilaz bûne û ew hazir dibin dîsa 20.000 hebî çapkin.

- Con, me tu cara tiştê usa nedîtîye, - ewî got, - û pêşkêşvanên wê bernamê gotine me, wekî me tu cara bersiva wî cûreyî nestendîye.

Dilê xweda min zanibû, wekî ew progirama Xwedê bû. Wê bûyarê îzbat kir, wekî banga wê kitêbê ji Xwedê bû.

Kitêba *"Tela şeytan"*, paşê bû kitêba navnetewîye bi nav û deng, ya ku nava 25 salên dawîda ketibû nava navnîşên kitêbên eyan. Wextê ku min ev kitêb dinivîsî, belavbûna *"Tela şeytan"* îdî gihîştibû du mîlîyon meseleyî, yê çapkirî, êlêktronî û bi cûrê aûdîyo. Tiştêkî hewaskare, ku em bîr bînin, ku ew hemû tişt çawa qewimî. Ew çapxana ku pêşda ez çawa xudanê nivîsara înkâr kiribûm, niha *"Tela şeytan"* hesab dike çawa kitêba hemû demaye here başe ku gelek hatîye frotanê. Bêyî şikberî, li cem Xwedê jî texmînkirina henek heye.


Heger min gura Wî nekira û nenivîsîya, ev bang wê gelek meriv qewat nekirana. Nivîsarê ev bang çendbare kir, çimkî kitêba *"Tela şeytan"* dighîje piranîya meriva, bona kîjana minê tu cara nikaribûya bi xwe dannasîn bikira.

Bi rastî, ev çendbarebûn wextê nivîsara vê kitêbê destpê nebû. Ew wî çaxî destpê bû, wextê ku em dişuxulîn û me gelek derb alt dikirin. Ez bi kel û ced dixebitîm, ku min serwêrê xweyî ewlin ji hemû cûre hukuma bida azakirinê, bona ku hukumê civîna me çendbarebûya, qulixa serwêrê ciwanada. Ew yek bi rêya *"Mêsîncêr întêrnêyşinil"*-ê berdewam bû, wextê ku em her roj dixebitîm, ji şebeqê hetanî êvarê, û me gura temîya Xwedê kir ku kitêba binivîsin û bidine çapkirinê.

Ez difikirîm, wekî şuxulkarîya çendbarebûna banga *"Tela şeytan"* îzbat bibû, wekî ewê bi rîya firotana kitêba bihata belavkirinê, usa jî ji alîyê minda bi dannasînkirina li civîna û hemcivîna. Ez şaş dibûm: Xwedê hazir dibû tiştên diha zêde bispêre min.

BIFIKIRIN

1. Fikirdarîya weye çendbarkirinê heye, yan fikirdarîya we diha gelekî ya xweyîkirinê ye? Hûn jîyana anegorî xwestina xwe qebûl dikin, ya bêyî pêşkeftinê, yan her dem dijî xwe derdikevin?
2. Çendbarebûn wê neqewime, heger hûn xweranedîtî û bêkarin. Em gerekê ne tenê bi kel û ced bixebitin, lê gerekê karê xwe bi şabûn bikin. Hûn xwe çawa xebatkarekî ku bi kel û ced dixebite hesab dikin? Hûn bi xebata xweva şa dibin, yan hûn sekinîne, wextê ku hûn gihîştine dereceke açixîyêye usa, ya ku we hesab kirîye ku bese, yan jî we nava destanînên xweda çawa ya here bilind hesab kirîye?
3. Wextê ku min destpê kir binivîsim, min acizî, înkarbûn û gumanbirî texmîn kir. Feqet, guhartin wî çaxî hat, wextê ku ez gura wê yekêda mam, çi ku Xwedê gotibû min. Hûn bi wê keremê çawa dighîjin, ya ku nava jîyana wedane? Gelo serhatîya min piştgirîyê dide we ku hûn pêşda herin, bi altkirina acizîyê û gumanbirîyê?



*“Ew bi duayê Wî bi mezinayî
çendbare dibin”*

– Zebûr 107:38, ESV

Çendbarebûna mezin

Gelek cara Xwedê wê acizîyê û nerazîbûnê çawa hişyarkir yan jî çendbarebûna pêşin, yan jî çendbarebûna bona êtapa bi sirê, bide xebatê. Em mînaka derheqa wê yekêda nava jîyana Abramda dibînin. Xwedê li wî eyan bû, dema ku ew 75 salî bû û bi dîtînokê wîra xeberda:

“Netirse, Abram, çimkî Ezê te biparêzim, û *xelata teyê gelekî mezinbe*” /Destpêbûn 15:1, NLT/.

Em vê xeberê lêkolîn bikin. Xwedê Yê herî bi hêz ev dinîya çê kirîye û ew bi tamamî ya Wî ye, bi rêşûrsên xweye mezinva. Ew her dem hebûye, û heyîna Wî wê tu cara ser hevda neyê. Tu tiştêk nikare bi cûrekî biçûkva jî himberî mezinaya Wî be. Usa nîne, wekî jîyana Wî heye: Ew bi Xwe jîyane. Temamîya zanebûna mayî, serwaxtî, xizne û tiştên baş nava Wî danin. Ji Wî der tu tiştêkî qîmetlû tune.

Û Ew eyan dike ku wê bi Xwe Abram *biparêze*, û wê *xelata mezin* bide wî. Werin em him derheqa *parastîne* da, him jî derheqa *xelata mezin* da xebêrin.

Em ji *parastîne* destpêkin. Bînin ber çevê xwe, wekî serokê Ştatên Amêrîkayêye Yekbûyî hemû qewatên welête sîlhkirî bona *parastîna* we başqe bikira. Hemû gênêral dibêjine ofîsêrên xwe ku hûn şexsekî mezinin, û lazime hemû tiştî bikin, bona ku bêqezîyabûna we bê çareserkerinê. Heger lazimbe, ewê dora we hemû leşkera cîhwarkin, bi pircûretîya tamamîya sîlihên pêşkeftî. Eva tiştêkî nebînayîye, lê heger tiştêkî usa bibûya, ez hêvîdarim, wekî weyê xwe gelekî çareserkerî û bêqezîya texmîn bikira. Feqet, ev yek himberî wê yekê nuxsan dibe, wekî Xwedê, Yê herî qewat, dibêje: “Ezê te *biparêzim*”.

Lê *xelata mezin*? Heger cînarê we bigota: “Ezê *xelata mezin* bidime te”, xebêrên wî wê gelekî qenc û rehm bûna, feqet diqewime gelek tiştên wî

tunebûna ku bida we. Heger ew xeber merivê Ştatên Yekbûnî herî dewletî usa bigota, hûnê diha ruhdarbûna. Feqet ev herdu mînak jî wê yekê şirove nakin, çî ku li vir nivîsare. Ewê ku hemû tiştên li ser vê topa dinîyayê û li ezmana yê Wî ne, xelatê pêşnîyarî we dike. Bi zelal gotî, bêşnorîya vî sozî meriv çetin bikaribe bîne ber çevê xwe. Feqet me hê bi temamî ev xeber raber nekirîye.

Rastîya nebînayîye mayîn ewe, wekî Efrandar mizgîndar neşand: Ew bi Xwe hat. Xwedêyê herî qewat ev sozên nebînayî rû bi rû da. Hûn wê mezinayê tînin ber çevê xwe? Meyê çawa bersiva wê yekê bida? Gelo ew xeber dikaribûn şabûn, ew ruhdarbûn, bextewarî û xof bidana kifşê, ya ku ji me her yek bikaribûya texmîn bikira. Feqet bersiva Abram nêzîkî van texmînkirina nîbû. Ew awqasî jî ruhdarbûyî nîbû: ew bi rastî acizbûyî bû.

“Lê Abram got: “Ya Xweyî Xudan! Tê çî bidî min? Ezî va bêzuret mame” /Destpêbûn 15:2, NLT/. We nerazîbûn nava bersiva wîda texmîn kir? Tiştê ecêbmayînêye! Lê diqewime wekî kêmasîya şabûna Abram bi rastî tiştêkî baş bû? Wê çî bûya, heger Abram bigota: “Tiştên ecêbmayînêye! Gereke vê yekê bi heyteholî bidine kifşê!”: gelo ev serhatî wê cûrekî mayîn xilazbûya? Meriv dikare pirseke diha zelal bide: Gelo Xwedê wê li Abram eyan bûya, heger bersiva wî usa bûya. Ez usa nafikirim, û îzinê bidin ez bersiva xwe bidim.

Qasekî em serhatîya Abram berdin, bona ku ez bidime zelalkirinê ku fikira min çîye. Piştî gelek sala, wextê ku îsrayêlî li qûmistanê digerîyan, nerazîbûna wan ji wî halê şexsîtiyê bû, ku li wana xweş nedihat, û mixabin wê yekê ew ji navê wan miqûf hişt. Lê belê, Pawlosê şandî nêzîkbûna xweye Xwedêhizîyê raber kir, nivîsî:

“Ez hîn bûme ku nava hemû halîda çawa razîbim, çî jî hebe. Ez zanim çawa bijîm, bi tu tiştîva û bi hemû tiştîva. Ez hîn bûme û her halîda ser vê surê vebûme û hîn bûme ku razîbim, heger têrbim, heger birçî, yan hebûnêdabim, yan jî tunebûnêda” /Fîlîpî 4:11, 12, NLT/.

Him Pawlosda, him jî Abramda Xwedê ew meriv dîtî, yê ku hazir bûn tengasîya bibînin û derheqa xweda nefikirin. Nerazîbûna wan ji cedandinên wane şexsî nedikişîya, lê diha gelekî li ser merivên başqê hatibû merkezkirinê.

Vê pirînsîpê bîra xweda xweykin: heger menîya nerazîbûnê hewcetîya mine şexsîye, ew li Xwedê xweş nayê. Feqet, heger menîya nerazîbûnê hewcetîyên merivên başqeye û çêkirina padişatîya Xwedêye, ew li Xwedê xweş tê. Acizîya Abram vî cûreyî bû, û Xwedê çî kir? Xwedê dîtînoka wî berfireh kir. Ewî steyrkên ezmana û qûma ber behrê nîşanî wî da, soz da, wekî xelata wî

wê hukumî li ser gelek meriva bikira, û ewî nikaribû ew hesab bikira. Nêzîk-bûna Abram usa kir, ku Xwedê bêje: “Ezê peymanî Xwe nava Xwe û teda daynim, û *gelekî bêhesab te li hev zêdekim*” /Destpêbûn 17:2/.

Wê çî bûya, heger Abram bi wê yekêva razî bûya, wekî jîyana wî duakirî bû? Gelo 75 salîya xweda wê menîk hebûya ku ewî bawar bikira, wekî zaroka wî wê hebûya? *Nerazîbûna wî bû hişyarkira bona çendbarekirinê.*

Ez hîn bûme ku meriv gerekê nerazîbûnê hesab hilde: ew bona kardarîya diha mezin dibe cîhê defdanê. Civîna Lavodîkê ji vê yekê miqûf bû. Îsa bi cûrê berk bona nêzîkbûna wan pêşda hat, ya ku ev bû: “Ez... qet hewcê tu tiştî nîme” /Eyantî 3:17/. Ew aciz nedibûn, wextê ku meriv Mizgînê qebûl nedikirin, çimkî ew xwehiz bûn û jîyana anegorî xwestina xwe nava zêdayêda derbaz dikirin. Çawa encam, wana berbi çendbarekirinê nedicedand.

Stên hema rastî vê yekê hatibû. Ez jî carina tevî vê yekê şerkarîyê dikim û ez mecbûr dibim ku wê yekê ji xwe dûrxim. Bi rastî, tê bêjî em hemû jî, yan jî gelek meriv, dijî wê yekê şerkarîyê dikin.

Bi çîqaşî zêde ez qulixî Xwedê dikim, awqaşî zêde ez fem dikim, wekî reze-kî bawarmendê rast ew cedandine, ku padişatîya Xwedê bîne nava jîyana merivên başqe. Wextê xilazbûna xwe, em tîn guhartinê, dibine şexsekî lap başqe. Em careke mayîn dibin û dîcedînin bona merivên başqe qulixkin. Îsa dibêje:

“Bila piştî we *bona qulixê girêdayî* be û *çirên* we *vêxistî* bin” /Lûqa 12:35/.

Ev temîya ji Xudanê me wê tabîyê dide kifşê, kîjanê bawarmend gerekê xweykin: *cedandina bona qulixê* û qulixkirinê. Min xebera “*xweykirin*” da xebatê, çimkî ew îdî beşeke tebyeta meye nûye. Gelek cara ew nayê hesabihildanê, çimkî em ditirsin bikevine nava “xilazbûna bi kar”, nenihêrî wê yekê, wekî ew pêşkêşa belaş tê dayînê. Lê belê, qulixkirin xilazbûna bi karva girêdayî nîne: ew xwestina anegorî ruhê meye. Gelo em bona çî vê goveka jîyana xweye nû hesab hilnadin û hukumî ser dikin. Diqewime wekî cedandina wedê nihaye bona werguhastina mesîhîtiyê bawarîya me diha pêş dixê û bi wê yekêva em piştgirîyê didine xweranedîtîyê, ya ku anegorî xeysetê tebyeta merivê ketîye?

Bona çî Îsa got: “Bila piştî we bona qulixê girêdayîbe”. Bona çî Ew kinca himberî qulixê dike. Kitêba Eyantîyê alî me dike, ku em bersiva vê pirsê bidin.

““Werin em Wîra gul bidin û şabin û şikirîyê bidine Wî. Çimkî wedê bona dewata Berx hatîye û dergîstîya Wî *karê xwe kirîye*. Bona li

xwekirinê kitanê birqokî paqij jêra hatîye dayînê”. Çimkî ew kitan nîşana *kirinên* cimeta Xwedêye *qencin*” /Eyantî 19:7, 8, NLT/.

Ya ewlin, em dibînin, wekî ne ku Xwedê dergîstî hazir kirîye, lê dergîstîyê xwe hazir kirîye. Ya duem ewe, ku ewê çawa xwe hazir kirîye. Her bûkek nava wedê dirêjda kincê bûktîyê dibijêre. Ew yek nava navnîşa karên wêda xaleke here girînge bona ewê roja eyan. Nava kûltûra meye Rojavayêda bûk gelek wede dide xebatê bona ku kincê bûktîyê bigere û dest bîne. Nava padişatîya Xwedêda em, çawa dergîstîya Mesîh, wedekî dirêj didine wê yekê ku xwe hazir bikin. Kincê me ji kitanê nazike, yê ku anegorî wê beşa Încêlêye kifşkirî qulixa meye bona çêkirina padişatîya Xwedê. Usa dertê wekî qulixkirin dikeve nava xwîna meye ruhanî. Îsa dibêje: “Çawa ku Bavê Ez şandim, usa jî Ez we dişînim” /Yûhenna 20:21/. Ew bona qulixkirinê hat /Marqos 10:45/, û mîsîya me eynî ewe. Ew jî bersiva wê pirsê dide, ku bona çi qulixkirin girînge: “Xwarina Min ewe ku Ez xwestina Yê ku Ez şandime bikim û şuxulên Wî bînim sêrî” /Yûhenna 4:34/.

Bedena me wê bêyî xwerin teyax neke. Hema wî cûreyî jî, bawarmendê ku qulixî çêkirina padişatîya Xwedê dike, wê wedekî dirêj bêyî xwerin nemîne, û wê bi kutasî paşda vekîşe. Û Îsa derheqa wê yekêda dîsa Lûqa 12-da dibêje. Eve menî, wekî hêzên, qewatên vê dinîya ketî wê hemû tiştî bikin, ku em anegorî xwestina xwe jîyanê derbazkin, dewsa wê yekê ku em wê nerazîbûnê qebûlkin, ya ku rêberîya meye berbi çendbarekirinê dike.

Xwendevanên hizkirî, wê nerazîbûnê hesab hildin, ya ku nava weda rûyê dereca hukûmê nihada bilind dibe. Gelek cara Xwedê wî cûreyî bawarîya we dide gurkirinê, bona ku hûn bawarîya xwe li çendbarekirina xwedêtiyê bînin.

NERAZÎBÛNA MIN

Piştî wê yekê, wextê ku kitêba “Tela şeytan” destpê kir ne tenê li Ştatên Amêrîkayêye Yekbûyî belav bibe, lê usa jî li welatên mayîn, hûn dikarin bifikirin, wekî ez razî bûm. Feqet ew yek neqewimî. Min destpê kir li ser dereceke başqe dijî nerazîbûnê şerkarîyê bikim.

Wî çaxî min li civînên diha mezin dannasîn dikir, lê nerazîbûna min ji wê yekê dihat, wekî min nikaribû temamiya banga xwe wextê qulixekê derbazî cem meriva bikira. Ez nêzîkî 400 sehetî bona nivîsara kitêbekî başqe dikim û nava wî wedeyîda Ruhê Pîroz gelek tiştî li min dide eyankirinê. Ev rastî li wan meriva eyan dibin, kîjana Xwedê hiz dike, bona qewatkirina wana, dayîna azayê û bona ku wana nêzîkî Xwe bike.

Li hemû civîna û hemcivîna wedê axaftinê ji 35-a hetanî 45 deqeye. Dêmek, bi dannasînkirina derheqa kitêba “Tela şeytan”-da, min dikaribû bi

cûrê herî baş matêrîyalê serîk û nivê kitêbê raber bikira. Usa dertê, wekî 90 selefê wê bangê wê negihîšta meriva, heger wana kitêb nekirîya û nexwendada. Lê ew yek jî tenê nêzîkî yek pêncanîya wan meriva wê bikira.

Ji wê nerazîbûnê, piştî çapkirina wê kitêbê îdî çar-pênc sal derbaz bibûn, wextê ku fikirek li cem min pêşda hat: bona çî meriv nikaribe li ser hîmê wê kitêbê dersa sazke? Min dikaribû matêrîyalên hînbûnêye bi cûrê vîdêyoyê, yên 20-30-î deqeyî, hazir bikirana û derheqa rastîyên her serîkî kitêbê raber bikira û ew meriv him yên komên biçûk, him jî şexsên başqe, dikaribûn bi temamî derheqa wê bangêda ne tenê bi xwendinê, lê usa jî bi temaşekirinê û guhdarkirinê pê bihesîyana. Bi wê yekê ew bang wê diha zêde nêzîk û kardar bûya. Me dikaribû pirsên gotûbêj kirinê bona şexsa û komên biçûk hazir bikirana û wî cûreyî mecalê hebûya ku Ruhê Pîroz bi kûrayî nêzîkî meriva bûya û bona her yekî ew bang bikira diha ya praktîk.

Min ew yek tevî koma me gotûbêj kir. Endamekî koma me pêşniyar kir, ku em hevaltîke perwerdê bigerin, ya ku wan kitêba dersa yan jî kitêba xebatê hazir bikira, usa jî bona dersbêjên komên biçûk kitêb hazir bikira, yên ku wê ew 12 matêrîyal tijî bikirana. Ew ders dikaribû nava qewilên cuda-cudada bidana xebatê.

Me hevaltîke baş, ya ku matêrîyalên wî cûreyî hazir dikir, dît û ya ku bona 2. 500 cîya xebatên wî cûreyî dikir, nava kîjanada bûn usa jî çend hev-altîyên Ştatên Yekbûyîye mezin. Hema destpêkêda me ev yek hîvî kir: “Nava xebatêda bêyî kêmasî, nava wêda bêyî berdaxustin, usa jî nêzîkbûna berke nû. Armanca me ewe ku em bi sala ji normên niha û bi stîla niha, usa jî bi mêtodên niha pêşda herin”. Çawa dîyarkirineke ji der, mecaleke min hebûye ku ez bona admînistrasîya serokekî Ştatên Amêrîkayêye Yekbûyî lêkolîna Încîlê derbazkim. Wextê ku ez ji milê Rojavayê ketime Qesira Sipî, min her cîya tiştên here baş didîtin. Wê rojê ez fikirîm: “*Ev hemû serokê Ştatên Yekbûyî raber dike: em nava “Mêsîncêr Întêrnêyşînilê”-da Padişê Ezmîn raber dikin*”. Neniherî wê yekê, wekî qulixdarîya me hema destpêkêda guhdarî dabû ser başiyê, piştî wê cêribandinê me jî usa kir, ku nava tu pirsekêda berbi berdaxustinê neçin û nava karê xweda kêmasîya têbernedin.

Dema ku temamîya matêrîyalên dersa hazir bûn, borcdarîyên du endamên koma me ji nûva hatine parevekirinê: ew destpê kirin bi miaşa tam, bi telefonê, hemûyava bêne girêdanê /salên 2.000-î têlêfon mecala îzbatkirina pêwandîyên tevî rêbera mecala here baş bû/. Me teslîmî wana kiribû, ku ew tevî her civînekê pêwandîya îzbatkin, li kîderê nava dehsalîya dawîda em bi mêvandarî hatibûne qebûl kirinê û me derheqa dersderbazkirina xweda elamî rêbera kiribû. Xwestina dilê me ew bû, ku em li rex serwêra bisekinîyana û me alî wan bikira, ku endamên civîna wan hîn bikirana, nava encamê

wê yekêda civîna cî bida qewatkirinê. Wî çaxî dersên wî cûreyî awqasî jî zef nîbûn: ew fikir hê belavbûyî nîbû.

Em gelekî şabûn, dema ku rêberên civîna begemî dane fikira me: bersiva wana em gelekî şa kirin. Piştî wedekî kurt, civîna destpê kir mera binivîsin, wekî li cem wan hatina meriva zêde bûye, him nava komên biçûkda, him jî wextê berevbûnên sereke. Pêşda em difikirîn, wekî ew ders tenê civînên ji sedî hindikir endama wê bidana xebatê, lê belê usa jî çend civînên başqe, hejmara endamên kîjana dighîşte çend hezara, wextê qulixdarîyên xweye roja yekşemê vîdêyoyên me didane xebatê. Û ew jî zêde dibûn. Rêbera mera dinivîsî, wekî endamên civînê hîvî dikirin, ku dursa mayîn bidine kifşê, çimkî dawîya hevtê cejin dibû û ewê ne li malê bûna, û ne jî wextê qulixê hazir bûna. Mera civînên usa dinivîsîn, yên ku dubare û sêbare bibûn.

Serwêra derheqa wê yekêda hevalên xweye serwêrra gilî dikirin, ku li civînên wan û usa jî li komên biçûk, çi diqewimî. Îdî serwêr jî mera têtêfon dikirin, dixwestin dersên me dest bianîyana. Nava çend salada bi hezara civîn, ji 20.000 zêdetir civînên li Ştatêd Amêrikayêye Yekbûyî û usa jî ji hezarî zêdetir civînên li Avstralîyayê, gihîştine me. Beşa meye pêwandîyên civînê mezin bû, û ew gihîşte hevt endamên koma me. Offisa me her dem sedetî derheqa jîyanên guhartî, malbeta û civîna distendin.

Nava çend salên peyîra me bona her kitêbekê ders hazir kirin, yên ku qulixdarîya me hazir kiribûn. Nava 12 salada îdî ji deha zêdetir dersên cûre-cûre li cem me hebûn, yên ku li civînên li Ştatên Yekbûyî û Avstralîyayê dixebitandin.

Alîkî vê çendbarebûnê hebû, yê ku me nikaribû têra bidîta, lê derheqa wêda em paşê pê hesîyan. Gelek şexs, yên ku tu cara tu kitêbeke min nekiribûn û dannasînkirinên min guhdar nekiribûn, niha ew bang distendin. Ew li wan civîna bûn, yan jî komên biçûkda bûn, rêberyên kîjana kiribûn, ku wana bi matêrîyalên me hînkîn.

“TU AMIN BÛYÎ”

Bêguman, em bi razîbûnêva tijîbûyî bûn. Hejmara kitêbên firotî dighîşte mîlîyona, lê ders dihiştine seda hezara. Feqet, min hê dijî nerazîbûnê şerkarî dikir. Min zanibû, wekî ew bang bona bedena Mesîh bûn. Nenihêrî wê yekê, wekî wana îdî rezê mezin dianîn, lê hê gelek bawarmend hebûn, bona kîjana rastîyên nava wanda pêwîst bûn.

Min hîvî ji Xwedê dikir, ku mecala bide min, bona ku min diha zêde kitêb pêşkêş bikirana. Min zanibû, wekî li temamîya dinîyayê hebûn serwêr, rêber û bawarmend, perên kîjana tunebûn û mecala kîjana tunebû ku ew

kitêb bikrîyana. Bi mîlîyona civînên xewile hebûn, li welatên kîjana firotana kitêbên mesîhîtiyê qedexekirî bû. Li welatên başqe gelek bawarmend hebûn, mecalên kîjana tunebûn ku kitêb bibirana welatên xwe.

Meyê çawa bikaribûya alî wan bikira?

Min zanibû, wekî hewcetîya wê yekê çiqasî mezin bû, lê tê bêjî îzbatkirina pêwandîyên tevî wan serwêra û rêbera tiştên bûyînê nîbûn. Lê belê, me gerekê tişteke bikira. Me destpê kir bersiva wan hewcetîya bidin, rastî kîjana em dihatin. Me gote serokê beşa meye navnetewî ku heger ji welatên ku pêşda diçin, yan jî ji wan welata, li kîderê mesîhî tîz zêrandinê, hebin rêber /yên ku kitêba ji me bixwezin/, emê hemû tiştên lazim wanra bişînin, çawa dîyarî, yan jî emê li welatê wan çapkirina kitêba teşkîlkin û perên wan jî bidin.

Nerazîbûna min zêde dibû, çimkî me tenê xebateke hindik dikir, salê ji deha hetanî 20.000 kitêb pêşkêş dikirin. Ew hejmar, himberî wan matêrîyalên hînbûnê, mînanî niqteke nava derdanêda bû, hewcetîya kîjanê hebû, lê me hersal ew yek berdeyam dikir û me mecalên xwe didane xebatê.

Piştî wê yekê ew roja balkêşe sala 2010-a hat /31-ê gulanê/. Lîza li Anglîyayê bû: ew teglîfî li hemcivîneke jina kiribûn, ku ewê li wêderê qulix bikira. Min teze raûndeke golfê ser hevda anîbû. Min Încîla xwe hilda û ez peîyayî qatê meyî jêrin bûm, çimkî li cem min xwestina xwendina kitêba Danîyêl pêşda hat. Wextê ku min serê duem dixwend, nişkêva Ruhê Xwedê temamiya qatê me tijî kir, û min dilê xweda ev gotin bihîstin: “Kurê min, tu nava dinîya înglîzîaxfda *amin* bûyî. Ez niha dixwezim wekî tu bangên xwe bighîni her serwêr û rêberêkî li temamiya dinîyayê”.

Hazîriya Xwedê çend deqa ma. Ez zendegirtî mabûm, qasekî li wir nelivîyam, hetanî ku ew hate hildanê. Ewê rojê min fem kir, wekî guhartin qewimî bû. Meyê îdî mecalên xweye destanî raste-rast nedana xebatê: niha teslîmkirina xwedêtiyê hebû. Me gerekê raste-rast serwêr û rêber bigerîyana, yê ku nava hewcetîyêda bûn, nenihêrî miletîya wan, zimanê wan û karebûna wane finansî.

Wextê wê hevdiîna tevî Ruhê Pîroz, ew yek eşkere bû, wekî Ewî xebera “*amin*” da xebatê. Wî çaxî min xebera “*amin*” çendbarekirinêva girê nedida: ev rastî hê li min eyan nebibû. Heger ji min bipirsîyana, wekî şirovekirina xebera “*amin*” anegorî Încîlê kîjan bû, nava bersiva minda wê xebera “*çendbarekirin*” wê tu cara tunebûya. Ew çî ku Ruhê Pîroz li qatê mala meyî jêrin gote min bona vê rastîyê, dilê min vekir. Min zanibû, wekî min ji Xwedê bihîstibû, ez hê dudilî bûm ku çawa qulixdarîya me dikaribû xebateke usa mezin bikira.

Hevalekî meyî berê hebû, navê kîjanî Rob Bîrkbêk bû, yê ku nava qulixdarîke navnetewîye mizgîndarîyêye eyanda dixebitî. Rob serwêrê wê qulix-

darîyê bû û çapkirin, belavkirina wan kitêba dikete nava borcdarîyên wî. Bo wê yekê jî pêwandîyên Robe mezin tevî çapxanê û serwêra bawarkî her welatekî li dinîyayê hebûn. Wan dawîya Rob xebata xwe unda kiribû, çimkî ew meriv derbazî pênîyayê nebibû. Me, tevî Lîzayê, pêşniyarî Rob û jina wî Vanêsayê kir ku ew bighîjine koma me, çimkî serwêrê beşa qulixdarîya meye navnetewî ji xebatê dûr ketibû. Ji me tu kesî texmîn nedikir, wekî hukumê hevkarîya pêşerojê wê çi cûreyî bûya.

Meha çileya sala 2011-a bû. Rob û Vanêsa li oda meye şewirdarîya, wextê civîna serwêrên beşên qulixdarîya me, hazir bûn. Wextê wê civînê min pirsî:

-Sala derbazbûyî me çend kitêb pêşkêşî serwêr û rêberên welatên bîyanî kirine?

Endamekî koma me raporta dawîya salê nihêrî û got:

-35.000 kitêb.

Ew fikirî, wekî bersiva wî ya razîkirinêye, lê ew yek lap cûrekî mayîn bû. Min carekêra nerazîbûna xwe da der.

-Gelo çiqas hejmareke biçûk e!

Û nişkêva ji devê min ev xeber derketin:

-Îsal emê 250.000 kitêba pêşkêşî serwêr û rêberên li welatên ku pêşda diçin û li kîderê ew tî zêrandinê, bikin.

Li temamiya odê bêdengîke qewîn bû. Paşê Lîzayê minra got, wekî wî çaxî ewê texmîn kiribû ku xwerina mada wêda çawa bilind bû û ewê tema wê xwêrinê texmîn kiribû /li cem wê henekên li ser dereca bilind hene/.

Serokê beşa finansîyî sereke, yê ku kurê minî mezine, yê ewlin bû ku xeberda.

-Bavo, -Êdîson got, -tu gumanî, wekî tu dixwezî awqas kitêb pêşkêş bikî.

-Belê, emê wê yekê bikin, - min li ser xwe guman bersiv da.

Ewî nava 20 deqên piştra dîsa pirs dane min. Li ber wan merivên li wir me xeber dida. Ewî bi qedirgirtin xeber dida, lê her dem gotina xwe pêşda dikişand ku emirkirina min gelekî giran bû. Paşê ewî got:

-Ez awqasî naxwezim armanca ku nikare mîyaser bibe, daynim pêşîya koma me.

Piştî wê yekê îdî ez hazir nedibûm ku min ew gotin qebûl bikirana. Min bi kulma xwe sivirê xist û bi cûrê berk got:

- Min got, ku emê îsal 250.000 kitêba pareve bikin.

Li odê bêdengî bû. Zûtîrekê civîn ser hevda hat û em hemû ji wir çûn.

Rojtira mayîn şebqê, dema ku em tenê bûn, kurê min got:

-Min rûyê wê yekêda acizî texmîn kir ku te çawa minra xeberda.

Em îdî edil bibûn û me dixwest ku em li hev bihatana.

-Kurê min, tu zanî wekî ez emekê koma meyî nava karda hiz dikim, -min got.

-Her dem ez pêşniyarên her kesî lê dinihêrim, hetanî ku em birîyara dawî bidin. Feqet duh cûrekî mayîn bû. Min ji we nepirsî: "Hûn difikirin ku em gerekê 250.000 kitêba pêşkêşkin?", - yan "Bi fikira we sala tê emê çend kitêba pêşkêş bikin?". Min gote we, wekî emê usa bikin. Feqet tu 20 deqeyî ser hev tevî min ketî nava hevraqayîlnebûnê.

Ewî gotina min qebûl kir û minra qayîl bû, lê ji min tişteke hîvî kir, vê carê bi cûrê edil:

-Bavo, tu dikarî bona vê yekê 24 seheta dua bikî? Heger piştî wê yekê tu li ser wê fikirêbî, wekî em gerekê wê yekê bikin, koma me wê hemû cedandina bide xebatê, bo ku wê yekê mîyaser bike.

-Belê, ezê wê yekê bikim, - min gotê.

Bi bêqelpî gotî, min bona wê yekê gelek dua nekir. Min bi cûrê kurt dua kir bona ku sozê xwe xweykim, lê piştî hevdiîtina li mala meye li qatê jêrin, min îdî zanibû, wekî me gerekê ew yek bikira.

Diqewime hûn bipirsin: "We nerihetî texmîn dikir?". Hûn dikarin şikber nîbin. Ez gelekî ditrsiyam. Min îzin nedida xwe bifikirîyama ku gelo finans wê ji kîderê bihatana. Heger min îzina wê yekê bida, wî çaxî ezê kurê xwera qayîl bûma û minê hejmara kitêba bigîhanda hejmareke "nêzîkî aqila". Yek çaranîya mîlîonek kitêba armanceke ne nêzîkî aqila bû, lê min qîrar kiribû peyî wê emirkirinê biçûma, ya ku min stendibû. Min zanibû, wekî meyê yanê stratêciya efrandarîyê bistenda, yan jî piştgirîke bi ecêb bistenda. Min ji kîderê zanibû, wekî ew herdu jî wê hebûna?

Piştî sêhevtîya, ez li mêvanxaneke Florîdayê bûm, û min kitêbeke nû dinivîsî. Koma me zane, wekî şebeqa minra gerekê têlefona nekin, çimkî wî çaxî ez dinivîsim, bona min ew wedê yê herî başe, wextê ku ez dikarim fikirên xwe li ser hev berevkim. Têlefona min zengil xist û min dît, wekî ew zengil ji ofîsa meye. Min bersiva wê têlefona da, çimkî min zanibû, wekî ew gerekê tişteki lez, yan jî girîng bûya. Min texmîn kir, wekî li ofîsê atmosferê şabûnê bû. Hema ew meriv, yên ku sê hevtê pêşda wextê wê civîna derbazbûyî hazir bûn, hema li wê odê bûn û ji wêderê min zengilê têlefona stand û tê bêjî rûyê tişteki da ew şa dibûn û dikenîyan.

Êdîson got:

-Bavo, em bi fermî berbirî hevlikarên xweye finansî nebibûn, me negotibû wan, wekî em hazir dibin 250.000 kitêba belavkin. Endamekî koma me

nasekî xwera qise dikir, û wextê ku ew meriv derheqa progirama meda pê hesîya, soz da ku wê 300.000 dolar pêşkêşî wê projeyê bike.

Hetanî wî çaxî pêşkêşkirina here mezin ya ku qulixdarîya me stendibû 50.000 dolar bû. Ez jî tevî wan şabûm. Piştî şirovekirinên bi şabûnê, min gote hemûya:

-Niha hûn fem dikin, ku bona çî min wî cûreyî wextê hevdiîna sê hevtê pêşda gote we?

Kurê min kenîya û lez got:

-Bavo, heger tu bêjî me, wekî emê mîlîonek kitêb belav bikin, ezê carekêra, bêyî fikirmîşbûn, tevî tehim.

Yên mayîn jî bi dil qayîl bûn.

Ezê tu cara wê şebeqê bîr nekim. Min tîlefon ji destê xwe danî û min îdî nikaribû nivîsara xwe berdewam bikira. Li oda mêvanxanê, ez diçûm û dihatim, û min xwera digot: "Spas dikim! Spas dikim! Spas dikim!". Wî çaxî hêsir ji çavên min dikişîyan. Dilê xweda min tenê ew serwêr û rêber didîtin, li cem kîjana hewcetîya ruhanî hebû, yê ku bona xwe matêrîyalên hînbûnêye gelekî pêwîst distendin.

Ez gelekî razîme, wekî Êdîson usa zelal bû û destpê kir pirsra bide min. Ez şame wekî ewî fikirên xwe veneşartin, ew tişt dane dîyarkirinê, kîjan ji alîyê wan merivada dihatine parevekirinê. Bi texmîn, wana wî çaxî guhdarîya Êdîson dikir û xemgînîyên xwe didîtin, û wî çaxî pêwîst bû li ber wan bi fikira ber xwe bidana. Vê serhatîyê usa kir ku em rû bi rû rastî tirsên dijî xwe bîn, û heger me guhdarîya wan bikira, diqewime me şuxulkaîya xwe biguharta û em nava sînorên mecalên xweda bimana. Dîtinoka me wê bitemirîya, û meyê pêşkêşkirineke wî cûreyîye mezin nestenda. Diqewime me 50.000 kitêb pêşkêş bikirana, yan jî nava wî halê neeyanda bimana.

Me merem danî pêşîya xwe, Ruhê Pîroz ew yek guhdar kir û nêzikî dilê wî merivî bû, bona ku ewî ew pêşkêşkirin bikira. Koma me bilind bû, gihîşte dereceke bawarîyê nû.

Ewê salê me bi kerema Xwedê karibû 271.700 kitêb li 48 welata pêşkêşî serwêra û rêbera bikin. Nava wan welatada bûn Îran, Îraq, Sûrîya, Libnan, Ûzbêkîstan, Qazaxstan, Tirkmênstan, Xorvatîya. Albanîya, Misir, Vîyêtname, Mîyanman, Kamboca, Çînistan, Mongolîya, Tirkîya, bê hesab welatên Afrîkayêye nava hewcetîyêda û gelekên mayîn. Salên pêşîya wê yekê me bi deha hezara kitêb pêşkêş dikirin, lê niha em gihîştibûne hejmara ji yek çaranîya mîlîonekî zêdetir. Hukumê qulixdarîya me heyşt cara zêde bû. Şikir ji Xwedêra, ew yek çendbarekirina mezine.

NERAZÎBÛNA HÊ MEZIN

Gelo dikaribû diha zêde bûya?

Piştî pevçûyîna berke li oda qulixdarîya meye şêwirdarîyê, çar meh derbaz bibûn, gulana sala 2011-a bû, wextê ku ez û Rob li Bêyrûtê, li Libnanê, me bona serwêr û rêberên ji Rojhilata Navîn hatî qulix dikir. Wextê navbirîke berevbûnekê, Rob bi hîvîkirinekê nêzîkî min bû:

-Li vir serwêrekî ji Hewlêrê, Îraqê, heye, yê ku dixweze bi kurtayî tevî te qise bike. Tê bixwezî wî bibînî?

-Belê.

Rob hevdfîtina me li sera mêvanxanêye pêşin teşkîl kir. Ew serwêr ciwan bû, nêzîkî 35 salî, û çevên wî tê bêjî bi xebathizîyê dişuxulîn. Min dît, wekî ew bi rastî nava pîrsa çêkirina padişatîya Xwedê da mêrkîmî sekinî bû. Ew bona qulixkirina hazir bû û îşîqa wî gelekî bi qewat dişuxulî. Ew tenê bi menîkê ji Hewlêrê hatibû bona ku ji hînbûnê û berevbûna qewat bistenda. Min dikaribû carekêra bigota, wekî ew rêberêkî pêşverû û nû bû, yê ku girîngîya nêzîkbûna undabûya fem dikir.

Qîsa me çawa gotûbêjkirina sivik û xweş destpê bû, lê paşê ew werguhêzî axaftineke mezin bû. Ewî got:

-Serwêr Bîvêr, ez we çawa bavekî ruhanî hesab dikim. Ezê wî hemû tiştî bixwînim, çî ku hûn dinivîsin /ji kitêbên min hindik bi zimanê wî tercimekirî bûn, lê ewî înglîzî zanibû/. Ez heta karta xweye bankê jî didime xebatê, bona ku matêrîyalên weye li malpera "Mêsîncêr întêrnêyşîni" -ê barkim...

Wî çaxî dilê minda hemû tişt sekinî. Bi rastî, nayê bîra min ku me paşê derheqa çida xeberda. Fikira min kire qîrîn: *"Ez li serwêrekî ji Îraqê dinihêrim, ji welatekî ji şêr xirabbûyî û zîyanêketî û ew mecbûre karta xweye bankê bide xebatê, bona ku matêrîyala ji malpera me hilde?"*. Ez bêsebir hîvîyê bûm, wekî tevî Xudan tenê bimama û min ew hewcetîya wîye giran rast bikira.

Piştî xatirxwestinê, ez carekêra çûme oda xweye li mêvanxanê û min derî girt. Ez awqasî tevîhev bibûm, wekî min kire gazî:

-Xwedê, Tu gerekê nîşan bidî, ku em wan banga çî cûreyî bighînin wan meriva, yên ku Te spartine me, bona serwêr û rêberên li temamiya dinîyayê, hewcê kîjanane ew.


Ez qet xemgîn jî nedibûm ku kî li oda li rex min bû. Min gerekê stratêciya ji Ezmîn bistenda, bona ku min fem bikira ku çawa xebata Wî ya teslîmkirî bikira, ew matêrîyalên me bigîhanda wan rêbera.

Piştî wê duakirinê, hindik wext derbaz bibû, dema ku fikireke stratêc xuliqî, ya ku wê bi cûrê diha mezin hukumê qulixdarîya me çendbare bikira û wê ew werguhêzî qulixdarîke diha kardar bikira, bêyî xebata zêde, yan jî xercê zêde.

Ew fikireke gelekî baş bû... û ew yek dikaribû tenê serwaxtîya Xwedê bûya. Ew gelekî zelal bû, lê em derheqa wê yekêda nefikirîbûn. Xwendinê berdewam bikin!

BIFIKIRIN

1. Acizî û nerazîbûn gelek cara dikarin piştgirîyê bidin, çendbarekirina bawarîya me bidine gurkirinê. Gelo Xwedê we def dide ku nava gov-ekeke jîyana xweda hûn pêşda herin? Heger usaye, hûn çawa bersiva Wî didin?
2. Heger menîya nerazîbûnê hewcetîya weye şexsîye, wî çaxî ew yek li Xwedê xweş nayê. Feqet, heger menîya nerazîbûnê hewcetîyên merivên başqe û çêkirina padişatîya Xwedêye, wî çaxî ew yek li Wî xweş tê. Menîya nerazîbûna we kîjane?
3. Derheqa serpehatîya minda, ya derheqa 250. 000 kitêbada, bifikirin. Bona çi pêwîste bawarî hebe, bona ku sozên Xwedê bistînin û bighîjine derecên çendbarekirinêye nû? Bona we girînge ku hûn gura Xwedêda bin, heger yên mayîn jî wera qayîl nînin?



«Heger hûn nizanin çi bikin,
wî çaxî duayî Bavê bikin.
Ew hiz dike alî bike”
– Aqûb 1:5, MSG

Fikirên stratêcî

Ez hersal diha zêde nava qîmetê fikira stratêcîye ruhdarbûyî da bi fikira xwe diha qewîn dibim. Gelek cara em hîvîyêne, wekî dayîna Xwedê yan jî tevbûna Wî, wê bêyî tu bernameke stratêcî mîyaser nebe, feqet, çawa qanûn, usa nabe. Xwedê fikirên stratêcîye ruhdarbûyî dide me, û ew mîyaser dibin. Derheqa wê yekêda mînakên Încîlê bêhesab gelek in, lê em çend heba bidine kifşê, yên ku piştgirîya vê fikirê dikin.

- Fikira stratêcî, ya derheqa avîtina dare nava avên tel, bona ku bi mîlîyona meriv bikaribûna av vexwerana /bixwînin Derketin 15:22-25/.
- Dîsa fikireke ruhdarbûyî: avê bidine bi mîlîyona meriva, bi lêxistina li zinar /bixwînin Derketin 17:5, 6/.
- Fikira stratêcî: ya derheqa şeş roja zivireke dora bajêrda. Lê roja hevta fikireke stratêcîye mayîn, hevt cara zivira dora bajêr, bi lêxistina borîya û paşê bi dengdayîna mezin. Meremê wî hemû tiştî ew bû, ku bikevîne bajêr û bajêr zeft bikin /bixwînin Hêşû serê 6-a/.
- Fikira stratêcî ya bona qirarkirina leşkerên here baş, yên eskerên çend deh hezarî: bêjine leşkera ku avê ji kanîyê vexun û wan leşkera cuda bikin, yên ku berê xwe berbi deşta şêr xweyî dikin, himberî wan leşkera, yên ku serên xwe berjêr kiribûn /bixwînin Hakimtî 7:4-6/.
- Dîsa fikireke stratêcî: êrîşa enîyê mîyaser nekin, lê dora eskerê dijminra bizvirin, bikevîne mêşê piş dijmin û hîvîyê bisekinin ku dengê linga li jora darên tûta bê bihîstinê, ew jî nava şêrda nîşana alîkarîya Xudan bû /bixwînin B Padişatî 5:22-25/.
- Dîsa fikireke stratêcî: wextê xelaya zor, ji jinebîyê û kurê wê hîvî bikin ku xwerina xweye dawîyê bidine pêxember: bi gurêdamayînê, ewê ji xelayê nemirana, mînanî malbetên mayîn /bixwînin G Padişatî 17:8-16/.
- Fikira stratêcî, ji jinebîya nava deynada /ya ku wê du kurên xwe unda bikirana/, bipirsin ku mala wêda çi heye. Gava mayîn ew bû, ku emirî

ser wê bikira, ku dewsê derdanên vala hildana, ku wanada hinek rûnê zeytûnê dagirta û paşê ew rûn bifrota, bona ku deyn bidana /bixwînin D Padişatî 4:1-7/.

- Fikireke stratêciye mayîn: ofîsêrê leşkerî nexweş bişîne çemê Urdunê ku hevt cara niqoyî binê avêbe, nava encamê kîjanêda ew carekêra qenc bû /bixwînin D Padişatî 5:1-19/.
- Fikira stratêciye derheqa wê yekêda, ku koma hebandinê û pesindayînê berî leşker bişînin, encamê kîjanê serkeftina cuda bû /bixwînin B Dîrok 20:21-26/.
- Fkira stratêciye derheqa wê yekêda ku dewsa xwerina li ser sivira padişeye tijî tiştên mayîn bixun, bona ku diha saxlembin, diha başbin û ji ciwanên welête here baş berbiçevbin /bixwînin Danîyêl 1:8-16/.
- Fikira stratêci: derdanên avê bidine xebatê bona ku şeraba here baş bistînin, meremê kîjanê ew bû ku şahîyê berdewamkin /bixwînin Yûhenna 2:6-10/.
- Fikira stratêci: tiştêkî xwerinêyî biçûk hildin, duakin, kerkin û parevekin, nava encamê kîjanêda bi hezara meriv hatine têrkinin /bixwînin Metta 14:13-21/.
- Fikireke stratêciye mayîn, ya derheqa tûkirina li ser erdê, çêkirina herîyê û lîxistina wê herîyê li ser çevên wî merivî. Gava mayîn ew bû, ku emirî li ser wî merivî bike, ku ew meriv here, ser çevê xwe bişo, bona ku ronahîya çevên wî bê dasekinandinê /bixwînin Yûhenna 9:6, 7/.
- Fikireke stratêciy derheqa wê yekêda, ku heger meriv dixwezin xilazbin, gerekê ji gemîya ku niqoyî binê avê dibû, nehiştana, derneketana /Karên Şandîya 27:21-44/.

Nava van meselada her fikireke ruhdarbûyî tevbûneke xwedêtîyê têra dibîne. Hûn wê tomerîbûnê dibînin, ya ku nava van hemû mînakada heye. Anegorî van stratêciya meriva gerekê ew hemû tişt bidana xebatê, çî ku îdî hebû: ew gerekê tiştêkî xwe bidana xebatê, yan jî gerekê cûrekî mayîn bikirana. Nava her meselekêda dayîna xwedêtîyê mînanî tiştêkî sade pêçayî bû. Bi gilîkî mayîn gotî, tiştê ku ecêba sereke pêşda tîne, nedihate kifşê.

Binyata her stratêciyake ji alîyê Xwedêda dayî, gelek cara vî cûreyîye: bi xebitandina tiştên sade, bi cûrê nebînayî, bona stendina encamên nesade. Dêmek, stendina fikira ruhdarbûyî gelekî girînge. Nivîsare: “Stendina serwaxtîyê tiştê herî girînge ku tu dikarî bikî” /Gotinên Silêman 4:7, GNT/. Cûrekî serwaxtîya xwedêtîyê jî fikira stratêciye, û mizgînî ewe, wekî Xwedê serwaxtîya Xwe ji me venaşêre. Aqûbê şandî me hîn dike ku em çî bikin, dema ku em rastî dijwarîyên nebînayî tîn:

“Heger hewcetîya weye serwaxtîyê [fikira stratêcî] heye, hîvî ji Xwedêyê meyî merd bikin, û Ewê bide we. Ewê tu kesî bêqedir neke” /Aqûb 1:5, NLT, nava xetên çargoşeda zelalkirina mine/.

Ewê zelal serwaxtîya Xwe eyanke. Ewê ji we veneşêre, çimkî Ewî soz daye. Lê belê, du qewil hene, yên ku pêwîste bikin, bona ku fikira stratêcîye ruh-darbûyî bistînin.

“Li ser wê fikirêbin, ku hûn bi bawarîya bi guman qewatbûyî, hîvî dikin, bêyî şikberî, wekî hûnê bistînin. Çimkî yê dudilî hema wî çaxî bawar dike, lê paşê şikber dibe. Dudilîbûn we werguhêzî behra dike, yên ku tevlîhev dibin û ji bayê nasekinin. Qasekê hûn li jorin, lê paşê li jêrin. Dema ku hûn dudilîne û ne qewînin, hûn neqewînin dibin. Gelo hûn dikarin hîvîyêbin, wekî hûnê ji Xudan tiştêkî bistînin, dema ku hûn nava halê wî cûreyîdanin?” /Aqûb 1:6-8, TPT/.

Em gerekê bi bawarîya bi guman hîvî bikin: ne ku hêvîya me heye, wekî emê fikira stratêcî bistînin, lê em bi tamamî hêvîdarin. Bona hêvîya me gerekê cedandina me hebe: em gerekê bi gumanbirî wê yekê bixwezîn. Hêvîkirina me gerekê ji nêzîkbûna xirab pêşda bê, mînak: “Heger ez wê yekê bistînim, gelekî başe. Heger na, pirsgirêk tune”. Li vir texmînkirina gumanbirîyê û qewînbûnê bona stendina ji Xwedê heye.

Fikira stratêcî pêşkêşa ji Xwedêye û çaxê ew tê dayînê, derî berbi dereceke kardariyê başqe vedibe. Ew qewata çendbarekirinê dide me.

FIKIRA STRATÊCÎ YA RUHDARBÛYÎ

Ez vegerime oda xwe, ya mêvanxana li Bêyrûtê: ez neçûme li wir ku dua bikim: min nikaribû wî cûreyî dua bikira. Fikira min ketibû nava hesarê: tu fikireke min tunebû, lê min zanibû, wekî li min hatibû spartinê, ku min matêriyalên hînbûnê bidana wan serwêra, li cem kîjana hewcetîya birçîbûna ruhanî hebû. Li odên mêvanxana ez nakime qîrîn, lê bi rastî gotî, wê rojê xema min nîbû, ku kê gerekê min guhdar bikira. Ew banga gumanbirîyê bû, bona stendina stratêgîyê, bona ku kardariya me çendbare bûya.

Piştî duakirina bi kel û ced, edilyê dilê min tijî kir. Min zanibû, wekî hîvîkirina min hatibû guhdarkirinê û bi texmînkirina sivikayê, min bawar kir, wekî bersivê bê. Ji dilê min razîbûn derket, nenihêrî wê yekê, wekî min ew fikira stratêcî, yan jî bername, nestendibû.

Piştî çend roja li cem min fikirek pêşda hat: “Em gelek wede, pera û qewata xerc dikin, van kitêba çap dikin, lê her rêberek tenê matêriyalekî distîne. Gelo em bona çî usa nakin, çî ku me çend sal pêşda bi zimanê înglîzî

destpê kir bikin? Gelo bona çî bo wan rêbera bi zimanên başqe jî dersên tam negihînine cî? Emê kardarîya xweye tomerî zêdekin! “.

Feqet, diwareke mezin hebû: meyê çawa awqas matêriyal çap bikirana û belav bikirana? Heger me perên wan bida, bona çapkirina wan hemû matêriyala, wekîlên piranîya wan welata wê nikaribûna awqas matêriyal û awqas giranî cîguhastî bikirana, çimkî piranîya belavkirinên me nava cûngilîyên sixra, nava çîyara, qûmistanara, yan rêyên avêra derbaz dibûn. Li wan cîya gelek rêyên baş tunene. Xêncî wê yekê, li wan welata, li kîderê serokatî bi dijminatî nêzîkî mesîhîtiyê dibe, wê bi hêsanî ew meriv bidîtana û ew hemû matêriyal ji wana bistendana.

Piştî duakirin û fikirdarîyên bêyî navbirî, fikireke başqe pêşda hat, ku em tamamîya dersa derbazî ser DVD-ê bikin /yên bona kompyûtêra/. Feqet dîsa pirs pêşda hatin: gelo serwêr û rêberên ku li welatên cuda diman, kompyûtêr didane xebatê? Heger erê, gelo kompyûtêrên wan dikaribûn DVD bixwendana? Pirseke mayîn jî, lê ya cûrekî mayîn: gelo DVD dikaribû hemû matêriyal hildane ser xwe, bona ku hemû ders li ser cîhbûna?

Min dixwest derheqa vî hemû tiştîda bizanibûya û pêşda min ji Rob pirsî. Derheqa mecalên têknîkiye li wan welata ewî baş zanibû, çimkî ew çûbû ji 160-î zêdetir welata. Min jê pirsî:

-Gelo serwêr û rêberên li hemû welatên dinîyayê kompyûtêra didine xebatê, heger ew feqîrin?

-Belê, piranîya wan dide xebatê: hindik meriv hene ku mecala wane wî cûreyî tune.

-Mecala kompyûtêrên wan heye ku sêlikên DVD bixwînin? Heger ew mecal heye, wî çaxî çiqas matêriyala meriv dikare li ser sêlikeke DVD-ê cîhwar bike?

Rengê sifetê Rob vebû:

-Belê, hene, û ez difikirim wekî li ser sêlikeke DVD-ê dikarin gelek matêriyala cîhwar bikin.

Min fikireke başqe jî pêşniyar kir:

-Hûn dikarin sêlika DVD-ê, ya bi qaba zirav, rûyê kitêbêyî paşin bixin?

-Belê, -ewî bi şabûn bersiv da.

-Gelo pêvakirina sêlikekê li ser rûyê her kitêbekî wê çî bihayîbe?

Rob derheqa wê yekêda pê hesîya û piştî çend roja gote min:

-Behseke mine baş heye. Bi hesabkirina bahê çapkirina kitêbê û bahê belavkirinêyî navîn, pêvakirina sêlika DVD-ê wê bahê kitêbê tenê bi pênc selefîva zêdeke.

Ez şabûm, lê min hinekî xwe zeft kir, çimkî min nizanibû, ku çiqas

matêrîyal wê li ser sêlikekê cîhwar bûya.

-Bi rastî ew tişteki başe, - Rob got, - wekî em dikarin ne tenê derseke tam cîhwar bikin, lê em dikarin cûrê kitêba dersaye aûdîyo, usa jî du-sê kitêbên mayîn, Peymana Nû û fayla kitêbêye PDF-ê cîhwarkin /diha zêde kitêba çapkin, heger mecalên serwêrên cîh hebûna/.

Heger ez bi cûrê xwezeftkirinê bêjim, em gelekî şa bibûn.

Ji wê gotûbêjkirinê fikireke stratêcî jî pêşda hat. Ew yek dîsa mecalên wan welataye têknîkîva girêdayî bû. Min pirs da:

-Li wan welata, serwêr û rêber întêrnêtê didine xebatê?

-Bawar bikî li hemû welata didine xebatê, - Rob got.

-Em dikarin malpera întêrnêtê hazirkin û hemû matêrîyalên xweye tercimekirî malperêda cîhwar bikin. Wê malperê em dikarin bi cûrekî mayîn navkin, bona ku ew welatên ku dijî hînkirinê Încîlêne, malperê blok nekin. Adrêsa wê malperê emê li ser rûyê kitêbên ku tên belavkirinê zêde bikin. Emê pêşniyarî serwêr û rêbera bikin, wekî endamên civînên xwera bêjin, ku ew dikarin hemû matêrîyala ji wê malperê belaş barkin, bona ku civîn tevayî wana lêkolîn bikin.

Em mînanî du zaroka bûn, yên ku li dikana şîrinayê bûn:me nikaribû şabûna xwe zeft bikira û me fikirên wî cûreyî pevdiguhartin, yên ku stratêcîya me didane qewînkirinê.

Bi kirina hemû lêkolîn û hesabên pêwîst, me da zelalkirinê, wekî em dikarin bi hejmara mezin hazirkin û wan "berevokên rêberiyê" belavkin, her yek nêzîkî çar dolara. Çi ku derheqa malpera meye întêrnêtêda bû, koma meye "Mêsîncêrê" xweya zanebûnê pêwîst û karebûna bû, bona ku ew hazir bikirana.

Zûtirekê koma me fem kir, wekî bi saya wê fikira ji ezmana hatî, mecala me wê hebe, ku em bidine hînkirinê, perwerdekirinê û qewatkirinê, ne tenê rêberên cuda, lê usa jî tamamîya olên civîna û komên biçûk. Li hemû gundên li dinîyayê, bi taybetî li geleka, tenê civînek heye. Usa dertê ku em dikarin bi çend dolara hukumî li ser her oleke gundekî bikin. Eva învêstîsîyake kardare! Gelo bi rastî tiştê usa dibe?

Wextê civîna mayîn, min derheqa wê dîtînokêda elamî serokên beşên qulixdarîya "Mêsîncêrê" kir. Hemûya jî ew şabûna min texmîn kirin: tamamîya komê rûyê wê bernamêda bi şabûnêva tijî bû. Min bi şabûn elam kir:

-Ew yek girîng nîne, ku çi qas wede wê bê xwestinê, 10 sal, 20 sal, yan zêde?: bi wan matêrîyala, yên ku Xwedê spartine me, emê bighîjine her rêberekî li ser vê dinîyayê û alî wan bikin.

Piştî mehekê, bîznêsmênêkî ji Têxasê ofîsa mera têlêfon kir. Ewî hevdiîtina 15 deqê, ya tevî min û Lîzayê, hîvî kir. Ew tevî jina xwe bi teyarê hatine Koloradoyê. Wextê hevdiîtina me, ji çevên wî hêsiir hatin. Ew girîya û ecêbmayî got:

-Ez zanim ku hûn xebata çawa dikin. Ez zanim, wekî hûn bi matêriyalên xweva rêberên li welatên dûr qewat dikin. Ez dixwezim tevî wê yekê bibim.

Ewî çêk danî ser sivrê. Hindik mabû ez ji ser kursî biketama: ew çêk ya 750.000 dolarî bû.

Nava çend mehên mayînda me wêb sayta xwe hazir kir û me destpê kir bi kel û ced bixebitin, bona ku berevokên rêberaye li welat û nehîyên cuda-cuda hazir bikirana. Me bona tercima matêriyalên dersaye anegor û kitêba têradîtî carekê pere didan, usa jî bona tercimên kitêbên zêde, yên ku wê biketana ser sêlika DVD, bi zimanên cuda-cuda. Rob komên tercimeçîyaye here baş kirê kirin û da koordînasîyakirinê, bona ku kitêb bi zimanên cuda-cuda bihatana tercimekirinê. Ew herdu pêşkêşkirinên bi merdanî, hejmara kîjana ji mîliyonek dolarî hinekî zêdetir bû, nava sala ewlinda xercên meye pêwîst girtin.

FIKIRA DERHEQA ÇÊKIRINA KOMÊDA

Em niha paşda vejerine çileyê sala 2011-a, hema xût wan rojên piştî biryara derheqa parevekirina 250.000 kitêbada. Ev herdu pêşkêşkirin hê nehatibûne dayînê û ez bona wê yekê şabûm, çimkî tunebûna mecalê ez def dam, ku bona stendina stratêgîyayê, her şebeq ez li Xwedê bigerim. Mera progirama derheqa wê yekêda pêwîst bû, ku em çi cûreyî dîtînoke xwe raberî wan jin û mêra bikin, li cem kîjana pêşkêşa kirina pêşkêşkirina hebû, yên ku wê pêşkêşa xwe bidana xebatê, bona ku piştgirî bidana vê înnîsyatîva mezin û çawa komeke mezin ji wana sazkin. Bi saya koma wî cûreyî, meyê bikaribûya matêriyal bidana serwêr û rêberên li temamîya dinîyayê, nenihêrî wê yekê, ku ew bi çi zimanî diaxifin, li kîderêne û halê wanî finansî çi cûreyîye.

Piştî duakirinên her şebeq, piştî çend roja, Ruhê Pîroz dilê mînda got: "Kurê min, tu bi hizkirina xweyê hindava golfêda eyanî, wê yekê bide xebatê, ku tu mecalê berev bikî. Ezê mêr û jinên rast bînim, ku bighîjine koma te û piştgirîyê bidine vê mîsîyayê". Ez carekê fikirîm, wekî mêvanxaneke Amêrikayêye here baş li Kolorado Sprîngsêye, ya bi navê "Broûdmûr", li kîderê bona derbazkirina lehca du deştên golfê hebûn. Bi vê progiramê ez Êdîson û Lîzayêra parevebûm.

Wana guhdarîya min kir û paşê ji min pirsîn.

-Emê kengê wê yekê bikin?

-Werin em vê havînê wê yekê bikin, -min bersiv da.

Em xemgîn bûn, wekî diqewime wedê me bona teşkîlîkirina wê yekê

tunebûya. Gelo odên azad wê gelek hebûna, çimkî bona wê mêvanxana pêncsteyrkê ew yek dikaribû pirsgirêk bûya. Hîmlî odên wê mêvanxanê çend sal pêşda îdî tên hildanê û me jî hema wedê herî pêwîst bijartibû. Xemgînîke başqe jî hebû: gelo wê çi bûya, heger progiramên mêvanên meye başqe wê havînê hebûna.

Kurê min wê yekêva mijûl bû û piştî çend roja gote min:

-Bavo, nava temamiya havînêda ew mêvanxane, xêncî hevtêkê, betal nîne. Em dikarin nêzîkî sed odayî hildin, û usa derketîye, wekî hema wê hevtê tu û dayîka min maldanin.

-Werin wan oda hildin, -min gote wan.

-Em gerekê peymanê îmze bikin, - ewî eşaretî da, -û borcdarîya finansî hildin ser xwe. Gelo emê bikaribin wan hemû oda hildin?

Û carekêra dîsa ev xeber ji devê min derketin:

-Hemû ode wê ji alîyê meda bêne mijûlkininê.

-Min nedixwest derheqa wê yekêda gelekî bifikirîyama. Min rûê fikirên xweda nedixwest ku ez ji wê progiramê paşda bisekinîyama.

Min zanibû, wekî gelek civîn û bîznêsmên li Ştatên Yekbûyî hebûn, yêu ku wê bi hizkirin piştgirî bidana wê înisîyatîvayê. Min wan merivara têlêfon kir, yên ku dihatine bîra min, û bawar bikî hemû jî derheqa hazirîya tevbûnêda elam kirin. Nava du mehada me meriv berev kirin, bona ku hemû odên me bihatana mijûlkininê.

Bi progiramkirina vê lehcê, koma birîyar kir, wekî ewê ne tenê lehca golfê bûya, lê ewê usa jî bûyareke tam û bîranînê bûya. Me qîrar kir, wekî hemû tiştê li ser dereca bilind û bi armanca xwe bibûya, bona ku wede xweş derbaz bûya, bi taybetî bona wan mêr û jina, yên ku golf nedilîstin. Lîza gerekê hevdiîtinên mexsûs bona jina teşkîl bikira. Wextê hatina wan, me gerekê dîyarî bi zembîlên bedewva bidana wan. Xêncî wê yekê, teşkîldarîyên mêvanxanêye mexsûs û xwerinxwerina wane cuda wê bibûna, bona rêbera û bona hemû tevbûya xelatên baş têra hatibûne dîtinê. Meremê wî hemû tiştî ew bû, ku me razîbûna xwe bida kifşê, bona wê yekê ku ew bighîştana koma me.

Lehca meye ewlin, ya "Fincana Mêsincêrê" dawîya hezîrana sala 2011-a hate derbazkirinê. Hetanî destpêka teşkîldarîyê, min sportsmênên profesîyonal û sazbandên eyanra têlêfon kir û hîvî ji wan kir ku ew eşiyayên bi destên xwe li ser wan nivîsî pêşkêş bikin. Xêncî wê yekê, hinek îdare eşiyayên qîmetlû, yan jî qulixdarî pêşkêş kirin. Me ew pêşkêşkirin derxiste firotanê, ew jî wextê xwerinxwerina dawî. Me ji 340.000 dolarî hinekî zêde, wextê lehca xweye ewlin, berev kir, lê tê bêjî ew tam nîbû: me stratêciya here baş hê dest neanîbû bona ku me dîtinoka xwe derbaz bikira.

Wê payîzê, nava fikira endamekî koma meda fikireke ruhdarbûyîye başqe xuliqî. Me progiram kiribû, ku me lehca xweye hersaleyê duem havîna sala 2012-a derbaz bikira, û ewî got:

-Em eşiyayên bi înzên merivên eyan, kirasê bêysbolê, kumê rêgbîyê, kîtarê û tiştên mayîn didine aûksiyonê bona firotanê. Perên ji van eşiya stendî, bona fînansekirina matêriyalên bona miletekî têrê nakin. Werin em îdî wan eşiya dernexine firotanê: werin em mileta derxine holê. Qîmetê millet diha bilinde.

Ew fikir li hemûya xweş hat, lê endamekî koma me ew fikir da guhartinê û vî cûreyî gotina xwe berdeham kir:

-Merivên bi xeysetê xweva qewîn tên tevî vê teşkîldarîyê dibin. Werin em navnîşa pêşketîya çêkin, li ser kîjanê wê pêşkêşkirinên tevbûyîyê bona mileta bêne dîyarkirinê, û li ser hîmê wê yekê ew sponsêr, yên ku pêşkêşkirinên here mezin wê bikin, wê wan eşiyayên îmzekirî: top, kîtar û xelatên mayîn bistînin.

Bi vî cûreyî fikirên teze dixuliqîn. Qasekê ez diji wê yekê derketim:

-Ez wê yekê qebûl nakim, wextê ku ew aûksiyon dirêj dikişînin. Ew çend deqên bêdengîyê bona min tê bêjî heta-hetayîye. Werin em sehetê daynin û wedekî kurt birîyarkin, mînak 35 deqe û tevbûyên mera bêjim, ku çawa wede ser hevda bê, aûksiyon jî wê xilazbe. Û ew millet, projeya kîjanê wê yekê fînanse kirine, wê ewê salê matêriyala nestîne. Bi wê yekê lezbûneke mezin wê pêşda bê.

Niha îzinê bidin, ez şirove bikim, ku çi dixwezim bi gotina proje bêjim. Ew ji du beşaye. Ya ewlin, çapkirina hemû berevokên rêberîyêye, usa jî tercima aûdîyo û vîdêyoye, bahê kîjanê bona her zimanekî nêzîkî 17.500 dolarîye. Ya duem bahê belavkirin û çapkirina berevokên rêberîyê, yan jî kitêbaye li wan welataye. Li her welatekî nêzîkî 500- 40.000 rêber hene. Li piraniya welata hejmara rêbera ji 5000 hetanî 10.000 -ye û xercên wana ji 20.000 hetanî 40.000 dolare.

Wextê civînên peyîra, koma me fikirên nû derheqa wê yekêda pêşniyar kirin, ku çawa fikirên derheqa gavên başda derbazî cem tevbûya bikin, çawa dîtînoka xwe raberkin û çawa teşkîldarîya xweye duem derbazkin.

Ewê salê, wextê aûksiyonê, himberî sala derbazbûyî, em bûne şedê dubarebûna pêşkêşkirinên sozdayî. Wedê meyî biryarkirî hê ser hevda nehatibû, feqet ji 50-î zêdetir projeyên me îdî bi temami hatibûne fînansekirinê. Mezinaya pêşkêşkirina sala sêmda, wextê “ Fîncana Mêsincêrê ” diha zêde bû: me ji mîlîonek 300.000 dolarî zêdetir pere berev kirin, bona ku diha zêde projeya bidine fînansekirinê.

Hersal hewcetîya matêriyala diha zêde dibû. Ji milletên başqe-başqe meriv tevî Rob diketine nava pêwandîya, hîvî dikirin, ku matêriyalên me bidine wan. Paşê hejmara projeyên me ji sedî derbaztir bû, û îdî wextê «Fîn-

cana Mêsîncêrêye” şeşa 140 projeyên me hebûn, bona kîjana ji du mîlîona zêdetir dolar berev bûn. Sala nehada nêzîkî sê mîlîon dolara berev bûn, bona fînansekirina 200 projeya.

Heya çapbûna vê kitêbê, hetanî mehên sala 2020-ye dawî, koma “Fîncana Mêsîncêrê» nêzîkî 30-î mîlîon matêriyal pêşkêşî serwêr û rêberên li ji 100 welata, ji 120-î zêdetir zimana, pêşkêşî kirine.

Nava vî wedeyîda em bi mêrxasekîva ruhdar dibûn, bi Êndryû Karnêgîva. Nava dîrokêda ew xêrkirekî herî navdare, yê ku beşeke hebûna xwe pêşkêşî kirîye. Anegorî qîmetê dolare îroyîn, ewî bi mîlîyarda dolar pêşkêşî kirine. Piraniya wan pera bona çêkirina kitêbxanên civakî hatîye xerckirinê. Salên 1883-1918 -da ewî ji 25.000-î zêdetir kitêbxane çê kirine, piraniya kîjana li 47 ştatên Amêrîkayê.

Îzinê bidin ku ez pîrseke hewaskar bidim. Nava kîjan wedeyîda Ştatên Amêrîkayê Yekbûyî bû welatê hemdinîyayî. Ew yek salên 1883-1918-da bû, hema wî çaxî, wextê ku Karnêgî kitêbxane çê dikirin. Ez gumanim, wekî ewî nava civakêda zanebûn belav kirin, alî sazûna Amêrîkayê kir, çawa welatê hemdinîyayî.

Ev prînsîp usa jî derheqa zanebûna ruhanîdane. Xwedê dibêje:

“Cimeta Min rûyê tunebûna zanebûnêda tune dibe” /Hoseya 4:6, NKJV/

“Cimeta min ji nezanîyê dibe hêsîr” /Îşaya 5:13/.

Piştî, bi sala ser hev serkarîkirina qulixdarîya me, bona min eyan bû, wekî bona werguhastina gundekî û bajarekî mecala here kardar çêkirina avayê civînê nîne. Ew yek awqasî me rêberên civîna dide girêdanê. Em diha gelekî kardarin, wextê ku em zanebûna ruhanî didine rêberên cî, bi saya çî ew qewat dibin ku hukumê xwe li gund û bajarên xwe dihêlin. Ew zanebûn alî dîke, ku ew bawarî pêşda bê, ya ku pêwîste, ku civîn bighîje û xebata xwe bike, ya ku wextê ku pêwîstbe wê usa jî bikeve nava çêkirina avaya û destanîna mecalên başqe.

Wextê înisîyatîva meye stratêciye bona belavkirina matêriyala, tiştê baş ewe, wekî çêkirina avayê civînê bona me dikare bighîje bi deha hezara dolara, lê berevoka rêberîyê, ya ku bahê çend sed dolar matêriyal berev kirine, beşeke wêye biçûke.

Ev dehsalî, wextê kîjanê me berevokên rêberîyê belav dikirin bona civînên welatên ku pêşda diçin, nava qulixdarîya mine 40 saleda ya here xweş bû. Li min xweş tê, ku ez beşeke komekême, li kîderê meriv

berevbûyîne û divedînin mileta bi cedandinê û dîtînokê hînkin /bixwînin Met-ta 28:19, 20/. Me tevayî diha gelek tişt kirin, çî ku ji me her kes nikaribû bi xwe bikira. Xebata me vê xeberê nava xweda dike sîmvol: "Ji we pênc gerekê sedî bizêrîne û ji we sed gerekê deh hezara bizêrîne" /Q. Kahîntîyê 26:8/.

/Ev gotin dîsa alîkî çendbarekirinê şirove dike, ew jî yektîye, derheqa kî-janêda emê serîkî kitêbêyî peyîra bêjin/.

Yektîya me li ser van gotinên Îsa hatîye merkezîkirinê:

"Dema ku tu xwerinxwerinê, yan jî kêfekî teşkîl bikî, - Ewî got, -heval, bira, pismam û cînarên dewletî teglîf neke. Çimkî ewê jî te teglîfkin û ew yek wê bibe heqê teyî tek-tenê. Dewsa wê yekê kesîba, seqeta, topala û kora teglîfke. Û wextê rabûna yên heq, Xwedê wê bona teglîfkirina wan meriva heq bide te, yên ku nikaribûne bidine te" /Lûqa 14:12-14, NLT/.

Ew rêber, yên ku ji alîyê meda matêrîyal stendine, eseyî nîne ku ew seqet, topal, yan korbin: me ji van gotina tenê ev xeber hildane, wekî ew nikaribûne bidine me. Heger ez li civînekê yan jî hemcivîneke Ştatên Yekbûyîda qulix dikim, razîbûnê elamî min dikin, bi dayîna pêşkêşkirina bona "Mêsîncêr întêrnêşînil"-ê. Gelek rêberên li welatên cuda-cuda, nava jîyanên kîjanada emekê me heye, nikarin wê yekê bikin. Hemû endamên koma me, bîznêsmênên ku şuxulkaîya me fînanse dikin û rêberên civînê, usa jî teşkîla "Mêsîncêrê" fem dikin, wekî mecalên meye cuda hene: em didin, bêyî wê hevîdarîyê, wekî emê ji wan meriva tiştêkî bistînin, yên ku alîkaîya me stendine.

Çend sal pêşda ez çûbûm Yêrêvanê-Ermenîstanê, li Kîderê ji Rojhilata Navîn bi hezara rêber hatibûn ku tevî hemcivînê bibin. Li odeke başqe, wî çaxî em rastî serwêrên ji Îranê, Afganistanê, Sûrîyayê û dîsa welatên wî cûreyî hatî, hatin. Şikilkîşandî qedexekirî bû: ew meriv nedixwestin ku ew bidîtana. Hazîrîya Xwedê gelekî zor bû û ez ser hev difikirîm: "Ev rêber gerekê bona me dannasîn bikin, ne ku ez û Lîza bona wan". Nava xebera xweda min gote wan:

-Hûn hemû jî hesab dikin, wekî ez û Lîza mêrxasin. Lê mêrxas ne ku Con û Lîza Bîvêrin, lê ew bîznêsmên û civînin, yên ku bi mîlîona dolar pêşkêş kirine bona ku em bikaribin bi matêrîyalên xweva duakin. Ewin mêrxasên rast.

Piştî wedekî kurt, hemû hazîrên li wir tevî me nikaribûn hêsirên xwe zeft bikirana û em bi hevra girîyan.

Piştî hevdîtînê, rêberêkî îranî ji min pirsî:

-Gelo meriv çawa dikarin awqas perên mezin pêşkêşî wan meriva bikin, heger ew meriv tu cara nedîtine?

Bersiva min gelekî zelal tê kifşê, lê ew yek rastîye:

-Menî hizkirina Xwedê ye dilên wandane.
 Û careke mayîn hêsir kişîyan.

ÇENDBAREKIRINA DIHA MEZIN

Sala 2019-a me fem kir, wekî wêbsayta belavkirina matêrîyalên me tam nîne. Ew sala 2011-a kardar bû, wextê ku me ew saz kir, lê roja îroyîn ew bêfesa û sînorkirîye. Mînak, bi tîlefonên smartfon gelekî çetine wê yekê bikin. Lîza, gelek endamên koma me û ez, gelek cara li welatên kesîb û bêçare bûne. Me nikaribû nedîta, wekî nenihêrî wê yekê ku meriv çadirada, malên ji xwelîyê çêkirî û holikên ji dar çêkirîda diman, lê li cem piranîya wan smartfon hebûn. Bi rastî, tîra tî dîtinê, wekî hetanî dawîya sala 2020-î, ji pênc mîliyad merivî zêdetir wê bibine xweyên smartfona.

Piştî gelek rêwîtiya eyan bû, wekî zûtirekê, heger ne niha, bi rîya tevgerêdana onlayn wê mecal hebe bighîjine her merivekî li ser vê topa dinîyayê. Usa jî çawa yên mayîn, min texmîn kir, wekî em dîsa nava wedê dîrokîye “Rêya Romayî” ne.

Îzinê bidin ez bi kurtayî şirove bikim. Kitêba Pîroz dibêje: “Lê gava wext pêra gihîşt, Xwedê Kurê Xwe şand” /Galatî 4:4/. Gihîştina wede derheqa gelek tiştîdane. Nîşaneke girînge pêragihîştina wede ewe, wekî Mizgînî wê bighîje temamîya dinîya eyan. Ji sala 312-ye berî Îsa, romaya destpê kirin torên rêyên li ser erdê û behrê bidine pêşxistinê, yên ku li ser temamîya dinîya wî çaxî belav bû. Wê demê, wextê ku Îsa got ku herin li temamîya dinîyayê, ew rê gelekî pêşketî bûn û wê yekê îzin da, ku Xebera Xwedê li temamîya dinîya eyan, lez bidine belavkirinê.

Ez bawar dikim, wekî dîsa pêragihîştina wede nêzik dibe, bona hazirkirina rîya hatina Îsaye duem: întêrnêt nava rojên meda “Rîya Romayî” ye. Karebûna me, ya bona hînkirina hêmu mîletên li dinîyayê, bona belavkirina Xebera Xwedê, heye.

Bi femkirina vê yekê, koma me careke mayîn destpê kir dua bike, û stratêcîyê çê bike. Piştî lêkolînên bi meha, me tevî hevaltîke baş, ya ku wêbsayta li Ştatên Yekbûyî çê dike, projek destpê kir. Me bona hînkirinê dika tîradîtî çê kir, ya ku lez dixebite û pîrfûnksîyone, û meriv dikare bi hêsanî bi smartfonên “iPhone” û “Android”, usa jî bi plansêta û kompyûtêra bixebite û hînbe. Armanca me ew bû, ku me dika here baş çêbikira, kîjan bi tîknolocîyên roja îroyîn tiştê bûyînêye. Me dixwest ku rêberên civînê li her dera, bi taybetî li welatên bêçare, bighîştana wê yekê. Roja îroyîn ber çevaye, wekî malperên meda ji 227 welata û herêma bi mîliyona peyhatî hene, yên ku bi kitêbên malpera meda hîn dibin, dîsa derbaz dibin û matêrîyalên hînbûnêye mayîn didine xebatê. Tenê maye ku hukumê me bighîje hindik mileta, bona ku em bighîjine hemû mileta.

Piştî hinek wede me destpê kir derheqa mecalên çendbarekirinêye zêdeda bifikirin. Bona bilindkirina kardarîya dika me û berfirehkirina wê, me qirar kir dersdarên eyane baş teglîfkin, ku ew bi bangên xweye cuda pêşda bèn. Niha hemû rêberên li dinîyayê dikarin kompyûtêrên xwe, planşet, yan jî tîlefonên xwe bidine xebatê, bona ku him bi şexsî, him jî komên biçûk, yan jî civînada hînbin. Bi vê gavê kardarîya dika me wê ne tenê bê çendbarekirinê, lê hînkirinên me wê diha qewînbîn, lê ne ku kitêbên çapkirî, û ewê bighîje nifşa pêşerojê.

Gelo wê çi bibûya, heger ne Lîzayê, ne jî ez, me qirar bikira nenivîsîya? Yan jî wê çi bûya, heger em bi wê yekêva razîbûna, ku em nivîskarên eyanin û me destpê nekira, ders hazir bikirana? Wê çi bibûya, heger koma me tenê xwe bigîhanda şexs û civînên înglîzîaxife li dinîyayê û bi wê yekêva razî bûna? Wê çi bibûya, heger temamiya teşkîla koma me nexwesta qewatên xwe bida xebatê, ku li mêvanxana Broûdmûrê ji temamiya Ştatên Yekbûyî kom berev bikira? Dijwarîyên her derecekê hebûn, kîjana em berfireh kirin, em mecbûr kirin ku hindava kerema Xwedê hêvîdarbin. Li ser her dereceke cuda wê diha hêsa bûya, cîhê xweda bimana, ne ku pêşda biçûna, ku diha bi kardarî bona meriva qulix bikirana.

Wextê ku em guhdarîya Ruhê Xwedê bikin, emê gav bi gav berbi çendbarebûna diha mezin herin. Ewê hemû gava ji destpêkê nîşan bide, û pêra jî gavên duda, yan jî sisîya. Wê diha hêsa bûya, heger mecal hebûya, nava topeke şûşe binihêrîya, wextê ku ez hê ji 30-î salî derbaztir bûm û min temamiya rê bidîta, bi kîjanê koma me îdî nava van 30-î salada derbaz bûye. Lê belê, heger mecala usa hebûya, meyê awqasî bi kel û ced bona her gavekê şerkarî nekira, bi duakirinê û çûyîna peyî rêberîya Xwedê. Nava meda usa jî ew bawarî û îzbatbûn wê çênebûya, ya ku me tevî her gaveke gurêdabûnê dest anî.

Çendbarebûn fikira mêriv nîne: ew fikira Xwedê ye. Dîsa bêjim, wekî ew bona merivatîyê temîya Xwedê, ya ewlin bû: “Her pêşkêşeke ku Ezê bispêrme we, bona çendbarekirina padişatîya Min e” /şirovekirina min ya parên Destpêbûn 1:22 û Metta 25:14-29/. Îzinê bidin ku ev rastîya bêhesab girîng biwekilînim: çendbarekirin gerekê hukumî li ser we neke, çimkî ew pêşkêşa Wî ye. Hûn tenê gerekê duakin, göhdarkin, bawarkin û gura wî hemû tiştî bikin, çi ku Ew dike dilê we.

Ewê bi Xwe rêberîya weye berbi çendbarebûnê bike.

Diqewime hûn bifikirin: “Dilê min ji wê şedetîyê dişewite, ya ku we nava hersê serên kitêbêye dawîda da. Lê ez dayîka ciwanim, xwendikarim, sportsmênê profesîyonalim, xebatkarim: ezê çawa bikaribim padişatîya Xwedê çendbare bikim?”.

Emê destpêkin derheqa wê yekêda serê kitêbêyî mayînda xeberdin.

BIFIKIRIN

1. Dayîna Xwedê yan jî tevûna Wî, hîvîya kîjanîne em, gelek cara bi cûrê fikira stratêcî tê. Nava jîyana weda halên usa hebûne, yên ku bi rîya fikira ji Xwedê ruhdarbûyî hatine guhartinê?
2. Stendina serwaxtîyê tiştê herî girîng e, kîjanê dikarin bikin? Nava kîjan goveka jîyana weda hûn hewcê serwaxtîyê bûne? Hûn çi cûreyî gerekê nêzîkî Xwedê bin, bona stendina serwaxtîya Wî?
3. Fikira stratêcî pêşkêşa ji Xwedê ye, ya ku dikare me berbi dereca kardarîyêye nû bibe û bona çendbarekirinê qewatê bide. Gavên çawa piştî stendina fikira stratêcî ji we tên xwestinê?



MessengerX

Pêwandîya we bona hînbûna herroje



Bi temamî belaş

Li ser mobayla xwe barkin
û bidine xebatê.

Yan jî cûrê wêye wêb bi vê
adrêsê bidine xebatê:



MessengerX.com

110+ ziman, hejmara kîjana zêde dibe



Carekêra matêrîyalên wergerandî, yên ji 110 zimana
zêdetir, temaşe bikin.



Û em her dem matêrîyalên wergerandîye nû zêde dikin.

Temaşe bikin! Bixwînin! Guhdar bikin!

Berevokên matêriyaliyaye berfireh lêkolîn bikin, dikevîne nava kîjanê ders, kitêbên êlêktronî, kitêbên aûdîyo, kurtefilm û tiştên hê zêde, kîjana hûn dikarin temaşe bikin, bixwînin û guhdar bikin.



Mecalên diha zêde, yên ku wê li we xweş bîn.

- Mecalên zelal û hêsa, kîjan wê alî we bikin ku van matêriyala pareve bikin.
- Bona temaşekirina bi têtêvîzîyonên weye hizkirîye smart: «Chromecast» û «AirPlay».
- Pêşkeftina xwe li ser hemû dezgehên xwe xweyîkin. Matêriyalên xweye bijartî kitêbxana xweda xweyîkin bona ku lez bikaribin bibînin.
- Matêriyala li ser dezgehê xwe bêyî temaşekirin barkin.
- Lêgerîna serwaxtî û filtir bona dîtina wê yekê, kîjanê hûn digerin.




Gihîştina nva hemû govekên girîngda

Têmayên usa lêkolîn bikin, yên mînanî malbatê, heleqetiyên saxlem, meremê jîyana we, azadbûna ji pornografiyayê, çêkirina bawariya we, guhdarkirina dengê Xwedê, serwêrkirina îşê xwe û hê zêde.

Rêya gihîştina we

Meremê **MessengerX**-ê ewe ku alî we bike, ku hûn nava jîyana xweda gava bi sirê biavêjin. Me rêya hînbûnê saz kirîye, ya ku wê bi înrûmêntên hukumdar alî we bike, bo ku hûn li ser wê rêyê bimînin.



- 1 Pêwandîya **MessengerX**-ê ji «Apple Store»-ê û «Google Play»-ê barkin.
- 2 Hesab vekin û bi zimanê xwe wê pêwandîyê bidine xebatê.
- 3 Bigerin, bixwînin, temaşê bikin, guhdar bikin û matêrîyalên ku we bijartine barkin û pareve bikin.

Bibine şagirt û hîn bikin

Bi bûyîna parçekî **MessengerX**-ê, hûnê alî me bikin ev matêrîyalên wergerandî bona temamîya merivên li dinîyayê belav bikin.

Çimkî her kes layîqî wê yekê ye ku bizanibe.



MessengerX



MessengerX.com

*“Xwedê, bi kerema Xwe, pêşkêşên /xaîzma/
cuda-cuda dane me, bona ku em karên kardar bikin.*

*Dêmek, heger Xwedê karebûna pêxemberbûnê
daye we, bi wê bawariyê awqasî bêjin, çiqas Xwedê
daye we. Heger pêşkêşa we bona qulixkirina bo
merivê başqe ye, bi kardarî qulixî wan bikin. Heger
hûn dersdarin, bi kardarî hîn bikin. Heger pêşkêşa
we bona piştgirîya meriva ye, bibin piştgir. Heger
ew parevekirin e, bi merdanî pareve bikin. Heger
Xwedê karebûna rêberkirinê daye we, bi rastî wê
cabdariyê hildine ser xwe. Heger pêşkêşa we ew e,
ku hûn bona merivên başqe qencîyê bikin, wê yekê
bi şabûn bikin”.*

– Romayî 12:6-8, NLT

Învêstîsîya

Pawlosê şandî ew pêşkêşên pircûre dide rêzê, kîjan Xwedê dane her xulamekî Xwe. Ez careke mayîn bêjim, wekî ez bawar nakim, ku navnîşa van pêşkêşa ser hevda tê, feqet dorana karebûnên xwedêtîyêye berfireh dikeve nava wê. Diqewime hûn minra qayîl nebin, lê îzînê bidin, ez şirove bikim.

Nava navnîşa Pawlosda ez karebûnên stiranbêjîyê, advokatîyê, doxtirên ku emelyeta dikin, şikilkişandina şikilên ruhdarbûyî, sazbandîyê û karebûnên mayîne ji alîyê Xwedêda dayî nabînim, kîjana em her roj dibînin. Awa bo wê yekê jî ez bawar nakim, wekî navnîşa van pêşkêşa tame. Heger hûn minra qayîl nînin, yeke, ez dîsa qedirê tabîya we digrim: ev têma ne hewca gotûbêjkirinêye, çimkî ew ne têma kitêba meye serekeye.

Bi paşdahatîna li ser xeberên Pawlos, li min xweş tê, wekî «Tercima nûye sax» xebera “*xarîzma*” çawa karebûna “bi kardarî mîyaserkirina hinek îşa” şirove dike. Bêyî şikberî, ev şirovekirin fikira vê kitêbêye sereke dide kifşê. Hersê serên kitêbêye derbazbûyî şedetîya derheqa pêxemberbûnê û çendbarekirina pêşkêşên hînkirinêda bûn. Werin em guhdarîyê bidine ser pêşkêşeke mayîn, ya *parevekirinê*.

ÎNVÊSTÎSÎYA NAVA PADIŞATÎYÊDA

Hevalekî min heye, navê kîjanî Mayke. Ew 11 salîyêda bû bawarmend û destpêkir peyî Îsa Mesîh here. Feqet, nava jîyana xweda ew nava çêkirina padişatîya Xwedêda kardar nîbû. Nerazîbûna wî rûyê wê yekêda diha zêde dibû. Paşê, 35 salîyêda ew îdî ji wê yekê weystîyayî bû, wekî ewî bona hiştîna hukumê hetayê-hetayê tu tişt nedikir. Gelek cara merivên ku tîn ser wê fikirê, dicêribînin nava jîyana xweda, bêyî zanebûnê, serwaxtîyê û bawarîyê guhartina bikin. Feqet, nêzîkbûna Mayk cûrekî mayîn bû. Ewî qîrar kir, wekî hiştîna hukum berê ewlin “tîjîkirina hewiz” bû. Dêmek, nava şeş mehên peyîra, ew 2000 xeberên ji Încîlê ezberî hîn bû.

Pîştî şeş meha, hinek wext derbaz bibû, ewî qîrar kir, ku li bajarê ştata

Arîzonayêyî Fînîksê here hemcivîneke rêberîyê. Ew awqasî kesîb bû, wekî nikaribû oda mêvanxanê kirê bikira, û ew mecbûr bû tevî 11 xwendikara maleke sêodêda cîhwarbe.

Wextê hemcivînê qurbanîya mexsûs hate elamkirinê. Rêberê hemcivînê ber dilê tevbûyada hat, ku bona wê yekê dua bikin ku ew gerekê çî bikirina qurbanî. Mayk ji Xudan ev xeber bihîstin: “Ez dixwezim wekî tu 200 dolarî bikî qurbanî”.

“Xwedê, ew temamîya perên li cem minin”, - Mayk got.

Xudan bi cûrê milahîm gote wî: «Ez hîvî nakim, wekî tu ji wê zêdetir bidî”.

Mayk gura Xudan kir û temamîya perên xwe kire qurbanî. Piştî wê yekê Xwedê temî da Mayk ku hetanî dawîya salê her meh 100 dolarî bike qurbanî, xêncî dehekê wî.

Zûtirekê, Xudan destpê kir progiramên dayînê bide Mayk, û karên wî bi cûrê qewîn berfireh bû. Sala mayîn, Mayk texmîn kir, wekî bona çêkirina padişatîya Xwedê gerekê her meh 400 dolar bikira qurbanî, xêncî dehekê xwe.

Piştî salekê ewî îdî her meh 1.000 dolar dikire qurbanî, dîsa xêncî dehekê xwe. Saltireke mayîn ew pere gihîşte 4000 dolarî, xêncî dehekê wî, lê piştî du sala ew gihîşte 10.000 dolarî, dîsa xêncî dehekê wî.

Wî çaxî Mayk hîvî ji Xudan kir ku bona çêkirina padişatîya Wî karebûna qurbanîya 10 mîlîyon dolara bide wî. Tê bêjî hîvîkirina wî mezin bû, tiştê bûyînê nîbû, lê ew nava fikir û hîvîkirina xweda qewîn bû. Lê belê, çî ku ewî dilê xweda bihîst, ew ecêbmayî hişt: “Kurê min, tu bona çî min didî sînorkirinê?” Mayk sînorkirinên xwe dûr xistin û destpêkir bona tiştên hê zêde bawar bike. Piştî wedekî kurt, qurbanîyên wî lez zêde bûn. Sala peyîra, ewî îdî her meh 17.000 dolar dikire qurbanî, xêncî dehekê xwe. Ew pere gihîşte mehê 25.000 dolarî, paşê 40.000-î, û piştî hinek wede gihîşte 50.000-î. Paşê Mayk destpê kir her meh 100.000 dolarî bike qurbanî, xêncî dehekê xwe, bona çêkirina padişatîya Xwedê. Cara xilazîyê, dema ku min wîra qise dikir, ewî îdî her meh 150.000 dolar dikire qurbanî, xêncî dehekê xwe.

Mayk jîyaneke gelekî baş derbaz dike, lê ew kîsî 10-15 selefê kara xwe dijî. Belê, we rast xwend: ew 85-90 selefê kara xweye salê dike qurbanî. Ew açixîya xwe hînbûna Xebera Xwedê, guhdarkirina dengê Xwedêva, yê nava duayêda, dide girêdanê û îzinê dide ku mesîhîyên ku ji wî zêdetir zanin wî hîn bikin.

Bi xebardana derheqa çendbarekirinêda meriv nikare *parevekirinê* hesab hilnede, çimkî çawa qanûn, ew pareke çendbarekirinêye serekeye. Gelek bawarmendên bi menîyên qenc derheqa *qurbankirina* finansîda vî cûreyî difikirin: “Ez çî dixwezim *bidim bo van meriva?*”. Eva nêzîkbûneke qenc û pa-

qije. Lê heger ew tenê wî cûreyî qurbankirinê dinihêrin, wî çaxî fikira wan tam nîne. Îzinê bidin şirove bikim.

Ya ewlîn, ev yek raste: Xwedê hizkirina Xweye hindava merivada kirîye dilên me, û rûyê wê yekêda nava meda xwestina *parevekirinê* û *qulixkirinê*ye bi xwepêşkêşkirinê heye. Lê belê, *parevekirê serwaxt* qurbanîyê ne tenê çawa pêşkêşa hizkirinê û qulixê dibîne, lê çawa *învêstîsîya*. Învêstîsîya dide kifşê, wekî meriv ji xerckirina mecalên xwe dûr dimîne, bona zêdekirina wê yekê. Bi taybetî nava finansada ew dide kifşê ku niha wan pera xerc nekin, bona ku wana bidine xebatê ku ew zêdebin.

Çend sal pêşda me, ez û Lîza, du parên erd dîtîn. Me fem kir, wekî ew bi bihakî nimiz difrotin, û nava wededa bahê wan wê zêde bûya. Perên me hebûn ku me herdu par jî bikirîyana û me qirar kir ku em perên destê xweda bona xerckirinên xweye şexsî xerc nekin, bona ku finansê bidine zêdekirinê. Bahên wan herdu parên erd diha zêde bilind bûn, û piştî du sala învêstîsîya me dubare bû. Wî çaxî me dikaribû li ser dereca diha bilind învêstîsîya bikira.

Îsa dibêje, wekî bi învêstîsîyakirina nava padişatîya Wî da, emê “*nava vê jîyanêda* heqê *çendbare* bistînin” /Lûqa 18:29, 30, NLT/. Ew nabêje «nava jîyana *peyîra*”, lê dibêje “nava *vê jîyanêda*”. Ez û Lîza şa bûn, çimkî perên nava wî erdîda învêstîsîyakirî dubare bûn. Lê belê, ew çî ku Îsa dibêje, qet nêzikî wê yekê jî nîne: firqîke mezin di navbera *dubare* û *çendbarebûnêda* heye. Gelo învêstîsîya çendbarebûyî bi çî qewatêye? Em dikarin wê yekê bi mînakî jîyana Mayk bînin ber çavê xwe.

Pawlosê şandî *parevekirina* me himberî reşandina toxim dike. Neniherî qewilên ji der, ew genimê ku nava xurekda nayê xebitandinê, lê nava axêda tê învêstîsîyakirinê, dikare feydayên ji sed carî zêde bide. Eva heqê *çendbare-ye*. Awa bona çî nivîsare : “Bi rezedilîya xwe bide û tê diha dewletî bibî: timabî û tê hemû tiştî unda bikî” /Gotinên Silêman 11:24, NLT/. Silêman, Îsa û Pawlos wê rastîya derheqa *parevekirinêda* neanîyana li merkeza guhdarîyê, heger hewcetî tunebûya, wekî bawarmend derheqa merdanîyê û çendbarebûnêda bifikirîyana.

Gelek meriv wê ewê yekê çawa qurbanîya hizkirinê hesabkin, wekî Mayk qirar kirîye ku bi 10-15 selefê kara xwe bijî. Lê belê, fikirdarîya Mayk diha berfirehye. Çimkî ew bi serwaxtîya Xwedê va tijîbûyîye, çimkî ewî şexsê xwe bi 2000 xeberên Încîlêye ezberî hînbûyî daye ronahîkirinê, ew wê yekê ne tenê çawa qurbanîya hizkirinê dibîne, lê çawa învêstîsîya.

Ew hema wî cûreyî dinihêre, çawa ku min û Lîzayê li wan herdu parên axê dinihêrin. Nêzikbûna wî meriv dikare himberî stratêçîya malbeteke xweya rêstorana eyan bike. Dewsa xerckirina karê, ew malbet para karêye mezin başqe dike, bona ku avayên nû dest bîne, xebatkarên nû kirê bike, diha zêde

xurek bikire û wî hemû tiştî bike, çi ku bona mezinkirina karê wan pêwîste. Heger rast bê kirinê, ewê bibin xweyên pênc rêstorana û kara wana wê pêncbarebe. Nava wê yekêda ewê bikaribin bona gelek meriva bibin dua, lê ne ku heger tenê rêstoraneke wana hebûya.

Heger Mayk bi cûrekî mayîn li qurbanîyên xwe binihêrîya, lê ne ku çawa învêstîsîya, ewê destpê nekira fikira parevekirinêye diha kûr fem bikira. Meteloka talanta hema derheqa vê yekêdane. Gotinên Îsa bixwînin: “Ew xulamê ku pênc torbe nîv stendin, destpêkir wî pereyî învêstîsîya bike, dîsa pênc torbên başqe qazanc kirin” /Metta 25:16, NLT/. Ew xebera *învêstkirin* dide xebatê, bona ku nîşan bide ku wî xulamî çi çawa stendibû, çendbare kir.

DÎSA METELOKEKE DERHEQA ÇENDBAREKIRINÊDA

Em dîsa metelokekê bixwînin, ya ku Îsa bona şiroveirina çendbarekirinê da xebatê.

“Elaletê guhdarîya wî hemû tiştî dikir, çi ku Îsa digote wan. Îsa meseleke din jî anî ser wê yekê, dema ku ew nêzîkî Orşelîmê dibû serhatîk wanra gilî kir, ku ew fikir bida rastkirinê, ku padişatîya Xwedê wê carekêra destpê bûya” /Lûqa 19:11, NLT/. Serecema vê metelokê gelekî li min xweş tê. Meriv hîvîyê bûn, wekî Îsayê padişatîya xwe bida îzbatkirinê û ew ji hukum û desthilatdarîya Romayê bida azakirinê. Ewî fikirdarîya wan rast kir, fikira rast da wan: Ewî dixwest ku me pêşîya çûyîna Wî padişatîya Xwedê çê bikira. Lê ew yek wê çawa bihata kirinê? Bi rîya *învêstkirinê*. Vê serhatîyê guhdar bikin:

“Merivekî esilzade çû împêratorîke dûr ku padişatîya xwe bistîne û vegere. Pêşîya çûyînê, ewî gazî deh xulamên xwe kirin, deh zîv dane wan û got: «Vana bona min *învêst* bikin, heta ku ez vegerim”” Lûqa 19:12, 13, NLT/.

Mînanî meteloka Metta, ew temîyê dide ku xulam “învêstkin”. Em gerekê nava wê yekêda xweranedîtî nîbin, çi ku spartine me. Lê gerekê bi *kel û ced* û bi *serwaxtî* bixebitin.

Nenihêrî wê yekê, wekî ev herdu metelok tê bêjî mînanî hevîn, lê ew cudane. Firqiyên wan em lêkolîn bikin. Ya ewlîn, Metta derheqa sê xulamada dibêje, lê Lûqa derheqa deh xulamada. Ya duem, nava serhatîya Mettada çapa zîvê ku xulama stendibû ne weke hev bû, lê vê metelokêda hemûya weke hev zîv stendin. Ya sêem nava serhatîya Mettada çapa zîv cûrekî mayîn bû. Bi himberîhevkirina van herdu meteloka, ez difikirim, wekî meteloka Metta derheqa wan pêşkêşadane, yên ku weke hev nayêne dayînê, lê meteloka Lûqa derheqa wî hemû tiştîdane, çi ku her bawarmendekî weke hev ji Xwedê

stendîye, bawarî çawa hîm, hizkirina Xwedê, Xebera Xwedê, duayên peymana me û tiştên mayînin. Lê belê, nava hîmê herduada jî dîsa ew prînsîpin. Em vê serhatîyê berdewam bikin:

“Piştî wê yekê wextê ku ewî padişatî stend, paşda vegeerîya û gazî wan xulama kir. Ewî dixwest pê bihesîya ku kara wan çiqas bû. Xulamê ewlin got:”Ez xulam, min perên te învêst kirin û ez *deh cara* zêde xebitîm”.

“Eferim, -padişê kire gazî. -Tu xulamekî qencî. Tu nava wî tiştê hindikda *amin* mayî, yê ku min sparte te: dêmek çawa heq, tê bibî serwêrê *deh bajara*” /Lûqa 19:15- 17, NLT/.

Em gerekê çend fikira bidine kifşê. Ya ewlin, wî xulamî ew învêst kir, çi ku dabûne wî. Ya duem, ew bi *kel* û *ced* û bi *serwaxtî* xebitî, feydayê kîjanî jî *deh cara* çendbare bû. Xebata bi *serwaxtî* ewe ku meriv bi *serwaxtîya* Xwedê bixebite, lê ew yek wî çaxî dibe, wextê ku meriv gura şewira Xwedê dike, çawa ku hevalê min Mayk dikir. Ya sêem, *çendbarekirin* raste-rast aminayêva girêdayîye. Li vir tu tiştek nehatîye kifşkirinê, çimkî aminayî bona Xwedê çendbarekirinê dide kifşê. Ya dawîyê, heqê xulame heta-hetayê weke çendbarekirina wîye:serkarîkirina *deh bajara* spartine xulamê ewlin.

Niha dîna xwe bidine xulamê duem:

“Xulamê mayî got: “Ez xulam, min perê te învêst kir û himberî perê berê pênc cara zêde xebitîm”.

“Eferim, -padişê gotê. -Tê bibî serwêrê pênc bajara” /Lûqa 19:18:19, NLT/.

Vî xulamî *deh cara* zêde nekir, lê pênc cara. Heqê wîyî heta-hetayê dereca învêstkirina wî da kifşê, pênc bajar, lê ne ku *deh bajar*. Bona çi ewî *deh cara* zêde nekir, çawa xulamê mayî? Diqewime ewî awqasî guhdarîya *serwaxtîya* Xwedê nedikir? Lê diqewime ewî mecal ji destê xwe berdabûn? Diqewime wekî ew li ser salên xweye pêşîya xwe sekinîbû, çawa ku serê kitêbêyî ewlinda Stên dixwest bikira? Diqewime fikirdarîya wî îdî ew bû, ku ewê derbazî hêsbûnê bûya?

Çend sal pêşda, wextê hemcivîneke rêberîyê, min dannasînkirineke derheqa çendbarekirinêda dikir. Bîznêsmênêkî ji Kalîfornîyayê, yê ku avayîçêkirinêva mijûl dibû û îdî bi mîlyona dolar pêşkêşî padişatîya Xwedê kiribûn, piştî dannasînkirinê nêzîkî min bû. Ewî ecêbmayî li min nihêrî, lê bi sifetekî ronahîbûyî bû û gote min:

-Con, min destpê kiribû derheqa sekinandinêda bifikirîyama, çimkî ez îdî gihîştibûme açixîyê. Meriv dikare bi hêsanî bikeve bin hukumê vê fikirdarîyê, lê ez niha dibînim, wekî ew yek şaşe. Ezê dîsa xebata bi kel û ced berdewam bikim û wî hemû tiştî çendbare bikim, çî ku Xwedê daye min.

Diqewime wekî tobekirina wî merivîye bi dil şuxulkarîya wî biguhêre, û ew ji zêdekirina pênc care bibe çendbarekirê deh cara.

Lê xulamê sêem/?

Lê xulamê sêem tenê ew perên pêşda stendî paşda vegerandin û got: «Ez xulam, min perê te veşart û xweyî kir. Ez ditirsîyam, çimkî tu merivekî usayî, tevî kîjanî karkirin çetîne: tu wê yekê hildidî, çî ku ne yê teye, û wî rezî didrûyî, yê ku te nereşandîye”».

“Xulamê xirab, - padişê kire gazî. -Xeberên te, te gunehkar dikin. Heger te zanibû, wekî ez merivekî berkim, yê ku wê yekê hildide, çî ku ne yê wîye, û wî rezî didrû, yê ku ewî nereşandîye, bona çî te perên min bankêda xweyî nekirin? Wî çaxî minê bikaribûya ji wan pera selef bistendana” /Lûqa 19:20-23, NLT/.

Mînanî meteloka Metta, li cem vî xulamî jî ew herdu pirsgirêk hebûn. Ya ewlin, ew tirsîyayî bû, û ya duem, ewî xeysetê agayê xwe nas nedikir. Bi vê metelokê jî em pê dihesin, wekî *xweyîkirina* tiştên ku Xwedê daye, *aminayî* nîne, lê *xirabîye*. We dît, wekî padişê kire *qîrîn*. Xweranedîtîne hêrsa wî rakir û ewî ew yek da kifşê. Ew yek tiştê hişyarkirinêye, heger hûn derheqa wê yekêda bifikirin.

Ew çî ku piştî wê yekê qewimî, diha baş fikira meye ji meteloka Metta, diha baş îzbat dike:

“Û ewî berê xwe da ewên ku li cem wî sekinîbûn, û padişê emir kir: “Perên li cem vî xulamî hildin û bidine wî, li cem kîjanî deh cara zêde bûye».

“Feqet, em xulam, -wana got, -li cem wî îdî awqas heye”.

“Belê, -padişê got, - ewên ku bi kardarî wî hemû tiştî didine xebatê, çî ku wanra hatîye dayînê, wê wanra diha zêde bê dayînê. Feqet, ewên ku tu tiştî nakin, heta ew tiştê biçûk jî ku li cem wan heye, ewê ji wana bê stendîne”” /Lûqa 19:24-26, NLT/.

Em careke mayîn dibînin, wekî Xwedê Efrandarê sosiyalîst nîne, Ew bi fikirdarîya Xwe diha zêde “kapîtalîst” e. Îsa da kifşê, wekî ew merivên li wir ber gilîyê padişêda hatin, çimkî li cem xulamê ewlin îdî awqas zîv hebûn, û agayê wan fikirdarîya wane “heq” da rastkirinê: “Ewên ku bi kardarî *învêst*

dikin, wanra wê zêde bê dayîné». Û wekî mayîn: «Ewên ku *xweyî dikin*, heta ew tiştên biçûk ku li cem heye, wê ji wan bê stendinê”.

Him tiştê ecêbmayînéye, û him jî tiştê tirsêye wekî heger em wî tiştî nekin, çi ku Mayk kir, wedekî dirêj bona Xebera Xwedê da xebatê û Wî va nehate girêdanê, emê destpê bikin xeysetê Xwedê ji wî alîda lê binihêrin, li kîderê em dijîn. Em dikarin Wî ji aliyê civaka meda lê binihêrin, ji aliyê Holîvûdê, îstagramê, ji aliyê prêssayê, ji aliyê bavê berk, ji aliyê ayîna dîn, usa jî ji aliyê fikirdarîya civakî û cêribandina wêda lê binihêrin, ya ku yan li me xweş tê, yan jî li me xweş nayê. Feqet, wextê ku em ji nêzîkva Xwedê û Xebera wî naskin, emê wan fikirên şaş bidine eşkerekirinê.

HEMÛ JÎ BONA PAREVEKIRINÊ HATINE GAZÎKIRINÊ

Pêşkêşa Mayke *parevekirinê* heye: ew nava wê yekêda berbiçeve. Lê em hemû jî gerekê *parevekirin*.

Çawa zelalkirin, îzinê bidin ez vê yekê himberî wê teslîmkirina Îsaye bona dannasînkirina Mizgînîyê li temamîya dinîyayê bikim /bixwînin Marqos 16:15, 16/. Ev temî bona bawarmenda hatîye dayîné. Em hemû gerekê bibin bayloz û tevî undabûyên bi Mizgînîyê pareve bibin. Derheqa wê yekêda usa jî Pawlos dinivîse: «Xebata mizgîndar bike” /B Tîmotêyo 4:5, NLT/, û gotinên wî bona hemû bawarmendane.

Lê belê, qulixek û pêşkêşeke cuda heye, ya ku çawa *mizgîndar* tê navkirinê. Pawlos dinivîse: “Û Ewî... da... *Hinek mizgîndar /bibin/” /Efesî 4:11/*. Ne ku hemû, lê hinek bona vê qulixê hatine gazîkirinê. Ev pêşkêş bi berevkirina rezê merivava berbiçeve. Nava kitêba Karên şandîyada Filîpos çawa mizgîndar tê navkirinê, lê ne ku hemû bawarmend /bixwînin Karên şandîya 21:8/. Bîllî Grêhên, Tî Êl Osboron û Rêynhard Bonkê mizgîndar bûn. Ji wana her yekî, bi alîkarîya koma xwe, rêberîya bi mîlîyona merivî berbi Mesîh kirîye. Wana pêşkêşa ji aliyê Xwedêda wanra dayî, wî cûreyî çendbare kirine, çawa ku Mayk û yên mayîn kirine, derheqa kîjanada min pêşda gilî kirîye.

Mînanî wan, em hemû jî bona *parevekirinê* hatine gazîkirinê, lê hene meriv, li cem kîjana *xarîzma parevekirinê* heye. Ew hema rast wî cûreyî bi *parevekirina* finansava berbiçevin, çawa ku mizgîndar bi qazînkirina merivava berbiçev dibe. Banga vê kitêbê derheqa çendbarekirina pêşkêşên ji aliyê Xwedêda dayîdane.

Lê belê, çawa ku *parevekirina* finansava alîkî çendbarekirinêye serekeye, hetanî dawîya vê kitêbê, ez dixwezim zelal bidime kifşê, wekî ji me her yek bona çendbarekirinê, ya nava *parevekirina* finansada, hatîye gazîkirinê.

Nava 40 salên qulixa xweda ez bûme şedê du bûyarên derheqa finansava

û parevekirinêye êkstrêmal. Ev êkstrêmalî li civînê hukumî li ser gelek meriva dike, û ez bi rastî hêvîdarim, wekî ev hal wê bê guhartinê. Ya ewlin, hene meriv, yên ku didin ku tenê bistînin: ew bi menîyên xwehizîyê zêde dixwezin. Heger em rastbin û hemû tiştî bi navên wan navkin, meriv dikare vê menîyê bi xeberekê şirove bike: *çevtengî* Mixabin ev cûrê fikirdarîyêye şaş alî wê yekê kirîye ku êkstrêmalîya wekî mayîn pêşda bê. Nava wêda hîmlî ew merivin, yên ku dîna xwe nadine mînaka Mayk, ew şewira Xebera Xwedê, kîjanê bi temamî lêkolîn nakin. Ew her hînbûnekê tevlihev dikin, ya ku bawarîya merivaye derheqa parevekirina finansada çê dike. Ev tabî dikare bighîje êkstrêmîzma usa, ku her tiştekî qurbankirinêva girêdayî bide înkarkirinê. Bi texmîn, piştgirên vê fikirê him kardarîya xwe, him jî ya guhdarvanên xwe, didine sînorkirinê. Çawa encamê vê yekê, xebata Mizgînîyê bi tomerî tê sînorkirinê.

Piştî qebûlkirina Îsa, ez û Lîza bûne endamên civînekê, ya ku bi berfirehî derheqa parevekirinêda hîn dikir. Wedekî salên 1980-yî bû, wextê ku gelek meriv diha zêde guhdarîya xwe li ser xwe dabûne merkezkirinê, ne ku li ser mîsîyonêrîyê. Nenihêrî wê yekê, wekî hînkirina civîna me hîmlî ya rast bû, lê rûyê tunebûna xeysetê rastda gelek meriv gelek tişt qurban dikirin, bona ku malên diha mezin bistendana, avtomaşînên diha baş û mezin bistendana, biçûna cîhê hêsbabûnêyî giranbiha û gelek xwestinên xweye xwehizîyê mîyaser bikirana. Meremên wan bawar bikî dîsa ew bû, çawa ku cedandinên gelek bêbawara bû, tenê bi wê firqîyê, wekî wana dîna xwe dida formûla nivîsarên pîroz. Me destpêkêda zanibû, wekî ew nêzîkbûn nebalanskirî bû, lê me nikaribû ew yek şirove bikira ku pirsgirêk kîjan bû.

Bi rastî gotî, piştî bûyîna nava atmosferê wî cûreyîda, ez û Lîza gerekê prosêsa paqijbûnê û gihîştîbûnêra derbaz bûna, bona ku me bi cûrê rast parevekirin lê binihêrîya. Feqet, rêberê wê civînê cîh da rêderketinê û hemû tişt unda kir. Piştî dîtina wê yekê, li cem me tiştekî usa pêşda hat, wekî dihate ber çevê me ku em derbazî halê êkstrêmalîyî wekî mayîn bûna, lê me qîrar kiribû ku meyê bawarîya xwe li Xebera Xwedê bianîya, lê ne ku cêribandina xwe.

Piştî du sala, wextê ku civînê em şandin ku em qulixa xwe destpêkin, ez rastî cêribandineke nebînayî hatim, kîjanê bersiva gelek pirsê da. Ez teglîfî qulixekê kiribûm û ez bona dannasînkirinê hazir dibûm, wextê ku Ruhê Pîroz ji min pirsî: “Kurê min, tu zanî ku *ruhê bawarîyê* çîye?».

Min xwendibû, dannasîn kiribû, guhdarî kiribû û heta derheqa fikirdarîya bawarîyêda jî nivîsibû, lê wextê ku Ruhê Pîroz ew yek ji min pirsî, min carekêra fem kir, wekî tiştekî sa hebû, çî ku min fem nekiribû. Min gotê: “Bawar bikî nizamim, heger usa nîbûya, teyê ji min nepirsîya. Ew çîye?”.

Min bersiva Ruhê Pîroz bihîst: “Ruhê bawarîyê ewe, wextê ku meriv Xebera Min bona mîyaserkirina xwestina xwe dide xebatê. Merivê wî cûreyî

gotinên Min nake, û xwestinên dilê Min bona wî pirsên pêşin nînin. Ew Xebera Min bona kara xwe dide xebatê”.

Ev xeber piştgirî dane wan guhartina, yên ku gerekê piştî bûyîna nava atmosferê xirabda dilê minda bibûna. Ew banga ji Ruhê Pîroz nîşanî min da, wekî em dikarin pareve bikin û serbara serda jî rezên wan bidrûn, lê em wê yekê dikarin bi menîya şaş bikin. Qanûnên Xwedê wê wî çaxî jî karê bînin, heger menîya mêriv rast nîne.

Pawlosê şandî xwelîbêcerkirin da xebatê, bona ku parevekirinê şirove bike, usaye îzinê bidin ku em jî wê yekê bikin. Xwelîbêcerkir dikare bi meremekî toxim bireşîne, bona ku temamîya rez bona xwe xweyîke. Ewê imbarên diha mezin çêke, bona ku wî hemû tiştî zexîreke û wê nikaribe wî hemû tiştî xercke, û wê xwera bêje: “Gelek hebûna te heye, ya têra gelek sala ser hev danî. Hêsave, buxwe, vexwe, şabe” /Lûqa 12:19/.

Caba Xwedê bona wî merivî ev e: “Bêfemo!” /Lûqa 12:20/. Pirînsîpa reşandinê û dirûnê bona wî merivî şuxulî, nenihêrî wê yekê, wekî çawa ku Îsa dide kifşê, ew çevbirçî bû.

Merivekî mayîn jî dikare bixweze ku alî meriva bike û wana bide têrkirinê. Dirûna wîye çawa bêcerkirê axê wê hebe, lê caba wî wê cûrekî mayînbe. Ewê xwera bêje: “Ne tenê xurekê min heye, lê ezê usa jî bikaribim alî meriva bikim, ku ew diha qewat û saxlembin. Ez dikarim merdbim”.

Qanûna derheqa reşandinê û dirûnêda bona herdu meriva jî dişuxule. Wê tişteki bêfikir bûya, heger hemû jî ne bireşandana, û ne jî bidrûtana, çimkî menîya merivê ewlin çevqulî bû. Usa ye, nava padişatîya Xwedêda gelek nava goveka parevekirinêda hema usa kirine.

Werin em diha bi kûrayî gotinên Pawlos lêkolîn bikin. Ew vî cûreyî destpê dibe:

“Ez fikirîm, wekî gerekê hîvî ji bira bikim, ku berî min bêne cem we, wekî wê pêşkêşê, ya ku we soz da, bibînin ku hazire, lê ez dixwezim wekî ew bibe pêşkêşa ku bi rezedilî tê dayînê, lê ne ku bibe ya ku bi nerazîbûn tê dayînê” /B Korintî 9:5, NLT/.

Pawlos eşkere derheqa pêşkêşkirina finansî, yan jî qurbankirinêda dibêje. Ew dîsa prînsîpa xwelîbêcerkirinê dide xebatê, bona ku bide kifşê, wekî Xwedê wê bona parevekira çî bike:

“Vê yekê bîr nekin: ew merivê ku tenê hinek toxim direşîne, wê rezê hindik bistîne. Lê ewê ku bi merdanî direşîne, wê gumreh jî bistîne” /B Korintî 9:6, NLT/.

Heger menîya parevekirinêye tek-tenê alîkirina merivaye, wî çaxî bona çî Pawlos derheqa wê yekêda dibêje, wekî nava parevekirinêda emê rez bistînin? Gelo xwestina duem, ya çendbarekirinê heger hebe şaşe, ya ku wê alî bike, ku xwestina here pêşin bidine gurkirinê û berfirehkirinê, çêkirina jîyanên merivaye bona padişatîya Xwedê? Diqewime wekî Pawlos bawarmendên civîna korintîyaye nû hîn dikir, ku kardariya xwe çendbare bikin, çawa ku Îsa ew yek şagirtên Xwe hîn dikir, mesela derheqa talantada gilî dikir? Meriv dikare bêje, wekî Pawlos ber dilê wanda dihat ku ew bi qencîyêva bihatana rêberkirinê, lê bi wê yekêva tevayî învêst bikirana, bona ku duayê diha mezin bibûya?

Ez li ser wê fikirême, wekî menîya Pawlos hema ew bû, çimkî ew xebera xwe vî cûreyî berdeyam dike:

Her kes gerekê bi xwe dilê xweda qirarke ku çiqaşî pêşkêş bike. Û bi nexwestin, yan jî bin hukumda nedin. “Çimkî Xwedê merivê usa hiz dike, yê ku bi şabûn dide”. Û Xwedê wê wî hemû tiştî bi merdanî bide, hewcê kîjanêne hûn. Û *hemû tiştê* weye bona we *pêwîst* wê hebe, *û gelek zêde, bona ku tevî yên mayîn hûn parevebin*” /B Korintî 9:7, 8, NLT/.

Guhdariyê bidine ser wê yekê, wekî li vir du tişt dibin. Hewcetîyên şexsî wê bêne tijîkirinê, lê Pawlos usa jî başqe dide kifşê, wekî wê “*Gelek zêde hebe, bona ku hûn tevî yên mayîn parevebin*”. Karebûna meye merdbûnê çendbare dibe, çimkî em învêst dikin, yan jî toxim direşînin. Nava xeberên peyîra ev menî diha zêde îzbat dibe:

“Çimkî Xwedê bona mêriv toxim dide, û nan dide bona xwerinê. Hema wî cûreyî jî Ewê bide û wê *mecalên we zêdeke* û wê dirûna *merdanîyê* mezin bide. Belê, hûnê her alîva dewletîbin, bona ku bikaribin *ku her dem merdbin* /B Korintî 9:10, 11, NLT/.

Pawlos mexsûs dibêje, wekî bi saya parevekirinê Xwedê wê *mecalên we bide zêdekirinê*, bona ku hûn bikaribin *her dem merdbin*. Ev rastî ne tenê derheqa wandane, yên ku pêşkêşa parevekirina fînanza stendine: ew derheqa her bawarmendekîdane. Eva qanûna ruhanîye, ya ku Xwedê zûva îzbat kirîye.

Wextê ku min û Lîzayê şuxulkarîya qulixê destpê kir, kara meye salê 18 000 dolar bû. Me bi dijwarî heqên xwe didan. Ez nava qulixêda bûyîna meye Pîroze ewlin bîr tînim. Me bi mecbûrî perên xweye hindik dane xebatê, bona ku me matêriyal bikirîyana, bona hazirkirina pêşkêşên bi desta çêkirî. Perên ku cem me hebûn, îdî bona tu tiştî têrê nedikirin.

Piştî du sala, serwêrê me qurbanîya mexsûs berev kir. Me jî dixwest ku

em tevî wê însîyatîva qulixdarîyê bibûna, bona kîjanê ew dihate berevkirinê. Û Xwedê gote me: “1000 dolarî bidin”.

Nava du salên pêşinda me pere paş dixistin, bona ku me hinek berev bikira, bona maleke biçûk. Me 1800 dolar berev kiribûn û ew hemû perên me bûn. Mecalên meye başqe tunebûn, ji kîjana me bikaribûya bida xebatê. Heger me ew pere bikirana qurbanî, temamiya hebûna me wê bima 800 dolar. Li ber çeva bû, wekî berevkirina meye nava du salada wê rûyê qurbankirinêda bihata kurtkirinê. Gerekê dîsa sal derbazbûna, hetanî ku me bikaribûya hinek pere bona kirîna malê berev bikira. Lê belê, me ew pere kirine qurbanî, çimkî me dixwest hukumê xwe nava jîyana merivada bihişta. Me jî dixwest ku em diha merd bûna. Me ji Încîlê zanibû, wekî mecala tek-tenê, ya bona zêdekirina karebûna parevêkirina me, çendbarekirina perên meye hindik bû.

Sal derbaz bûn, û me îdf karibû tiştên zêde pêşkêşî meriva bikira, ne ku zembîlên biçûk û pêşkêşên bi desta çêkirî. Tenê îsal, bona mîsîyayê, me ji 50-î carî zêdetir himberî qurbanîya xweye ewlin daye. Em dixwezî her roj diha zêde hukumî li ser meriva bikin. Xwedê karebûna me çendbare kir û bona merdbûnê qewat da. Tercima “Şabûn” bi cûrê bedew vê rastîyê raber dike:

“Xwedêyê merd, bi merdanî toxim dide mêriv, yê ku bona xurek dibe nan, diha zêde merde hindava weda. Berê ewlin, ew hemû hewcetîyên we tijî dike û hê zêde. Lê paşê toxim çendbare dike, wextê ku hûn direşînin, bona ku dirûna merdanîya we zêde bibe. Hûnê her alîva dewletîbin, wextê ku hûn bi merdanî hemû tiştî pareve bikin” /B Korintî 9:10, 11, TPT/.

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî Ew hindava meda gelekî merde. Ewê wê învêstîsîyayê *çendbare bike*, kîjanê em bona çêkirina padişatîya Wî dikin, bona ku *merdanîya me zêdebe*. Em hesabên xweye li Ezmîn zêde dikin, li kîderê bizûz û jeng xirab nakin, û diz bi şikêrandin nakevine hundur û nazizin. Feqet emê usa jî ji vê jîyanê hesaba hildin. Belê, heqdayîna heta-hetayê heye, lê hesab jî heye, kîjanî em zêde dikin, bona ku em li vê dinîyayê jî merdbin. Pawlos gelekî zelal derheqa wê yekêda got û bawarmendên Fîlîpîyêra nivîsî:

“Ne ku ez dixwezîm, yan jî hazirim pêşkêşa [we] bistînim, lê ez dixwezîm û hazirim wî rezî bibînim, yê ku kîsî we zêde dibe. [Dirûna dua, ya ku kîsî we zêde dibe]” /Fîlîpî 4:17, AMPC/.

Mînanî wan meriva, hesabên kîjanaye banka, fonda û hesabên învêstîsîya hene, usa jî hesabên hemû bawarmendaye Ezmana hene. Bi saya wî hesabî,

em dikarin kardarîya xwe çendbare bikin, bona li vê dinîyayê çêkirina padişatîya Xwedê. Gelo wê çi biqewime, heger hemû bawarmend derheqa vê qanûna ruhanîda pê bihesin, fem bikin û bawarîya xwe lê bînin? Emê diha lez bi Mîzgînîyê bighîjine vê dinîyayê. Niha eyane ku bona çi dijminê padişatîya Xwedê bi her cûreyî dicêribîne îzinê nede bawarmenda ku toximên finansî biçîne?

Ez û Lîza hevalên jin û mêrekî, Fîlî û Danayêye nêzîkin, yên ku parevekirên zorin. Ew nivê kara xwe dikine qurbanî. Tenê van axirîya wana 100 000 dolar pêşkêşî qulixdarîkê kirin, bona projeya mizgîndarîyê. Piştî du roja, wana dîsa 100 000 dolar bona projeya qulixdarîke mayîn pêşkêş kirin. Ez wê yekê zanim, çimkî qulixdarîya duem “Mêsîncêr întêrnêşînil” bû.

Fîl karê xwe gelek sal pêşda destpêkir. Ew li ser dereca navîn bû û ji dereca here bilind gelekî dûr bû. Lê belê, 25 sal pêşda Fîl û Danayê soz dan, wekî piştî sê sala wê 250 000 dolar pêşkêşî qulixdarîkê bikin. Ew yek tê bêjî tiştê bûyîne nîbû, lê wana dixwest, wekî Xwedê tevî karên wan bûya.

Karê Fîl carekêra bû, lê ewî texmîn nedikir ku bi rastî karên wî çiqas baş bûn. Piştî sê meha, ewî fem kir, wekî li ser hesabê wî 250 000 hezar dolarên zêde hebûn. Wî cûreyî ewî û Danayê qîrar kirin carekêra sozê xwe biqedînin, dewsa dayîna wan peraye nava sê salada. Ewî gote min: “Con, ew yek wî çaxî bû, dema ku me destpêkir perên mezin pêşkêş bikin”.

Mînanî Mayk, ew jî nexwestin bisekinin. Ew pêşda çûn, wextê ku sekinandin diha hêsa bû û hesabê wanî ezmana mezin bû, gihîşte çapeke usa, derheqa kîjanîda qet nikaribûn xewnêda jî bidîtana. Gelo ev yek usa jî derheqa we û minda nîne? Pawlos zelal dibêje me:

“Tu cara şikber nîbin, wekî qewata Xwedêye mezin wê nava weda bişuxule û wê hemû tiştî bighîne dawîyê”. Ewê bighîje zêdaya bêşînor, ji xwestina we zêdetir û wê ji fikirên weye mezin zêdetirbe. Ewê ji wî hemû tiştî derbartzirbe, çimkî qewata Wîye ecêb her dem gewatê dide we” /Efesî 3:20, TPT/.

TERŞLÊKETIN

Bi sala ser hev, bi bûyîna nava qulixêda, ez hîn bûme, wekî emê him nava *xarîzmayê*, him jî nava *parevekirina finansîda* bêne cêribandinê. Dikare wedekî usa bê, wextê ku tu çapxanek kitêba weva hewaskar nîbe, û ew yek dikare çend sala bikişîne. Hûnê derheqa terşdayîna wî karîda bifikirin, çimkî we xebateke bi kel û ced kirîye, lê ew kitêb tê bêjî ji alîyê tu kesîda nayê qebûlîkirinê, û hûn tu guhartînekî nabînin. Lê belê, hûn dîsa bi gurêkirinê hîvîyê disekin. Û nişkêva terklêketin dibe.

Yan hûn dikine qurban û dîsa dikine qurbanî, lê hûn dirûna lez nabînin, û tê bêjî halê weyî fînansî gelekî xirabe, bona ku hûn dîsa bikin qurbanî. Lê nişkêva Xwedê wera xeber dide, mînanî Mayk û hûn dîsa gurêda dimînin, nenihêrî wê yekê, wekî li ber çevê we ew yek tiştê bûyîne nîne. Hûn dibine sedê terklêketinê û dikevîne dereca parevekirinêye başqe.

Terşlêketin çî ye? Ferhenga onlayn, ya «Dictionary. com» -ê, vê xeberê vî cûreyî şirove dike: “Kirinek, yan jî bûyareke usa, wextê ku dijwarî, yan qedexek tê dûrxistinê». Vê yekê bînin ber çevê xwe: av bi dîwarê imbarêva sînorkirîye. Dereca avê bere-bere bilind dibe, lê dîwarê imbarê dîsa nahêle ku av derbazbe. Nişkêva li ser dîwarên imbara avê, terk pêşda tîn: piştî wedekî kurt av nişkêva derdikeve. Imbar xirab dibe û av aza dikişê li wir, li kîderê pêşda pêşîya wê hatibû birînê. Eva terklêketine.

Dawidê padişa dibêje: “Xwedê dijminên min bi destê Xwe mînanî terşa ava qelaşt /yan jî “terk” lêxist/” /A Dîrok 14:11/. Bilindbûna avê sembola rastîya gurêkirina meye, lê piştî terklêketinê ava ku dikişê, sembola rezdayîne, yan jî zêdayêye.

Çi ku derheqa hevalên me Fîl û Danayêdane, Fîl gote min, wekî piştî pêşkêşkirina 100 000 dolarî karê wan nava hevtêkêda gelekî baş bû, wekî wana dîsa 100 000 dolar qazinc kirin û hela tiştê jî zêde. Awa terklêketin çî cûreyîye. Destpêkêda jîyana wan wî cûreyî nîbû: wana ser hev qurbanî dikirin, lê carekêra dirûna mezin nedidîtin. Lê piştî gelek sala, wextê kîjana wana diçand, terklêketin pêşda hat û tê bêjî dirûn wî cûreyî tê, çawa ku çandina wane. Eva mîyaserbûna xeberên Amosê pêxembere: «Wedeyê bê, - Xudan dibêje, - wextê ku genim û tirî wê diha lez bighîjin, ne ku wana pêra bighînin berevkin” /Amos 9:13, NLT/. Ev rastî bi cûrê bedew nava tercimeke başqeda hatîye raberkirinê:

“Vaye, roj tîn, -Xudan dibêje, -
Gava ku cotkarê bighîje kêlendîkêş,
Û ewê ku tirîya dipelçiqîne wê bighîje yê ku diçîne.
Çîya wê bi şeraba şîrin dilop bikin,
Û gir wê biherikînin”.

Kêlendîkêşê awqasî bidrû, wekî yê ku diçîne wê bighîje wî.

Ewên ku tirîya dipelçiqînin, wê hê rezê pêşda berevkirî bihelçiqînin, lê cotkar wê îdî xebata xwe bona sala tê destpêkin. Eva mînaka feydayê mezine. Xwestina him cotkara, him kêlendîkêşa, him jî ewên ku tirîya dipelçiqînin çêkirina şerabêye. Awa feydayê wan çî cûreyîye: «Şerabê her dem bikişê, ewê nesekine: wedê tunebûna rez îdî wê tunebe” /şirovekirina xudanê kitêbê/.

Nava *xarîzma* û *paravekirina meye fînansîda* êtapeke usa heye, wextê

ku ev yek diqewime. Ev yek hate serê Mayk, usa jî serê Fîl û Danayê. Çi ku derheqa “Mêsîncêr întêrnêşînilêdane”, nava van salada me bêhesab şedetî derheqa wê yekêda stendine, wekî jîyanên meriva, bi saya matêrîyalên ji alîyê meda çandî, hatine guhartinê. Tirî diha lez dighîje, ne ku ewî pêra dighînin berevkin.

Gelek meriv, hinek wext pêşîya berevkinê, teslîm dibûn. Ew rûyê nestendina feydayên ku ew dixwezî teslîm dibin. Çawa ez, usa jî Lîza, me bi hêsanî dikaribû berbirî fikirdarîya rast û logîkayê bûna û me dengê Ruhê Xwedê hesab hilneda. Bona perê malêyî pêşda, ya here kê 5.000 dolar lazim bû, çimkî mal gelekî mera lazim bû. Pîranîya malên bajarê meye bedew bi merivên gihîştîva cîhwarkirî bûn, û ew mal bona jîyana tevî zaroka fesal nîbû. Em dikaribûn bifikirîyana: “Pêşda emê malê dest bînin, lê paşê emê berevkin û emê wan pera pêşkêşî projeke qulixdarîyêye mayîn bikin. Me dikaribû ew mecala baş, ya bona învêstkirina nava padişatîya Xwedêda û zêdekirina mecalêd me, unda bikira.


Alîyê vê serhatîyêyî ecêb ewe, wekî piştî şeş meha 5.000 dolarên me îdî hebûn. Lîzayê ji hesabekî bankê pere stendî, yê ku bavê wê vekiribû, lê wî çaxî em derheqa wê yekêda haj pê tunebûn. Bi wê yekêva tevayî, du meriva, yê ku derheqa hewcetîya meda zanibûn, 2.000 dolar pêşkêşî me kirin. Negihîştibû salekê û em îdî mala nûda bûn. Eva ecêb bû û bona pêşxistina bawarî û sebira xwe, diha baş bû me bidîta ku çawa Xwedê wî çaxî da me, wextê ku ew yek tê bêjî “ne tiştê bûyîne bû”. Ez bawar nakim, wekî ew yek bibûya heger me ew 1.000 dolar xweyî bikira, wextê ku Ruhê Pîroz gote me ku em wî 1.000 dolarî pêşkêşkin.

Niha emê bi serwaxtî bişuxulin, heger em vê eşaretîyê qebûlkin. Em gerekê nava vê pirsêda li ser xwe guman nîbin. Ez çî dixwezîm bêjim? : Em gerekê Hevalkarê xwe bigerin, şêwira Ruhê Pîroz. Ew dibêje me: “Ezîm Xwedêyê te, wekî te hînî stendina karê dikim, wekî li ser rîya teye çûyîne rêberîyê li te dikim» /Îşaya 48:17/. Heyîna wijdanê rast /çimkî Ruhê Pîroz li wir me ronayî dike/ û kirina gura gotinên Wî gelekî girînge, çimkî Ruhê Pîroz rêberîyê li me dike, bona ku em karê ji învêstîsîyayên meye nava padişatîya Wîda kirî bistînin. Meyê ew 1.000 dolar pêşkêş nekira, heger Ewî dilên meda derheqa wê yekêda negota.

Hene meriv ku şêwira Wî nabhên. Hene meriv jî ku nikarin şêwira Wî guhdarkin, çimkî gelek cara wana Wîra gotine “na”. Wijdanê wan îdî texmîn nake. Heger hûn wî cûreyîne, wî çaxî tobekin û hîvî bikin, ku Ew bona fetisandina dengê Wî bibaxşîne li we. Wî çaxî texmînkirina we wê carekêra paşda vegere. Ew zû dibaxşîne. Lê paşê gotinên Wî guhdarkin û dîna xwe bidinê, û îzinê nedin, wekî dengê mayîn we paşda bigre.

BIFIKIRIN

1. Xwedê hizkirina Xweye hindava merivada kirîye dilên me, û bo wê yekê jî nava meda xwestina *pareveirinê* û *qulixkirinê*ye bi cûrê xwepêşkêşkirinê heye. Niha hûn çî cûreyî pareve dikin qulixî meriva dikin? Hûn bi cûrê efrandarîyêye çî cûreyî dikarin nava govekên parevekirinê û qulixkirinêda pêşda herin?
2. Parevekirina bi cûrê serwaxt ne tenê çawa qurbana pêşkêşa hizkirinê û qulixkirinê, lê usa jî çawa *învêstîsîya* tê lênihêrandinê. Nava encamê parevekirinê û qulixkirinêda hûn dikarin hîvîya paşdahatîna *învêstîsîyayên* çî cûreyîbin? Nêzîkbûna weye hindava parevekirinê û qulixkirinê çî cûreyî tê guhartinê, gava ku hûn wê yekê çawa *învêstîsîya* dibînin?
3. Hûnê nava *xarîzma* xwe û *parevekirina fîmansîda* bêne cêribandinê. Wextê wan cêribandîna wedê usa wê hebe, wextê ku hûnê texmînkî, ku berevkirina rez derengî dikeve, lê xebat jî bêfeydaye. Dema ku hûn dixwezî terka hemû tiştî bidin bersiva we gerekê çî cûreyîbe? Hûn bona pêşdaçûyîna çawa ber dilê xweda tî?



“Xwedê ji pircûretîya pêşkêşên Xweyên ruhanî, ji we her kesîra pêşkêş daye. Wana bi kardarî bidine xebatê bona qulixkirina hevdura”.

– A Petrûs 4:10, NLT

10

Alîkar

Nava vî serê kitêbêyî serekeda ezê derheqa wê yekêda xebardim, çî ku *bi kardarî alî çendbarekirinê* dike. Bi xebitandina xebera “*kardar*” ez dixwezim derheqa çendbarekirina usada bêjim, ya ku heta-hetayê dimîne.

Alîkar faktora sereke ya guhartina îş, yan jî lezêxistinêye /şirovekirina min ji ferhengên cûre-cûre hatîye hildanê/. Me hemûya jî pêşkêş standine, lê qewata mayîna wana bi wê ykêva tê xebitandinê, derheqa çida Petrûsê şandî dibêje: “*Bi kardarî wana bidine xebatê... bona qulixkirina*”. Alîkar qulixkirine, lê qulixkirina rast her dem ji hizkirinê pêşda tê. Pawlosê şandî dinivîse:

“Çimkî em li ber Bav û Xwedêyê me bîr tînin, ku hûn çawa bawarîyê didine xebatê, çawa *hizkirina we we berbi qulixkirina bona yên mayîn dibe*” /A Têsalonîkî 1:3, TPT/.

Qulixa rast ji dilê ku bi hizkirinê dişuxule, dertê. Ew beşera hundure, ya ku rûyê tengasîya, dijarîya, yan jî halên xirabe mayîn nayê guhartinê. Carina ew bi xebera, lê diha gelekî bi kirina tê kifşê.

JINA KU ÎNDEWIR DIFROTIN

Ezê mînanekî derheqa qulixkirinêda bînim ber çeva, ezê serhatîkî gilîkim. Ew jin û mêr, derheqa kîjanada ezê gilîkim, hevalên meye nêzîkin, lê wana hîvî kir ku navên wan nedin. Dêmek, anegorî hîvîkirina wan, ezê navên li ber xwe derxistî bidime xebatê.

Raylî û malxwê wê Dêyv li bajarekî Ştatên Yekbûyîyê herî mezin dijîn. Ew li rex bajêr dijîn. Hevdîtina wan pêşda qirarkirî bû, çimkî ew li rex hev dijîtin.

Piştî zewaca wan hindik wede derbaz bibû, Raylî difikirî ku bona çî hemû civîn, cîhên bona merivên bêmal û teşkiletên xêrkirinê xwerin û pêşkêş tenê wextê bûyîna Pîroz didan, lê wextê cejina Razîbûnê tu tişt nedikirin. Ew li ser

wê fikirê bû, wekî cejina Razîbûnê girînge, çimkî ew cejina malbetêye û ew bi edetî dora sivira şîvê dide berevkirinê. Gelek dayîk, merivên seqet û bêmal nikarin sivira cejinê hazirkin, yan jî tevî nanxwerina cejinê bibin. Ew li ser wê fikirê bû, wekî îdarên ku xwerina germ didin, şuxulekî pêwîst dikin, feqet nava wanda ew atmosferê nêzîkayê tune, ya ku dikare xwerina malê bona malbetê çêke.

Raylîê digot: “Ji me her kes dikare tesîrê bihêle, lê bi hevra, tevayî tesîra me diha mezine”. Ew kitêba Pîrozra baş nas bû û zanibû, wekî cedandinên wane tevayî /ya wê û malxwê wê/ bi deh cara zêdetir diha kardarin, ne ku cedandinên merivekî /bixwînin Q. Ducarî 32:30/. Ewê usa jî baş zanibû, wekî wextê ku diha zêde bawarmend bona îşekî dighîjine hev, feydayên wî îşî diha zêde dibin. Ew bi dil dîsa nava rastîkêda hêvîdar bû: qulixçiyên rast hazirin nava komêda qulixkin, û pêra jî derheqa wê yekêda nefikirin, wekî xebat hema xût ya wan nîne. Tabîya Raylîyê ev tiştên bona çendbarekirinê dide kifşê.

Wextê cejina Razîbûnêye ewlin, bona teşkîlkirina tiştêkî, Raylîyê pere ji malbeta xwe û hevalên xwe bona kirîna aloqa berev kirin. Li cem wê fikirdarîya çendbarekirinê hebû û bo wê yekê jî ew û Dêyv bi mecalên xweva soz dan ku her dolarekî berevkişî dubare bikin. Ewê salê wana 11 aloq kirîn û bênav ji avtomaşîna Raylîyê belav kirin. Sala duem hejmara aloqa gihîşte 31-ê.

Sala sisîyada wê jinê gote malbeta xwe û hevalên xwe wekî ew dikarin derheqa wê yekêda hevalên xwera gilîkin, lê bi wî qewilî, ku derheqa wanda bîr neynin. Wana ew yek kir û ew program gelekî lez belav bû. Hetanî sala pêncê, wana qulixî 500 malbeta kir û pêra jî karibûn li ser her pêşkêşekî du derdanên girtî xwerinê belavkin.

Wî çaxî ewê ne bi fermî peymanê belavkirinêye *bênav* tevî “Eskerê xilazkirinê” mor kir. Ew teşkîleta xêrkirinê tevî qulixdarîyên dewletêye sosîy-alî hevkarîyê dike û ewê şuxulkarîya raberkirina erza teşkîl kir, bona dîtina merivên nava hewcetîyêda. Merivên usa hatine bijartinê, mocala kîjana stendina tu tiştî tunebû /çêkên xurek, programên dewletê û tiştên mayîn/. Raylîyê û koma wê cîhê parevekirina xurek nava têrîtorîya teşkîleta “Eskerê xilazkirinê” da saz kirin.

Geleka tiştên cûre-cûre li br xwe derdixistin, bona ku xwerina pêwîst hildana. Ewana tevî xwe zembîl, yan jî erebe dianîn, yan jî hîvî ji cînarên xwe dikirin, ku wana bi erebê bînin, yan jî bi çerxesîyarê dihatin yan jî peîya dihatin aloq, û xwerina başqe jî distendin. Gelek cara ew ji cîhên dûr dihatin û mecbûr dibûn rêya dirêj derbaz bûna û paşê paşda vedigerîyane cîhê mayîna xwe malê, li wê parkê, yan jî cîhekî vekirî, li kîderê ew diman. Merivekî bêmal hîn bibû, ku aloqê bona xwe û hevalên xweye bêmal bi aparata qelandinêye wêda avîti û balonê gazê çêke.

Bi kutasî ew belavkirin awqasî mezin bû, wekî cîhekî nû pêwîst bû, bona ku bo gelek mervî qulix bikirana. Li rex wî cîhî têrîtorîyake mezin hebû, ya ku vala bû û ew ya “Asosîyasîya mesîhîtîyêye merivê ciwan” bû. Feqet heleqetîyên wê teşkîletêye tevî teşkîleta “Eskerê xilazkirinê” ne baş bûn. Wê hewcetîyê usa kir, wekî ew herdu teşkîlet jî heleqetîyên xweye xirab hesab hilnedan. Ew li hev hatin, û destpê kirin tevayî li ser projey Raylîyê bixebitin, usa jî li ser projeyên mayîn.

Her sal armanca Raylîyê û Dêyv ew bû, ku belavkirina sala nû ji ya derbazbûyî zêde bikirana. Wana qîrar kir, wekî li nehîya wan wê tu kes bêyî şîva Razîbûnê nema. Hejmara wan meriva ku ew alîkarî distendin, çiqasî zêde dibû, awqasî ew belavkirin tevîhev dibû û dijwar dibû, xwezima rûyê bilindbûna bihada, usa jî rûyê wê yekêda, wekî hinek heval nedixwestin tevî programê bibûna, yan jî cîguhastî dibûn. Raylî û Dêyv bi finansî diha qewîn bibûn û nedixwestin, wekî pêşkeftina wan biseknîya: Dêmek wana qîrar kir ku bi mecalên xweva her dolarekî pêşkêşkirî sêbare bikin /çawa fikireke ji der, tiştê ecêbmayînê nîne, wekî halê wanî finansî nava wan şeş salada diha qewîn bibû. Xwedê parevekirina wan çendbare dikir, bona ku ew diha kardarbûna/.

Bi gotina Raylîyê, “Bi rêyên cûre-cûre, Xwedê her dem ji kanîyên cûre-cûre finans didane me û mecalên me her dem zêde dibûn”. Ew yek tiştê ecêbmayîneye, wekî hema destpêkêda Raylî û Dêyv qîrar kirin wekî ewê bi programên dewletê, yan jî ji hevaltîyên mezin tu tiştî qebûl nekin. Ew hemû mecal gerekê ji malbetê, ji hevala û hevalên hevala bihatana stendinê”.

Tevî mezinbûna belavkirina, usa jî dijwarîyên nû pêşda hatin. Nava rojekêda îdî nikaribûn aloq belav bikirana, çimkî hejmara meriva gelekî mezin bibû. Raylî û Dêyv mecbûr bûn bona belavkirinê rojekê jî zêdekin, lê wê yekê dijwarîke başqe pêşda anî:ew aloq wê li kîderê xweyî bikirana, yên ku wê bona belavkirina rojtira mayîn bimana? Raylî bersiva wê yekê digerîya. Nîvê şevê dikaneke xureke mezin, ji kîjanê wana hemû aloq distendin, pêşniyar kir ku belaş imbarên wane sar dikarin bidine xebatê. Vê carê wana îdî dikaribû temamiya pera li ser xurek xerc bikirana, lê ne ku li ser xweykirina xurek.

Gelek dijwarîyên başqe jî hebûn, yên ku hatine altkirinê û ew awqasî gelek bûn, wekî meriv nikare hemûya bide rêzê. Bawarîya Raylîyê û Dêyv gelekî qewat bû, û ew neşikestin û li ser tabîya xwe man. Dema ku ew rastî tengasîya dihatin, wana dua dikir, gazî Xwedê dikirin, fikirên stratêcîye ruh-darbûyî distendin û li cem wan meriva qencî didîtin, yên ku dikaribûn alî wan bikirana.

Eva îdî serê 26 salaye ku ew vê qulixê dikin û tenê îsal, wextê ku ez vê kitêbê dinivîsim, îdî 10.500 malbet têr kirine /yan jî 42.000 meriv, heger malbetek ji çar merivêbe/. Raylîyê û Dêyv her merivekî feqîrî li temamiya

nehîya wan û piranîya merivên feqîre li du nehîyên li rex wan têr kirine /bîr bînin, wekî gilî derheqa bajarekî Ştatên Yekbûyîyî mezindane/. Bona kirina vê xebatê, wana pênc avtomaşînên barbare dirêj /her yek 15 mêtir/ bi aloqa tijî kirine û dîsa sê avtomanînen wî cûreyîye başqe bi xwerineke başqeva tijî kirine. Ji 200 rezedilvanî zêdetir gihîştine vî karî, ji kîjana gelek meriv çend roja ser hev, bêyî hêsbûn, xebitîne. Gelek rezedilvan tevî Raylîyê ji destpêka vî karîda xebitîne. Û tiştê ecêbmayîne ewe, wekî piranîya wan hetanî niha “wê jina ku aloqa pareve dike” nas nake.

Wê tiştê nebûyînebe ku wan hemû ecêba, serhatîya û şedetîyên derheqa guhartina jîyanada bînin ber çeva, yên ku bi saya çendbarekirina Raylîyê û Dêyv qewimîne. Bêhesab meriv Îsa qebûl kirine, nava kîjanadanin usa jî Raylî û Dêyv, û gelek paşda vegeyîyane berbi bawarîyê. Malbet li hev hatine û gelek ruhdar bûne, dikevîne nava kîjana xebatkarên dewletê, xebatkarên dikanên xurek, endamên teşkîletên “Eskerê xilazkirinê” û asosiyasiya mesîhîtiyêye merivên ciwan û rezedilvan, usa jî merivên ku li wê nehîyê dijîn.

Îzinê bidin, ku ez çend serhatîyên kurt rabeî we bikim. Hevalekî Raylîyê li klûba motosîklîstaye cîh dixebite. Hersal ew hîvî ji endamên klûbê dike, ku bona jina ku aloqa belav dike, pêşkêşkirinê berevkin. Gelek cara ew bi hevra dikevîne nava lehcê, bo ku bibînin ku kî diha zêde pêşkêş dike. Sala derbazbûyî, piştî cejina Razîbûnê, Raylîyê û Dêyv elametîk stendin, wekî sala tê, wextê cejina Razîbûnê, klûba motosîklîsta wê pêşkêşkirina xwe bi 3000 dolara zêde bike.

Salekê, jina ku aloqa belav dike, qirar kir ku perê zêdebûyî pêşkêşî civîneke cîh bikin. Ew civîn ruhdar bû û qirar kir nimûna progirama Raylîyê bide xebatê û progirama xwe destpêke, bona ku alî feqîra bike, him wextê cejina Razîbûnê, him jî nava temamiya salêda.

Endamên “Eskerê xilazkirinê”, yên ku cîguhastî ştatên mayî bûn, hazir bûn progiramên anegorî nimûna progirama Raylîyê destpê bikirana. Merivên başqe, yên ku cîguhastî wî cîhî bibûn, bêsebir dixwestin derheqa wê qulixêda bizanibûna, çimkî serhatîya Raylîyê bi destî qulixçiyên “Eskerê xilazkirinê” bihîstibûn.

Raylî serwêr nîne: ev jin tu civînekîda naxebite, ew bîznêsmên nîne û seroka tu hevaltîke mezin nîne. Ew jine, dayîke û bawarmenda xwepêşkêşkirîye, ya ku bi aminayî diçe civînê. Ew derheqa wê yekêda baş zane, wekî ew qulixî Xwedêyê herî zor dike, Yê ku bi saya çendbarekirina Xwe şabûnê texmîn dike. Bona min qedire, ku ez hevalê Raylîyê û Dêyvim.

MESELA MEZIN, YA ÇENDBAREKIRINA HETA-HETAYÊ

Qulixa ji hizkirinê alîkara çendbarekirinêye. Em niha çend mînakên Încîlêye çendbarekirinê lê binihêr'in. Bêguman, kitêba Pîrozda mesela çendbarekirinêye here berbiçev Îsaye. Ew dibêje:

“Heger hûn dixwezn bibin yê herî mezin, çawa meriv bijîn, yê ku bona qulixkirina bo yên mayîn hatîye gazîkirinê. Rîya stendina pêşdaçûyîne û berbiçevbûnê ji heyîna dilê xulam destpê dibe, yê ku qulixî hemûya dike. Çimkî hetanî Kurê Mêriv jî bi hêvîdarîya stendina qulixê nehat, lê bona *qulixkirina bo hemûya* û emirê Xwe, çawa heqê xilazkirinê da bona xilazbûna geleka» /Marqos 10:43-45, TPT/.

Îsa rîya mezinayêye rast nîşan dide, wextê ku em berbi qulixkirinê divedînin, ne ku qulixê bistînin. Tiştê ecêbmyîne nîne, wekî Ew qulixa Xweye here mezin vî cûreyî şirove dike: “Ez rast bêxêlif wera dibêjim, heger heba gênim nekeve erdê û nemire, ewê tenê bimîne, lê heger ew bimire, wê gelek ber bide” /Yûhenna 12:24/. Ez careke mayîn bêjim, ku em derheqa *çandinê* /yan *învêstîsyakirinê*/ û *dirûnê*da guhdar dikin. Çawa ku hebekî gênim, yê *învêstîsyakirî* gelek hebên gênim dide, usa jî gurêdabûna Îsa nava qulixkirinêda gelek kur û keçên Xwedê dan. Gelo meseleke çawaye! Ewî rê rast kir û nîşan danî, da kifşê, wekî çi cûreyî em gerekê bi kardarî çendbare bikin. Îsa dibêje:

“Hûn Min nav dikin çawa “Dersdar” û “Xudan”, û hûn rastin, çimkî Ez ewim. Û çimkî Min, Xudan û Dersdarê we, lingên we şûştin, hûn gerekê lingên hev bişon. Min *bona dînxwedayîne*, mesele da we. Usa bikin çawa ku Min hindava weda kir” /Yûhenna 13:13-15, NLT/.

Çawa reber, terîfîkir, û xudanê nivîsara, ez girîngîya *xebera dawî* zanim. Eva ew gotin, yan jî bange, kîjanê hûn xwendevan, guhdar, şagirt, endamê komê, xebatkar, zaroka xwe, yan jî her merivekîra dihêlin. Eva fikira serekeye, wekî hûn dixwezînin ku guhdarên we bîra xweda xweykin û pêşda herin.

Gotina Îsaye dawî, ya wextê ku Ew li vê dinîyayê bû, kîjan bû? Tiştêkî he-waskare, wekî pêşîya xaçbûna Xwe, Ewî bangek bi mesela praktîk dannasîn kir: Ewî lingên peyîhatîyên Xwe şûştin.

Ezê tevî we zelal bim: wextê ku ez ji nûva bibûme bawarmend, min ew yek qebûl nedikir, wextê ku komeke biçûkda yekî ev tişt pêşniyar dikir: “Werin em lingên hev bişon”. Wî çaxî min menîk li ber xwe derdixist, ku zû ji wêderê birevîyama: li min xweş nedihat, wextê ku destê mêra lingên min diketin.

Piştî çend sala min sivikayî texmîn kir, wextê ku min fem kir, wekî şûştina linga diha gelekî edet bû û hevalên min dîna xwe didane wê yekê. Mesela rex wêda ewe, wextê ku Mûsa mar darva darda kir /bixwînin Jimar 21:8, 9/, û gava mar merivekî dixist, ewî li marê ji sifir çêkirî dinihêrî, birîn qenc dibû. Ew tiştêkî ecêb û hukumdar bû. Lê belê, piştî gelek nisileta, Îsrayêlê ew mer xwera kire heykel /bixwînin D Padişatî 18:4/. Wana guhdarîya xwe dane li ser wî tiştî, dewsa wê yekê gerekê fem bikirana, wekî fikira wê serhatîya ku çend sal pêşda qewimîbû, mîyaserkirina temîya Xudan bû.

Salên 1980-yî em nava komên lêkolînkirina Încîlêye biçûkda bi wê rêyê diçûn. Me lingşûştin şaş fem dikir û me şaş ew yek dida xebatê. Me diha zêde guhdarîya xwe li ser wê kirinê dida merkezkirinê, ne ku li ser fikira wê. Sedsala ewlinda rê hela hê selkirî nîbûn, xêncî peîyaçûyîne, heywan mecala transportêye tek-tenê bû, û solên sportêye mînanî “Adidas”-ê “Nayk”-ê tunebûn. Meriva sandal pê dikirin û gelek cara jî sol pênedikirin: dêmek, herî, qirêja heywana û qirêja başqe lingên merivava digirtin. Meriv dikare bêje, wekî nava qewilên wî cûreyîda qirêja linga û ew bîna xirab dighîşte wê derecê, ya ku bona civaka Rojavayêye wedê niha eyan nîne.

Li malên dewletîyada xulam hebûn, yên ku gerekê lingên agayên xwe, endamên malbeta wî û mêvanên ku dihatine mala wan, bişûştana. Li mala wekilên derecebilind gelek îş hebûn: pêwîst bû dîna xwe bidana cîhê hespa, xwerin çêbikirana, ode paqij bikirana û tiştên mayîn. Şûştina linga karê xulamê herî nimiz bû. Li nehîyên başqe meriv diha zêde dûr diçûn: li wan dera ew borcdarî didane ser xulamên jine here nimiz, çimkî tenê ew bûn ku çawa yên “nelayîq” dihatine hesabê, bona kirina xebata wî cûreyîye nebaş.

Wextê şîva dawîyê şagirt li maleke usa bûn, ya ku gelekî mezin bû, bona ku temamîya koma Îsa li odên cuda-cuda cîhwar bikirana. Bawar bikî li wî bajarî ew mala here dewletî bû. Çend sehet pêşda xulamê herî nimiz lingên wan her kesî şûştibûn. Feqet, çawa gaveke ecêbmayîne, hema wê êvarê Îsa ne tenê teşt û usa jî cêrê bi avê tijî hilda, lê kincên Xwe êxist, sîmvola tabîya Xweye dersdarîyê ji xwe dûrxist, û destpêkir lingên wan bişo. Wana gelekî baş zanibû ku çi diqewimî û ew yek sîmvola çi bû. Nava salên hînbûna li ûnivêrsîtê wî edetî ez didame şaşkirinê û serbara serda jî ez dûr dixistim, çimkî lingên min paqij bûn: pêşîya lêkolînkirina Încîlê min pêşda av li xwe dikir. Wê yekê jî nerihetî dida min: *“Bona çi xortekî ku ez lê nas nakim dicêribîne lingên min bişo?”*.

Heger em careke mayîn xeberên Îsa bixwînin, fikira wan wê bona we diha kûrbe. Ewî tesîreke mezin li ser şagirta hişt, ya ku wê hetanî dawîya jîyana wan tevî wan bima. Ew *xebera Wî, ya dawîyê* bû.

Em niha bidine tomerîkirinê: bona ku em mezinbin, em gerekê bi rezedilî

xwe dewsa xulamê herî nimiz daynin. Diqewime eve menî, wekî Îsa dibêje:»Ez şikestîme, û milahîmim “ /Metta 11:29/.

Hinek wede hate xwestninê, hetanî ku min ev rastî fem kir. Dema ku ez ji nûva bibûme bawarmend, min texmîn dikir ku gelek ji me qulix rast wekî mayîn didîtin. Fikira me vî cûreyî bû: “*Tu merivê girîng nînî, heger tu dannasîn nakî û rêberîyê li geleka nakî*». Qulixkirinên cûrên başqe li civînê bona merivên li ser tabîya diha nimiz têra hatibûne dîtinê. Û heger gelekî bixebitîyana, hûnê rojekê bibûna merivekî girîng. Gelo fikirdarîya me çiqasî tevîhevbûyî bû!

Ez bona sebira Ruhê Pîroz, ya wextê gihîştina me gelekî razîme. Ewî fikirdarîya min da guhartinê, lê bona wê yekê wede hate xwestinê.

Çawa ku min îdî nava çar salên ewlinda gotîye, yên qulixa min, ez alîkarê serwêrekî şexsî bûm. Carekê, wextê ku min xebateke biçûk dikir, Ruhê Xwedê gote min: “Kurê min, heger Ez pêşdaçûyînê bidime te, tê *bona qulixkirinê li ser tabîke diha bilindbî*. Heger tu niha şaşbî, tê wî kirasî xirabkî, yê ku te daye bona paqijkirina zîha. Nava qulixkirina tomerîda, şaşîya te wê kirasva girêdayî nibe, kîjanî meriv dikare biguhêre: ewê zîyanê bide meriva, kîjana Ez hiz dikim”. Xeberên Wî bi rastî hukumî li ser min kirin. Xêncî wê yekê, çî ku Ewî gote min, ew bû, wekî tabîyên qulixkirinêye bilind cabdarîya qulixkirinêye diha mezin têra dibînin, ewî usa jî nîşanî min da, ku çiqasî girîng ku nava tiştên biçûkda jî meriv her dem aminbe. Ez gerekê wî çaxî jî xulam bûma, wextê ku hebûna rast bispartana min, û ew hebûn merivin.

RÊBÊKA

Mesleke balkêş jî ya girêdayî qulixkirina xwepêşkêşkirinêra nava peymanana Kevinda jîyana Rêbêkayêye. Werin em bi kurtayî serhatîya wê bîr bînin.

Birahîm xulamê xweyî herî amin şande wî welatî, ji kîjanî ew derketibû hatibû ku bona Îshaqê kurê xwe qîzê bibîne. Xulam lez ket, kete li ser rêya dirêj û tevî xwe pênc deve birin.

Wextê ku ew gihîşte cî, ew wede bû, dema ku keçikên ciwan dihatine ber bîrê ku avê bibin. Ewî dua kir: “Awa hîvîkirina min: ezê ji wana ji yekê hîvî bikim, ku ji cêrê xwe avê bide min. Heger ew bêje: “Belê, vexwe, ezê usa jî deveyên te avdim”, - bila ew bibe ew keçik, ya ku Te bona Îshaq çawa jin bi-jartîye” /Destpêbûn 24:14, NLT/.

Hetanî ku ewî duayê xwe ser hevda anî, Rêbêka ji cêrê avê nêzik bû û ewî av ji wê hîvî kir. Ew çî ku paşê qewimî, tiştêkî gelekî berbiçeve:

“”Belê, agayê min, - ewê got, -vexwe”. Û ewê cêrê avê *lez* li ser sergirka milê xwe peyîya kir û av da wî. Peyî dayîna avêra got: «Ezê

avê usa jî bona deveyên te derxim, hetanî ku ew vexun û têrbîn». Û ewê *lez cêr* vala kir û paşda berbi bîrê revî ku avê bona hemû deveyên wî derxe» /Destpêbûn 24:18-20, NLT/.

Xulamê Birahîm rihet dîna xwe didayê, wextê ku keçikê deh deve av dida. Nava van çend gotinada em cêrge cudatîyên derheqa qulixkirina Rêbêkayêda dibînin. Ezê yek bi yek wana raberkim:

Bi kel û ced : ew bi dijwarî nedigerîya, ku lingên xwe çetin bibirana. Ewê hemû tişt lez dikir û serbara serda revo-revo diçû berbi bîrê û dihat. Qulixkirina hêdî û bêyî cedandin qulixkirina rast nîne. We dîtîye, wekî hinek qulix dikin, lê wê yekê bi cûrekî mayîn dikin û tê bêjî dibêjin: “*Ez ji temamîya vê xebatê westîyayîme*”. Rêbêka û her xulamêkî rast wî cûreyî nakin. Xulamên rast hazir û aktîvin û ew yek ji kirên wan tê kifşê.

Yê ku zêde dike: xulam gelekî baş dikin. Rêbêkayê ji wê yekê zêdetir kir, çî ku jê hîvî kirin. Ji me gelek meriv xudîyê deva nîbûne û li qûmistana Rôjhilata Navîn nemane, emê vê faktorê pêşda nekişînin, ya ku rûyê qulixkirina Rêbêkayêda me zendegirtî dihêle. Piştî rêwîtiya dirêj, deveyê tî dikare ji 120-î hetanî 150-î lîtr av vexwe. 10 deveyên xulamê Birahîm hebûn. Werin em hesabkin: heger her devek tenê 120 lîtr av vexwera, usaye ku Rêbêka gerekê bi seda lîtira av ji bîrê bianîya. Heger cêra avê 20 lîtrî hildide, usa dertê, wekî ew gerekê 60 carî biçûya ber bîrê û paşda vegeîya.

Feqet kirina wê ya diha ecêbe. Wî çaxî du cûre bîr hebûn. Wextê ku bîr cûrê ewlin bû, wî çaxî şîrît cêrva girê didan û peyîyî çelê dikirin, hetanî ku bighîştana avê. Heger cûrê mayîn bû, wî çaxî lazim bû ku 20-30 gava peyîyabûna û bighîştana avê. Gelo em zanin, wekî Rêbêka li ber kîjan cûre bîrê bû. Bêyî şikberî, ew bîr ya cûrê duem bû, çimkî paşê, wextê ku xulamê Birahîm derheqa kirina Rêbêkayêda malbeta wîra gilî dikir, ewî got: «[Rêbêka] peyîyî kanîyê bû û av derxist”. Xêncî wê yekê ew 60 carî çû berbi bîrê û paşda vegeîya, her carekî 20 lîtr av li ser milê wê bû, pêra jî ew mecbûr bû awqas gav biavîtana. Û bîr nekin wekî ewê bi xwe derheqa kirina wî hemû tiştîda hazirîya xwe elam kir, nenihêrî wê yekê, wekî ji wê hîvî nekiribûn. Derheqa vê cudatîyêda xala meye mayînda nivîsare.

Cabdar :wextê ku hewcetîya kifş heye, xulamê rast hîvîyê nasekine ku ji wî hîvî bikin: ew carekêra derbazî îş dibe. Wextê salên cêribandina min, min zelal dîtîye, wekî nava jîyana wan merivada, yên ku tenê hîvîya teslîmkirinandin, çendbarekirin tune. Çendbarkir ew merivin, yên ku her dem çawa yên pêşin dişuxulin.

Xwepêşkêşkirî : nenihêrî wê yekê, wekî ew xebat giran bû, Rêbêka nava qulixkirina xweda bi kel û ced dixebitî. Nava salada min tişteke dîtîye: xebata

teslîmkirî çiqasî dijware, awqasî hazirî zû, lez ditemire. Xeysetê merivatîyê wî cûreyîye. Lê belê, tebyeta meye Îsa Mesîh heye. Ew tu cara teslîm nebû, wextê ku çetinayên mezin û tengasî dîtin. Anegorî tebyeta Îsa bijîn û bi Rêbêkayêva ruhdarbin!

Ewê ku kar dighîne dawîyê :Rêbêka nesekinî, çimkî ewê xebata xwe ser hevda neanî bû. Ew teslîm nedibû. Kirina 99 selefê kar nade kifşê, wekî şuxul ser hevda hatîye. Em wê yekê bîr tînin, wekî wî cûreyî Şaûlê padişa kir, dema ku ew tevî amelekîya nava şêrda bû. Ewî bi deha hezara meriv kuştin, lê yek hişt, û Xwedê bona cedandinên wî heq neda /bixwînin A Padişatî serê 15-a/. Rêbêkayê ev hemû tişt kir, lê ewê nizanibû wekî bona wê kirinê ewê heq bistenda. Eva nîşana wê yekêye ku ew xulama raste: xulam bo heq kar nakin: heq bona wana hema qulixkirine. Ew wê şabûnê, razîbûnê hiz dikan, kîjana qulixkirin pêşkêşî wan dike. Heger heq heye, wî çaxî ew duayê zêdeye, lê ne ku menîya wane. Heqê Rêbêkayê tiştê gotinê nîbû: ewê texmîn nedikir, wekî ew deh deve tiştên giranbiha û pêşkêş bona wê anîbûn, û ewê mêrekî xwedêparêz bistenda. Feqet ji van herduya tu yek heqê ku bima nîbû. Heqê ku bima ew bû, ku ew kete nava wî sozî, yê ku Xwedê dabû Birahîm. Ewê bibûya dayîka gelek mileta. Hemû millet wê bi destî wê bihatana duakirinê. Rêbêkayê çendbarekirina usa stend, ya ku nayê gotinê.

MÎNAKÊN BAŞQE

Gelek mînakên nivîsarên pîroz hene, yê ku derheqa çendbarekirina heta-hetayêdanin û ew ji qulixkirina bi dil kirî dikişe. Awa dîsa çend hebên mayîn, kîjana hûn dikarin bi hûrgilî, wextê lêkolînkirina Încîla xwe, lêkolîn bikin.

Rût

Mînanî Rêbêkayê, xwesîya Rûtê ji Mowabê Noyêm sê cara berbirî wê bû ku ew vegere welatê xwe. Lê Rût ji wê gotinê paşda sekinî û got:

“Min mecbûr neke, ku ez te bihêlim û ji cem te paşda vegerim, çimkî tu kuda jî herî ezê bêm, û li kîderê bimînî, ezê li wir bimînîm. Cimeta te cimeta mine, û Xwedêyê te, Xwedêyê mine” /Rût :16/.

Rût mînanî Rêbêkayê hazir bû diha zêde bikira, bi kel û ced bixebitîya, xwe pêşkêşkirî bima, heger dijwarî jî hebûna. Rîya Rûtê bawar bikî diha dijwar bû, ne ku ya Rêbêkayê, çimkî ew mowabî bû bawar bikî, ew ji alîyê binelîyên bajarê Noyêmêda, rûyê milletî û welatê xweda dihate zêrandinê. Feqet ewê li ber her tengasîkê teyax nekir, ku bona xwesîya xwe bi aminayî qulix bikira.

Gelo nava encamê wê yekêda çi qewimî? Ew bû pîrika gelek merivên berbiçev, nava kîjanada bûn Dawidê padişa, Silêmanê padişa û hemû padişên Cihûdayê. Ya here girîng, ew kete nava nisileta Îsa. Ew jî kete nava peymanana heta-hetayêye çendbarekirinê, ya ku Birahîmra hatibû sozdayînê.

Elîşa

Elîşa qîrar kir ku tevî Îlyas bimîne û bona wî qulix bike, nenihêrî wê yekê, wekî Îlyas sê cara bebirî wî bû, ku ew here. Hetanî wî çaxî jî, wextê ku pêxembera gelek cara qerfê xwe lê kirin û gotin, wekî ewî wedê xwe unda dikir ku Îlyasra qulix dikir, yeke, Elîşa tevî wî ma. Fikirdarîyên wan tê bêjî nêzîkî aqila bûn:ew bibûne pêxemberên tam, statûs û cêribandin dest anîbûn. Wê çi bihata serê Elîşa, wextê ku Îlyas bihata hildanê?

Gelo ewî salên xwe badîhewa derbaz kiribûn û nikaribû qulixî Îlyas bikira, û îdî mecala wî tunebû ku qulixa xwe çê bikira? Ew yek fikirdarîya wan pêxembera bû, lê Elîşa guh neda wan. Dewsa wê yekê, ewî hercar bi cûrê berk emirî ser wan dikir ku bêdengbin, xwe kerkin /bixwînin D Padişatî serê 2-a/. Ewî îzin neda, ku tu tişt wî ji qulixê dûr bigre û xebata xwe kir.

Kirina Elîşa mînanî kirinên Rêbêkayê û Rûtê bû. Gelo nava encamê wê yekêda çi qewimî? Ewî du cara zêdetir ecêb kirin, ne ku Îlyas, û ew karibû wî tiştî bike, çi ku Îlyasra li hev nehat, ku dawîbûna padişatîya Îzabêlê bine. Wîra çendbarekirin hat.

Gêêzî

Mecala Gêêzî hebû, ku karê Elîşa çendbare bikira, lê dilê wî ne yê xulama bû. Ew xwehiz û tima bû û nava jîyana wîda çendbarekirina kardar neqewimî /bixwînin D Padişatî serê 5-a/.

X

Nava peymanana Nûda em derheqa wan mêrada dixwînin, yên ku qulixî jinebîya dikirin. Ew bi dil nêzîkî borcdarîya xwe bûn. Ew danîne li ser wê xebatê ku xebata xwe baş mîyasekin. Feydayê wê xebatê berbiçev bû, çimkî kitêba Karên şandîyada ev tiştê ecêb hatîye nivîsarê.

“Û Xebera Xwedê belav bû, û hejmara şagirta li Orşelîmê, *bi mezinayî çendbare bû*” /Karên şandîya 6:7, NKJV/.

Gelo ew bo çi awqasî ecêb bû? Bi dengê bilind van xebera biwekilînin: “Bi mezinayî çendbare bû”. Derheqa wê yekêda bifikirin. Ev xeber piştî roja

Pêncîye hesaba nehatine nivîsarê, wextê ku bi destî banga Petrûse klasîk, nava rojekêda 3000 meriv careke mayîn xuliqîn. Na xêr, li wir xebera “zêde bûn” hatîye xebitandinê /Karên şandîya 2:41/. Dema ku derheqa wan merivada tê gotinê, ewên ku paşda vegeŕiyane, dîsa xebera «zêdebûn» tê xebitandinê /Karên şandîya 2:47/. Hema ew xeber jî bona wan 5000 merivîda tê xebitandinê, yê ku nava wedê kurtda emirê xwe pêşkêşî Îsa kirin /bixwînin Karên şandîya 4:4/.

Xebera “çendbarekirin” hetanî serê kitêba Karên şandîyaye şeşa nayê xebitandinê, li kîderê temamiya civînê destpê dike bona çêkirina padişatîya Xwedê bişuxule.

Çendbarekirin roja îroyîn diqewime, wextê ku merivên mînanî Stên, Mayk, Fîl, Raylîyê û Dêyv li ser tabîyên xweye qulixkirinê cîyên xwe digrin û pêşkêşên xwe didine xebatê. Hema vî çaxî jî em derheqa *çendbarebûna mezin* dibhên.

FAKTORA QIRARKIR

Niha hûn fem dikin, wekî faktora çendbarebûna kardare qirarkir kîjane? Dîsa bin ronahîya wan serhatîyên nivîsarên Pîroz derheqa hevalên min Raylîyê û Dêyvda bifikirin. Ev jin û mêr, yê ku stratêjiyên bi ruhdarbûyî stendî îdî hukumî li ser jîyanên bi deha hezara meriva kirine. Ew anegorî gotinên Îsa mezin bûne. Ew yek usa jî derheqa Stên, Mayk, Fîl û Danayêdane. Li cem van hemû meriva cudatîya bona xulamtîya rast heye.

Lê belê, ez hîvî dikim, ku hûn guhdarîyê bidine li ser van gotinên girîng: *hûn dikarin bi menîyên xwehizîyê çendbare bikin*, lê hukumê we wê yê he-ta-hetayê nîbe. Hene meriv ku çendbare dikin, lê rojekê hemû karên wan wê bişewitin, çimkî menîya wan berjewandîya şexsiye. Ev yek nava serhatîya wî merivîda tê şirovekirinê, yê ku imbarên diha mezin çê dikirin, û derheqa vê yekêda Îsa gilî dike. Ew merivî jî xwe razî bû û ewî xwe pîroz kir, got: «Hêsabe, buxwe, vexwe, şabe û ez gîhştîme meremê xwe û niha hemû tiştên min hene, çi ku min lazîmin û hela tiştêk jî zêde». Lê ev serhatî baş xilaz nebû, çimkî nava wedekî kurtda hemû destanên wî unda bûn.

Meremê banga vê kitêbê ew yek nîne, ku hûn bawarîya xwe li çendbarekirinê bînin û destpêkin xizna ser hev berevkin. Meremê vê kitêbê ewe, ku piştgirîyê bidine xwe, ku hûn jîyana xwe pêşkêşî qulixkirina meriva bikin. Îsa got, wekî wextê ku hûn vî cûreyî bikin, ew hemû tişt, berbi çi bêbawar divedînin, wê wera bê dayîne /bixwînin Metta 6:33/. Ez derheqa vê yekêda zanim, çimkî min bi xwe ew yek li ser xwe dîtîye.

Em paşda vegeŕine li ser serhatîya min û Lîzayê, ya derheqa civîna meye

ewlinda. Şeş sala ser hev, mayîna nava atmosferâ nesaxlemda, dilê minda derheqa çendbarekirinêda fikirên zeyîf mabûn. Piştî çûyîna ji wê civînê, piştî hinek wede, şebeqekê, wextê ku min avtomaşîne diajot, hevdîtineke min, ya ku diguhêre û azat dike, ya tevî Ruhê Pîroz, qewimî. Ewî got: “Kurê min, Min, bona duakirina negere. Îzinê bide u Ez wana bidime te”.

Min carekêra Metta 6:33 anî bîra xwe:”Ji hemû tiştî zêdetir padişatîya Xwedê bigerin û bi heqî bijîn, û Ewê wî hemû tiştî bide we, hewcê kîjanêne hûn» /NLT/. Xeberên Ruh fikirdarîya rast dane min û alî min kirin ku ez wan fikirên minda mayî, yê xwehizîyê, ji kokêva rakim.


Ez awqas gelekî ji Wî razîme. Ez zanim, ku xwehiz û çevbirçî çîye, wextê ku hûn bextewar nînin, bin hukumdanin û ji hazirîya Xwedê dûrin. Wextê ku ez rîya Wî hîn bûm û usa jî hînî wî hemû tiştî bûm, çi ku dilê Wîda ye, wextê ku min sirîya ewlin destpêkir berbi çêkirina padişatîya Xwedê bicedînim, min şabûneke bêsinor, aşîtî û hazirîya Wî nava jîyana xweye herrojeda dest anî.

X

Niha em gerekê vê pirsê bidin: em çawa dikarin çendbare bikin, heger em serkarîyê li karên xwe nakin, lê nava koma kesekîda qulix dikin? Werin em bersiva vê pirsê serê kitêbêyî mayînda bidin û emê wan hemû zêdaya bibînin û bi wî cûreyî bighîjine wana.

BIFIKIRIN

1. Îsa dide kifşê, wekî rîya mezinaya rast qulixkirine. Îsa çi cûreyî qulixkirin da kifşê? Feydayên qulixkirina Wî kîjan bûn? Rîya mezinaya Xwedê bi çiva ji rêyên vê dinîyayê cuda dibe?
2. Serpêhatîya Rêbêkayê bîr bînin. Cudatîyên qulixkirina wêye berbiçav kîjan bûn?
3. Hûn dikarin bi menîyên xwehizîyê çendbare bikin, lê hukumê we wê yê heta-hetayê nîbe. Firqîya qulixkirina xwehizî û xwepêşkêşkirî kîjan e? Bona çi qulixkirina xwepêşkêşkirî girîng e?



“Ez hîvî ji we dikim, çav bidine min.
Bi vî meremî...”.

– A Korintî 4:16, 17, NKJV

Çav bidine min

Hetanî ku em derheqa wê yekêda xeberdin, ku çi tişt nahêlin ku çendbarebûn biqewime û çi jî alîkarîyê dide wê yekê, em gerekê govekeke girîng jî gotûbêj bikin. Em çi cûreyî çendbare dikin, wextê ku em li cem kesekî dixebitin, yan qulix dikin? Ev pirs derheqa piranîya xwendevanadane.

Bona dayîna bersiva vê pirsê, ezê li ser goveka qulixkirinê bisekinim, lê ew prînsîp, kîjana ezê raberkim, bona hemû qulixa tèn xebitandinê, yên wedê nihaye nava hemû govekada: ya korporatîv, bîznêsê, xwendinê, saxlemîxweykirinê, dewletê, mêdîyayê, sportê, edebyetê û yên mayîn.

Pawlos dibêje: “Ji wekîl jî dikeve, ku ew aminbe” /A Korintî 4:2/. Çawa ku me ji Încîlê da kifşê, cudatîke bona aminayê çendbarekirine. Piştî çend gotina, Pawlos beşeke hîmlî, ya çendbarekirinê dide eşkerêkirinê. Ew dinivîse:

“Heger wê jîyîna weye tevî Mesîhda bi hezara terbyetdarên we hebin, lê tenê bavekî we heye, çimkî wê jîyana weye tevî Mesîh Îsada hûn ji min bi Mizgînîdayînê dinêketin” /A Korintî 4:15/.

Pawlos *bavê* civîna Korintîya bû. Anegorî vê gotinê, *bav* ewe, ewê ku rêberîya kesekîye berbi bawarîyê dike. Feqet, şirovekirinên başqe jî, yên xebera “bav”, hene. Încîlêda bav diha gelekî merivekî usaye, yê ku tevî anîna kesekîye li ser rîya rastîyê nabe.

Hema Pawlosê şandî jî berbirî civîna Galatîyê dibe, dibêje: «Ez nava ci-hûtîyêda ji gelek hevalên xweye cihû pêşdatir çûbûm, alîyê ra û rizma *kal-bavada* /yan jî “*bava*”/ jî gelekî xweyî xîret bûm /Galatî 1:14/. Bi nivîsara derheqa *bavada*, Pawlos tenê derheqa merivekîda nabêje. Ev gotin bi xeberên “ne ku *gelek* bav” îzbat dibe. Nava zimanê yûnanîda xebera «gelek», ya ku gelekî hatîye xebitandinê, dide kifşê “bi hesabê mezin”: dêmek, nava jîyana meda dikare ji yekî zêdetir “bav” hebin.

Pawlos Tîmotêyo gelek cara çawa “kurê” xwe nav dikir. Feqet, ewî rêberîya wîye berbi xilazbûnê nekiribû, çimkî nivîsare, wekî Pawlos “hate Dêrbê û Lîstrayê. Li wir şagirtek hebû, navê wî Tîmotêyo, kurê kulfeteke cihûye bawermend bû, lê bavê wî yûnan bû. Bawarmendên Lîstrayê û Ornayê hindava wîda qenc xeber didan” /Karên şandîya 16:1, 2/. Eyane, wekî Tîmotêyo îdî bawermendê îzbatbûyî bû, wextê ku Pawlos cara ewlin ew dît.

Peymana Kevinda Dawid rêberê xweyî berk çawa “bavê min” nav dike /bixwînin A Padişatî 24:12/. Elîşa jî rêberê xwe çawa “bavê min” nav dikir /D Padişatî 2:12/. Îlîyas got, wekî ew jî “bavên” xwe baştir nîbû /bixwînin G Padişatî 19:4/:vê navnîşe meriv dikare êpêce dirêj berdewam bike.

Nava doranên vê kitêbêda meremê min ew nîne, ku ez bi hûrgilî şirove bikim, ku *bav kîye*: ez dixwezim bidime kifşê, ku *kî dikare rola bavêda be*. Bav ew merive, yê ku rêberîyê dike, dide û kûltûrayê tîne nava jîyana şexsekî yan jî teşkîletekê. Nava dorana gotûbêjkirina meda, bav dikare li ser gelek tabîyabe: ew bîznêsmên, li cem kîjanî hûn dixebitin, serokê beşa we, serwêrê we, serwêrê koma weye biçûk, serwêrê heja we, dersdarê we, telîmdarê we, ew doxtir, alîkarê kîjanîne hûn, eve navnîşa kurt, ya gelek tabîya. Bêguman, we tê bêjî fem kir, wekî “bavê” ku li ser van tabîyaye, dikare jinbe jî. Dêmek, bi xeberdana derheqa bavada, ez dixwezim bêjim, wekî vê rolêda usa jî dikarin jin hebin.

CÛRÊN ŞUXULKARÎYÊYE CUDÀ

Çawa bavê civîna Korintîya, Pawlos, nava xebera mayînda şîretê dide:»Dêmek, ez hîvî ji we dikim, çev bidine min” /A Korintî 4:16, NKJV/.

Pawlos nabêje: “Çev bidine min, çawa ku ez çev didime Mesîh” /Vê gotinê ew diha dereng, serê 11-da, dibêje/. Nava vê gotinêda ew temîyê dide: “Çev bidine min”. Menîya wê yekê heye, bona kirina wê yekê, û niha lê binihêrin:

“*Bi vî meremî* min Tîmotêyo şande cem we, yê ku nava Xudanda kurê minî hizkirî û *amine*, yê ku wê derheqa *rêyên mine nava Mesîhda* bîr bîne, çawa ku ez li her dera, li her civîna, hîn dikim” /A Korintî 4:17, NKJV/.

Destpêka vê gotinêda, gotina “bi vî meremî” balkêşe. Pawlos hema hêja temî da xwendevanên xwe ku çev bidine wî. Û bona ku ew bawarbe, wekî nava wanda hevraqayîlnebûn wê tunebin, yê nava dîtinokê, kûltûrayê û

fikirada, ewî kurê xweyî *amin* şand. Gelo nîşana kurê *amin* kijane? *Kur yan jî keça amin cûrê karkirina bavê xwe çendbare dike*. Zûtirekê ezê diha bi hûrgilî vê yekê şirove bikim, lê berî her tiştî wê yekê bifikirin: Pawlos civîna Korintîyara nanivîse û nabêje, wekî Tîmotêyo “wê nava Mesîhda derheqa rêyên Petrûsê şandîda bîr bîne”. Meriv dikare bêje, wekî Petrûs civînêda rêberêkî bi nav û deng bû? Bêguman! Gelo meriv dikare bêje, wekî ew rêberêkî xwedêparêz û xwedêdayî bû? Careke mayîn bêjim, belê! Încîlêda ewî du kitêb nivîsîne. Gelo meriv dikare bêje, wekî Petrûs diha zêde wede şandî bû, ne ku Pawlos? Dîsa, belê!

Pawlos usa jî nanivîse, wekî Tîmotêyo “wê derheqa rêyên Aqûbê şandî nava Mesîhda bîr bîne”. Çawa Petrûs, Aqûb jî bavekî civînêyî rast bû, ew wedekî diha dirêj şandî bû, ne ku Pawlos, û ew rêberêkî amin bû. Ewî jî Încîlêda kitêbek nivîsîye û li civîna Orşelîmê çawa serwêrê sereke qulix dikir.

Gelo Petrûs û Aqûb cûrekî mayîn qulix dikirin, ne ku Pawlos? Belê! Dêmek, meriv dikare bêje, wekî kitêbên Pawlos û cûrê şuxulkarîya wî, kitêb û şuxulkarîyên Petrûs û Aqûb hêç dike? Na xêr! Feqet, cûrê şuxulkarîya wan herdu şandîya bona civîna korintîya fesal nîbû, bavê kîjanêyî ruhanî Pawlos bû.

Pawlos li civîna Korintîya nava şuxulkarîya îzbatkirina kûltûra xweda bû. Mêtodên wî ji mêtodên “bavên” mayîn cuda dibûn. Nenihêrî wê yekê, wekî ji wana her kes jî hindava hînkirinên Mesîhda amin bûn, lê mêtod, cûrên şuxulkarîyê û fikirdarîyên cuda-cuda hebûn, li rex kijana wana şuxulkarîya hînkirina hemû mileta mîyaser dikir.

Em rastîkî dibînin, derheqa kîjanîda gelek bawarmend nizanin, û ew nezanî gelek cara nava bedena Mesîhda dibe menîya dutîretîyên xirabkirinê. Ew rastî eve: civînêda *cûrên şuxulkarîyêye* cûre-cûre hene. Mecalên cûre-cûre hene, bi kijana meriv dikare dîsa wî meremî mîyaser bike, padişatîya Xwedê belav bike.

Pawlos civîna korintîya hîn dike:

“Usa jî cûre-cûre karîn hene, lê xût ew Xwedê ye, ku van dayîna karînê dide her kesî” /A Korintî 12:6/.

Çawa qulixçî, yê ku 30-î salî nava rêwîtiyadane, ez li civîna hemdinîyayê rastî kûltûrayên cûre- cûre, mêtod û fikirdarîyên cûre-cûre hatime. Feqet nava her atmosferêkêda min hazîrîya Îsa texmîn dikir.

Pawlos gelek cara, bona hînkirina civînê, xeberên leşkerî dide xebatê. Ew tenê bi xeberên başqe nîne: em bi rastî, li ser vê dinîyayê leşkerên eskerê Xwedêne. Ezê dîna xwe bidime mînaka wî, bona ku cûrê şuxulkarîyên cu-

da-cudaye bona qulixkirinê şirove bikim. Qewatên Ştatên Yekbûîye sîlhkirî ji pareskerên cuda-cuda sazûyîne. Dikevine nava wan esker, qewatên behrêye leşkerî, qewatên hewê û yên behrêye mayîn, pareskerê parastina kenara û usa jî qewatên ezana. Ev paresker şuxulkarî û borcdarîyên xwe bi mêtod û cûrên cuda-cuda mîyaser dikin. Lê belê, meremê wan dîsa ewe, wextê ku gilî derheqa parastina welatê me û qulixkirina bona welatê medaye.

Kadêtê îdara qewatên hewê wê mexsûs bona leşkerîya qewatên Ştatên Yekbûîye hewê bê hînkirinê. Nava hînbûnêda guhdarîya mezin tê danînê li ser opêrasiyonên hewêye taktîkî, çimkî ew leşkerên wan pareskera hîmlî nava hewêda şerkarîyê dikin. Heger wî kadêtî nava pareskerê behrêda kifşkin, ewê dîsa hewcê hînkirinêbe. Bi rastî, gelek û bêhesab mêtodên hînkirinê hene, yên ku li wan herdu pareskera nêzîkî hevin. Feqet, pareskerê behrê hîmlî nava behrêda şerkarîyê dike, lê endamê qewatên hewê wê mecbûr bûya manêvir û stratêciyên piraktîke nû hînbûya.

Ev yek mînanî padişatîya Xwedê ye. Awa meseleke vî cûreyî. Bînin ber çavê xwe, wekî navên serwêrên weye sereke Co û Têrî Andêrsonin. Ew tevî koma xweye rêberîyê, bi kerema Xwedê, civîn gîhandine hetanî 1800 endamî û cûrên şuxulkarîyêye kifşkirî îzbat kirine, mêtod û kûltûra, yên ku bona stîla wane rêberîyê başqene. Zêdaya civîna we eşkere hukumî li ser cîhê weyî jîyînê kirîye. Ew li wir naskirîye, lê bi wê yekêva hukumê civîna we tê sînkirinê. Em hesabkin, wekî li cîhekî mayîn civîneke eyan heye, endamên kîjanê çend deh hezarin, ya ku nava dinîyayêda naskirîye. Navên serwêrên wane sereke Kêvîn û Marîsa Smîtêrin. Ew bi stratêciyên nû rêberîyê dikin, yên ku hukumî li ser diha zêde meriva dikin, lê ne ku qulixa serwêrên we. Hûnê peyî kîjan cûrê şuxulkarîyê, Smîtêra, yan serwêrên we Andêrsona, herin?

Diqewime hûn dîna xwe bidine cûrên şuxukarîya rêberên li dinîyayê naskirî û hûn bicêribînin serwêrên xwe bînin li ser wê qîrarê, ku ew mêtodên wana qebûlkin. Heger hûn xwe bidine wê qîrarê, minê bigota, wekî hûn xulamên Îsa Mesîhe amin nînin, lê hûn bêtifaqîyê, hevraqayîlnebûnê û heta şera jî çê dikin. Mînanî korintîya hûn gerekê bicedînin mêtodên rêberên xwe û kûltûra wan naskin û boy yekîtiyê peyî wan herin. Rastî ewe, wekî Smîtêr rêberên we nînin, rêberên we Andêrsonin.

Bi lênihêrandina bedena Mesîh, bi tomerî hildayî, nava salên rêwîtiyêye li temamiya dinîyayê, ez bûme şedê gelek tragêdiya, yên ku rûyê nezanîya vê rastîya hîmlîda qewimîne. Min meriv dîtine, yên ku çûne mektebên rêberîyê, yan jî Încîlêye cûre-cûre, kûltûra kîjana ji ya civîna mayîn cudatir bûye, li kîderê ew mezin bûne. Gelek cara ew mekteb civîneke mezinva girêdayî bûne, ya ku kûltûra civîna wê rêgîyonêye tomerî pêşda kişandîye. Ew xwendikar bin hukumê cûrê şuxulkarîya wê civînêda bûne, him wextê hînbû-

na li wê mektebê, him jî wextê qulixdarîyên hebandinêye dawîya hevtê.

Piştî demamkirinê, ew xwendikar, bi ruhdarîke mezinva tijîbûyî, paşda vedigerin, û destpê dikin hemû tiştî bikin, bona ku kûltûra û mêtodên civîna xwe bighêrin. Neniherî wê yekê ku ew dikarin bi wê bawarîyê rastbin, wekî ew cûrê şuxulkarîyê, yê ku ew hîn bûne, diha kardarin û bona wan rehete, heger ew serhişkîke mezin bidine kifşê, ewê bi hêsanî yekîtîya wê civînê tev-lîhev bikin.

Heger mêtodên wan xwendikarên berê pêşnîyarkirî ji alîyê civîna wanda bèn înkarkirinê, wî çaxî bona hemûya cûrê herî baş wê ewbe, ku ew xwendikar dua bikin û ji Xwedê bipirsin, ku gelo ew gerekê cîguhastî wê civînêbin, yan gerekê bi temamîya dilê xweva gura kûltûra û mêtodên rêberê xwedabin?

Heger ew cîguhastîbin, gerekê wê yekê usa bikin, bo ku zyanê nedine civîna xweye berê. Her dem cûrê herî baş wê ewbe, wekî ew ji wî cîhî cîguhastîbin. Xwedê her dem dikare rêberên wî cûreyî cîguhastî li cîyên nû bike, li kîderê ewê hemû tiştî ji nûva destpêkin û wê necêribînin meriva /yên ku tevî wanin/ ji wê civînê bidine dîrxistinê, li kîderê ew qulix dikin.

KURÊ AMIN

Niha em derheqa wê yekêda xebardin, wekî Pawlos Tîmotêyo çawa «kurê amin» nav dike. Çawa ku hate gotinê, kurê amin divedinê cûrê şuxulkarîya bavê xwe bide çendbarekirinê. Eva tiştêkî nêzikî aqilaye, wekî pêşkêşên we hene, yê ku li cem rêberê we tunene. Wî çaxî pirs vî cûreyî: gelo hûn pêşkêşên xwe himberî dilê wî didine çendbarekirinê? Gelo menîya çendbarekirina weye hundurda anegorî fikirdarî û kûltûra wîye, yan hûn şerkarîyê dikin, ku cûrê şuxulkarîya xwe îzbatkin, ya ku kardar nîne û dijî wê dîtînokêye, ya ku dilê wîdane?.

Hûn çawa dikarin cûrê şuxulkarîya bavê xwe çendbare bikin? Du mecal hene. Ya ewlin, bicedînin pêşkêşên xwe bidine xebatê, bona ku «çav bidine» feydayê rêberê xwe, heger ew tabîya weda bûya û pêşkêşên wî hebûna. Ev yek nade kifşê, wekî hûn gerekê kirina xweye mexsûs hesab hilnedin û bibine kopîya rêberê xwe. Ez dixwezim vê yekê bêjim:

Bînin ber çavê xwe, wekî hûn serwêrê qulixdarîya ciwanane. Hûnê negihîjine cahilên ola xwe, heger hûn qulixdarîya roja yekşemê, ya serwêrên xwe kopî bikin. Lê belê, hûnê bi aqilmendî wê yekê bikin, heger qulixkirina xwe usa sazkin ku bighîjine ciwana, û ew dîtînok hebe, ya ku dilê bavê weda heye. Ev yek dikare tenê wî çaxî bibe, heger hûn tevî wî nava tevgirêdanabin. Hûn gerekê bi cûrê vekirî tevî wî stratêcya û mêtodên xwe gotûbêj bikin. Bi

guhdarkirina bersivên wî, hûn gerekê hesab hildin ku bi çiqasîva ew çî ku dilê wîda heye anegorî normên progiramên weye.

Bona bi kardarî kirina vî hemû tiştî, di navbera weda gerekê tevgirêdana vekirî û bêqelp hebe. Heger hûn texmîn dikin ku hûn dicêribînin tiştekî usa bikin, çî ku “hûn gumanin wekî ewê nebîne yan jî nizanibe», hûn îdî dikarin fem bikin wekî hûn bi rêya tunekirinê diçin. Heger şikberîyên usa hene derheqa wê yekêda gilîkin: zelal bêjin, bona ku ew rast fem bike, ku çî we xemgîn dike. Mînak, hûnê bi aqilmendî wê yekê bikin, heger hîvî ji wî bikin, ku ew wextê qulixkirina we hazirbe û we qîmet bike. Heger mêtodên we li wî xweş nayên, şirove bikin, ku bona çî hûn usa dikin. Heger gotinên we jî ji alîyê wîda nayêne qebûlkirinê, wî çaxî bicêribînin progirameke qebûlkirinê pêşniyarî wî bikin.

Mecala duem, bi kîjanê meriv dikare vê yekê bike, ewe ku hûn gerekê xwe «ji nûva pêşda bibin». Em hesabkin, ku qulixdarîya weye cahila bajarê weda ya here mezine. Ew tiştekî başe: Xwedê mêtodên we dua dike, û pêşkêşa Wî ya nava jîyana weda meriva dibe alîyê xwe. Lê gelo hûn merivên başqe bi pêşkêşên wî cûreyî dibînin, û wê serwaxtiyê û cûrê şuxulkariyê derbazî cem wan dikin, yê ku hûn hîn bûne? Gelo hûn bona pêşerojê bo qulixdarîya cahila serwêra bilind dikin, pêşda dibin? Wî çaxî, heger “bavê” we bêje, wekî civînê bona berevbûna li cîhekî bajarê weyî nû bide hîmdanînê, wî çaxî îdî merivê hebin, yê ku hîn bûne û hazirin herin. Ez li ser wê fikirême, wekî menîke wê prosêsê ku bona çî civîn nikarin berevbûna li cîhekî bajêrî mayîn destpêkin, yan jî li nehîyên mayîn civînên nû bidine hîmdanînê, ewe wekî alîkarên serwêrê sereke xwe ji nûva nadine pêşxistinê.

Hûn dikarin bibine înjênêrê dengayî herî baş, êdîtorê vîdêyoyê, serwêrê qulixdarîya zaroka, rêberê hebandinê, sazband, dannasînkir, qulixçiyê qeyde-qanûnê, yan jî xebateke mayîn bi cûrê herî baş mîyaserkin, lê ew yek nava padişatîya Xwedêda çawa açixîya rast nayê hesabê. Açixîya rast nava wê yekêdane, ku hûn xwe ji nûva bidine pêşxistinê. Ji xwe bipirsin: “*Gelo ez bona wê yekê dua dikim, wekî merivên usa bibînim, pêşkêşa kîjanaye usa heye, ya ku li cem min jî heye?*”.

Û hema hûn merivên usa dibînin, gelo hûn wana hîn dikin, telîm dikin, û alî wan dikin, ku pêşkêşên wan bidine pêşxistinê, bi wê yekêva tevayî ew tişt çî ku dilê bavê weda heye, derbazî li cem wan dikin?

Awa ew herdu mecal, bi kîjana hûn dikarin aminbin, dema ku hûn qulixî dîtînoka kesekî dikin. Em gerekê bîra xweda xweykin, wekî Îsa bi cûrê mexsûs dibêje: “Heger hûn nava tiştê xerîbda amin nîbin, ya we kê wê bide we?” /Lûqa 16:12/.

Em gotina Îsa biwekilînin, şirovekirina Wî ya xebera “amin” bidine xebatê:

“Heger we ew tişt nedaye çendbarekirinê, çi ku yê merivekî başqeye, ya we kê wê bide we?», yan jî, “Heger we cûrê şuxulkarîya rêberê xwe, kûltûra, alîyên qewat, dîtinok, mecal û ew çi ku dilê wîdaye, nedaye çendbarekirinê, ya we kê wê bide we?”. Werin em şirovekirineke başqe bidine xebatê: “Heger we hemû qewata xwe, fikira xwe, karebûn û dilê xwe bona berfirehkirina dorana cabdarîya xwe nedaye xebatê, kê wê qulixa we bide we?”. Ev gotin, yên hişyarkirinêne.

Hemû merivên açix, rastî kijana ez wextê rêwîtîya têm, pêşda nava merivên başqeda amin bûne. Min gelek cara derheqa destpêka rêya wan merivên açixda pirsîye. Min tu cara merivê usa nedîtîye, li cem kîjanî açixîya nihaye rast heye, yê ku berê nava wî hmû tiştîda amin nîbûye, kijan yê bavê wî, yan bavên wî bûne.

ŞERKARÎYA MIN YA HERE MEZIN

Dema ku ez ji nûva bibûme qulixçî, şerkarîya mine here mezin tevî wê texmînkirina bêçarîyêye veşartî bû, rûyê kîjanêda min dixwest ez naskirî û girîng bûma. Min divedand li ber meriva bida kifşê û diha gelekî min dixwest li ber xwe xwe bida kifşê, wekî ez rêberê bi fikirê cuda bûm. Paşê ez pê hesîyam, wekî gelek rêberên pêşerojê tevî texmînkirina bêçarîyê şerkarî dikirin, û heger ew wê yekê dilê xweda alt nekin, ew yek dikare bibe menîya ketina wan.

Ez li civîneke bajarekî mezin serwêrê qulixdarîya cahila bûm, ya ku li Amêrikayê dikete nava civînên ku lez pêşda diçûn. Koma meye ciwana progiramek hazir kiribû, ku li bajarê me bighîştana her şagirtêkî dersxanên bilind. Ew progirameke cuda û baş bû. Pêşeroja koma meye ciwana wê dora wê însîyatîvê bihata merkezkirinê. Em, ez û alîkarên min, heşt meha bona hazirkirina stratêjîyê dixebitîn. Min ew dîtinok raberî qulixdarîya meye ciwana kiribû, û wana ew yek qebûl kiribû.

Lê belê, dema ku em hazir dibûn programa xwe destpêkin, ez pê hesîyam, wekî ew ne anegorî dîtinoka serwêrê me bû. Ewî hîvî kir, ku ez wê progiramê destpê nekim. Nêzîkî 20 deqeyî em bi hevra qayîl nebûn, lê paşê gotinên min ser hevda hatin û min devê xwe girt, lê ez gelek hêsrketî bûm. Xebata heşt meha badîhewa çû: ew progirama baş parçe-parçeyî bû. Feqet, tiştê herî xirab ew bû, wekî dîtinoka qulixdarîya me bi temamî dora wê progiramê hatibû sazîkirinê, û me gerekê hemû tişt careke mayîn destpê bikira. Minê çawa derheqa wê yekêda 24 rêberên mera û qulixdarîya cahilara gilî bikira? Ew gelekî li ser wê progiramê xebitîbûn.

Min hêvîya xwe unda kiribû, û ez çûme cem Lîzayê, ku berdildahatinê bigerim. Bi guhdarkirina acizîya min, ewê bi cûrê nerm got:

-Con, tê bêjî Xwedê dicêribîne tiştêkî li te hîn bike.

Niha jî ez li ser serwêrê xwe, him jî li ser jina xwe hêrsketî bûm.

Min Lîza tenê hişt, çimkî, bi fikira min, ewê piştgirîya min nedikir. Ez difikirîm, wekî ew progirama hazirkirî ya here baş bû, bi kîjanê meriv dikaribû bighîsta şagirtên undabûyîye li dersxanên bilind. *Him serwêrê min, him jî jina min, gerekê bi temamî kor bûna*: ez usa difikirîm. Min xwe tenê, acizbûyî û bîntengbûyî texmîn dikir. Wedekî kurt ez fikirîm, wekî ew yek xewine, û wekî ezê zûtirekê hişiyarbim û hemû tiştê careke mayîn başbe.

“Gelo bi rastî tiştê usa dikare biqewime?”.

Wî çaxî Xwedê gelekî zelal dilê minra xeberda: “Kurê min, wextê ku ez te bona wedê bûyîna serwêrê qulixdarîya ciwana qîmetkim, ezê berê ewlin nenihêrim ku te rêberîya çend cahilaye berbi Min kir. Ezê berê ewlin wê yekê qîmetkim, ku tu çiqasî hindava wî merivîda *amin* bûyî, yê ku Min li ser tera kifş kiribû”.

Van xebera ez hişyar kirim, lê ne awqasî bi qewat, çiqasî gotinên wîye peyîra. Ewî dilê minda got: “Tu dikarî nava temamiya bajêrda rêberîya her şagirtêkî dersxana bilind, ya berbi Min, bikî, lê rûyê bêaminîya hindava serwêrê xweda, temamiya razîbûnê û heqê kirê xwe unda bikî”.

Ez ji xofa pîroz lerizîm. Min carekêra tobe kir û baxşandin hîvî kir, lê paşê min serwêrê xwera têlefona kir û dîsa ew yek kir. Dema ku min têlefona danî û ez derheqa wê qewimandinêda fikirîm, Xudan nişkêa dîtinokek da. Min dît, wekî ez bi gavên beşerxirab diçûme berbi 24 serwêra. Min giranî û beşera xirab texmîn dikir û min bi acizî got: “Lawikno, hûn zanin, wekî em bi meha li ser vê progiramê dixebitin: eva dîtinoka qulixdarîya meye ciwanaye, lê serwêrê meyî sereke hinekî pêşda ew yek da sekinandinê. Ew hemû tiştê ku em li ser dixebitîn, ser hevda hatîye”.

Min dît, wekî çend serwêra bi beşereke xirab serê xwe peîya kirin: çev û devên yê mayîn ji wê ecêbê vekirî man. Hemû li ber xwe diketin. Nava wê dîtinokêda min zanibû, wekî hemû kes jî li ser serwêrê meyî sereke hêrsketî bûn û wana koma me çawa qurbanîya kêmasîya efrandarîya wî didîtin.

Xwedê ji min pirsî, gelo minê çawa bikira? Min gotê: “Na, usa na. Na, usa na. Na!”. Min zanibû, wekî Ewî nêzîkbûna min û tabîya dilê min dicêriband. Dîtinoka ku Ewî da min, dida kifşê, wekî dilê bavê min hê li cem min tunebû. Min carekêra li ser dereca diha kûr tobe kir.

Tê bîra min, wekî piştî çend roja ez çûme hevdiîna tevî wan serwêra. Niha jî dilê minda xofa pîroz dişuxulî: gavên min aktîv bûn, çevên min dibriqîn û dengê min zîz bû. Min bi ruhdarbûneke mezin got:

-Lawikno, behseke mine baş heye. Serwêrê meyî sereke me ji bûyîna Îsmayêl xilaz kir. Ewî got, wekî progirama ku em li ser dixebitin, ew alî nîne, bi kîjanî ew dixweze rêberîyê li civînê bike: dêmek, em vê progiramê derdixin.

Hemûya bi şabûn bersiv dan. Hinek kenîyan, yên mayîn bi şabûn li hev nihêrîn, lê yên mayîn bi dengê bilind begemî dan. Her kesî fem kir, ku dilê minda çî hebû, çimkî min bi kutasî fem kir, ku dilê serwêrê minda çî hebû.

Piştî salekê ez nava progirameke myîne girîngda hatime cêribandinê, li ser kîjanê em çend meha xebitîbûn. Vê carê serwêrê min derheqa wê yekêda zanibû û wê progirama mera qayîl bibû. Feqet, piştî xebata sê meha, ewî fikira xwe guhart. Careke mayîn ew alî hate guhartinê, û ewî bona wê yekê baxşandin hîvî kir. Vê carê ez bi tamamî cûrekî mayîn nêzîk bûm, ne ku çawa cara pêşin. Min ew progirama destpêkirî, bêyî dijîderketin, hevraqayîlnebûn û elamkirina qayîlnebûnê da derxistinê. Ew firqî gelekî baş tê bîra min, ya ku min texmîn kir: ez rûyê wê yekêda razî bûm, wekî min karibû qayîlbim, lê bi rastî, heger bijartin ya min bûya, minê ew program berdewam bikira.

Min careke mayîn derheqa hêçkirina wê progiramêda gote serwêrên xwe, û tê bêjî ew fikir ya min bû. Xwedê ew qulixdarîya meye cahila dua kir: qulixdarî nava wan sê salada çendbare bû, dema ku ez qulixa serwêrê qulixdarîya cahila bûm.

Ez li ser wê fikirême, wekî ezê li wir nîbûma, li kîderême roja îroyîn, heger min ew cêriband biteribandana. Ez dikarim bêjim ku wê çî biqewimîya, çimkî Ruhê Pîroz nişanî min dabû. Çawa jî hebûya, ezê mecbûr bûma, ku ew progiram nehatana hesabhildanê. Minê bi nêzîkbûneke usa ew yek bikira, ya ku wê li ser serwêrên min belav bûya, û ew bidana guhartinê. Paşê ezê ji civînê dûrketama, û rûyê pêşkêşa nava jîyana minda, minê hukumî li ser komeke merivaye biçûk bikira. Feqet, minê tu cara ew qulix nestenda, ya ku niha ya mine, li kîderê ez niha, çawa dannasînkir û xudanê kitêba, hukumî li ser bi mîlîyona merivên li dinîyayê dikim. Bona çî? Çimkî ezê nava wî hemû tiştîda amin nîbûma, çî ku yên merivên başqe bûn, mîsîya ji alîyê Xwedêda dayî wê li min nehata spartinê.

Hînbûna van hemû tiştî, hêsa nîbû. Çawa rêber, min bona wî hemû tiştî şerkarî fikir, çî ku min hesab fikir tiştê herî baş. Lê min fem kir, wekî Xwedê bona xeysetê min diha gelekî xemgîn bû, ne ku bona feydayên min. Ewî dixwest, ku hîmekî qewîn sazbe, hetanî ku mîsîya me bisparta min û Lîzayê.

Hevalê giranbiha, hûn jî rêberin. Heger em bi rêyên Xwedê herin, Ewî soz daye ku mecalên rêberîyê bide hemû lawên Xwe. Em serîne, lê ne ku poçin, û em tenê li ser bilindayêne, lê ne ku li ser cîhê nimiz /bixwînin Q. Ducarî 28:13/. Ez hîvî dikim, ku alîkar nexin, çawa ku min ew yek fikir. Ji min hînbûn, bona ku hûn jî cabdarîya diha mezin nava padişatîya Xwedêda bistînin.

GİRÎNGYA YEKÎTÏYÊ

Her teşkîletek gerekê yekbûyîbe bona ku çendbarekirin hebe. Derheqa beşeke kitêba Pîroze ku diha gelekî ronahî dike, kitêba Destpêbûnêda nivîsare. Komeke merivên bêxwedê qirar kir, ku tiştêkî usa bikin, yê ku bona merivên hemû wedeyî tiştê nebûyîne bû. Wana qirar kir ku bircekê çêkin, ya ku gerekê bighîştta ezmana. Lê belê, guhdar bikin ku Xwedêyê Karîndar çi dibêje:

“Hingê Xudan got: “Vaye, evana miletekin û zimanê hemûya jî yeke. Evana destpêkirin çê dikin û bona van ne çetine çi ku sêwirandine bikin””/Destpêbûn 11:6/.

Bînin bîra xwe, ku ev xeber yên kêne: yên Xwedêne. Guhdarîya Wî bikin: “Bona wana wê çetin nîbe, çi ku sêwirandine bikin”. Bona çi Xwedê tiştêkî usa got? Çimkî “yek” bûn û zimanê wan jî “yek” bû. Ew yek bûn. Qayîlîya wane tevayî hebû.

Heger ev gotin ji devê Xwedê derketin, yên derheqa merivên nexilaz-bûyîda, Ew cimta Xwera çi dibêje? Hela serbara serda jî, wextê ku cimeta Wî dibe yek, nivîsare, wekî “li wir Xudan temîya duayê da” /Zebûr 133:3, NKJV/. Xebera “temî” dide kifşê “emir bikin, rê nîşan bidin, kifşkirin”. Vê gotinê meriv nikare cûrekî mayîn şirove bike: yekîti duayê tîne û çendbarekirin nava wêdaye.

Eva diha gelekî peymanana Nûda derheqa lawên Wîdane. Tiştêkî ecêb-mayîne nîne, ku em her dem gotinên vî cûreyî dixwînin:

“Bi rastî min bextewar bikin, *bi temamîya dilê xwe* bi hevra *qayîlbin*, hev hiz bikin û bi hevra kar bikin, *bi fikirekî* û *bi meremekî*” /Fîlîpî 2:2, NLT/.

“Heyneser, xwîşk-birano, xweşbin, ser xweda werin, dil bidine hevdu, *ser nêtekêbin*, li peyî edilaîyêbin, û Xwedêyê hizkirinê û edilaîyê wê tevî webe» /B Korintî 13:11/.

“Bila kirina we tenê layîqî Mizgînîya Mesîh be, bona ku bîn û we bibînin, yan jî li wir nîbin, derheqa kirên weda bibhên, ku hûn bi îzbatî *bi ruhekî*, *bi fikirekî*, bona bawarîya Mizgînîyê şerkarîyê dikin” /Fîlîpî 1:27, NKJV/.

Em recakirina *bavê* van civîna dibihên. Pawlos gotinên “bi temamîya dilva qayîlbin”, “fikirek”, “ruhek” dide xebatê. Ewî dixwest, ku ew civîn nava halekî usada bûna, ku temîya Xwedêye bona duayê qebûl bikirana. Ewî zanibû,

wekî tenê wî çaxî çendbarebûna wane rast, ya nava hemû govekada, wê hebûya.

Awa meseleke başe derheqa wê yekêda, wekî temîya duayê bona merivên yekbûyî xweykirîye: “Peyîhatîyên Îsaye amin gura temîya Wî kirin, ku li Orşelîmê bimînin /bixwînin Karên şandîya 1:4/. Piştî rabûna Îsaye ji nava mirîya, nava 40 rojîda, Ew here kê m li 500 jin û mêra xuya bû /bixwînin A Korintî 15:16/, lê piştî jorhilata wî, piştî deh roja, tenê 120 li Orşelîmê ma-bûn, yê mayîn li kîderê bûn? Ez tîm ser wê fikirê, wekî ji 75 selefê wan zêdetir gura gotinên Îsada neman. Dibek em nizanin, ku ew li kîderê bûn, lê em zanin, wekî xwestina Wî bona wan pirsra sereke nîbû.

Jin û mêrên ku li Orşelîmê bûn bin serkarîya xebera Xwedê da bibûn yek. Pirsra mayîn ew bû, ku ewê Petrûs çawa qebûl bikirana, yê ku rêberê ji alîyê Îsada kifşkirî bû, *bavê* wê civînê, yê ku Ewî kifş kiribû.

Nava Mizgînîyada Petrûs gelek cara tiştên ji nişkêva dikirin û xwestina Xwedê fem nedikir. Dema ku Petrûs îzbat kir, wekî Îsa Mesîh bû, Kurê Xwedêyî sax, Îsa ew duakirî nav kir. Feqet, piştî hinek wext, Îsa ser Petrûsda vegeerîya û gotê: «Ji ber çevê Min betavebe, cino! tu cêribandîyî, çimkî ew nêt-fikira te ne ji Xwedêye, lê ji merivayêye” /Metta 16:23/. Careke mayîn jî Petrûs li ser avê gerîya, lê şagirtên mayîn dîna xwe didane wî. Ew careke mayîn li ser tabîya pêşin bû. Lê piştî çend deqa ew niqoyî binê avê dibû. Îsa bi yazixî got: «Kêmbawarno! çima tu dudilî bûyî?” /Metta 14:31/.

Nava serhatîke mayînda jî Petrûs, Yûhenna û Aqûb rêberîya Îsaye berbi çîyê dikirin. Li wir wana dît, ku sifetê Wî mînanî royê dibriqî û heta kincê Wî jî hatine guhartinê. Mûsa û Îlyas xuya bûn û tevî Îsa qise kirin. Gelo qedirekî çiqasî mezine! Lê hetanî ku Îsa û sê şagirtên wî ji çîyê peîya bûn, Petrûs pêşniyar kir ku çadira hazirkin, ji kîjana dudu bona Îlyas û Mûsa bûn /bixwînin Metta serê 17-a/. Dîsa ewî progiram û meremên Xwedê fem nedikirin. Bi bîra xweda xweyîkirina vê yekê, em qirarên Petrûse ewlin lêkolîn bikin, çawa rêberê civîna tezesazbûyî. Lê, hetanî destpêkirinê em gerekê tişteki girîng jî bîr bînin: çend roj ji wê yekê derbaz bibûn, dema ku Petrûs înkâr kiribû wekî ewî Îsa nas nedikir. Bona geleka ew yek dikaribû bibûya menîya neçûyîna peyî rêberîya Petrûs, bi taybetî heger ew mêtod û qirarên wîye pêşniyarkirîra qayîl nîbûna.

Em serpehatîya vê qewimandinê raberkin. Piştî jorhilata Îsa çend roj derbaz bibûn, û Petrûs kitêba Zebûrada xebereke pêxembertîyê dît, ya ku raste-rast girêdayî bû wê yekêra, ku Cihûda çawa Îsa firot. Petrûs ew li Mala Jorin li ber berevbûya xwend: “Çimkî kitêba Zebûrada nivîsare... “De bila qulixa wîye serwêrtîyê yekî din bistîne” /Karên şandîya 1:20/. Petrûs careke mayîn ew yek dît, çî ku yê mayîn nedidîtin, lê gelo ewê himberî dîtina xwe rast bikira?

Ew çî ku emê bixwînin, hûn dikarin wê yekê çawa fikir lê binihêrin, lê ez hêvîdarim ku ezê bikaribim ji kitêba Pîroz gelek îzbatîya raberkim, bona ku gotina xwe bînim ber çeva. Ez li ser wê fikirême, wekî Petrûs careke mayîn nava qirara xweda Xwedê fem nedikir, çimkî ewî pêşniyarî hemû mêra kir, yê ku hema destpêkêda tevî wan bûn, doranê bigrin, bona ku “peşk bia-vîtana” û bidîtana ku Xwedê wê dewsa Cihûda kê bibijarta.

Peymana Nûda hûnê li tu cîyekî nebînin, wekî Xwedê bi peşkavîtîne şandîkî bibijêre. Îsa rîya Xwedê nîşanî şagirtên xwe kir, wanra mînak hişt. Ewî temamiya şevê dua kir û guhdarîya Xwedê kir, hetanî ku 12 şandîyên ewlin bijartin /bixwînin Lûqa 6:12, 13/. Tiştê herî baş wê ew bûya, heger Petrûs bicêribanda mînanî mesela Îsa şandîyê mayîn qîrar bikira.

Bîr bînin, wekî piştî çend sala pêxemberên Entakîyayê û dersdar peyî mesela Îsa çûn. Wana rojî girtin û dua kirin, hetanî ku Barnabas û Şawûl bona qulixa şandîya cuda kirin /bixwînin Karên şandîya 13:1-4/. Eva jî derheqa wê yekêda îzbat dike, wekî birîyara Petrûse lez şaş bû.

Li oda jorine mezin, 120 merivî du kandîdat dîtin: Matîyo û Yûsto. Matîyo peşik bir û hate hesabê ku ew tevî şandîyaye /bixwînin Karên şandîya 1:23-26/, lê hûnê îdfî peymana Nûda navê Matîyo nebînin. Bona çî? Çimkî kitêba Pîroz dide kifşê, wekî Xwedê dewsa Cihûda Pawlos bijart, lê ne ku Matîyo. Awa bo çî Pawlos dinivîse:

“Aqûb Ew [Îsa] dît. Lê paşê hemû şandî Ew dîtin. Dawîyê, tê bêjî ez wedekî şaş hatibûme dinê, min jî Ew dît. Çimkî ez nava hemû şandîyada yê herî biçûkim” /A Korintî 15:7-9, NLT/.

Pawlos derheqa xweda got, wekî tê bêjî ew wedekî şaş hatibû dinîyayê: bi gilîkî mayîn gotî, ew bi texmîn, bona bûyîna nava 12 şandîyên ewlinda gelêkî ciwan bû. Bi lêkolînkirina wê yekê, min gelek fikir û salên derheqa bûyîna Pawlosda dîtin: qîmetkirinên kanîyên cuda-cuda hetanî 14 sala li hev nagrin. Tiştêk wek îzbatîye, wekî tu kes sala bûyîna wî nizane. Dêmek, dîna xwe bidine wedê peymana Nû, bona ku hûn derheqa yaşê wîda bînin ber çevê xwe.

Anegorî piraniya melûmetîyên dîrokî, mirina Steyfan çar sala piştî rabûna Îsaye ji nava mirîya qewimî, û ew yek dide kifşê wekî Îsa şagirtên Xweye ewlin hevt sal pêşîya wê yekê bijartibûn. Wextê ku Steyfan dane ber kevira, kitêba Pîroz Şaûl /Pawlos/ çawa “cahil” nav dike /bixwînin Karên şandîya 7:57/. Anegorî “*Ferhenga yûnanî-înglîzî*”, ew xebera yûnanî, ya ku bi xebera “cahil” hatîye tercimekirinê, wedê gihîştina xortekî dide kifşê. Dêmek, heger em hevt sala ji wan sala derxin, wî çaxî meriv dikare bêje, wekî Pawlos bona bûyîna nava şandîyên ewlinda gelekî cahil bû.

Ez bi tamamî bawar dikim, wekî Pawlos bijartina Xwedê bû. Ber û ser-wêrtîya wî, himberî Matîyo, nava jîyana wîda kifş bûn. Gotina mine hîmlî eve. Bi fikira min, Petrûs çawa rêber, nişkêva biriyareke usa qebûl kir, ya ku ne anegorî progirama Xwedê bû. Heger ewî li civîna wedê niha usa bikira, wî çaxî emê bi texmîn, pareveyî ser sê koma bûna: ya ewlin wê dijî wê yekê bûya, ku bi peşikê şandî bibijartina, ya duda wê bigota, wekî hewcetîya şandîyên nû tune, lê ya sisîya wê qayîl bûya, ku bi peşikê şandî bibijartana û wê tevî Petrûs bima. Lê belê, awa kitêba Pîrozda piştî wê yekê çi hatîye nivîsarê:

“Gava roja Pêncîye hesab hat, hemû jî *hevra* li cîyekî bûn” /Karên şandîya 2:1/.

Xebera “*yekbûn*” zimanê yûnanîda xebera “*homotûmadon*”e. Şirovekirina vê xeberê eve: “bi fikirekî, qayîlîya tevayî, yekbûyî, hemû bi *hevra*”. Ev şirovekirin veqetandinê têra nabîne, him bi fikirê, him jî bi karva. Ew bi merem, bi fikirê, bi dil û bi ruhva yekbûyî bûn. Nava encamê wê yekêda çi qewimî? Kitêba Pîroz dibêje, wekî wê rojê 3000 meriv hatine ser rîya rast. Heger em vê hejmarê pareveyî ser 120-î bikin, wê eyanbe, wekî ew 25 cara hatine *çendbarebûnê*. Derheqa wê yekêda bifikirin: wextê qulixkirinekê civîn 25 cara zêde bû. Bi saya yekbûna wan, Xwedê duayê Xwe da wan. Eva qanûna ruhanîye.

Ez li ser wê fikirême, wekî li Oda mezine jorin hebûn bawarmend, yên ku wê cûrekî mayîn bikirana, ne ku Petrûs. Bêşik, wê diha baş bûya, ku peyî mesela Îsa biçûna û pêşîya qebûlkirina qirara wî cûreyî, wedekî anegor bona dîtina Xwedê başqe bikirana.

Nenihêrî wê yekê, wekî mecala wê bijartinêye diha baş hebû, li Oda jorin meriva tiştê serekeyî diha mezin didîtin: ew, bi qebûlkirina stratêciya rêberê xwe, yekbûyî man. Her kesî gav avît, tê bêjî ew fikir ya wî bûya. Gelo çiqas car em badîhewa û rûyê tiştên biçûkda, kîjanara em qayîl nînin, parçe dibin.

Îzinê bidin ku ez rastîke girîng raberkim: heger rêberê we qirarê qebûl dike, kîjanê kitêba Pîroz çawa *guneh* qîmet dike, eva tiştê tek-tenêye, wextê ku wera tê gotinê ku hûn qayîl nebin. Feqet, gelek parçebûn rûyê mêtodada diqewimin, lê ne ku rûyê *gunehda*/.

QEWATÊN BINA

Em gerekê bîr nekin, wekî qayîlnebûn bi xebera û kirinava nayê sînorkirinê. Qayîlnebûn diha kûre:ew nava fikirê, dil û ruhdane. Careke mayîn ew hersê beşên ji Încîlê bixwînin û bînin bîra xwe. Em dikarin ji derva yekbûyî

bêne kifşê, lê bi menî û fikirên xweva parçebûyî bin.

Dayîka min li ştata Florîdayê, li Vêroyê dijî. Ji mala wê, nêzîkî 20 kîlomêtrî dûr cîyek heye, yê ku tê navkirinê çawa çela Sêbastîyan. Ew cîh bi qewatên xweye binavva bona binelîya eyane. Qewata binav tişteki usaye, ya ku li ber çeva nayê kifşê. Ava okêanêye jorin tê bêjî li ser alîkî dikişê û tê bêjî nêzîkî kenar dibe. Feqet binê avêda, av lez wekî mayîn dikişê. Ev qewata wekî mayîn çî ku ber ket, dibe berbi behra vekirî û carina jî emirê wan ji wana destine

Gelo li civînên me, li îdara, mekteba, hukumata, komên sportê û klûbada qewatên wî cûreyîye binav hene, yên ku çetinaya bi cûrê tunekirinê bona çendbarekirinê pêşda tînin? Belê! Menî kîjane? Diqewime menî ewe, ku em dicêribînin padişatîya Xwedê bi fikirdarîya dêmokratîk çêkin, lê ne ku bi fikirdarîya padişatîyê.

Em welatîyên padişatîya rastin û em nikarin serwêrtîya ji alîyê Padişê meda kifşkirî hesab hilnedin. Duayê wî eyan dibe, dema ku em bi dil gura rêberên xwe dikin.


Em gerekê ji xwe bipirsin: *“Diha girînge wekî em rastbin, yan yek-bûyîbin?”*. Hûn dikarin bi sed selefîva rastbin û bi wê yekêva tevayî bi sed selefîva şaşbin. Heger komek hebûya, ya ku wê pêşniyar bikira, ku qirara Petrûs hesab hilnedana, ya derheqa peşikavîtinêda û dewsa wê bi rojgirtinê û duayêva ew yek bikirana /anegorî wê meselê, ya ku me kitêba Pîrozda dît/, ew kom wê bi sed selefîva rast bûya. Lê rûyê bêtifaqîya wanda hatina duayê Xwedê wê bisekinîya.

Heger hûn bîr tînin, *çendbarebûna ecêbe* ewlin kitêba Pîrozda peyî wê yekêra qewimî, wextê ku bava emirkirina qulixê kirin. Peyî wê yekêra em dixwînin: *“Hemûya ev fikir begem kirin” /Karên şandîya 6:5, TPT/*. Gelo encamê wê kîjan bû? *“Hejmara şagirta li Orşelîmê bi mezinayî çendbare bû” /Karên şandîya 6:7, NKJV/*. Hemû kesê li civînê ew yek qebûl kir, tê bêjî ew stratêcîya wan bû. Ez dîsa bêjim, wekî ez li ser wê fikirême, ku meriv dikaribûn wê yekêra qayîl nîbûna, lê wana rastîk eyan kiribû: *“Diha başe duakirîbî, ne ku rastbî”*. Dêmek, wana ew mêtod usa qebûl kirin, tê bêjî ew fikir ya wan bû.

Niha emê pirsê here çetin bidin: ji me çend meriv wê li ber dîwana Îsa bisekinin, yên ku wê piştî wê yekê ecêbmayîbin, ku Ewê çî eyanke? Gelo Ewê bi hêsira nîşanî me bide ku çawa serhişkîya me duayê Wî, yê temîkirî, da sekinandinê? Gelo emê meriva bibînin, yên ku gerekê hukumê heta-hetayê li ser xwe bikirana, û emê tevî Wî bigirîyana, bi femkirina têberdana mecalên çendbarekirinê? Ji me gelek meriv wê bixwezin paşda vegevin û berbi yekbûnê bicedînin, lê ne ku rastbin, lê wî çaxî îdî wê derengbe.

BIFIKIRIN

1. Bav ew meriv e, yê ku rêberîyê dike, dide û kûltûrayê tîne nava jîyana şexsekî, yan jî teşkîletekî. Bav dikare li ser gelek tabîya cîhê xwe bigre: serkar, serwêr, rêberê koma biçûk, serokê beşê, dersdar, telîmkir, eva tenê çend mînak bûn. Bavên jîyana we kîne? Wan çi cûreyî wera bawtî kirine?
2. Kur yan jî keça amin wê cûrê şuxulkarîya bavê xwe çendbare bike. Bona çi girînge ku hûn çav bidine cûrê şuxulkarîya rêberên xwe? Ev yek çi cûreyî hevraqayîlnebûna nava dîtînokê, mêtoda û kûltûrayêda înkâr dike?
3. Bona çendbarekirina hebûka merivekî başqe, hûn gerekê bi xwe “xwe pêş bixin”. Gelo hûn merivên usa dibînin ku pêşkêşên wane wî cûreyî hene û hûn wê serwaxtîyê û cûrê şuxulkarîyê derbazî cem wan dikin, yê ku hîn bûne? Gelo hûn merivên başqe bilind dikin, bona kirina wê xebatê, kîjanê hûn niha dikin? Heger na, hûn çawa dikarin wê yekê destpê bikin?



“Axayê min, min zanibû ku tu merivekî hişkî, u tu wî berî didrûyî, yê ku te neçandîye, û wî berî berev dikî, yê ku te nereşandîye. Ez tirsîyam, ku minê perê te unda bikira, û min ew erdêda veşart”.

– Metta 25:24, 25, NLT

Dijwarîyên çendbarekirinê A

Niha emê diha bi hûrgilî menî û fikirên mesela Îsaye derheqa xulamê xweranedîtîda lêkolîn bikin. Bona çi herdu xulamên mayîn çendbare kirin, lê ewî tenê xweyî kir? Bona çi herdu xulamên mayîn çawa “qenc û amin” hatine navkirinê, lê ew “xirab û xweranedîtî”?

Hetanî dûmayîkirinê, werin em derheqa rastîkêda xebêrdin: *wextê ku yek nava hazirîya Îsada disekine, nikare derewa bike*. Bona çi ez vê yekê bîr tînim? Îzinê bidin ez bi meselekê şirove bikim. Gelo we filmên derheqa cesûsada dîtine, kîjanada wextê lêpîrsînê derman bi derzîyê dikine nava xwîna wî, bona ku surên wî pê bihesin? Cesûs wê yekê gilî dike, bona kîjanê ewî sond xweribû, ku tu kesîra nebêje: temamîya rastîyê wî çaxî eşkere dibe.

Îzinê bidin ez meselekê bînim ber çeva. Wextê ku ez teze zewicî bûm, ez hê negihîştî bûm û min bêçarebûn texmîn dikir Hinek cara min kirinên xwe çawa yên qebûlîkirinê hesab dikirin, hetanî ku Lîza dijî min dernediket. Wextê ku me derheqa wê yekêda xeber dida, min kirin û menîyên xwe diparastin û gelek cara min digot, wekî xebêrên min yên gotûbêjîkirinê nînin. Diha dereng, wextê ku min dua dikir û ez diketime nava hazirîya Xwedê, min fem dikir, wekî Lîza bi temamî rast bû. Ez şikestî paşda vedigerîyame cem wê û min şaşîya xwe qebûl dikir.

Bi rastî, derewkirin, nerastî, fêlbazî, qelpî û tiştên mînanî wê yekê, nikarin nava hazirîya Xwedêye padişatîda bimînin. Îsa dibêje:

“Ew wede tê, wextê ku, çi ku veşartîye eyan dibe û hemû sur bona hemûya eyan dibe. Ew hemû tiştê ku we nava tariyêda gotîye, wê nava ronahîyêda bê guhdarkirinê, û ew hemû tiştê ku we piş derîyên girtî kirîye piste-pist, wê bona hemûya li ser banê avaya bê elamîkirinê” /Lûqa 12:2, 3, NLT/.

Bi vê gotinê, Îsa derheqa dîwanêda digot, wextê kîjanê wê tu kes nikaribe bi xapandin bifikire û xebêrde, çimkî atmosferî li wir bi temamî wê rastîyêva

tijîbûyîbe, û tu derewek, yan jî xebra derew, wê nikaribe bê gotinê. Ew yek, wekî derheqa wekîltîyêda nava mesela meda çawa dîwan tê raberkirinê, dide kişfê, wekî em dikarin li ser wê fikirêbin, wekî bersiva xulamê xwer- anedîtî ya rast bû. Ewî xwe eşkere kir, û hema gotinên wî jî ew gunehkuar kirin.

Du faktorên girîng hene, rûyê kîjanada çendbarebûna *heta-hetayê* neqewimî:

- Ewî xeysetê axayê xwe nas nedikir.
- Ew ditirsîya.

Ev herdu menî bi sirîya rast hatine danînê. Ya duem, gelek cara, lê ne her dem, ji ya ewlin tê, çimkî nasnekirina xeysetê Xwedê bi hêsanî alî tirsê dike. Evê diha zelal bê kifşê, wextê ku em dîsa van herdu şaşîya bidine eşkerekirinê.

“Ez bawarîya xwe li çi tînim”

Em destpê bikin şaşîya ewlin bi serhatîkêva bidine eşkerekirinê. Firîna bi teyarêye heyştsehetê, ya berbi adên Havayê teze serhevda hatibû. Min hela hê kincên xweye rêwîtiyê neguhartibûn û ez hîvîya wê yekê bûm, ku bona min oda mêvanxanê hazir bikirana. Ez li ber hewzê avê rûniştim ku hinekî hêsbûma. Li wir usa jî jineke bîznêsmên hîvîyê bû, ya ku hatibû li wir ku tevî hemcivîneke başqe bibûya. Me bi hevra qise kir, û wextê ku ew pê hesîya, wekî ez xudanê nivîsarên mesîhîtiyême û qulix dikim, ewê destpê kir derheqa pêwandîyên xweye tevî Xwedê xeberde.

Deqek, yan du deqe hatine xwestinê, bona ku meriv fem bikira, wekî ewê Xwedê nas nedikir. Ewê li ser xwe guman tiştên usa digotin, wekî bi xwe li wan tiştên *bawar dikir*, nenihêrî wê yekê wekî ew gotinên wê yên ne anegorî rastîya kitêba Pîroz bûn. Hetanî ku ewê derheqa fikirên xweda gilî dikir, min hîvî ji Ruhê Pîroz kir ku serwaxtiyê bide min, û Ewî nîşanî min da, ku ez gerekê çi bêjim.

Wextê ku wê jinê xebardana xwe ser hevda anî, min jê pirsî:

- Hûn wî mêrê ku wî berî hewzê avê rûniştîye, dibînin?

-Belê, - ewê got.

-Îzinê bidin ez derheqa wîda wera gilîkim. -Min gotê. -Ew bêhesab şînayê duxwe: çi tiştê heywanva girêdayîye naxwe, hetanî hingiv jî naxwe. Ew dixweze bikeve nava koma Ştatên Yekbûyîye xweavêxistinêye olîmpîyê û herroj sê seheta xwe telîm dike. Ew badmîntonê, tênisê, firînen bi paraşyûtê û şikilkîşandinê hiz dike. Ew jina li cem cakûzîyê sekinîye, jina wîye û ew bi deh sala ji wî çûktire.

Gotina min li cem wê jinê hewaskarî pêşda anî, lê ew ecêbmayî bû, wextê ku min nişkêva têma xebardanê guhart. Ewê fikirên xweye kûre derheqa Xwedêda minra gilî dikir û nişkêva, çawa bersiv, min destpê kir derheqa mêrekîda, yê ku wî berî hewz rûniştibû, gilî bikim. Hewaskarîya wê ew alt kir, û ewê ji min pirsî:

-Ew jî diçe wê hemcivînê, kuda hûn diçin?

-Na, xanim.

-Heger usaye, hûn ji kîderê derheqa wî merivîda zanin?, - ewê diha bi hewaskarî ji min pirsî.

-Ez cara ewlin wî dibînim.

Vê carê ew gelekî tevlihevîyê û bi xemgînî ji min pirsî, ku ez ji kîderê awqas tiştî derheqa wî merivîda zanim. Ez nikarim bi temamî li ser xwe guman bêjim, lê bi hesabildana nihêrandina wê, ew difikirî, wekî ez yan xebatkarê îdara cesûsîme, yan jî agêntê byûroya cesûsî, yan xebatkarê polîsîyayême, yan jî jinhizim. Hewaskarîya wê gihîştibû asta here bilind. Piştî navbirîya biçûk min gotê:

-Ez bawar dikim, wekî ew yekî usa ye.

Ew zendegirtî bû û bêdeng ma.

-We hema hêja li ser xwe guman mezin gilî dikir, ku Xwedê bi fikira we çi cûreyîye, - min xebardana xwe domand. -Lê ew hemû tiştên ku we derheqa Wî da gotin, rast nînin. Ez wê yekê zanim, çimkî ez Wî nas dikim.

Piştî wê yekê ez vegeirîyam, min raste-rast çevên wê nihêrîn û gotê:

-Gotinên min, yê derheqa wî merivîda, kîjanî ez cara ewlin dibînim, bi tu tiştîva ji gotinên we cuda nabin. Wextê ku min derheqa wî merivê ku wî berî hewzê avê rûniştîye gilî dikir, min gote we ku min *bawarîya* xwe li çi dianî, û min bi dengê bilind li ser xwe guman derheqa wê yekêda digot. Dibek nava gotina minda gelek tişt rast nînin, çimkî min tu cara wede başqe nekirîye, bo ku wî merivî nas bikim.

Wê jinê guhdar dikir, lê ew hinekî tevlihevîyê bû.

-Xwedê Xebera Xwe nava rûpelên Încîlêda nivîsar da me, kîjan eyan dike, ku Ew kîye, - min rihet gotê. - Ewî usa jî Ruhê Xwe şand, bona ku Ruhê Îsa li me eyanke, lê Îsa jî sirîya Xweda Xwedêye Karîndar li me eyan dike, çimkî Ew bi bedenêva Xwedêye eyabûyîye.

Min xebardana xwe da sekinandinê û paşê bi cûrê nerm jê pirsî:

-Hûn difikirin, wekî ew yek tiştê bûyînêye ku fikira xweda we Xwedê xwera çê kirîye, yê k bi rastî tune?

Mixabin, ew yan hazir nîbû ku rûyê tunebûna zanebûna derheqa Xwedêda ber gilîyê minda bihata, yan jî ditirsîya û bi rastî nedixwest rastî Wî bê. Me

dîsa çend deqa qise kir û hinekî şûnda me xatirê xwe ji hev xwest.

Diqewime hûn bin pozê xweda dikenin, wextê ku hûn vê serhatîyê dixwînin û difikirin: «*Ez Xwedê nas dikim. Ez diçime civînê û min Încîl xwendîye*». Lê belê, hetanî ku em bi wê fikirêva ber dilê xweda nehatine, werin em halê fêrisîyayî xirab bîr bînin Wana tu cara berevbûnek bernedida, her dem dua dikirin, û rojî digirtin û dikaribûn pênc kitêbên Încîlêye ewlin ezberî bigotana /bêşik, pêşkiftina mine wî cûreyî tune/. Lê belê, wana Xwedêyê bi bedenêva eyanbûyî, Îsa, nas nekirin, Yê ku li ber wan sekinîbû.

XWEDÊ NAS BIKIN

Kî mecalâ naskirina Xwedê distîne? Ev teglîfikirin bona hemûya ye, lê normên zelal yên kifşkirî hene. Derê rastî bona heleqetîya bona me vekirî ye, wextê ku em dilê xweda qîrar dikin ku bi temamî jîyanên xwe teslîmî Wî bikin. Ne ku qîrara formal, lê ya usa, ya ku bi kirinên anegorva tê raberkirinê. Îsa dibêje: “Heger tu emirê xwe bona Min unda bikî, tê wî xilazkî” /Metta 16:25, NLT/. Gelo Ew çi dixweze bêje, wextê ku Ew derheqa xilazkirina emir-da dibêje. Caba vê pirsê zelale: jîyana rast tenê nava *naskirina Wîda* ye.

Em Xwedê bi çûyîna civînê, bi hevalên xweye mesîhîva, bi guhdarkirina sazbandîya hebandinê, bi wekilandina “duayê xilazbûnê”, yan jî bi kirina karên qenc, nas nakin. Încîlêda Îsa gelek cara çawa Zeva tê navkirinê, lê em jî çawa bûk. Dema ku zeva û bûk dighîjine hev, herdu dibin yek. Paulos dinivîse: “*Eva mesela* derheqa wê yekêdane, ku Mesîh û civîn çi cûreyî dibin yek” /Efesî 5:32, NLT/. Bona ku mera şirove bike, ku naskirina Wî çi dide kifşê, Xwedê *dannasînkirina berbiçev* da me, ya ku nava merivatîyêda belavbûyîye. Her roj em dikarin mesela sadeye heleqetîya tevî Wî bibînin, bi mecalâ *xêlîya zewacêye Pîroz*. Wextê ku jin bi kincê sipî li xwekirî cêrgên civînêra digere, bin dengê miqamê zewacê, ew tiştêkî gelekî hukumdare: ew xatirê xwe ji hemû 3. 930.000.000 mêrî dixweze. Ew temamîya dilê xwe, şexsê xwe, bedena xwe û jîyana xwe pêşkêşî wî mêrî dike, yê ku hîvîya wêye. Tiştêkî hewaskare, wekî qîrara wê sîmvola “*tobekirina*” raste. Ew mecalâ morkirina yekîtiya zewacêye tevî her mêrekî, ya li vê dinîyayê, înkâr dike. Ew û mêrê wê dikevîna nava peymanê: mêrê wê bi temamî yê wêye,

lê ew jî ya mêrê xweye. Herdu jî prosêsekê destpê dikin, ya ku mecalê dide ku heleqetîyên kûre dualî çêkin, hevdu diha baş naskin, lê ne ku naskirina merivekî başqe.

Niha ez dixwezim vê yekê bêjim, çi ku dikare wekî mayîn bê texmînkirinê, lê hetanî dawîyê guhdarîya min bikin. Ez bi xwe bawar dikim, wekî dijwarîke mezin, ya ku me nava pirsâ *naskirina Xwedê* da çêkirîye, “*duayê gunehkar*”e. Em vî cûreyî dikin: em heleqetîya tevî Xwedê usa difroşin, ku tê bêjî em

tişteki frotanê rêklam dikin. Piştî banga mizgîndarîyê, yan jî qisa şexsî, em dibêjin: “Hûn dixwezin Xwedê nas bikin? Hûn dixwezin tevî Efrandarê xwe bikevine nava heleqetîyê? Wî çaxî vî duayî dua bikin: “Îsa, were nava jîyana min. Ez gunehên xwe tube dikim. Ez Te çawa Xilazkirê xwe qebûl dikim. Spas, wekî Tu li min dibaxşînî û min dikî lawê Xwedê»».

Ya mayîn ewe, wekî em behsa şabûnê derheqa bûyîna nûda hazirên mayînra eyan dikin, rûyê wê yekêda şa dibin, wekî yên ku ketine li ser rîya heta-hetayêye rast nava Xwedêda çareserbûyîne û wana teglîfî berevbûnên xwe dikin. Lê belê, me derheqa tobekirinêda tu tişt negot, derheqa wê yekêda wekî ew gerekê ji cûrê jîyana xwehizîyê paşda bisekinin û emirên xwe pêşkêşî Xwedê bikin. Lê gotina Îsa bi temamî guhdar bikin:

“Heger hûn bi rastî dixwezin peyî Min bîn, hûn gerekê bi temamî emirê xwe înkarkin. Û hûn gerekê hazirbin, xaçê Min hildin û wî çawa yê xwe qebûlkin, li ser rêyên Min xwe pêşkêş bikin. Çimkî heger hûn xwepêşkêşkirinê bibijêrin û emirên xwe bona rûmeta Min undakin, hûnê her dem jîyana rast bidine eşkerekirinê. Lê heger hûn qirarkin, ku emirê xwe bona xwe xweykin, hûnê ji wê yekê miqûf bimînin, çi ku hûn dicêribînin xweykin “ /Metta 16:24, 25, TPT/.

Em dikarin bi rastî Xwedê naskin, heger em destpêkin bi cûrê rast tevî Wî bikevine nava heleqetîya, derheqa çida Îsa nava van gotinada dide kifşê. Naskirina Xwedê qewimandina yekcar nîne, lê ew qirara îzbatbûyîye, ya bona kirina gura rêyên Wî, û çûyîna peyî wan, lê ne ku peyî wî tiştî, kîjanî hûn bona xwe çawa yê herî baş hesab dikin. Ev qîrar her roj û her car tê qebûlkirinê. Heger gotina Wî pirseke nava jîyana weda zelal eşkere dike, wî çaxî hûn gerekê ji guhdarkirinê nerevin. Çûyîna peyî Îsa dide kifşê, wekî kûraya dilê xweda hûn qîrar dikin wî hemû tiştî înkarkin, çi ku Wî dide xeydandinê, û her dem qulixî Wî bikin.

Aqûbê şandî dinivîse: “Lê tenê guhdarîya Xebera Xwedê nekin. Hûn gerekê wî hemû tiştî bikin, çi ku Qîrar dibêje. Heger usa nebe, wî çaxî hûn tenê xwe dixapînin” /Aqûb 1:22, NLT/. Ew merivê ku guhdarîya Xebera Xwedê dike, lê bi fikira xwe, xeber û kirê xweva bersivê nade, usaye ewî xwe xapandîye.

Tercima bi navê “Şabûn” wê yekê çawa “xwexapandin” nav dike, û ew yek bi fikira min derheqa wekîlê sisîya, fêrisîya, wê jina ku li ber hewzê li adên Havayê bû û gelek merivên başqedane, rastî kîjana ez hatime, yên ku bi temamî li ser wê fikirêne, wekî tevî Xwedê nava heleqetîyadanin, çimkî ew diçine civînê û beşên nivîsarên pîroz ezberî zanin, lê çawa qanûn dijî Xebera Wî dibêjin û dijîn. Ew telebextra şaşbûyîne. Ew yek çawa *xwexapandin* tê navkirinê.

Îzinê bidin, ez lez tiştêkî girîng bêjim. Lîzayê bêje we, wekî ewê nava salên zewaca meda gelek şaşî kirine /min diha gelek şaşî kirine, lê vê carê ez derheqa bûkêda dibêjim/, lê ewê tu cara bi zanebûn necedandîye xwestinên xwe mîyaserke, ew jî kîsî peymanaya meye zewacê. Kirinên wê tam nîbûne, lê dilê wê tu cara ji aminayê dûr neketîye.

Hema wî cûreyî jî nava heleqetîyên meye tevî Xwedêye, heger em carina gurê nakin, Ew dibaxşîne. Vê yekê em dikarin himberî wê yekê bikin, wekî mêr û jin peymanaya xwe nateribînin, wextê ku ji wana yek şaş dibe. Heleqetîya meye tevî Efrandarê me li ser hîmê aminaya raste ku ji dil dikişê, çêbûyîye, ew tenê ji lêvê meriva dernakeve, bêyî hesabildana karên anegor.

Îsa gotineke berk dibêje: “Heger kesek *dixweze* xwestina Wî bike, ewê *bi-zanibe ...*” /Yûhenna 7:17/. Hemû tişt ji kûraya heyîna me tê, dema ku em bi kûrayî dixwezîn bişuxulin, lê ne ku tenê guhdar bikin. Em wê yekê *dikin* çî ku Ew dibêje, û wî çaxî em *pê dihesin*. Em Xwedê û Xebera Wî pê dihesin û *nas dikin*. Tercîma “Şabûn” bi cûruê bedew Yûhenna 7:7 şîrove dike: “Berî her tiştî, bi kel û ced bicedînin xwestina Xwedê mîyaserkin, lê paşê hûnê bikaribin ji hev cudakin, ku gelo hînkirinên Min ji dilê Xwedê tên?”

Nava mesela talantada hersê xulama jî ew emirkirin bihîstin, wextê ku agayê wan gerekê biçûya. Du xulama gotinên wî kirin, lê yekî tu tişt nekîr. Ew yek badîhewa nîne, wekî hema xulamê sêem bi rastî agayê xwe nas nedikir, û rûyê wê yekêda gotinên wî nekîrin. Ew ketibû nava xwexapandinê.

XOFA PÎROZ

Em dikarin gotûbêjkirina xweye hetanî niha bi gotineke Încîlê şîrove bikin: “*Xofa Xudan*”. Gelek tirsên cuda-cuda hene, xwezîma nava rojêd meda, em ji vê gotinê ditirsîn. Lê belê, *du cûrê tirsê* hene, yên k bi temamî ne mînanî hevî. Ji wana yek *tirsa ruhe*, lê ya mayîn *tirsa Xudane*. Kitêba Pîroz di navbera van herdu tirsada firqîyê datîne. Mûsa peyî wê yekêra gote cimeta Xwedê, wextê ku ew ji hazîrîya Xwedê dûrketin.

Mûsa gote cimetê: “*Netirsîn*, çîmkî Xwedê hatîye we bicêribîne, wekî *xofa Wî* ser webe, ku hûn guneha nekin”. Cimet *dûr sekinî*, lê Mûsa çû *nêzîkî* wê tarîya şevreş *bû*, wê dera ku Xwedê lê *bû*” /Derketin 20:20, 21/.

Pêşda meriv texmîn dike ku tê bêjî Mûsa bi xwe dijî xwe derdikeve. Îzinê bidin ku ez gotîna wî bona zelalkirinê şîrove bikim: “*Netirsîn*, çîmkî Xwedê *hatîye bibîne*, ku gelo *tirsa Wî* nava wedaye?”. Gotîna wî ne dije: ew firqîya di navbera “Ji Xwedê tirsîyayî” û “*Xofa Xudan*”da dide kifşê, çîmkî di navbera herduada firqî heye. Ew merivê ku ji Xwedê tirsîyayîye, tiştêkî wîyî veşartî heye. Bîr bînin ku Adem ji hazîrîya Xudan xwe veşart, wextê ku ewî dijî Wî

guneh kir /Destpêbûn 3:8/. Lê ew merivê ku li cem wî xofa Xwedê heye, tu tiştêkî veşartî tune: ew diha gelekî ditirse ku ji Xwedê dûrkeve.

Dêmek, îzinê bidin hema ji destpêkê vê yekê bêjim: “*Xofa Xudan nade kifşê ku ji Xwedê tirsîyayîbin*”. Em çî cûreyî dikarin ji nêzîkva tevî wî nava heleqetîyadabin, ji kîjanî em ditirsin? Çawa ku min îdî gotîye, xofa pîroze rast tîrsa dûrketina ji Xwedê dide kifşê. Hûn naxwezî ji hazîrî û hizkirina Wî dûr bimînin. Hûn qewînin, nenihêrî wê yekê ku hal çî cûreyîye, yan jî ew hal çawa tê ber çevê we. Hûn zanin, wekî ji bûyîna li cem Wî baştir cîhekî başqe tune. Merivê ku li ser vê tabîyêye gura Wî da ye.

Heyîna xofa Xwedê dide kifşê, wekî ew meriv diha bi qedir û hurmete hindava Wî da, ne ku hindava yekî mayînda. Ew dide kifşê, ku qîmetîyên here bilind bidine Wî, û xwestinên dilê Wî hesabkin çawa yên diha giranbiha û qîmetlû, ne ku yên me. Em wî hemû tiştî hiz dikin, çî ku Ew hiz dike, û em wê yekê hiz nakin, çî ku Ew hiz nake. Ew çî ku bona Wî girînge bona me jî dibe girîng: ew çî ku awqasî jî bona Wî girîng nîne, awqasî jî bona me ne girînge.

Bi heyîna vê tabîyê, em dikevî nava cêrga wan meriva, yên ku teglîfkirîne bona ku nêzîkî Wî bin. Em dibînin wekî hizkirina zarokên Îsrayêl, ya hindava Xwedêda, ya bi peymanê bû. Dema ku hal bona wan baş bû, wana diheband, gurê dikirin û hiz dikirin. Wextê ku hal nebaş bû, wana gazin dikirin. Hindava Wî da guman nîbûn. Wana dîcedand emirên xwe xilazkin û dijî wê gotinê derketin, kîjan Îsa Mizgînîyêda kir: wana ew mecala bi rûmet, ya heleqetîyên raste tevî Xwedê ji destê xwe berdan.

Li cem Mûsa xofa Xwedê hebû, lê li cem wan tunebû.

Menîyên wan hatine eşkerekirinê: cimet *dûr sekinî*, lê Mûsa *nêzîkî* hazîrîya Xwedê bû. Raste, ew dijîtin, lê mînanî kora tiştê herî baş nedidîtin. Himberî wan Mûsa zelal didît. Mûsa Xwedê nas dikir: Xebera Wî, rê û serwaxtîya Wî, lê wana bi awqasîva Xwedê zanibûn, ku çawa Ewî bersiva duayên wan dida.

Dema ku li cem me xofa Xwedê heye, em carekêra gura Wî dikin, hetanî wî çaxî jî, wextê ku ew yek mera bêfeyda tê texmînkirinê, tê kifşê, ku bona me kardar nîne, yan jî dikare zyanê bide me. Em xeysetê Wî nas dikin û bo wê yekê jî em gumanin. Heger tiştê li me çawa tiştêkî zîyandar tê texmînkirinê, emê berbi undabûnê neçin, heger em gura Xwedê bikin. Ya dawî, bûyîna nava xofa Xwedêda bi gurêdabûnêva tê kifşê. Birahîm hema wî cûreyî kir, wextê ku Xwedê gote wî, ku wî hemû tiştî bihêle, çî ku bona wî tiştê herî girîng bû, bona kîjanî ew 25 sala hîvîyê sekinîbû. Ewî gote Birahîm ku wî merivî bike qurban, kîjanî ewî ji hemûya zêdetir hiz dikir: Ewî gote Birahîm ku kurê xwe Îshaq bike qurban. Birahîm sibe zû derket û rîya sê roja da ber xwe, bona ku hîvîkirina Xwedê biqedanda. Xwedê tu menîk raberî wî nekir,

û tê bêjî ew qurbanî wê ew hemû tişt unda bikira, bona çî Birahîm dijît. Tê bêjî ew undabûn bû. Lê ewî bawarîya xwe li *xeysextê* Xwedê anî /ew yek dijî kirina xulamê xweranedîtî bû/.

Çawa ku Birahîm kêr bilind kir ku Îshaq bikuje, milyaketê Xudan ew da sekinandinê û got: “Bi tu cûreyî zyanê nede wî, çimkî Ez niha zanim, wekî tu *bi rastî* ji Xwedê *ditirsî*. Te hetanî kurê xwe, kurê xweyî tayê tenê, bona Min nehêvişand “ /Destpêbûn 22:12, NLT/. Hizkirina wî cûreyî, aminayî û bawarî dilê wî merivîdanin, li cem kîjanî xofa raste ji Xwedê heye.

Nivîsare: “Xofa Xudan destpêbûna zanebûnêye” /Gotinên Silêman 1:7, NKJV/. Kîjan zanebûn? Em bersiva vê pirsê piştî çend xebera dibînin, lê em usa jî qewila vê bersivêye pêşin bixwînin, ya derheqa bilindkirina Xebera Wî ye ji hemû tiştî, çawa ku ew yek Birahîm kir:

“Kurê min, heger tu gotinên Min qebûl bikî û temîyên Min mînanî xiznê dilê xweda xweyîkî, bona ku guhdarîya serwaxtîyê bikî û femdarîya dilê xwe rastkî, belê, heger tu bikî qîrîn û pircûretîyê hîvî bikî û dengê xwe bilindkî, femdarîyê hîvî bikî, heger wî mîna zîv bigerî, û mînanî xiznên veşartî wî bigerî, wî çaxî tê xofa Xudan fem bikî û tê *zanebûna derheqa Xwedêda bibîni*” /Gotinên Silêman 2:1-5, NKJV/.

Bersiv gelekî zelale: xofa Xudan *destpêka zanebûna derheqa Xwedêdane*. Îro meyê hinekî cûrekî mayîn ev fikira bida eyankirinê. Me dikaribû bigota: “Tê xofa Xudan fem bikî û tê destpêkî ji nêzîkva Xwedê nas bikî». Niha em koka şaşîya xulamê xweranedîtî fem dikin. Xofa pîroz li cem wî tunebû, çimkî ew yek ji bêxebatîya wî û ji bersiva wî tê kifşê. Wî xulamî agayê xwe çawa dîktator hesab dikir, yê mînanî Îsrayêl, yê ku carina hema wî cûreyî jî derheqa Xwedêda difikirî. Ew hindava xeysetê rêberê xweda kor bû.

Xofa pîroz destpêka naskirina Xwedê ye. Zebûr wê yekê îzbat dîke û dibêje: “Xudan hevalê wane, yên ku ji Wî ditirsin» /Zebûr 25:14, NLT/. Heval ew merivin, kîjna em *ji nêzîkva* nas dikin. Îsa dibêje: «Hûn didine kifşê, wekî hûn hevalên Min, yên nêzîkin, wextê ku hûn gura wî hemû tiştî dikin, çî ku Ez wera dibêjim” /Yûhenna 15:14, TPT/.

Nava meda hene gelek meriv, ên ku dibêjin, wekî ew Îsa wî cûreyî “h’iz dikin”, çawa ku em dibêjin, wekî em artîstekî eyan, sportsmênekî, yan jî şexsekî mayîne eyan hiz dikin. Destpêka sala 2020-î, wextê ku baskêtbolîstê amêrîkîyî bi nav û deng Kobî Brayant û keça wî Cîyanna rûyê ketina helîkoptêrêda wefat bûn, temamîya Amêrîkayê şîn dikir û gelek jî digirîyan. Meriva wî çaxî nivîsar û kulîlk dianîn li ber “Stêypils Sêntrî” ya Los Ancêlêse, li kîderê ewî baskêtbol dilîst. Min jî rûyê wê tragêdiyayêda şîn dikir û ez gele-

kî derheqa wê yekêda difikirîm.

Lê belê, nava meda gelek meriv, ewên ku şîn dikirin, Kobî usa baş nas nedikirin, çawa ku jina wî, malbet û hevalên wîye nêzîk ew nas dikirin. Heger ewî li derva em bidîtana, ewê pê nehesîya, ku em kîne. Ez tu cara tevî wî nava heleqetîyada nîbûme, lê min şîna wî dikir, tê bêjî min ew nas dikir. Çawa ku Kobî wê wextê saxîya xwe ez nasnekirama, usa jî wê gelek jin û mêr hebin, yên ku dibêjin ku Îsa nas dikin, çimkî ew çûne civînê, derheqa Wî da torên sosîyalîda nivîsîne, stiran derheqa Wî da bihîstine, bi navê Wî tişt kirine û Ew hebandine, wekî Ew Xudanê wane. Lê bersiva Îsa wê evbe: “Min tu cara hûn nas nekirine”. Awa bo çî:

“Ne hemû kesin, wekî gazî Min dikin «Xudan, Xudan», wê bikevine padişatîya Ezmîn. Tenê ewê bikevinê, yên ku bi rastî xwestina Bavê Minî Ezmana dikin. Roja dîwanê gelekê bêjine Min: “Xudan, Xudan. Me bi navê Te pêxembertî kirin û bi navê Te cin derxistin, û bi navê Te gelek keremet kirin”. Lê ezê bêjim: “Min hûn tu car nas nekirine. Ji Min dûrkevin, hûn qanûnên Xwedê diteribînin” /Metta 7:21-23, NLT/.

Emê tu cara nexwezin ku Xudan wî cûreyî mera bêje. Heger em vê beşa nivîsara pîroz bi guhdarî lêkolîn bikin, ev meriv li ser xwe guman bûn, wekî heleqetên wane tevî Îsa hebûne, û ew bi saya wê yekê jî şa dibûn. Kobî wê bigota min: “Hûn kîne, ji kîderêne? Navê we çîyê? Vî cûreyî jî Îsayê bêje gelekê, ewên ku dibêjin ku Wî nas dikin: «Ez we nas nakim, û nizanim ku hûn ji kîderêne» /Lûqa 13:25, NLT/.

TEVÎ WÎ WEDE DERBAZ BIKIN

Xofa Xudan, destpêka naskirina Wî ya ji nêzîkva ye, lê bona çî ji destpêkêda îzbat dibe? Diha zêde nava heleqetîyên xweda kûrbin, çimkî Ew gazî we dike, ku hûn diha zêde nêzîkî Wî bin. Temîke wa mera hatîye dayînê: “Nêzîkî Xwedêbin û Ewê nêzîkî webe”/Aqûb 4:8/. Tiştê ecêbmayînê ewe, wekî em dereca nêzîkaya xweye tevî Wî qirar dikin.

Ez zendegirtî dimînim, wekî gelek bawarmend ji wê jinê cuda nabin, ya ku min li adên Havayê dît. Ew “Zanebûna derheqa Xwedêda” ji torên sosîyalî, stiranên hebandinê, bloga, qisên hevala û hevtê carekê ji serwêrê xwe pê dihesin, dema ku derheqa Wîda xeber didin. Lê ew tevî Xwedê wede derbaz nakin.

Lêpîrsînên here nû didine kifşê, wekî merivên ji 15-a hetanî 25 salî nava hevtêda 53,7 seheta li ber êkrana, smartfona, planşêta, kompyûtêra û tîlêvîzîyona derbaz dikin. Tiştêkî hewaskare, ku ew çiqas wede tevî Xebera

Xwedê wede derbaz dikin? Û ev pirs ne tenê derheqa cahiladane.

Eva ji 40 salî zêdetire, wekî ez Încîla xwe dixwînim û ew kirineke mine here hizkirîye. Hetanî destpêkirina xwendinê, ez her dem hîvî ji Ruhê Pîroz dikim, ku Îsa ji nûva minva bide eyankirinê. Bi sala ser hev, ez sibe zû hişyar dibim û wede başqe dikim, bona ku yan binê mala me, yan jî li derva bigerim, carina jî li oda mêvanxanê, û li wan dera bixwînim, dua bikim û guhdar bikim. Ez naxwezim bibim ji wan meriva, yê ku li temamiya dinîyayê Mizgînî dannasîn kirîye û tenê hîvîya pêşkêşa xweye, lê usa jî Pêşkêşkir nas nekirîye.


Xwedê dixweze ji nêzîkva tevî we nava heleqetîyada be. Hizkirina Wîye tam tirsê dide dûrxistinê. Gelek cara em fem dikin, wekî me mînanî wî xulamî kirîye, yê ku xeysetê agayê xwe nas nekiribû. Bo wê yekê jî ez ber dilê weda têm ku hûn dua bikin, bona ku Xwedê bi tirsaxweye pîroz dilê we tijî bike. Bona vî hemû tiştî dua bikin, wedekî baş tevî Wî derbazkin û heyîna Wîye rast eşkere bikin: Hizkirinê.

Xwedê em dîtin, em hiz kirin û bona me diha zû wefat bû, ne ku me Ew nas kir. Ewî ew eleqeta ecêb pêşda anî. Ew li alîyê weye. Ew hiz dike ku ji nêzîkva we nas bike. Lê belê, ew awqasî kûr me hiz dike, wekî naxweze me borcdar bike, ku em tevî Wî nava heleqetîyadabin.

Dêmek, hema niha qirarkin! Jîyanê bibijêrin! Qirarkin, ku ji nêzîkva Wî naskin...

BIFIKIRIN

1. Nezanîya xeysetê Xwedê her dem dibe menîya tirsê. Gelo fikirdarîya neraste derheqa xeystê Xwedêda hukumî li ser wê yekê kirîye, ku we çî cûreyî pêşkêş û navê xwe dane xebatê, û çî cûreyî ew yek kirîye?
2. Heleqetîya raste tevî Xwedê wî çaxî dibe, wextê ku hûn bi tamamî emirê xwe teslîmî wî dikin û dijîn, bi kirina gura Xebera Wî. Nava jîyana weda fikirdarî, yan jî kirineke usa heye, ya ku bona heleqetîya weye tevî Xwedê dijwarîyê pêşda tîne?
3. Di navbera *tirsa ji Xwedê* û *xofa Xwedê* da firqîke mezin heye. Firqî kîjane? Bona çî heyîna xofa Xwedê, bona naskirina Xwedê, ya ji nêzîkva, faktora qirarkir e?



*“Xudan, ez zanim, wekî normên Te yên
bilind hene û tu şuxulkarîya nebaş hiz nakî,
wekî Tu dewa tiştê herî baş dikî û
heger şaşî dibe ber danaxwî.
Û ez tirsîyam”*

– Metta 25:24, 25, MSG

Dijwarîyên çendbarekirinê B

Niha em hazirin gotina xulamê xweranedîtîyî duem lêkolîn bikin: "Ez tirsîyam". Tirsê ew civandibû ser hev. Gotina xulamê sêem, ya ji tercima "Bang" li min xweş tê: «Ez zanim, wekî normên Teye bilind hene... Tu dewa tiştê herî baş dikî û heger şaşe, Tu ber danaxwî.

Eva serhatîkê tîne bîra min. Min nava du komên telîmkirên cudada baskêtbol lîstîye. Herdu komên baskêtbolêda jî ez parêzerê êrîşkir bûm, çimkî li ser dûraya pênc mêtira min gelekî baş top diavîte zembîlê.

Telîmkirê minî ewlin dixwest ku me encamê herî baş bistenda û ewî berdildahatin, usa jî rastkirinên normal didane xebatê, ku em bighîştana wî encamî. Min zanibû, wekî ew ne dijî min bû, lê piştgirê min bû. Min li ser xwe guman ji beşên deştêye cuda-cuda top berbi zembîlê diavît. Bawarîya wîye hindava minda aminaya min dida gurkirinê.

Telîmkirê minî mayîn cûrekî mayîn bû. Bi gotina wî, ew merivekî usa bû "li cem kîjanî normên bilind hebûn û heger şaşî hebûya, ber danedixist". Dema ku min top diavît û ez nedighîştme meremê xwe, ew wextê navbirîya lîstîkêye mayîn bi cûrekî berk minra xeber dida, û peyî wê yekêra ez gelek cara ji lîstîkê der dimam. Wextê ku ewî telîm dikirin, min nikaribû top bi açixî biavîta. Dema ku ez tenê bûm û ew li wir nîbû, min ji cîhên deştêyî cuda-cuda top bi açixî diavît. Ez dîsa ew lîstîkçî bûm, bi talanta wî cûreyî, lê min nikaribû ew talant bida xebatê, dema ku ew deşta lîstîkêda bû.

Heger hûn bersiva xulamê sêem nava wan nivîsarên pîrozda bixwînin, hûnê bibînin wekî *fikirdarîya* wîye derheqa axayê wîda hema wî cûreyî bû, çawa ku fikirdarîya min bû derheqa wî telîmkirê minda, kîjanî ez rexne dikirim. Lê belê, firqîke mezin heye: *bi rastî*, axayê wî xulamî qet mînanî telîmkirê koma meyî duem nîbû.

Ez dîsa bêjim, wekî bi hesabildana vî hemû tiştî, ku em ji serê kitêbêyî pêşda çî hîn bûn û ew bêhesab girînge ku em wede bona naskirina Xwedê başqe bikin. Ew tu cara mînanî *fikirdarîya* wî xulamê xweranedîtî nîne.

Xwedê piştgirê meye: Ew li me bawar dike û li me amin dibe. Heger em Wî bi vî cûreyî *nenihêrin* wî çaxî em dikarin bi hêsanî teslîmî tirsêbin, û pêşkêşên me çelkirî wê bimînin.

Piştî şirovekirina vî hemû tiştî, werin em derbazî menîya pêşin, ya derheqa reznedayîna bin. Çawa ku min serê kitêbêyî derbazbûyîda got, hene meriv, yê ku Xwedê nas dikin, lê bi wê yekêva tevayî dijî tirsê şerkarîyê dikin û hetanî teslîmî tirsê jî dibin. Kitêba Pîroz menîyên vê yekê dide kifşê û emê derheqa wê yekêda hetanî dawîya serê vê kitêbê xeberdin. Feqet, hetanî destpêkirinê em çend fikirên kûr derheqa tirsê û çend têmayên derheqa wê yekêda xeberdin:

“Meriv gerekê ne ku ji mirinê bitirse, lê wekî ewî usa jî jîyan destpê nekirîye”:

– Markos Avrêlios

“Tu cara ji cêribandina tişteki nû netirsîn. Bîr bînin, wekî gemîya Nuh pêşezana çê nekir, lê *Titanîk* pêşezanên profesîyonal çê kirin”

– Xudanê neeyan

“Şaşîya here mezin, kîjanê em dikin, jîyana hertimîye nava tîrsa bona şaşbûnêye”.

– Con K. Maksvêl

“Ji eşkerekirin û syûrprîzên mêrive here mezin yek jî ewe, wekî ew fem dike, ku ewî dikaribû ew tişt bikira, çi ku ditirsîya ku wê nikaribûya bikira».

– Hênî Ford

Em gotûbêjkirina xwe bi rastîke başqeva destpêkin: *hizkirina Xwedê dijî tîrsa nesaxleme*. Dema ku em bêtî tu qewila Xwedê û meriva hiz dikin, tîrs unda dibe. Çawa ku Yûhennayê şandî dinivîse: “Hizkirina tam tirsê bi temamî dide derxistinê” /A Yûhenna 4:18, NLT/.

Çi ku derheqa vê rastîyêdane, ez bêjim, wekî ezê tu cara hevdfîtineke tevî Ruhê Pîroz, ya li bajarê San Dîyêgoyê, bîr nekim, ya ku eyantîke mezin da min. Min teze qulixkirina xweye bi sirê ser hevda anîbû û ez oda mêvanxanêda tenê bûm. Min dicêriband tîrsa dilê xweda, ya bona kurên xwe, ji xwe bida dûrxistinê. Min derheqa zarokên qulixçiyada bihîstibû, yê ku bi tragîkî wefat bibûn, yek ji lîxistinê ênêrgîya êlêktrîkî, gelek ji qezîyayên avtomaşîna, hinek ji xebitandina narkotîka, yan jî avêda xeniqîbûn, û yê mayîn jî bi menîyên cûre-cûre. Hinek wext pêşîya wê yekê, min derheqa tragêdiyakêda bihîst û

min dicêriband ji wê xemgînîyê azadbûma, ya ku ketibû dilê min. Nişkêva min dilê xweda bihîst: “Kurê Min, tirs nîşane. Tirs tenê wê goveka jîyana te dide kifşê, ya ku te teslîmî Min nekirîye: ew goveka jîyana te hê ya teye»

Xeberên wî tê bêjî ez hişyar kirim. Min fem kir, wekî min ew tişt hildabû ser xwe, ya ku min nikaribû xweyîkira. Piştî wê ronahîkirinê, çend deqîqe derbaz bûn û min kire gazî: «Bavo, ew kur ne yên minin. Ez tenê wekîlên wanîm û ew yên Te ne. Dêmek, ez dixwezim ku nava jîyana wanda ew tişt bibe, çî ku Tu dixwezî, çî jî hebe. Tu dikarî wana bibî perê dinîyayêyî mayîn û usa jî Ezmana, dema ku Tu hazirbî wana qebûlkî, lê ez li ser xwe guman hîvî ji te dikim, ku ew li vê dinîyayê wî hemû tiştî bikin, bona çî Te ew çê kirine.

Û min diha bilind kire gazî:

-Cin, bi navê Îsa, ez nahêlim ku tu nêzîkî wanbî. Ez elam dikim, wekî ew yên Xwedêne, û ez nahêlim ku tu, çî ku yê Xwedêye, bikujî, bidizî, yan jî tune bikî.

Dilê min bi edilaya mezinva tijî bû, û peyî wê yekêra ez îdî bona herçar kurên xwe ber xwe neketime. Dema ku nerihetî dicêribîne careke mayîn berbirî min bibe, ez bi cûrê berk dibêjim:

-Berxweketina bona kurên xwe min teslîmî Xwedê kirîye, wextê ku ez li San Dîyêgoyê bûm û ezê wê yekê paşda hilnedim.

Her car tirs carekêra ditemire, û edilayî paşda vedigere.

Tirs serwêrê hukumê xirabe. Ew neyare, ew divedîne me kontrolke, û hema ew te digre, hûn dikevîne bin hukumê wê. Heger em bi cûrê şaş bersiva tirsê bidin, ewê rêya jîyana we bide guhartinê. Feqet, mizgînî heye: meriv dikare tirsê altke, lê bona wê yekê nêzîkbûna rast pêwîste.

GUHDARÎYÊ BIDINE SER PÊŞKÊŞA XWE

Pawlos du name “kurê xweyî ruhanî” Tîmotêyora nivîsîn. Herdu namada jî ewî derheqa wê yekêda got, wekî pêşkêşa Tîmotêyo */xarîzma/* nedihate hesabildanê û nedihate şuxulandinê. Werin em hema destpêkêda rastîke girîng bidine kifşê: Tîmotêyo merivekî xwedêparêz bû. Nava namên xweda Pawlos bi xeysetê wîyî cêribandîva firnax dibû. Bêşik, Tîmotêyo nedikete nava wê navnîşa wan meriva, yên ku ji tirsê xwe civandibûne ser hev, rûyê nasnekirina xeysetê Xwedê da. Nava nama Pawlose ewlinda nivîsare: “Wê pêşkêşê *ji merkeza guhdarîyê der nehêle*, ya ku nava tedane” /A Tîmotêyo 4:14, NKJV/.

“*Hiştina ji guhdarîyê der*” ji xebera yûnanîye “*amêlêyo*” hatîye tercimekirinê. Du şirovekirinên wê gotinê evin: «hesab hilnedin,

yan jî girîngîyê nedinê”. Kanîke mayîn jî vê xeberê vî cûreyî şirove dike: “Meriv nafikire û nava encamê wê yekêda bersiva rast nade, ji guhdarîyê der dihêle”.

Bona çi Tîmotêyo, yan jî yekî ji nava me, gerekê pêşkêşa ji Xwedê da dayî ji guhdarîyê der bihêle, yan jî hesab hilnede û xilazîyê qet derheqa wê yekêda jî nefikire? Menîke wê yekê eve:

*Ew anegorî hêvîdarîyên me naşuxule,
yan jî feyda nade*

Hûn difikirin: “*Min cêriband, lê tu tişt nehate stendinê*”. Gelek cara nava dehsalîyên jîyana xweye duda û sisîyada ez usa difikirîm. Ji wan mesela yek jî ew bû, wekî rojekê, dema ku min dannasîn dikir, Lîza û hevala xwe wî çaxî xewra çûn, derheqa wê yekêda min pêşda nivîsiye. Ez difikirîm: “*Kî wê bixweze guhdarîya min bike, heger merivên here nêzîk nikarin hişyar bimînin?*”.

Hema wî çaxî jî dîsa tiştê diqewimî, rûyê çida min diha gelekî şerkarî dijî fikirên derheqa teribandinada dikir. Me, ez û hevalê xwe, li mekteba roja yekşemê ders derbaz dikirin. Dema ku dersên wî derbaz dibûn, yên ku li sera usada dihatine derbazkirinê, li kîderê kursî tunebûn, ji 200 merivî zêdetir li wir hazir dibûn. Hema wî çaxî jî, wextê dersên min nêzîkî 20 merivî hazir dibûn. Carekê tenê merivek hate dera min.

Tiştên başqe jî qewimîne, gelek cara tiştên wî cûreyî hebûne, nava encamên kîjanada min ew yek texmîn dikir. Niha ez fem dikim, ku heger min cî bida fikirên derheqa teribandinên hêvîdarîya, minê gavên nava qulixêda neavîtina, minê rêyeke başqe bibijarta, û bi kutasî ezê rûyê hiştina navê jîyana xweda bêbext bûma. Em dikarin usa jî rûyê wê yekêda pêşkêşa ji Xwedêda dayî hesab hilnedin, yan jî ji guhdarîyê der bihêlin:

Rexnekirina meriva

Bêyî şikberî, piştî wê yekê min texmîn dikir ku ezê nivîsarê berdim, wextê ku destnivîsara mine ewlin nehate hesabildanê, hate rexnekirinê, û ji alîyê rêdaktorê ewlinda, lê paşê jî ji alîyê çapxwenên başqeda hate înkarkirinê. Diha dereng, piştî bi xwe çapkirinê, hevaleyê min derheqa cûrê nivîsara min da baş xeber neda. Wê êvarê, piştî guhdarkirina şirovekirinên wî, ez 20-30-î deqeyî li oda me paldam û min banê avayî dinihêrî. Ez gelekî xemgîn bûm û ez difikirîm, wekî min temamîya saleke jîyana xwe badîhewa derbaz kiribû û perên mezin rûyê wê kitêbêda xerc kiribûn. Ez difikirîm: “*Rêdaktorê ewlin, çapxane, niha jî hevalên min ez rexne kirim. Hişyarbe, Con! Bona çi tu xwe mikur nayêyî, wekî ew yek bêkêre û tu teribîyî?*”.

Heger ez teslîmî wan fikirên xwe û fikirên yên mayîn bûma, minê kitê-

ba xweye duem nenivîsîya, ya ku dîsa tê bêjî neaçix bû. Tê bîra min, wekî min ew şande dersdareke mektebêra, ya mekteba Încîlê. Wê jinê kitêba min rexne kir, û min xwe diha zêde niqobûyî texmîn kir. Ji du sal nîvî zêdetir derbaz bibû, û tê bêjî mecala gihîştina açixiyê, ya bona herdu kitêbên min, tunebû.

Heger min her car guhdarî bida li ser rexnekirinên meriva û fikirên xweye wî cûreyî, wê diha hêsa bûya, ku min ew hemû tişt berda. Wî çaxî minê kitêba xweye sêem nenivîsîya, kîjan *"Tela şeytan"* bû.

Em dikarin bi menîke başqe jî pêşkêşa ji Xwedêda dayî hesab hilnedin, yan jî ji guhdarîyê der bihêlin:

Tirsa teribîbûnê

Rastîya vê tirsê eve: em hetanî destpêkirina tişteki jî, texmîn dikin ku emê negihîjine açixiyê, em nacêribînin û xwe jî diparêzin. Fikira wê yekê eve: *"Bona çi bicêribînin, heger wê tu tişt neyê stendinê?"*. Çiqas xiyal û dîtî-nok rûyê tirsêda hatine teribandî! Tişteki çawa tragîke, wekî pêşkêşên ji Xwedêda dayî wî cûreyî nayêne hesabildanê, çawa ku ew yek xulamê xweranedîtî kir.

Hevalê min, Mayls Monro, kitêba xweye *"Qewata xwe eşkere bike"* da derheqa tirsê neaçixiyêda wa nivîsîye:

"Cîhê mexberaye li vê dinîyayê, cîhê lapî dewlemende, çimkî meriv dikare li wir hemû hêvîdarîya û xiyala bibîne, yên ku usa jî nehatine mîyaserkirinê, kitêbên ku usa jî nehatine nivîsarê, stiranên ku usa jî nehatine stiranê, ulmên ku usa jî nehatine gilîkirinê, qenckirinên ku usa jî nehatine eşkerikirinê, tenê bona wê yekê, çimkî kesek bona avîtina gava ewlin gelekî tirsîyayî bûye".

Bi qayîlbûna Maylsra, ez ber dilê weda tîm: îzinê nedin, ku pêşkêşên ji Xwedêda dayî nava vê jîyanêda neyêne kifşê.

Ew çî ku ezê niha bêjim, dikare we zendegirtî bihêle, çimkî em hemû jî Tîmotêyo bilind qîmet dikin. Lê belê, em ji namên Pawlos dibînin, wekî Tîmotêyo dîsa wî alîda diçû, li kîjan alî xulamê xweranedîtî diçû. Pêşkêşa wî, ya ji Xwedêda dayî nedişuxulî û ji guhdarîyê der mabû. Feqet, bavê wîyî ruhanîyî baş hebû, yê ku îzin neda wî ku ew wî halîda bimîne, ji guhdarîyê der mabû.

Nava nama duemda ya ku Pawlos *"kurê"* xwera nivîsî, ewî îdî wede xerc nekir û carekêra derheqa wê pirsêda got: *"Ez tînim bîra te, ku tu wê pêşkêşa Xwedê bidî gurkirinê, ya ku dilê tedaye"* /B Tîmotêyo 1:6, NKJV/. Xebera *"gurkirin"*, xebera yûnanîye *"anazopûrêo"* ye, şirovekirina kîjanê *"careke mayîn şuxulandina agir"* e. Feqet, *"Fehenga yûnanî-înglîzî"* fikira vê xeberê diha tam dide: *"Destpêka nû bidine tişteki: careke mayîn destpêkin"*. Pêşkêşa

ku ji Xwedêda hatibû Tîmotêyora, nedihate şuxulandinê û ew hewcê destpêka nû bû. Lê menîya wê yekê kîjan bû? Pawlos nava gotina peyîra dibêje:

“Çimkî Xwedê ruhê xofê da me, yê qewat û hizkirin û hişyarîya başqe” /B Tîmotêyo 1:7/.

Xebera yûnanîye “*dêîlîa*” dikare usa jî çawa “tirs” bê tercimekirinê, lê tercima diha rast “*xof*” e. Pawlos dixweze vê yekê bêje: “Tîmotêyo, pêşkêşa ku Xwedê daye te, rûyê ruhê *tirsêda* naşuxule”, yan jî heger diha zelal bêjin: “Tîmotêyo, pêşkêşa ji Xwedêda tera dayî rûyê ruhê *xofê* da naşuxule”.

Em bi hêsanî dikarin vê xeberê fem bikin. Xof dide kifşê ku “rûyê tirsêda ji wê kirinê paşda bisekinin”. Lê ew yek diha girînge wekî nava hîmê xofêda *ruhe*. Ew qewata ruhanîye û heger em li ser dereca ruhanî dijî tirsê nîbin, kokên wê wê bi temamî neyêne dûrxistinê.

ŞERKARÎYA MIN YA TEVÎ XOFÊ

Ez gelekî baş derheqa wê yekêda zanim, çimkî bi sala ser hev min vî ruhîra şer kirîye. Min texmîn dikir, wekî ew zeyîfîya min bû. Destpêka salên 1990-î, wextê derbazkirina cêrge berevbûna, min eşkere kir, wekî fikira min bi temamî şaş bû. Min gerekê berevbûnên çarroje li civîneke bajarekî biçûk derbaz bikira, lê ew werguhêzî heja Xwedê bû, ya ku çend roja kişand. Her êvar sera tijî bû: gelek xilaz dibûn, qenc dibûn û azad dibûn. Pêşkêşa min, ya ji Xwedêda dayî, ya ku dannasînkirin bû, gelekî bi hukum û berbiçev dişuxulî. Meriv ji dûraya 150-î kîlomêtrî dihatin, bona ku tevî qulixkirinên êvarê bibûna. Ez gelekî baş bîr tînim, ku wextê roj diketime avayê civînêyî vala, min texmîn dikir ku tê bêjî hazirîya Xwedê li wir dima.

Lê êvarekê, dawîya hevtê, hemû tişt hate guhartinê. Êvara derbazbûyî, çend rêberên koma hebandinê qulixkirina min rexne kiribûn. Rêberêkî civînê pêşîya qulixê derheqa gotinên wanda minra gilî kir. Ew çî ku wana gotibû piştgirîya yekalî bû, lê zyandar nîbû. Lê belê, min nikaribû ew yek ji fikira xwe bida dûrxistinê. Guhdarîya min, ya li ser qulixa gerekê hebûya, dûrket û hate ser rexnekirina banga mine êvara derbazbûyî. Serwêrê civînê gotinên wan qebûl nekiribû: me dua kir û em çûne sera civînê, hema wî cûreyî, çawa ku me wextê qulixkirinên derbazbûyî dikir.

Wê êvarê hemû tişt tê bêjî zîha bû. Min dicêriband usa qulix bikira, çawa ku min ew yek nava du hevtîyên pêşda dikir, lê ez şaşbûyî bûm, min nikaribû fikirên xwe berev bikirana û min nedixwest li ser dikê bimama. Min dixwest ji serayê, ji derê piştêva birevîyama. Tê bêjî ez bêqewat bûm, çawa ku ez salên xortanîyêda bûm, wextê ku min li mektebê, li ber hevalên xweye mektebê,

axaftinên xwe didane teribandinê. Min qet rûnkirin texmîn nedikir, min texmîn nedikir, wekî hazirîya Xwedê li ser min bû. Halê gelekî nexweş bû. Min berevbûn zû ser hevda anî û paşda vegeŕiyame li wir, li kîderê ez dimam. Ez li ser Xwedê hêrs ketibûm. *“Bona çi te alî min nekir? Bona çi ev qulixkirin mînanî yên mayîn nîbû? Bona çi min xwe tenê texmîn dikir? Ez difikirîm: “Ew bang û qulixkirin bêfikir bûn. Sibê-êvarê tu kes wê paşda venegere. Ez jî naxwezim sibê herime wir”.*

Ez bi wê hêvîyê çûm razê, wekî rojtira mayîn hemû tişt wê baş bûya.

Rojtira mayîn, ez bi texmînkirina giranîyê, bin hukumda û bi zeyîffiyê hişyar bûm. Min cêriband dua bikim, lê ew yek badîhewa bû. Wî çaxî xemgînîya mine derheqa wê yekêda diha zêde bû. Min wê rojê sê sehetada ser hev dua kir. Nava wî wedeyîda min tevî fikirên xweye bêaçix şer dikir. Paşê min aktîvî texmîn kir, min ew giranî ji xwe dûrxist û bi fikirên xweva xwe bona qulixkirina êvarê hazir kir.

Wê êvarê jî hebandin tê bêjî zîha bû, mîna êvara derbazbûyî, û dihate texmînkirinê ku min nikaribû tu tişt bida wan. Min careke mayîn dixwest ku ez ji serayê birevîyama. Dema ku gazî min li ser dikê kirin, ez ji cîhê xwe rabûm û çend deqa min tevîhevbûyî xeberda. Min nikaribû fikirên xwe li ser hev berev bikirana. Nişkêva min fikira xweda dengê bihîst: *“Bona çi te ew yek got? Meremê banga te kîjane? Tu bêfikirî!*

Ez îdî hazir nedibûm, ku min ew yek qebûl bikira. Min nişkêva gote 600 merivên berevbûyî:

-Ez nizamim, çi diqewime, lê tiştê nava van herdu êvarên dawîda cûrekî mayîne. Hûn dikarin bisekinin û tevî min dua bikin?

Dema ku me teyayî dua dikir, Xwedê minra xeberda: nava 24 sehetada min dengê Wî cara ewlin bihîst. Ewî ew yek anî bîra min, çi ku Pawlos B Tîmotêyo 1:7-da dinivîse. Ewî got:» Kurê min, tu rûyê komêda, ya hebandinê li ser dikê sekinî, li piş xwe xofê texmîn dikî. *Ruhê xofê* bişkêne û wê yekê bêje, çi ku Ez didime te”.

Min hema usa jî kir, çawa ku Ewî got, û peyî wê yekêra bangeke ji kitêba Pîroz hate raberkirinê. Ji wan 21 qulixkirina, wê rojê ew ya here hukumdar bû. 75 selefê hazira pêşda hat, ew xwe mikur hatin, wekî wana jî tevî tirsê şerkarî dikirin. Cêrgên di navbera kursiyada merivava tijî bibûn, ewên ku dixwestin ku bona azadbûna xwe dua bikirana.

Piştî çend hevtîya, serwêrê wê civînê minra heleqetîya xwe îzbat kir, bona ku gilî bikira ku qulixa wê rojê bi çiqasîva kardar bû. Ew rêberên ku xeberên rexnekirinê derheqa minda gotibûn, nava gunehê eşkereda diman: ji rêderketinê, vexwerina alkoholê û zinêkarîyê. Ew hemû tişt nava du hevtîyên peyîra eşkere bû, û hemû, xêncî yekî, ji civînê dûrketin. Wî serwêrî gilî kir,

wekî koma wîye hebandinê tu cara awqasî yekbûyî û kardar nîbûye, çiqasî piştî wan bûyara bû. Çi ku wê rojê qewimî, jîyana wê civînê û qulix da guhartinê.

Nava jîyana minda wê yekê şerkarîya bi salaye dijî wê tirsê da sekinandinê, usa jî ew yek da dûrxistinê, wekî carina min dicêriband bi qewatên xwe qulixkirin derbaz bikirana, bi nexebitandina pêşkêşa ji Xwedêda dayî. Eşkerekirina girîng ya ku min kir, ew bû, wekî gerekê raste-rast dijî *ruhê tirsê usa* derkevin, çawa ku Îsa bi Xebera Xwedê, wextê cêribandinên Xweye li qûmistanê, dijî cin derket. Îsa ji *Xwedê* hîvî nekir ku wan êrîşa bide dûrxistinê: Ewî bi Xwe, bi cûrê qewîn, emirî ser cin kir.

DEWSA ÊLYAS

Ez berbirî we dibim, ku hûn beşên G Padişatî 17-19 bixwînin. Hûnê pe-
vçûyîna Êlyase tevî tirsê bibînin /ya mîna cêribandina min/, ya ku rûyê padişa
Îsrayêlê da, Îzabêlêda, qewimî.

Ew pêxemberê mezin bi mêranî, li ser çîyayê Karmêlosê ber cimeta
Îsraêlê ber xwe da: 850 pêxemberên derewîn dijî wî bûn, Akabê padişa û
xulamên padişê. Xwedê bi agir bersiva duayê Êlyas da, ew jî li ber temamiya
milet. Êlyas emirî ser cimetê jî kir, ku hemû pêxemberên derewîn bikujin.
Ewî bi cûrê hukumdar pêşkêşa xwe dida xebatê. Peyî wê yekêra ewî dua kir
û bêavî xilaz bû. Çawa xilazbûna wê yekê, ew bi revê pêşîya ereba padişê ket.
Ew hemû tişt nava rojekêda qewimî. Rojeke qulixkirinêye çawa bû!

Lê hetanî ku ro çû ava, Îzabêlê derheqa wê yekêda bihîst û şerkarîya rast
destpê bû:

“Îzabêlê ev cab Êlyasra şand: “Bila hemû xwedê minxin û bikujin,
heger hetanî sibê vî çaxî ez te nekujim, çawa ku te ew kuştin”
/G Padişatî 19:2, NLT/.

Hetanî şirovekirina gefxwerina Îzabêlê, îzinê bidin ez bêjim, wekî ruh
mînanî wanane, yên ku pêlên avê diajon. Bona wan pêlên avê lazimin, bona
ku sera xwe bişmitînin: ruhara xeber lazimin ku bişuxulin. Nivîsare: tu sîlihekî
dijî te wê negihîje açixîyê. *Tê* her dengekî *bidî kerkirinê*, yê ku li ser te tê
bilindkirinê ku te gunehkar bike. Xulamên Xudan vê yekê dikin” /Îşaya 54:17,
NLT/. Guhdarîyê bidine ser wê yekê wekî em gerekê her dengekî bidine
kerkirinê, yê ku dijîme tê bilind kirinê. Eva karê meye, lê ne ku yê Xwedêye.
Îsa ji Xwedê hîvî nekir, ku li qûmistanê cin bide kerkirinê. Em jî gerekê usa
bikin, wextê ku êrîş tê ser me.

Kifşe, wekî nava xeberên Îzabêlêda ruhê tirsêyî hukumdar hebû. Guh-

darîyê bidine ser wê yekê ku çawa Êlyas bersiva wê da, wextê ku ew gotin gihîştine wî: «Û bi dîtina vê yekê, ew rabû û bona azadkirina şexsê xwe çû” /G Padişatî 19:3/.

Ew merivê ku li ber tamamîya millet, pêxemberên derewîn û padişê ber xwe dabû, revî. Ew ji alîkî Îsrayêlê çû alîyê mayîn, û çû qûmistanê, bi derbazbûna rîya rojekê, bin darekîda rûnişt û *dua kir, mirin hîvî kir*.

Gelo ev yek derheqa wî merivîdane? Gelo çi diqewime? Tê kifşê, wekî ew tevîhev bibû, bin hukumda bû, bêhêvî bû, û dîtinoka xwe unda kiribû. Evana nîşanên ruhê tirsêne. Rastî ewe, wekî gelek meriv tevî wan nîşana şer dikin, dewsa wê yekê, ku dijî ruhê li piş wan sekinî derkevin.

Rûyê nezanîyêda min jî gelek sala tevî wan nîşana şer dikir, hetanî wê êvarê, wextê ku Xwedê rêyên wî ruhê xirab da eşkerekirinê. Min nikaribû pêşkêşa xwe bida xebatê û min fem nedikir ku bona çi usaye.

Êlyas teslîm bibû, û Xwedê ew pêxemberê ku hêvîya xwe undakiribû şande rêwîtiyê. Milyaketek li wî eyan bû û xwerin da wî, bona rêwîtiya 40 rojêye berbi çîyayê Sînayê. Hema ku ew gihîşt cîh, pirsra Xwedêye ewlin ev bû: “Êlyas, tu li vir çi dikî?” /G Padişatî 19:9, NLT/.

Çi? Bisekinin! Xwedê gote milyaketekî ku bona rê xwerinê bide Êlyas, bona ku Êlyas bighîsta cî. Lê çawa ku ew gihîste cî, Xwedê pirsî ku bona çi ew li wir bû. Gelo Xwedê bi şîzofrênîyayê nexweşe?

Na xêr. Em gerekê fem bikin, wekî dema ku tirs me alt dike, Xwedê gelek cara me dişîne cîhekî nêytral bona ku qulixî me bike, çimkî Ew me hiz dike. Min nizanibû ku wextê wan berevbûna çi dihate serê min, lê ez nafikirim, wekî Êlyas jî haj pê tunebû. Ewî zanibû, ku çawa dijî wê yekê derketa, lê ew ji wê padişê tirsîyayî bû.

Em gerekê fem bikin, wekî Xwedê bi wê pirsra Xwe çi dixwest bigota. Ewî pirsî, ku bona çi Êlyas dijî wê padişê derneket, çimkî hema Îzabêlê ew hemû xirabî çê dikirin. Lazim bû, ku hema ew bidana sekinandinê, lê dewsa wê yekê Êlyas revî.

Dewsa dayîna bersiva wê pirsê, Êlyas têma da guhartinê û gazine xwe kir, wekî ew merivê tek-tenê bû ku mabû, yê ku bi rastî qulixî Xwedê dikir. Ewî serhatîke klasîk raber kir:

«Min bi cûrekî hevsûdî qulixî Xudan Xwedêyê Karîndar kir. Lê cimeta Îsrayêlê peymana xweye tevî Te teriband. Wana her cîhên Teye qurbanîya xirab kirin, û her pêxemberekî Te kuştin. Ez yê tek-tenême ku mame û niha ew dicêribînin min bikujin» /G Padişatî 19:10/.

Xwedê ev bersiv bi tamamî hesab hilneda û careke mayîn ew pirsra dayî

da: « Êlyas, tu li vir çî dikî?» /G Padişatî 19:13, NLT/. Û careke mayîn, Êlyas dîsa ew serhatî raber kir /bixwînin xebera 14-a/. Ew teslîm bibû, û nedixwest rastî xirabîya raste li piş xirabîya niha bihata.

Xwedê careke mayîn guhdarî neda ser serhatîya wîye bi stîla «wey li min» û temîke ecêb da:

“Dîsa bi wê rê paşda vegere, bi kîjanê hatî, û here berbi qûmistana Damişqê. Wextê ku bighîjî cî, Azayêl çawa padişê Aşûrîstanê rûnke. Paşê peyî wê yekêra nebîyê Namêsî Hêû çawa padişê Îsrayêlê rûnke û kurê Sapat Elîşa ji bajarê Abêl-maûlayê, *dewsa xwe çawa pêxemberê Min rûnke*” /G Padişatî 19:15,16, NLT/.

We guhdarî da ser xeberên “dewsa xwe çawa pêxemberê Min»? Xwedê Elîşa dewsa Êlyas kifş kir, çimkî Êlyas teslîmî tirsê bibû û bin ketibû. Heger hûn kitêba D Padişatî bixwînin, hûnê bibînin wekî Êlyas piranîya çar salên xweye peyîra, yê dewsa xwe hîn kir. Behseke mayîn jî ewe, wekî ewî Azayêl û Hêû rûn nekir. Ew yek yê dewsa wî, Elîşa, kir.

Elîşa teslîmî tu cûrekî tirsê nebû. Ew bêtirs bû, ew li ber tu xirabîkê paşda venedikişîya. Xwedê derheqa wîda got: yê ku ji şûrê Hêû difilite, Elîşa wê bikuje” /G Padişatî 19:17/. Hêû û Elîşa padişatîya Akab û Îzabêlêye xirab welgerandin. Ez li ser wê fikirême, wekî pêşda ew yek xebata Êlyas bû, lê rûyê tirsêda ew progiram hate guhartinê.


Em fem dikin, wekî Êlyas, himberî xulamê xweranedîtî, xeysetê Xwedê nas dikir. Lê belê, şerkarîya wî zelal dide kifşê ku tirs û xof dijî pêşkêş û navê me çî dikarin bikin.

Tiştêkî bêhesab girînge qirareke usa qebûlkin, wekî emê paşda venekişin, wextê ku em rastî tirsê û xofê bîn. Xwedê wê piştgirîyê bide me, dema ku em derkevîne dijî van qewata. Tirsê dikarin altkin, lê em gerekê derbê bighînin, bi xebitandina Xebera Xwedê û sozdayînêd Wî.

Ez careke mayîn diwekilînim: Xwedê piştovanê weye. Ew li we bawar dike. Ez dixwezim ku hûn bi van pêşkêşa pêşda herin, kîjan Ewî dane we. Paşda venekişin! Îzîne nedine tu merivekî, yan tiştêkî başqe, ku we ji mîsîya we û navê we paşda bigre.

BIFIKIRIN

1. Tirsê gelek xiyal dizîne. Ew neyar e, divedîne we control bike, û heger hûn bi cûrê şaş bersivê bidin, ewê jîyana we bide guhartinê. Tirs çi cûreyî dicêribîne jîyana we bide guhartinê?
2. Eşaretî bona Tîmotêyo hate dayînê, ku ew pêşkêşa xwe bide xe-batê. Gelo bona çi hesabîl nedana pêşkêşa we qezîya ye? Anegorî mînakên raberkirî, ji wan menîya kîjan e ew menî, ya ku li cem we diha zêde bersiv dît? Bona çi?
3. Tirs ruh e. Hûn çi cûreyî rastî wî ruhî hatine? Meriv gerekê çi bike ku bikaribe wî ruhî altke?



*“Bi hûngilî lêkolîn bikin, ku hûn kîn e û çi xebat
bona we hatiye dayînê, lê paşê navda kûr bibin... Ji
we her kes gerekê nava jîyana xweda bona kirina
xebata efrandarî ya here baş cabdarîyê hilde
ser xwe”.*

– Galatî 6:4, 5, MSG

Pêşkêşên xwe eşkere bikin û pêş bixin

Niha emê derheqa eşkerekirin û pêşxistina pêşkêşên mera ji Xwedêda dayî xeberdin. Çawa ku min îdî pêşda daye kifşê, meremê min xeberdana derheqa pêşxistina pêşkêş û karebûnên tebyetîda nîne. Wextê ku meriv çiqas lazime hîn dibe, dikare nava her govekekîda bibe pêşezan.

Malbeta min dikare vê gotinêra qayîl nebe, bi taybetî wextê ku gotina wî derheqa stiranbêjîyêdane û diqewime ew rastin. Dêmek, îzinê bidin meseleke diha rast bînin ber çeva. Heger ez nava deh hezar sehetada hînî instrûmêntekî sazbandîyê bihatama, ezê bikaribûma ji sazbandekî gelekî xirab werguhêzî sazbandê dereca navîn bûma. Bi saya wede û cedandinên xerckirî, lêxistina pîyanoyê, yan jî gîtarê, dikare xweşbe, lê piştî wê hînbûna wededrêj ewê nebe *xarîzma*, ya ku wê alî navê min bike, yê bona çêkirina padişatîya Xwedê.

HEVKARÎYA XWEDÊ

Nava vî serê kitêbêyî beşa ewlinda, emê van xeberên Pawlos gotûbêj bikin: “Bi hûrgilî lêkolîn bikin ku hûn kîne û çi xebat bona we hatîye dayînê”. Bona eşkerekirina navê we û pêşkêşên ku rêberîya wan dikin, formûla tunene. Neniherî wê yekê, kitêbên cûre-cûre hene, yên ku dikarin alî we bikin ku hûn eşkerekin, ku li cem we ji hemû tiştî zêdetir çi baş tê stendinê. Wextê ku gilî derheqa hukumkirina heta-hetayêdane, piştgirîya Erandarê me pêwîste, bona ku *nav* û *xarîzma* we bêne eşkerekirinê.

Carina hêsaye hevkarîya Xwedêye rast nava pirsê eşkerekirina pêşkêşên weda fem bikin, çawa ku, mesele, wextê ku Ewî temîya bona nivîsarê da min. Minê tu cara necêribanda binivîsîya, heger wextê duakirinê, havîna sala 1991-ê, min xeber nestenda. Tu kitêbek, yan jî dersek nikaribû ez bianîyama li ser wê qîrarê, û bêşik, ezê nehatama ser wê fikirê. Çawa mînak, Dawidê

padişa wê tu cara nizanibûya, wekî ew şerkar bû, heger pezên xwe ji hirç û şêr neparasta. Piştî wan bûyara pêwîstî pêşda hat ku kesek Îsrayêl ji filistinîya azad bikira. Pêşda terewilên bi qezîyaye ku rastî Dawid hatibûn çawa nerdewan bûn, yên ku bona şerkirinê wî çaxî nêzîkî Golyat kirin, dema ku Îsrayêl xwe veşartibû. Xwedê îzin da Dawid ku bi destî hewcetîyên leze li dor-bera pêşkêşên xwe eşkere bike.

Derheqa Gêdêonda bifikirin. Ew diha gelekî mînanî min bû. Xwedê gerekê çend cara, bi rîya hirîyê, ew bianîya li ser wê qîrarê, wekî ew bona şerkirinê hatibû gazîkirinê.

Em ji destêbûnêda destpêkin. Gelekî girîng hevkarîya Xwedê bigerin û wê yekê nava pîrsa eşkerekirina *xarîzma* xweda bawarîya xwe lê bînin. Kitêba Pîroz dibêje, wekî Xwedê heq dide wan, yên ku bi kel û ced û bi bawarîyê Wî digerin. Nivîsar nîne, wekî Xwedê heq dide wan, yên ku bi şikberî û sera-bera wî digerin /şirovekirina Îbranî 11:6, ya xudanê kitêbêye/. Îsa jî wî cûreyî dibêje me:

“Dîsa hîvî bikin û hûnê wê yekê bistînin, çî ku hîvî dikin. Dîsa bigerin û hûnê bibînin. Dîsa derî bixin, û derî wê bona we vebe. Çimkî her kes, yê ku hîvî dike, distîne. Her kesê ku digere, dibîne. Û her kesê ku dêrî dixê, derî wê vebe» /Metta 7:7, 8, NLT/.

Em gerekê bi temamîya dilê xweva *xarîzma* xwe bizanibin. Ez hêvîdarim ku ev kitêb nava weda xwestîna bi agir gur dike, bona ku hûn pêşkêşên xwe eşkere bikin û bidine xebatê. Ewê îzinê nede we ku hûn bi cûrekî mayîn hîvî bikin, bigerin û derî bixin: dewsa wê yekê hûnê li ser xwe gumanbin, çawa ku Îsa nava vê xeberêda dibêje. Usa jî nîne, wekî Xwedê tiştêkî ji we vedîşêre. Ew dixweze ku li cem we cedandinên gur bona wê yekê pêşda bînin, çî ku hûn hîvî dikin.

Dersxanên bilindda min dixwest dûrebîneke ku li steyrka dinihêrin, li cem min hebûya, çimkî min steyrkzanî hiz dikir û min dixwest ezmanê şevê lêkolîn bikira. Ji alîyê pîrsa finansîda dûrebîna steyrkzanîyêye baş bona min giranbiha bû, lê min ser hev kitêbên derheqa steyrkzanîyê û usa jî kovarên wî cûreyî dixwendin. Min her car çar-pênc kitêb ji kitêbxanê hildidan, dixwendin, wextê ku wedê minî aza hebû, carina jî çend cara min dixwend, lê paşê min ew kitêb paşda vedigerandin, û yên mayîn hildidan. Wê xwendinê xwestîna mine bona dûrebîna steyrkzanîyê unda kir.

Bi kutasî, cedandina min ez berbi fikireke başqe def dam, ku min bona xiyala xwe, ya bona dûrebîna steyrkzanîyê, pere berev bikirana. Ez li klûbeke xweavêxistinê û tînîsê telîmkirê tînîsê bûm û min tenê wextê hêsbûna havînê ders didan. Min tiştêkî usa kir, çî ku klûba meda tu kesî nikaribû bikira. Bi îzina şewira klûbê, min qîrar kir mehên payîzê, piştî dersên mek-

tebê, dersên şexsî bidim. Heger progirama min li hev bihata, minê gelek pere qazanc bikirana, bona ku min dûrebîna steyrkzanîyê bikirîya. Û hemû tişt hate stendinê! Bawarîya xwe li min bînin, ez tu cara bi cûrê xirab nêzîkî wê dûrebîna steyrkzanîyê nedibûm. Heger kesekî dûrebîna wî cûreyî pêşkêşî min bikira, hetanî ku xwestina min bi wê derecê qewat bûya, diqewime wê dûrebînê ez aciz bikirama, dema ku ruhdarbûna pêşin derbaz bûya.

Xwedê bi dijarî guhdar nake. Û Ew ji we tu tiştî venaşêre. Ew dixweze ku hûn wan pêşkêşa çawa yên sade hesab nekin, kîjana bona çêkirina cimeta Wî dide we. Cedandina we gerekê diha qewatbe, ne ku ew dijîderketin, ewên ku li ser rîya xiyalên we rastî we tên. Dêmek, îzinê bidin ku ew xwestin zêdebe û we defde ku hûn bi kel û ced bicedînin bizanibin ku *xarîzma* û talantên we kîjanin.

Ya mayîn, em gerekê fem bikin, wekî pêşda peyîhevhatin qirarkirî nîne, bi kîjanê Xwedê bersivê dide me:caba bersiva Wî bona her zarekî başqeye. Carina bona min cûrekî mayîn tê kifşê, wekî em tevî Îsa ser hev derheqa heyîna "Heleqetîya şexsî"-da xeber didin, lê wextê ku pêwîste guhdarîya Xwedê bikin, bona ku em derheqa *xarîzma* û pêşkêşên xweda bizanibin, em dixwezînin ku formûla hebe. Xwedê dixweze bi Xwe tevî me nava heleqetîyadabe. Ew dixweze wê yekê di navbera we û Xweda xweyîke. Ew bi cûrekî bersiva duayê her lawekî Xweyî giranbiha nade. Bo wê yekê jî Îsa temîyê dide ku ser hev hîvî bikin, bigerin û derî bixin. "Gera" xwestina Wî heye, ya ku bi rastî bona me kardare.

Nava gera meda em gerekê bi xwe pirsî bidine xwe û merivên başqe. Ev hemû tişt beşeke şuxulkarîya gerêye. Em serwaxtîya merivatîyê nagerin, lê em dixwezînin nava wan dengên merivada, tevî kîjana em xeber didin, dengê Xwedê bibihên.

Girînge ku em bizanibin ku tevî kê xeberdin. Em gerekê merivên usa bibînin, yên ku piştgirîyê didine me, lê natirsînin rastîyê bêjin. Minê bixwesta bigota, wekî merivên wî cûreyî gelekî, lê ew cudane. Ez meriva nas dikim, li cem kîjana meriv dikare biqeside, û ewê her dem derheqa wê yekêda bêjine min, çî ku ez hiz dikim guhdarkim. Hene meriv jî, yên ku tê bêjî rexnekirin, xirab xeber didin û himberî hemû tiştî nêzîkaya xirab nîşan didin. Li cem van herdu cûrên meriva dîtînok tune:ji merivên wî cûreyî dîr bimînin. Nava bawarîya bavê yan jî dayîkêda bibînin, yan jî merivekî serwaxt, yê ku rêyeke dirêj derbaz bûye, ne ku hûn, yê ku şaşî kirine û ji wan şaşîya hîn bûne.

Girînge wekî ew merivên ku hûn li wan amin dibin, bi sivikayî û bi cûrekî mayîn jîyanê nenihêrin, çimkî nêzîkî wî cûreyî anegorî wê yekêye ku ew xeyîdê xweda xweyî dikin. Merivê usa bigerin, yê ku lez dibaxşîne, yê ku nava jîyana ruhanîye cûrekîda nesekinîye, lê nava hejên teze û wedên Ruhê

Xwedê da pêşda diçe. Ji hemû tiştî girîngtir ew meriv gerekê ji alîyê heta-hetayêda li jîyanê binihêre. Dema ku hûn merivekî wî cûreyî bibînin, hemû tiştî bikin ku wî xweyîkin û wê heleqetîya tevî wî qîmetkin.

Gelek meriv hene, li cem kîjana serwaxtîya vê dinîyayê heye, lê ji alîyê heta-hetayêda ew dûrin. Hûn dikarin bi cûrekî mayîn aminaya xwe şêwirên wan bînin. Fesalbin, dema ku hûn wana guhdar dikin, û şêwirên wana bi Xebera Xwedê û bi duayê parzûn bikin.

Dê û bavên we, merivên li rex we û serwêrên we hewaskarin ku hûn pêşda herin û ew şêwirên serwaxt didin, nenihêrî wê yekê, wekî carina usa nabe. Dema ku ez ciwan bûm, min digote bavê xwe, wekî ez dixwezim bibim qulixçî. Nisileta wî li ser wê fikirê bû ku gerekê berbi jîyana çareserkirî bicedînin /ew yek wextê jîyana bawarîyê zeyîfîye/. Bavê min got: "Kurê min, li ser wê rê çareserî tune". Ewî pêşnîyarî min kir, ku ez bibim înjênêr, çimkî pêşkeftina mine bilind ji alîyê matêmatîkayê û dersên tebyetzanîyêda hebû, û ew jî 40 salî înjênêr xebitîbû. Ew karîyêra bêqezîya bû. Min nedianî ber çevê xwe, wekî ez qayîl dibûm ku şeş salên feqîr li ûnîvêrsîtête derbazkim. Nenihêrî wê yekê, wekî ez nava wê govekêda pêşkeftî bûm, lê min xwe çawa merivekî bêbext texmîn dikir, çimkî Xwedê bona wê yekê gazî min nekiribû.

Xebata min ya ewlin, ya çawa înjênêr, li hevaltîya «IBM»-ê bû. Rojekê serwêrê min ez birime ofîsê û got:

-Bîvêr, tu bona çî bûyî înjênêr? Tu merivekî xebardankirî: tu gerekê şuxulêkî usava mijûlbî, li kîderê tevî meriva heleqetî hene.

Qulixçiyên eyan jî, wextê berevbûna, ez dibirime li ser alîkî û digotîne min:

-Kurê min, ez dibînim ku nava jîyana teda banga ji Xwedê heye: tu gerekê Mizgînîyê dannasîn bikî. Wextê duakirinên mine şexsî, Xwedê her dem dilê min berbi qulixê dibir, nenihêrî wê yekê, wekî min nedixwest tevgirêdana mine tevî wê yekê hebûya. Hemû qulixçî, rastî kîjana ez hatibûm, li ber çevê min cûrekî mayîn dihatine kifşê. Lê dilê min hindva Efrandarê meda nazik bû. Pêşîya xilazbûna xwe ez hevtêkê çûbûme sêminarîya katolîk, û minva eyan bibû ku ez bona qulixê hatibûme gazîkirinê. Lê ez ji wê fikirê ditirsîyam, wekî heger ez bibûma katolîk, ezê tu cara nezewicîyama.

Lê belê, min ser hev îzbatî distendin û wê yekê alî min kir, ku ez şêwira bavê xwe daynime alîkî. Min bêhesab qedirê wî digirt û ew yek li Xwedê xweş dihat, lê wextê xwendina min û xebata înjênêrîyê min fem dikir, wekî tiştê gelekî şaş bû. Çimkî min hertim rêberîya Xwedê hîvî dikir û digerîyam, Ewî îzin neda peyî rêberîya şaş herim /usa jî bona wê şêwira bavê min, yê ku qencîya min dixwest/ û xwestina Xwe eyan kir.

Wextê ku ez îdî nava navê xweda îzbat bibûm, dilê minda xwestineke

gur pêşda hat, ya ku encamê gera mine sal nîvekê bû. Neh meh mabûn ku min xwendina xweye înjênêrîyê xilaz bikira. Min qirar kir, ku xwendina xwe xilazkim û bibim qulixçî. Ew qirar ya rast bû, çimkî ez stratêcîyên usa hînbûm, kîjan wê li mekteba Încîlê ez hîn nekirama. *Xwedê wê hemû cêribandina bide xebatê bona ku me hînke.*

Faktoreke bêhesab girîng bona eşkerekirina pêşkêşa we heye. Ew faktor ewe ku tu li civîneke saxlem nikandîbî. Kitêba Pîroz dibêje: “Ew Xana Xudan-da daçikandîne, hewşên Xwedêyê meda gul dane”/Zebûr 92:13/. Heger toximê pembu bireşînin, ji erdê wê kundir dernekevin. Ax civîna cîhe saxleme û dema ku hûn xwe pêşkêş bikin, pêşkêşên ji Xwedêda dayî wê li wir bêne kifşê. Nenihêrî wî hemû tiştî, hûn bona bîznêsmênîyê, xwendinê, serkarîkirinê, sportê, û nava govekên mayînda hatine gazîkirinê, hûnê gul bidin. Ew programê Xwedêye.

PIRS, KÎJANA HÛN DIKARIN BIDINE XWE Û HEVALÊN SERWAXT

Em derheqa dayîna pirsada xeberdin, him bidine xwe, him bidine hevalên xweye serwaxt. Pirsên raste ku didine merivên rast, wê alî bikin ku fem bikin ku karebûna we çîyê. Awa hinek mînak.

Bi tebyetî li cem we çi baş tê stendinê?

Eva destpêka baş e. Diqewime pêşkêşa we dinîya hesaba ye, yan jî çêkirina cumilên bi xeberên baş e, yan jî avahîçêkirin e, çêkirina firmaye, dîzayna kinca, yan jî teşkîlîkirina berevbûnaye. Diqewime karebûnên weye sporta tebyetî, yan jî bînhildana nazike cudakirina bîna, yan jî dîtina tiştên hûre. Alîyên weye qewate çawa jî hene wana eşkere bikin.

Heger guhdarîya weye sazbandîyê heye û hûn dixwezin rêberîya meriva nava hazirîya Xwedêda bikin, ew yek dikare bide kifşê, wekî diqewime hûn bona hebandinê hatine gazîkirinê. Yan jî hûn gerekê nava qulixdarîya sazbandîyêdabin. Hema wî cûreyî jî, heger hûn bi doxtirîyêva hewaskarin, hûn gerekê ji Xwedê bipirsin ku gelo hûn bona goveka saxlemîxweykirinê hatine gazîkirinê? Ew navnîş xilaz nabe.

Lê ev fikir gerekê bona we xebera dawîyê nîbe. Ez tînîsîstekî baş bûm. Min destpê kir komekêda tînîsê bilîzim, ya ku dikete nava teşkîla dîvîziyona Ştatên Yekbûyîye “Asosîyasîya mîletîyê, ya xwendikaraye cûrên sportêye” Ewlin. Ez usa jî tevî lehcên “Asosîyasîya Ştatên Yekbûyîye tînîsê» û «Fincana Dêvîsêye xorta» bûme. Çawa ku min îdî pêşda da kifşê, ez sê sala telîmkirê tînîsa profesîyonal bûm. Xêncî wê yekê, ez wextê lehca tînîsê, ya dersxanên bilinde li ştata Vîrcînîya Rojavayê ser ketibûm. Feqet, wextê ku min dua dikir,

min zanibû, wekî navê min tênîsa profesîyonal nîbû.

Hevalekî min heye, navê kîjan Aharon Bêdlîye. Ew lîstikçiyê golfêyî eyane û tevî lehca «Hevaltîya lîstikçiyên golfa profesîyonal» dibe. Feqet, sala 2004-a, wextê ku ew hela hê sala duem bû ku nava wê lehcêda bû, ew rastî dijwarîya hat /wîra bi çetînayî li hev hat careke mayîn qîtmekirinê bistîne û sala 2005-a paşda vegere, çimkî nava wê lehcêda ew nava navnîşêda ketibû cîhê 124-a/. Wextê ku sala bona wî dijwar îdî ser hevda dihat, ew hinek wede li mala me bû, wextê lîstika nava lehceke mayînda, ji kîjanê ew der ma. Em tevayî bi teyarê çûne Las Vêgasê, li kîderê min gerekê hemcivînekêda dannasîn bikira. Wextê wê qulixê, Xwedê çar cara dilê wîra xeberda: “Min bona qulixê gazî te nekirîye: Min nava *golfêda* gazî te kirîye”.

Aharon hemû qewatên xwe nava golfêda nedidane xebatê, çimkî ewî dixwest bi wê yekêva mijûlbûya, çiva ez mijûl dibûm. Ewî dixwest nivê wedê xwe bida xebatê bona ku tevî min nava rêwîtiyêda bûya û hemcivînada bûya, usa jî li civîna dannasîn bikira, lê nivê wedê xweyî mayîn ewî dixwest golf bilîsta. Wê êvarê ewî dilê xweda qîrar kir, wekî ewê bi temamî xwe bide nav û pêşkêşa xwe. Piştî du sala, ew îdî nava navnîşa lîstikçiyên hemdinîyayêda cîhê dudada bû, lê paşê ew çar cara nava lehca “Hevaltîya lîstikçiyên golfêye profesîyonal”da ser ket. Ew usa jî wextê lehca “Avstralîyan Mastêrs” ser ket. Ji 15 sala zêdetire ku ew tevî lehca dibe û hê dîsa dilîze. Hukumê wî mezin bûye, û gelek mecalên wîye qulixkirinê û dannasînkirina bona wan hebûne, yê ku naçîne civîne.

Hevalkî minî serwêr heye, navê kîjanî Ale. Çend sal pêşda, li civîna wî merivek hebû, yê ku hiz dikir Xebera Xwedê bida hînkirinê û nava wê yekêda gelekî zane bû. Ewî dixwest li civîne çawa serwêr û dersdar bixebitîya. Karbûna wî jî nava çêkirina avtomaşîna bû. Civîneke mezine li bajarê wan qulixa serwêrîyê û dersdarîyê jêra soz da. Ewî Alê serwêr teglîfî nanxwerinê kir, bona ku derheqa wê yekêda bêje wî. Al merivekî serwaxte û ewî gote wî merivî:

-Min bona te dua kirîye û ez texmîn nakim, wekî tu bona hînkirina Xebera Xwedê hatî gazîkirinê. Talanta teye nava çêkirina avtomaşîna heye.

Wî merivî gura şêwira serwêrê xwe nekir, û çû wê civîne.

Piştî salekê, ew kete nava halekî feqîr. Wî çaxî hê bi fermî xebata dersdarîyê pêşnîyarî wî nekiribûn, û ew ketibû nava pîrsgirêkên zewacê û finansî. Rojeke yekşemê, li civîne Xudan wîra got: “Min tu cara gazî te nekiribû bona ku tu bibî serwêr. Min çawa mêxanîk gazî te kiribû, yê ku wê Xebera Xwedê li civîna xweye cîh hîn bikira”.

Ew meriv çû cem Alê serwêr, bona wê yekê ku gura şêwira wî nekiribû, ewî tobe kir û paşda vegeyîna civîna xweye cî.

Ew careke mayîn derbazî li ser xebata xweye çêkirina avtomaşîna bû.

Êvarekê Xwedê xiyaleke derheqa wê yekêda da wî, wekî meriv dikare kompyûtêrê avtomaşînevê bike, bona ku kêmasîyên motorê bêne dîtî. Hevalekî wî hebû, yê ku kompyûtêr gelekî baş fem dikirin û wana teyayî aparata kontrolkirina kêmasîya çê kirin. Eyan bû, wekî ew aparata kontrolê dikare kêmasîyên avtomaşîne çar cara zûtir ji mêtodên sade raberke. Paşê wî merivî çend cîhên çêkirina avtomaşîna li temamiya ştata Karolîna Bakûr vekirin, ew jî bi saya çêkirina wê aparatê. Rojekê ew nêzîkî Alê serwêr bû, kenîya û gotê:

-Ez bona çêkirina avtomaşîna hatime gazîkirinê.

Gelo bi saya çi em aktîvîyê distînin?

Rojekê, alîkarê min ji min hîvî kir ku ez “dereca aktîvîya” borcdarîyên xebatêye nava hevtêda raberkim. Ewî ev tişt pêşniyar kir: ew xebatên ku qewatên min ji min distendin, gerekê bi -2-va bihatana qîmetkirinê :ew xebatên ku bi temami qewatên min nedistendin, gerekê bi -1-va bihatana qîmetkirinê: ew xebatên ku hindik aktîvî didane min, gerekê bi 1-va bihatana qîmetkirinê, lê ew xebatên ku aktîvîya mezin didane min gerekê bi 2-va bihatana qîmetkîrnê.

Çend xebat hebûn, mesele, rasthatinên tevî beşên qulixdarîyê, rêwîti, xebata tevî kageza, berevkirina çeltên bona rêwîtiyê û ew hemû tişt, kîjan bi -2 û -1-va hatine qîmetkirinê. Çend hebên mayîn bi +1-va hatine qîmetkirinê, lê bi rastî tenê du tişt: dannasînkirin û nivîsar min bi +2-va qîmet kirin.

Bi fikirmîşbûna derheqa van eşkerekirinada, min fem kir, wekî gelek cara, dema ku ez dinivîsim, ez texmîn nakim ku wede çawa derbaz dibe. Carina ez şebeqê zû destpê dikim binivîsim û fem nakim wekî îdî roje. Ez bi fikirdarî ji nivîsarê diwestim, lê ez aktîvim.

Wî cûreyî jî usa dibe, wextê ku ez dannasînkirinê dikim. Berê, wextê ku sînorkirinên wede tunebûn, min gelek cara ji du seheta zêdetir dannasînkirinê dikir. Ew bona min tê bêjî 30-î deqe bûn, lê ez nizanim ku aûdîtorîyayê çi difikirî.

Ez dîna xwe didimê ku çawa kurê meyî efrandar Alêk, bi seheta ser hev li ser projeyên nû dixebite û texmîn nake ku wede çawa derbaz dibe. Ew nava beşa qulixdarîya meye efrandarîyêda gihîştîye feydayên here baş. Ez dîna xwe didimê ku Lîza çawa bi seheta, piştî berevbûna tevî jina, bi seheta xeber dide û derheqa wededa bîr dike. Ew aktîv dibe, wextê ku bi qîsa alî wan dike û wana dide dasekinandinê.

Carina Albêrt Ênştâyî bi seheta dixebitî. Wextê ku ew gelekî diwestîya, ewî sinîke hesinî hildida û li ser kursî rûdinişt, sinî destên xweda xweyî dikir û dida ser çokên xwe, destên xwe jî didane ser. Dema ku xewra diçû, ew sinî

ji destê wî dişimitî û dikete erdê. Ji dengê bilind ew hişyar dibû û ew paşda vedigerîya ser xebatê xwe.

Eva mecaleke gelekî hêsaye ku hûn navê xwe pê bihesin. Pêşkêşên weye rast wê we ruhdar bikin, nenihêrî wê yekê, wekî hûn bi fikirdarî yan jî bi fizîkî ji xebata wededirêj biwestin. Bona wan meriva, kîjana pêşkêşa xweye rast êşkere kirine, sehetên telîmkirina, leca, yan jî xebatê dikarin çawa deqe bêne texmînkirinê. Dêmek, ji xwe bipirsin: “Gelo çi aktîvîyê dide min û ew yek usa dike, ku ez derbazbûna wede texmîn nakim?”.

Bersiva we nîşana raste derheqa pêşkêşa wedaye.

Çi tişt guhdarîya we dikişîne ser xwe?

Kîjan tişt guhdarîya we dikişîne ser xwe? Çi we aktîv dike? Dema ku hûn distirên, dilê we şaye? Hûn wî çaxî distirên, wextê ku tu kes naxweze bistirê? Ez zanim, wekî dema ku ez distirêm, ew yek mînanî xebateke girane, ya ku lez min dide westandinê. Ew yek pêşkêşa min nîne. Ez nikarim odekêda rûnêm û stiranê, yan jî miqam tevî merivên başqe binivîsim. Ew yek bona min he-waskar nîne, lê ez meriva nas dikim, yê ku wê yekê hiz dikin.

Kovarên çi cûreyî bo we hewaskarin? “Yûtûbê”-da hûn bi kîjan vîdêyoya ruhdar dibin? Kîjan tişt guhdarîya we dikişîne ser xwe, dema ku hûn «Pîntêrêstêda»-nin? Li mektebê, we kîjan ders ji hemû dersên mayîn zêdetir hiz dikir? Kîjan kitêb guhdarîya we

dikişînine ser xwe, dema ku hûn li dikana kitêbêda wana dikirin?

Pirseke girîng jî bidin: weyê çi bixwesta bikira, heger we bizanibûya, ku bona wê wê pera nedine we? Gelek sportsmênên profêsiyonel wê nava sporta xweda biketana nava lehcê, heger ew pê bihesîyana ku wê pere nedana wan. Her şemî, şebqê, bavê min ez didame rûniştandinê û gilî dikir ku motor, yan jî aparateke mayîn, çawa dixebite. Tê bîra min, wekî rojeke wî cûreyî, roja şemîyê, ewî şikilê motorê kişand û ji sehetekê zêdetir cûrê xebata wê minra şirovekir. Ez usa aciz bibûm, wekî hindik mabû bigirîyama. Hema wî çaxî gerekê min fem bikira, wekî înjênêrî ne navê min bû. Min usa gelekî bavê xwe hiz dikir, wekî min nikaribû bigota wî ku min ew ders hiz nedikirin. Min şaşîke mezin kir, dema ku ez bona heyîna çareserîya finansî bûme înjênêr. Şaşîya wî cûreyî nekin.

Gelek meriv nava xebata xweda bêbextin, çimkî ew wê yekê bona stendina miaşê dikin.

Çawa ku min îdî gotîye, çend sal pêşda, dema ku jina serwêrê min got, wekî ew nikarin anegorî wê xebatê pera bidine min, min gotê: “Çi jî hebe, ez qayîlim”. Ez hazir bûm bi heqê nimiz jî bixebitîyama, çimkî wê qulixê guhdarîya min dikişande ser xwe. Dema ku min ew xebat stend, ew 70 sehetê

nava hevtêkêda zû difirîn, wextê kîjana min qulixî serwêrên xwe û mêvanên wan dikir. Min gelek cara digote Lîzayê, wekî ne ku serwêrê min gerekê pere bidana min, lê min bi xwe gerekê pere bidana wan bona wê yekê, çimkî wana îzin dida ku min qulixî wan bikira.

Ez dudilî nînim ku derheqa wê yekêda dinivîsim, çimkî hûn dikarin bifikirin ku ez pesinê xwe didim, lê ez hêvîdarim wekî hûnê bawar bikin ku menîya min, xwestina min, alîkirina wan bû. Dema ku min û Lîzayê qulixkirin teze destpê kiribû, me birîyar kir wekî perên ji firotana kitêbên min, emê derbazî ser qulixdarîya “Mêsîncêr Întêrnêyşînil”-ê bikin. Hetanî niha min îdî ji 20 kitêbî zêdetir nivîsîne û bona her kitêbekê, bona nivîsarê û rêdaktorîya wan, min 400-450-î sehet xerc kirine. Ev yek dide kifşê, wekî nava nivîsarêda min 9000 sehet xerc kirine. Ev jî dide kifşê ku meriv sê sala ser hev, herroj, nava wanda usa jî rojên şemîyê û yekşemê, heşt sehet bixebite. Min ew yek kirîye, çimkî ew pêşkêşa mine, ya ku navê min berfireh dike.

Ez dikarim bi bêqelpî bêjim, wekî heger min ev xebata bibijarta û bikira, yan jî salê 200 000 dolar wextê xebata înjênêrîyê bistenda, gelo minê dîsa ew yek bêyî fikirmîşbûn bikira? Awa bona çi Pawlosê şandî dinivîse:

“Wekîltîya Mizgînîyê» li min hatîye spartinê, nenihêrî wê yekê ku ez heq distînim, yan na? Dêmek, heqê min nava çidane? Nava wê yekêdane, wekî ez her dem Mizgînîyê dilên merivara dannasîn bikim, bêyî borcdarî, belaş û bêyî dewakirina mafên mine stendina piştgirîya finansî” /A Korintî 9:17,18, TPT/.

Merivên çawa guhdarîya we dikişînin ser xwe?

Bi femkirina wê yekê, wekî merivên çawa guhdarîya we dikişînin ser xwe, hûnê derheqa nav û pêşkêşên xweda gelek eşekerekirina bikin. Meriv dikarin pêşkêşên we bidine hişyarkirinê û we hînkin, ku çawa wana bidine xebatê. Merivên nêzîke usa bibînin, nav û pêşkêşên kîjanaye wî cûreyî hene. Ew meriv wê nava jîyana wêda roleke mezin bilîzin, alî we bikin ku hûn fem bikin, ku hûn kîne û Xwedê pêşkêşên çawa dane we. Merivên nêzîk ewin, yê ku we qebûl dikin û we fem dikin.

Li min xweş tê ku ez rastî qulixçiyên usa bêm û derheqa bûyarên qulixêva girêdayî û derheqa dijwarîyada xebardim, usa jî dora Xebera Xwedê qisekim. Li min usa jî xweş tê rastî karmend û bîznêsmêna bêm. Ev govek alîyên mine qewatin.

Serkarîkirina teşkîleta qulixkirinê gelek alîyava mînanî serkarîkirina îdarêye. Ez û Lîza mecbûr bûne çawa karmend bixebitin. Dema ku em ciwan bûn, ji qulixdarîyên eyan tu yek wî cûreyî nedîxuxulî çawa ku me dixwest:

qulixdarîke usa tunebû ku me dîna xwe bida mînaka wê. Me gerekê rîya nû vekira. Bo wê yekê jî merivên dinîya bîznêsê nava minda tiştên usa hişyar kirine, kîjana alî min kirine ku ez diha bi profesîyonalî wê xebatê bikim, bona kîjanê ez hatime gazîkirinê.

Heger hûn bi sazûna hundurva hewaskarin, hevdîtina weye tevî dîzaynêrên başqe wê li we xweş bê. Heger hûn doxtirin, hûnê tevî doxtirên başqe xweşhalbin. Heger hûn sazbindin, sazbindên başqe wê alî we bikin ku hûn pêşkêşa xwe bidine gurkirinê. Ez dikarim ser hev derheqa vê yekêda bêjim: dîtina merivên nêzîk wê alî we bike û serbara serda jî pêşkêşên we bide eşkerekirinê.

Dîsa bêjim, girînge bîr nekin, wekî tu bersiveke van pîrsa nikare bi xwe qîrarkirbe, heger hûn bona Xwedê wede başqe nekin, bona ku li Wî bigerin û bizanibin ku Ewî bona çî gazî we kirîye. Heger min guhdarîya pîranîya wan qulixçîya bikira, yên ku nava salên sazûna mine ruhanîda şîret didane min, ezê biçûma bajarekî û minê civînek sazîra û bibûma serwêr. Hindik meriv ew nav û pêşkêşên cuda didîtin, kîjan nava jîyana Lîzayê û minda hebûn. Ji alîkî mayîna jî, çend qulixçîyên serwaxt hebûn, yên ku wî alîda alî me kirin ku em wî alî bilivin, kîjan me dilê xweda texmîn dikir.

PÊŞKÊŞA XWE BIDINE PÊŞXISTINÊ

Niha guhdarîyê bidine ser beşa duem, ya xebera meye vekirinê:

“Ji we her kes gerekê cabdarîyê hilde ser xwe, ku nava jîyana xweda xebata efrandarîye baş mîyaserke» /Galatî 6:5, MSG/.

Xwedê qewat daye me her kesî, ya ku alî me dike, ku him em jîyana xwe çêkin, him jî padişatîya Wî. Lê belê, wedekî usa tê, dema ku em mecbûr dibin rû bi rû li ber wê yekê bisekinin, wekî tenê heyîna qewatê bes nîne: ew gerekê bê mîyaserkirinê.

Gelo wê tişteki çiqasî xirab bûya ku em bighîştana dawîya jîyana xwe û me fem bikira, wekî nava meda hê gelek tişt mane, yên ku nehatine mîyaserkirinê. Li ber textê Dîwanê êşa poşmanîyê wê gelekî bi kederbe, dema ku em bizanibin ku çiqas tişt nava jîyana meda neqewimîne û tiştê herî xirab wê ewbe, ku çiqas meriv usa jî hukumê padişatîya Xwedê li ser xwe nebirin, çimkî em bi bêterbyetî nêzîkî pêşkêşên ji Xwedêda dayî bûne û me ew nedane pêşxistinê.

Hema niha birîyarkin wekî hûnê vala bimirin, xweda tu tiştî xweyî nekin. Biryarkin, wekî hûnê wî hemû tiştî bidine der, hetanî ku hûn valabin. Bona vê dinîyayê ew yek pêwîste çî ku cem we heye, pêşkêşên ji Xwedêda dayî.

Gotinên Silêman 18:16-da derheqa pêşkêşên meye ji Xwedêda dayî fikireke hewaskar hatîye nivîsarê:

“Pêşkêşa mêriv bona wî cîh vedike û tîne li ber merivên bona wî girîng” /NKJV/.

Pêşkêşa we bona we “cîh vedike” û tîne li ber “merivên bona we girîng”. “Vekirina cîh” dide kifşê «yêrê sazkin». Ew “cîh”, kîjanî em didine kifşê, bi du fikiraye. Ya ewlin, pêşkêşa we cîh vedike, ku hûn qewata xwe bidine xebatê û ji wê derê cîguhastî bibin, li *kîderê hûnin*, li wê derê, li *kîderê hûn dikarin bibin*. Ya dua, pêşkêşa we cîh vedike, bona ku hûn berbi derecên navê xweye nû pêşda herin. Bîr nekin, wekî bona her pêşdaçûyînekê karebûnên diha mezin tên xwestinê. Careke mayîn bêjim, Silêman dinivîse:

“Heger hûn nava karê xweda rûnkirîne, hûnê bilindbin, û pêşdaçûyîne bistînin. Wê we paşda negrin” /Gotinên Silêman 22:29, TPT/.

Derheqa Dawidda bîr bînin. A Padişatî 16-da serhatîke derheqa wê yekêda nivîsare, wekî Şaûlê padişa ji ruhê xirab diçerçirî, çimkî Ruhê Xudan ji wî dûrketibû. Şaûl berbi sivikayê divedand û ewî emir kir ku xulamên wî sazbandekî bibînin û bînin cem wî.

Xulamekî ciwan gotê: «Min kurekî Hêssê li Bêtlêhê mêmê ditîye, yê ku bi *profêsîyonalî* saz dixê» /A Padişatî 16:18, AMPC/. Dawid ne tenê sazbandê *rûnkirî* bû, lê usa jî *profêsîyonal* bû. Gelo çi ew kiribû *profêsîyonal*? Ewî pêşkêşa xwe dabû pêşxistinê û bo wê yekê cîh vebibû, yan jî mecal hatibû sazkirinê, ku ew nava navê xweda pêşda biçûya.

Gelo tiştê usa diqewime, wekî gelek meriv nava navê xweda pêşda naçin, çimkî pêşkêşên xwe bi cûrê anegor pêş nexistine? Gelo diqewime, wekî çapa pêşkeftina pêşkêşên me qirar dike, ku bi çiqasîva em *dikarin* pêşkeftinê bistînin?

Em paşda vegerine ser xeberên Pawlose bona Tîmotêyo, derheqa çida me serê kitêbêyî derbazbûyîda gotîye. Vê carê emê berdewam bikin û wê yekê lêbinihêrin, çi ku ewî pêşniyarî kurê xweyî ruhanî kir:

Hindava wê pêşkêşa xweye ruhanîda bêxem nîbe, ya ku dilê tedaye [ew tiştê mexsûsî hundurda], yê ku derbazî cem te bû... nava van borcdarîyada *hînbe* û wana *pêşxe* û dora wan *bifikire* :*bi temamî xwe bide wan* [çawa qulixa xwe], bona ku *pêşdaçûyîna* te bona *li ber çevê hemûyabe*” /A Tîmotêyo 4:14, 15, AMPC/.

Ji van xeberên serwaxt meriv dikare gelek tiştî hînbe. Em li wan jin û mêra dinihêrin, yên ku nava govekên xweda dighîjine pêşkeftinê. Gelek cara hêsaye açixîya wan bêqîmetkin û bêjin: “Ew bi pêşkêşa mexsûs hatine dinîyayê». Belê, ew jî mînanî we, bi rastî bi pêşkêşa mexsûsva hatine dinîyayê û qirar kirine wê pêşkêşê bidine pêşxistinê. Bi gilîkî mayîn gotî, heger me nedîtibe jî ku wana pêşkêşên xwe çawa pêş xistine, dîsa ew yek nade kifşê, wekî ew li ser wê yekê bi kel û ced nexebitîne.

Çawa ku min serê kitêbêyî derbazbûyîda da kifşê, Pawlos destpê dike eşaretîyê bide Tîmotêyo ku hindava pêşkêşa xweye ji Xwedêda dayî, bêxem nîbe. Em hindava pêşkêşa xweda bêxem dibin, dema ku em guhdariyê nadine ser wê. Pawlos Tîmotêyora dinivîse, wekî pêşkeftina wî li hemûya eyanbe, heger ew bi temamî jîyana xweye nava pêşkeftina pêşkêşa xweda, çî ku bi gotinên Pawlos, bi rîya *xwehînkirinê*, *pêşkeftinê* û *fikirmîşbûnê* mîyaser dibe. Werin em bi kurtayî van hersê tiştî gotûbêj bikin.

Xwe telîm bikin

Xwetelîmkirin wê yekê dide kifşê ku “tiştêkî ser hev biwekilînin, yan jî bixebitin bona bûyîna merivekî profêsiyonal”: ev fikir anegorî ferhenga *Mêriyam-Wêbstêrê*-ye. Profêsiyonalîzma me dereca şuxulkarîya me dide birîyarkirinê, çimkî emê her dem bi wê derecê bişuxulin, bona kîjanê em hatine telîmkirinê. Meriv hêsa dikare wê yekê bine ber çeva, lê telîmên bi hevîya, meha û sala, usa jî xebata bi kel û ced hesab hilnede, ya ku mêriv dighîne li ser dereca usaye bilind.

Anegorî kirên mêriv û şuxulkarîya pêşezana, pêwîste nêzîkî 10.000 seheta bişuxulin, ku nava îşekîda meriv bibe profêsiyonal.

Lê belê, profêsorê ûnivêrsîtêta Florîdayêye dewletê K. Anders Êrîkson wê fikira tradîsiyonra qayîl nîne, wekî “telîmkirin mêriv dide pêşxistinê”. Profêsor gavekê pêşda diçe û dide kifşê, wekî telîmên 10.000 seheta bes nînin, heger ew telîmên bi seheta ne ku bona pêşkeftinê tên kirinê, lê awqasî kirinên lazim tên mîyaserkirinê. Ew telîmkirina vî cûreyî çawa ya “telîma bi merem” nav dike. Ew dinivîse:

“Ezê bi du xebra telîma bi merem raberkim: ji zona bona xwe xweş derkevin, lê wê yekê bi cûrê merkezîrî bikin, bi heyîna meremên zelal, bi progirama ku bighîjine wan merema û çawa mecala kontrolkirina pêşkeftina xwe”.

Hetanî ku em xwe ji zona bona me xweş û dereca profêsiyonalîzmêye niha xwe def nedin, emê negihîjine pêşkeftinê. Heger em merem daneynine pêşîya xwe, wî çaxî emê bighîjine dereceke usa, ya ku wê me bide razîkirinê û emê bi hêsanî bibin ji xwe razî. Peyî wê yekêra îdfî dimîne pîrsa wede, ku emê kengê destpêkin îşê xwe xirab bikin û ew yek wê bi cûrê xirab hukumî li ser

xebata me bike û wê dijwarîya bona çendbarekirinê pêşda bîne.

Pêşxistina alîyên weye qewat azayê dide we, wê yekê nade sînorkirinê. Bi saya wê yekê, qewata weye çendbarebûnê zêde dibe. Ew yek nade kifşê, wekî em li ser alîyên xweye zeyîf naxebitin û karebûnên nû dest naynin, lê em nava wan govekada merkezbûyîne û emekê xwe dikine nava wan, bi saya kîjana qewata me wê encamê herî baş bide.

Ez pêşniyar dikim ku hînî karebûnên nûbin, lê gerekê wê yekê tu cara kîsî pêşxistina govekên navê weva girêdayî nekin.

Fikira sereke ewe, wekî gihîştin bi xwe naqewime: ew dewa merem dike. Heger em her dem xwe telîm nekin, bona ku em nava pêşkêşên xweda bibin “profesiyonal”, emê tu cara bi qewata xweye tamva neşuxulin. Bi vî awayî em gerekê her dem bona pêşkeftina xweye şexsî bixebitin. Piranîya meriva dixweze nava jîyanêda îşên mezin bike. Lê belê, hemû kes hazir nîne wê xebatê bike, ya ku bona gihîştina mezinayê pêwîste. Bi xwetelîmkirinê em wî bihayî didin, yê ku feydayên mezin dide.

Pêşkeftin

Xwetelîmkirin tiştêkî praktîke, lê pêşkeftin tiştê hînbûnêye. Xebera “pêşkeftin” dide kifşê: «Bi rîya hînbûnê yan jî xwetelîmkirinê pêşda herin: piştgirîyê bidine gihîştinê û pêşdaçûyîne».

Pêşkeftin şagirtîyêva girêdayîye. Şagirtî bona gihîştina weye şexsî û pêşdaçûyîne bêhesab girînge, çimkî bi rîya wê yekê hûn rexnekirina çêkirinê û rêberîyê distînin, kîjanê hûn bi xwe nikarin dest bînin. Her kesê ku nava pêşkêşên xweda gihîştîye dereca bilind, şagirtî û rêberî nava govekên jîyana xweye cuda-cudada standîye. Alîyê mamostayên jîyana we ewe, wekî ew qewata we dibînin û divedînin wê yekê ji we derxin, heger ew carina usa jî dibe, ku bi cûrê berk nêzîkî we dibin.

Hûn dikarin ji heleqetîyên şêwirdar-xweykir, bav-zarok, dayîk-zarok, dersdar-şagirtîyê bistînin, bi rîya praktîkayê û cêrbandina xebatê, usa jî bi cûrekî mayîn: ji kitêba, dersa û wan matêrîyala, yên ku li ber destê wane.

Mecaleke usa jî, ya bona hînbûna nava goveka pêşkêşên xweda ewe, ku dikarin tevî wan meriva berevbin, pêşkêşên kîjanaye wî cûreyî hene. Ez careke mayîn biwekilînim, çawa ku pêşda min îdî gotibû, vê yekêra gelek cara dibêjin “Merivên xwe bibînin”. Dema ku hûn tevî wan merivane, li cem kîjana talant û cedandinên wî cûreyî hene, wî çaxî hûn mecala hevkarîyê û efrandina tevayî distînin.

Salên 1930-yî û 40-yî komeke nivîskarên efrandar, yên ku bi navê “Înkling” eyan bûn, li odeke cuda, ya cîhê şerabêye nêzîkî têrîtorîya ûnîvêrîstêta Oksfordê, rastî hevdu dihatin. Diketine nava wan meriva usa jî K. S. Lyûîs û C. R. R. Tolkîn. Armanca hevdişîna wan ew bû, ku wan kitêbên endamên komêye

nîvcî mayî bixwendana û rexne bikirana. Ew hevdiştin kitêba Tolkîne «*Xudîyê gustîlka*» û ya Lyûîse “*Nivîsarên Narnîayêye dîrokî*” ruhdar kirin. Eva mînaka heleqetîyên tevî merivên xweye.

Fikirmîşbûn

Fikirmîşbûn dide kifşê «bifikirin». Gihîştin wî çaxî dikare bibe, wextê ku em wede başqe dikin bona ku em dora dersên xweye hînbûyî bifikirin. Dema ku em bi serwaxtî zêdaya xwe kontrol dikin û wede didine wê yekê bona qîmetkirina pêşkeftin û şuxulkarîya xwe, em wan goveka dibînin, yên ku hewcê guhdarîyê û başkirinêne.

Hevalê min, Con Maksvêl, gelek cara tîne bîra aûdîtorîya û xwendevanên xwe, wekî dersdarê herî baş ne ku cêribandine, lê *cêribandina qîmetkirîye*. Bi fikirmîşbûna dora pêşdaçûyîna xwe, bi dil wan fikira qebûlkin, kîjna hûn ji dersdar û hevalên xwe dibihên, usa jî derheqa xebitandina wan mecalên nûda bifikirin, yên ku wê pêşkêşên we bidine pêşxistinê. Pirsên rast bidine xwe û Xwedê: “Ez gerekê çi biguhêrim?”, “Nava kîjan govekêda ez gihîştîme zêdaya here bilind?”, “Ez gerekê guhdarîyê diha zêde bidime ser kîjan govekê?”, “Çi pêwîste ku ez bighîjime dereca nû?”.

Wedê fikirmîşbûnê tu cara xerckirina wedeye badîhewa nîne.

TU TIŞTÎ XWEYÎ NEKIN

Em careke mayîn xeberên Pawlose bona Tîmotêyo bixwînin:

“Nava van borcdarîyada xwe telîm bike û wana bide pêşxistinê û dora wana bifikire: *bi temamî xwe bide wan* [çawa qulixa xwe], bona ku pêşdaçûyîna te bona hemûya ber çevabe” /A Tîmotêyo 4:14, 15, AMPC/.


Ew hemû tiştê ku me gotûbêj kir, bona tiştekiye: em gerekê bi temamî xwe bidine wî şuxulixî, bona kîjanî Xwedê gazî me kirîye û pêşkêş dane me. Navê we dewa xwepêşkêşkirina tam dike. Dema ku em bi dil xwe bidine wê yekê, çi ku Xwedê spartîye me, pêşdaçûyîna me wê bona hemûya bê ber çeva û emê qewata xwe çendbare bikin.

Ji me her kes gerekê bona mîyaserkirina xebata efrandarîyêye here baş cabdarîyê hilde ser xwe. Me çawa da zelalkirinê, çapa karebûnên me wê yekê qîrar dike, ku bi çiqaşîva em dikarin nava goveka navê xweda pêşda herin û kardarîya xwe bidine çendbarekirinê.

Nava vê jîyanêda mecaleke me heye, bona kîjanê em dikarin hemû qewatên xwe bidine xebatê. Werin em tu tiştî xweyî nekin, werin em xwe bidine valakirinê û bi temamî xwe pêşkêşî Xwedê bikin. Awa bi vî cûreyî gerekê bijîn. Bi vî awayî emê bi rastî saxbin û emê tam jîyanê bijîn.

BIFIKIRIN

1. Bona eşkerekirina navê we formûle tunene. Neniherî wê yekê, kitêbên cûre- cûre hene, yê ku dikarin alî we bikin ku eşkere bikin ku li cem we kîjan alî gelekî başe. Bona dîtina navê xwe û pêşkêşên xwe şuxulkaîya Xwedê lazime. Gelo hûn Xwedê gerîyane, bona ku derheqa nav û pêşkêşên xweda bizanibin? Ewî çi nîşanî we daye?
2. Nava gera xweda em gerekê pirsê bidine xwe û merivên başqe. Ev hemû tişt beşa prosêsa gerêye. Wan meriva bibînin, li kîjana hûn amin dibin û ji wana bipirsin ku ew nava jîyana we û nava weda çi dibînin.
3. Tenê heyîna qewatê bes nîne: ew gerekê bê mîyaserkirinê. Bona çi ew yek girînge ku hûn pêşkêşên xwe bidine pêşxistinê? Çi diqewime, dema ku hûn pêşkêşên xwe bi armanc didine pêşxistinê?



*“Lê Ewê ku em weva tevayî yektîya
Mesîh da îzbat kirin û em kifş kirin Xwedê ye”*

– B. Korintî 1:21

Rûnkirin

Wextê cejineke Razîbûnêye dawîyê malbeta me dora sivira nanxwerinê rûniştî bû. Lîzayê kêfeke balkêş hazir kiribû. Ew yek îdî peyî nanxwerinê bû û me bi hewaskarî bi hevra xeber dida. Min texmîn kir, wekî çawa bav ez gerekê tiştêkî bêjime malbeta xwe, usa jî çend endamên koma me, yên ku gihîştibûne me.

Piştî duakirina nava fikira xweda, min dilê xweda xeberek stend.

-Ez îdî 60 salîme û bi gelek alîyava texmîn dikim, wekî çawa bav ez gerekê serwextîyêva tevî we parave bibim. Heger we ji min bipirsîya ku tiştê herî girîng kîjane, ku min tevî Lîzayê nava 40 salên dawîda tevî Xwedê kirîye, ezê vî cûreyî bêjim: *"Guhdar bin"*.

Nava wan salada me gelek cara dikaribû hemû tişt berda. Usa jî gelek mecalên meye berdaxustinê, yên bona berjewandîya şexsî, pêşdaçûyîne, yan jî azabûna ji tengasîyê, hebûne. Lê me qirar kirîye, ku rastî bibe hîmê me û em ji wê yekê xwe bigrin, nenihêrî wê yekê ku menîyên wê çiqasî yên bi êşin.

Gotineke Îboye serwaxt ev bû: "Ez dikarim nava vê yekêda dilminîyê bidime xwe: nenihêrî êşa xwe, ez hindava xeberên Pîroz xayîn nîbûme" /Îbo 6:10, NLT/. Dema ku min şaşî kirine /lê min şaşî gelek kirine/, min tobe kirîye û baxaşandin him ji Xwedê û him jî meriva xwestîye. Niha ez li rastîya gurêkix rina duakirinaye herdem dinihêrim, û ew nebînayîne. Kerema Xwedê gelege!

KIŞKIRIN

Duake mezine bona gurêkirina rastîyê ew kifşkirine. Bona ku em vê yekê fem bikin werin em derheqa kifşkirina Mezin da bixwînin, derheqa wê rojêda, wextê ku Bav Xwedê bi cûrê heyteholî Îsa çawa Padişayê ezmîn û dinîyayê îzbat kir:

"Çimkî Te heqî hizkir û ji neheqîyê dûr sekinîyî. Bo wê yekê jî, Xwedêyo, Xwedêyê Te Tu bi rûnê şabûnê rûnkirî, ji hevalê Te zêdetir" /Îbranî 1:9, TPT/.

Guhdarîyê bidine ser xeberên “*bo vê yekê*”, çimkî bona femkirina rastîya girîng ew yek bêhesab girînge. Tabîya Îsaye qewîn nava herdu pirsada kara mezin da û mînaka Wî gerekê bona me bibe norm. Îsa *heqîttî* hiz kir. Zimanê yûnanîda ew xebera “*dikaîosûnê*” ye, şirovekirina kîjanê /qayîlîya hindava dewakarîyên serokatîya diha bilind/ e. Lê, bi wê yekêva tevayî ewî *neheqî* hiz nekir. Gelek mesîhî hene, li kîjana neheqî *xweş nayê*, lê dilê Îsa vî cûreyî nîne: Ew wê yekê *hiz nake*. Zimanê yûnanîda ew xebera “*anomîya*” ye, ya ku dide kifşê ku “gura serokatîya Xwedê nekin”. Ew bi hiznekirin nêzîkî her tiştî dibû, çî ku mêriv ji serokatîya Xwedê dide dûrxistinê, û xilaz. Gurêkirina Îsaye qewîn, nenihêrî hemû dijarîya, bû menî ku rûnkirina Wî da diha zêdebe, ne ku nava jîyana hevalekî Wî da. Bona çî ez kitêba derheqa çendbarekirinêda, bi xeberdana derheqa rûnkirinêda, ser hevda tînim? Bersiva vê pirsê zelale, lê girînge: *Bi saya rûnkirinêye, wekî karebûnên ji alîyê Xwedêda dayî çenda bare dibin û tesîra heta-hetayê dihêlin*. Bînin ber çevê xwe, wekî rûnkirin qewatdara pêşkêşên weye. Îzinê bidin du mînaka bînin ber çeva.

Min guhdarîya merivên bi dengê xweş kirîye, û ez bi qîmetkirin nêzîkî wê yekê bûme, lê min usa jî guhdarîya merivên bi dengê ne baş jî kirîye, yên ku nêzîkî dilê min bûne û guhartin kirine nava jîyana min. Firqîya di navbera van herdu meselada *rûnkirine*. Min usa jî guhdarîya merivên usa kirîye, yên ku bi bangên bi fikira kûr dannasîn kirine, lê hebûne bangên usa jî bi fikira ne kûr, yên ku hukumî li ser dilê min kirine û kirinên min guhartine. Firqîya di navbera van herduada careke mayîn *rûnkirin bûne*.

Hema ev jî derheqa wan qulixçiyên Xwedêye rastdane, nenihêrî goveka navên wan, dixwezî ya serkarîkir, dixwezî ya bîznêşê, yan jî edebetê, perwerdê û govekên mayîn. Dawidê padişa vî cûreyî got:

“Lê Te sturîyê Min /sîmvolê qewata gelekî mezin û kerema bilind/ mîna sturîyê gayê beyanî bilind kir: Ez bi rûnê nû *rûnkirîme*” /Zebûr 92:10, AMPC/.

Xeberên wî gelek tiştî eyan dikin. Bi lêkolînkirina çend şirovekirinên pêşkêftî, min qayîlîke tomerî dît, wekî gayê beyanî nava vê gotinêda sîmvolê wê yekêye, ku Xwedê qewata mezin dide. Rûnkirin şabûnê tîne: Xwedê wê yekê çawa *rûnê xwezîliyê*, yan jî *şabûnê* nav dike, kîjan, anegorî kitêba Pîroz, *qewata meye* /bixwînin Nêmîya 8:10/. Bi texmîn, Zebûr dibêje, wekî rûnkirin me qewat dike. Ew pêşkêşên me dide berfirehkirinê û qewatkirinê, bona ku rezê heta-hetayê bîne.

Ez bawar dikim, wekî rûnkirin nava metelokên talanta û serwaxtada faktoreke bêşikê guhartinêye, û xebata herdu xulamên çendbarekir bi saya rûnkirinê berfireh bû. Ez xebera “bêşik” didime xebatê, çimkî min ev rastî

ji xeberên jorgotî hildaye. Bona çendbarekirinê pêwîst bû ku wana gura gotinên axayê xwe bikirana û bi hiznekirin nêzîkî wan merivabûna, yên ku gurê nedikirin. Bi saya vê nêzîkbûnê wana rûnkirin stend, encamê kîjanê berê firehûna pêşkêşên wan bû.

Dawid derheqa rune *nû* da dibêje. Rûnkirin qewimandineke yekcare nîne: ew duaye, ya ku nava jîyana merivê şikestîda, yê ku gura Xwedê dike, destê pêke û paşê jî berdewam dibe. Rûnkirin tiştêkî usa nîne, kîjanê em carekê distînin û bêguhdarî dihêlin, dibêjin: “Ya min heye”. Rûnkirina Samson hebû, lê ewî ew nava halê nûda xweyî nekir. Ew berbi berdaxustina diçû û gurê nedikir: ewî neheqî înkâr nedikirin. Ew jî çend cara bêencam nema lê dawiyê, gunehê wî ew atkir. Kitêba Pîroz dibêje:

“*Û qewata wî ji wî çûbû. Û jinê /Delîlê/ got: “Samson, filistinî hatine ser te”. Û ew hişyar bû, got: “Ezê derêm û mînanî carên ewlin xwe bakim”, lê ewî nizanibû wekî Xudan ji wî çûbû” /Hakimî 16:19b, 20/.*

Samson nizanibû wekî rûnkirin hatibû hildanê. Ev bû menî, wekî Dawid sirîya Bêrsabêda gura Xwedê nekir û bi kel û ced dua kir:

“Xwedê, dilekî paqij nav minda biefîne û ruhekî amin nav minda çêke . Tu min ji ber Xwe nevéje û ruhê Xweyî Pîroz ji min nestîne. *Şabûna* xilazkirina Xwe li min vegeîne û bi ruhekî *razî bona gurêkirinê* min bingehke” /Zebûr 51:10-12, NLT/.

Qîrîna dilê Dawid, recakirina wîye mezin ew bû, ku rûnkirin ji jîyana wî nehatana hildanê, û ewî zanibû, wekî ew yek girêdayîbû bi aminayî gurêkirina Xwedêra.

Lêkolînkirinê berdewam bikin, ku rûnkirin çîye û ew kêra tê dayînê. Careke mayîn xeberên Pawlos bixwînin, yên ku destpêka vî serê vê kitêbêda hene.

“Lê Ewê ku em weva tevayî yektîya Mesîhda îzbat kirin û em kifş kirin Xwedê ye” /B. Korintî 1:21/

Nava vê xeberêda, xebera “rûnkir” heye, ya ku zimanê yûnanîda “*krîo*” ye. Ew vî cûreyî tê şirovekirinê : “Tiştêkî teslîmî yekî mayîn bikin, bona ku ew bi qewata mezin bê *îzbatkirinê*, *duakirinê* û bi extîyarîya rûnkirinê: rûnkirin, dîyarkirin, *kifşkirin*”.

Nava vê şirovekirinêda du xeberên girîng hene û em gerekê guhdarîyê bidine ser xeberekê. Xebera “îzbatkirin” çawa “îzina fermî, yan jî begemîya

fermî bona kirina tişteki” tê şirovekirinê. Bi cûrê zelal gotî, rûnkirin *begemîya Xwedêye, ku ew bişuxule*. Îsa dibêje: “Ruhê Xudan li ser Min e, çimkî Ewî Ez rûnkirime...” /Lûqa 4:18, NLT/. Ew yek dide kifşê, wekî Xwedê begemî dabû, ku Îsa bişuxulîya. Petrûsê şandî derheqa wê fikirêda dibêje: “Ew Îsayê ji Nisretê... Xwedê bi Ruhê Pîroz û qewatê *kifş kir*, ku bi qencîkirinê gerîya û hemûyên ku bin bindestîya mîrêcinda bûn, *qenc kirin*...” /Karên şandîya 10:38/. Dîsa bêjim, wekî ew bona karkirinê tê dayînê.

Şirovekirina xebera “*krîo*” “kifşkirin”e. Nava qulixkirina bona Xwedê wedê cêribandinê heye. Em nava gurêkirinêda tèn cêribandinê, hetanî ku tèn kifşkirinê, yan jî rûnkirinê.

Nava serhatîya Maykda, ya ku serê 9-da nivîsar e, cêribandina wîye sereke wî çaxî qewimî, dema ku Xwedê hîvî ji wî kir, ku ew 200 dolarên xwê eye dawî bike qurbanî. Cêribandina meye di navbera min û Lîzayêda ew bû, ku me xwe pêşkêşî nivîsarê bikira, heta wî çaxî jî, dema ku tu çapxweneke bona herdu kitêbên meye ewlin hewaskar nîbû û ew layîqî guhdarîya civakê nebûn.

Îsa çendik-çend cara dibêje: “Gelek hatine gazîkirinê, lê hindik hatine bijartinê” /Metta 20:16 û 22:14/. Ez li ser wê fikirême, wekî xebera “gelek” derheqa wandane, yên ku yên Wîne. Ji me her kes bi navê xwedêtîyêye. Lê belê, xebera “bijartî” dide kifşê “kivşkirî”. Bi gotinên Îsa, hejmara merivên wî cûreyî mixabin, “hindik”e. Bo çi? Çimkî begemîya wê yekê heye, kîjanêra pêwîste derbazbin. Bi guhdarî vê gotinê bixwînin: “Slavê bide Hapêlîs, yê ku nava Mesîhda *cêribandîye* û *begemî stendîye*” /Romayî 16:10, AMPC/.

Apêlîs cêribandîbû, mînanî me hemûya, yên ku dixwezîn bikevîna nava navê xwe. Eyane, wekî ew cêribandina xwera derbaz bibû û bo wê yekê jî ew hatibû bijartinê, yan jî begemî stendibû. Anegorî prînsîpên kitêba Pîroz, em zanin, wekî Apêlîs hatibû rûnkirinê, nenihêrî wê yekê wekî derheqa wê yekêda zelal nivîsar nîne: pêşkêşa wî nêzîkbûna Xwedêye berfireh stendibû.

Awqas meriv hene, yên ku ji wede zûtir xwe nava wan govekada kifş dikin, li kîderê ew hatine gazîkirinê. Feqet ew gerekê ne ku berbi teslîmkirinê bo xwe, lê berbi begemîya xwedêtîyê bicedînin:

“Çimkî ne ku ewê ku peyê xwe dide li Xudan qebûle, lê yê ku Xudan peyê wî dide” /B Korintî 10:18/.

Em paşda veqerîna berbi şîva cejina Razîbûnê. Min dixwest ku endamên malbeta min û komê, yên ku li wir hazir bûn, bi zanîbûna wekî *gurêdabûna hertimî*, dêmek hizkirina heqîtiyê û hiznekirina neheqîyê bona mîyaserkirina navê me girînge, çimkî bi saya wê yekê ye, ku em rûnkirina Wî distînin.

Dema ku em paşda li jîyana xwe dinhêrin, ez û Lîza, me demên gelekî diyarda gura Xwedê kir. Gelek cara gurêdabûna me tê bêjî bona pêşkeftina me ne kardar û tiştê tunekirinê bû, bona ku em bighîştana gulvedanê, eyanbûnê û berjewardîyên şexsîye mayîn, ji kîjana tê bêjî em diha zêde dûr dikeftin. Feqet ew yek, çî ku bona me çawa tiştê nekardar dihate texmînkirinê, pêşerojêda werguhêzî wê kilîtê bû, ya ku bona navê me derîyê kardar vekir.

TESLÎMKIRINA BONA ME

Hûn awqasî gazîkirîne, çiqasî her kes gazîkirîye, heta ew meriv jî, kîjana hûn çawa mêrxasên bawarîyêye here mezin hesab dikin. Tiştê nêzîkî aqilaye, wekî navê we nava atmosferê civînêda nîne, çimkî hindik meriv bona vê govekê hatine gazîkirinê. Hûn bona pêşdaçûyîna û bona eyanbûna nava wê goveka jîyanêda hatine gazîkirinê, kuda hûn hatine şandinê.

- Danîyêl qulixên Babîlonêye serkarîkirda eyan bû /bixwînin Danîyêl 6:3/.
- Ûsiv li Misira mezin eyan bû /bixwînin Destpêbûn 41:39/.
- Foybê qulixçîvê civîna Kenxêrîyayêyî eyan bû /bixwînin Romayî 16:1/.
- Navê we jî eyan e.

Hûn bi cûrekî cuda rûnkirîne. Xwedê karebûnên lazim dane we bona ku hûn mîsîya xwe mîyaserkin.

Bixwînin ku Încîl derheqa Bisalê, Oholîyab û derheqa koma wîye xebatêda çî dibêje: "Xudan her xebateke girêdayî çêkirina pîrozgehêra *serwextî* û *karebûn* da Bisalê, Oholîyab û hostayên *zaneye* mayîn" /Derketin 36:1, NLT/. Karebûna wane bona qlixkirina bo meriva û dannaskînkirina Xebera Xwedê tunebû, çawa ku ew yek li cem Mûsa, Harûn û kurên wî hebû. Ew hosta hatibûne rûnkirinê, bona ku bi destên xwe bixebitîyana, bona ku pîrozgeh çêkirana.

Hûn jî hatine rûnkirinê bona ku pîrozgeha Xwedê bi wan karebûnava çêkin, yên ku Ewî dane we. Lê belê, ew pîrozgeh ji zêr, zîv, bronzê, kevirên giranbiha, postên bizina, ji darê biha û matêrîyalên başqe çêkirî nîne, kîjan bona çêkirina paristgeha peymanê Kevin û paristgeha Orşelîmê didane xebatê. Roja îroyîn pîrozgeha Xwedê ji kevirên sax, meriva, tê çêkirinê, û ev kevirên sax çawa mala Xwedê tîne çêkirinê /bixwînin A Petrûs 2:5 û Efesî 2:20-22/. Hûn bona çêkirina merivaye boy rûmeta Xwedê hatine rûnkirinê.

We bona çendbarekirinê qewat stendîye. Em wekîlên pêşkêşên ji Xwedêda dayîne, û Ew dixweze ku em rezê çendbarekirî paşda vegeînine Wî, bi saya pêşkêşên stendî. Em gerekê ji Ezmîn stratêciya bigerin bona çendbarekirinê. Rêber dikarin me hînî prînsîpa bikin, lê stratêciya ezmanaye başqe her

kesîra cuda tê dayîne: wana nikarin ji tu kitêbekê yan jî li cîhê guhdarkirinekî hînbîn.

Em, rêber, dikarin tenê ber dilê weda bîn ku hûn Wî bigerin û guhdarîya dengê Wî bikin. Gura Wîda bin, wî çaxî jî gura Wîda bin, heger ew yek wera çawa tiştekî ne girîng tê texmînkirinê. Gelek cara faktora çendbarekirinê li we çawa tiştekî ne girîng tê texmînkirinê. Toximê xerdelê bîr bînin, yê ku nava toximda yê herî biçûke, ji kîjanî dareke here mezin dighîje.

Hûn bi saya emekdayînê çendbare dikin. Emekdayîn bi gelek cûrava tê kifşê, wextê ku em didin, em dirûna duaya distînin. Heger toxim nayê danînê ew tenê dimîne, lê wextê ku ew tê danînê, ew dirûna çendbare dide. Her dem hûn dikarin toximê xwe yan xweykin, yan jî daynin. Tu cara danînê nedine sekinandinê: ew kilîta dereca kardarîya weye bi sirêye.

Pîştgira we qulixkirine. Heger menîya we, xêncî qulixkirinê, tiştekî başqeye, hûnê bikevine nava halekî usa, nava kîjanîda hûnê nexwezin bimînin. Diqewime sifetê we li ber meriva başbe, lê hûnê ji xebathizîya xwe miqûf bimînin. Çira we wê hema zeyîfbe, bighîje dereca temirandinê. Feqet hêvîdarbin, çimkî Ewê çira ku ditemire, vênesîne: Ewê her dem bicedîne guhdarîya we bikişîne û careke mayîn agirê we gurke /bixwînin Îşaya 42:3/. Neniherî wê yekê ku hûn çî dikin, bicedînin qulixkin, bi bêqelpî hiz bikin û li ber wê tengasîyê teyaxkin, rastî kîjanê hûn bîn.

Berbi rûnkirinê bicedînin. Ewê tesîra we bide mezinkirinê. Ewê xebateke we bike ya heta-hetayê. Ewê qewatê bide we û wê we nava wê govekêda eyanke, li kîderê hûn gazîkirîne. Ewê li vê dinîyayê û heta li civînê jî ji wan meriva cudake, yên ku pêşkêşên ji alîyê Xwedêda dayî bona armancên xwehizîyê yan jî meremên başqe didine xebatê.

Bawarîya we gerekê hebe. Bawarî mecala tek-tenêye ku hûn qewata ji alîyê Xwedêda dayî çendbare bikin. Bêyî bawarîyê “Meriv nikare li Xwedê xweş bê” /Îbranî 11:6/. Bona ku bawarîya we zêdebe, hûn gerekê guhdarîya Xebera Wî bikin. Nivîsare: “Bawarî ji guhdarkirinê tê lê guhdarkirin ji Xebera Xwedê” /Romayî 10:17, NKJV/. Guhdarkirin, guhdarkirin û careke mayîn guhdarkirine, ya ku îzînê dide ku xebera Xwedê dilê meda qewîn îzbatbe. Bi vî cûreyî hûnê bi serwextî bişuxulin, heger hûn vê kitêbê careke mayîn bixwînin û paşê careke mayîn jî bixwînin. Feqet usa nexwînin. Dora wî hemû tiştî bifikirin, ku ev rastî çî cûreyî derheqa wedanin, lê paşê li ser bingeha wan bişuxulin. Xebera Xwedê, ya ku nava vê kitêbêda hatiye cîhwarkirinê, nava ruhê xweda qebûlkin, bi rîya xwendinê, fikirmîşbûnê û duakirinê, hetanî ku hûn bawar bikin, wekî hûn bona çendbarekirinê hatine gazîkirinê, neniherî wê yekê ku li dor-berên we çî diqewime. Fikirdarîya weye hundure derheqa çendbarekirinêda gerekê zêdebe û hindava kirinên weye der serkeve.

Dêmek, bîr nekin: *Xwedê piştovanê we ye.*

“Çimkî Ez wan bernama zanim, yên ku li cem Min bona we hene,- Xudan dibêje,- ew bernama bona qencîyêne” /Yêremîya 29:11, NLT/.

Û careke mayîn Xebera Xwedê dibêje me:

“Heger Xwedê piştovanê me ye, kî dikare dijî mebe? Çimkî Ewî Kurê Xwe jî nehêvişand, lê bona me hemûya da der, gelo Ewê wî cûreyî hemû tiştî nede me?” /Romayî 8:31,32, NLT/.

Van xebera guhdarkin, lê ne ku wan gotinên bêguman, yên ku ji *xwedêyê vê dinîyayê* tî, gunehkarkir û acizkirê sereke. Efrandarê we Bavê weye, û ew açixîya we nava wî karîda dixweze, bona kîjanî Ewî gazî we kirîye.

Çawa bavê weyî nava bawarîyêda, yê ku îdî 60 salên xwe demam kirine, ez jî piştovanê weme. Ez piştgirîyê didime we bona ku hûn diha dûr herin, lê ne ku çiqas merivên yaşên miznda û ez çûne. Em qulixî Padişakî dikin, em welatîyên padişatîyekîne, em endamên malbetekîne, bawarîke me heye û usa jî mîsîyake me heye, ku em mala Xwedê çêkin, li kîderê Ewê nava temamîya heta-hetayêda bijî.

Werin em tevayî bişuxulin. Werin em yekbin û yekîtiyê xweykin. Werin em bibine dîtindarê wê yekê, ku rûmeta Wî çî cûreyî careke mayîn cîhê Wîye jîyînê tijî dike. Helkîrineke başqe bona pîrsgirêkên vê dinîyayê tune.


Ez we hiz dikim, lê tiştê herî girîng ewe, wekî Bav Xwedê, Îsa Mesîhê Kur û Ruhê Pîroz we bi kûrayî hiz dikin. Û *hizkirina Wan, ya hindava weda, heta-hetayê dimîne.*

“Wîra, Yê ku dikare we ji ketinê xweyke û li ber rûmeta Xwe /bê sûc û bê şaşî/ bêqisûr eşq [bi şabûn] bide [we] sekinandinê, Xwedêyê bêşirîkî-bêheval, Xilazkirê mera, bi destê Îsa Mesîhyê Xudanê me, şikir û mezinayî, qudret û hukumatbe, berî her- heyê û niha jî û heta-hetayê /nava hemû qurnên heta-hetayêda/! Amîn /bila usabe/”.

-Cihûda 24,25 AMPC

BIFIKIRIN

1. Bi saya rûnkirinê ye wekî hemû karebûnên ji Xwedêda dayî çendbare dibin, hukumê heta-hetayê dihêlin. Rûnkirina çî cûreyî tê? Pêşkêşên me çî cûreyî bi saya rûnkirinê dighîjine asta here bilind?
2. Rûnkirin çî cûreyî dikare nava jîyana weda nû bimîne? Dema ku rûnkirin bêguhdarî dimîne, çî diqewime?
3. Nava kîjan goveka jîyanêda hûn bona hukumhiştinê hatine gazîkirinê? Rûnkirin çî cûreyî dikare nava wê govekêda we berbiçav bike?



*“Heger tu bi devê xwe îqrar bikî, ku Îsa
Xudan e û dilê xweda bawar bikî ku
Xwedê Ew ji nava mirîya rakirîye, tê xilaz bibî.
Çimkî bi dil yek bawar dike, rast tê hesabê û bi
dev îqrar dike, xilaz dibe”*

– Romyî 10:9, 10

Zêdekirî

Xilazbûn bona hemûya

Xwedê dixweze, ku jîyana we tam baş bibe. Ew bi dil bona we xemgîn e û dixweze wekî hûn progirama Wî bona jîyana xwe mîyaser bikin. Feqet, rêyeke berbi wê yekê heye: hûn gerekê xilazbûnê bi destê Kurê Xwedê, Îsa Mesîh, qebûl bikin.

Bi saya mirina Îsa û rabûna Wî ya ji nava mirîya, Xwedê rê çêkir ku hûn bikevine nava padişatiya Wî, çawa kur yan jî keça Wî yê/ya/ hizkirî. Qurn banîya Îsa ya li ser xaç bêyî tu tiştî jîyana heta-hetayê û dewlemend pêşkêşî me kirîye. Xilazbûn pêşkêşa Xwedê ya bona we ye: hûn nikarin tu tiştî bikin ku xilazbûnê qazinc bikin, yan jî layîqî wê bibin.

Bona stendina vê pêşkêşa giranbiha, hûn berê ewlin gerekê gunehê jîyana serbeste ji Efrandarê xwe xwe mikur bîn, çimkî ev yek koka hemû gunehên weye kirî ye. Tobekirin qewilê gelekî girînge bona stendina xilazbûnê. Petrûs ev yek zelal kitêba Karên şandîyada wê rojê da kifşê, dema ku 5000 merivî xilazbûn stendin: “Awa tobekin û berbi Xwedê vezerin, ku gunehên we bêne resîtkirinê” /Karên şandîya 3:19/. Încîl eyan dike, wekî ji me her yek çawa xulamê gunehê hatîye dinîyayê. Ev xulamtî ji gunehê Adem destpê bûye, yê ku yê ewlin bû, ku bi zanebûn gura Xwedê nekir. Bi tobekirinê, hûn birîyar dikin ku hûn îdî gura şexsê xwe û mîrê cin nekin, yê ku bavê derewêye. Hûn gerekê gura Xudanê xweyî nû Îsa Mesîh bikin, Ewê ku emirê Xwe bona we da.

Hûn gerekê emirê xwe teslîmî serwêrtîya Îsa bikin. Qebûlkirina Îsa çawa Xudan dide kifşê, ku hûn îzîne didine Wî ku Ew serwêrtîyê temamiya emirê we bike /ruhê we, şexs û bedena we/, usa jî wê yekê dide kifşê, ku çî yê weye, yê Wîye: Ew nava jîyana weda serwêrtîya here bilind distîne. Wî çaxî, dema ku hûn wê yekê bikin, Xwedê wê we ji tarîstanê azat bike û wê we cîguhastî nava ronahî û rûmeta padişa Xwe bike. Bi gilîkî, hûnê ji tarîstanê

berbi ronahîyê cîguhastîbin û bibine lawê wî.

Heger hûn dixwezin bi destê Îsa xilazbûnê bistînin, vî duayî biwekilînin:

“Xwedêyê Ezmana, ez fem dikim, wekî ez gunehkarim û ji norma heqîtiya Te ketime.

Ez bona gunehên xwe layîqî cezakirina heta-hetayême. Spas ku min nava vî halîda nahêlî, çimkî bawar dikim, wekî Te Kurê Xweyî tektenê, Îsa Mesîh, şand, Yê ku ji Meyrema qîz hate dinîyayê, bona ku bo min bimira û cezayê min li ser xaç bidîta. Ez bawar dikim, wekî Ew roja sêem ji nava mirîya rabû û niha jî alîyê Teyî rastê rûniştîye, çawa Xudan û Xilazkirê min. Îro ez bona wê yekê tobe dikim, ku ji Te cihêbûyî bûm û jîyîna xwe heta-hetayê teslîmî serwêrtîya Îsa dikim.

Îsa, ez dihebînim, wekî Tu Xudan û Xilazkirê minî. Bi Ruhê Xweva were nava jîyana min, û min bike zarokê Xwedê. Ez şuxulên tarîstanê berdidim, nêzîkî kîjana bûm wextêda, û ji roja îroyînda ezê bona xwe nejim. Ezê bi kerema Te, bona Te bijim, çimkî Te emirê Xwe bona min daye, ku ez heta-hetayê bijim. Spas, Xudan! Niha emirê min bi temamî destên Te da ye, û anegorî Xebera Te, ezê tu cara bi navê Îsa şerm nekim. Amîn!”

Hûn bi xêr hatine malbeta Xwedê! Ez piştgirîyê didime we, ku hûn derheqa vê behsa başda bawarmendekî mayîna gilî bikin. Ew yek jî girîng e, ku hûn bighîjine civîneke cîh, ya ku bawarîya xwe li Încîlê tîne û tevî merivên başqe nava heleqetiyada bin, yê ku wê nava bawarîyêda piştgirîyê bidine we. Hûn dikarin tevî qulixdarîya me bikevine nava heleqetîya /werine MessengerInternational.org/ û emê alî we bikin ku hûn li wêderê, li kîderê hûn dijîn, civînê bibînin.

We hema hêja rêwîtiya here balkêş destpêkir. Ez bo we gelek eyantîya, keremê û hevaltîya tevî Xwedê, nava jîyana weda wera dixwezim.

XEBERÊN

Kitêba ku niha destê weda ye encamê xebata komê ye û ez dixwezim, ku bona emekê wan, sipasîyê bidime çend xebatkarên me:

Bryûs Nîgrên: Bona hostatî û cêribandina rêdaktorîyê spasîyê didim. Te careke mayîn destnivîsara min hilda, û bêyî undakirina dengê min, te ew diha hewaskar kir. Û bona wan pirsên dijwar jî spas dikim, yên ku te didane min, û bi saya kîjana ev kitêb diha rast û hukumdar bû.

Korî Êmbêrson, Lora Vîlbûr û Lorên Conson: Spas, wekî we korêktorî, rastkirinên vêrgula û nuxta û rastîya stîlê da çareserkirinê. Ez bi pêşkêşa weva hijmekarim.

Krîs Pêys: Bona piştgirîya bêdew ez sipasîyê elam dikim, ku destnivîsara vê kitêbê serî bi serî hatîye xwendinê. Spas, wekî te bona çêkirina serê 14-a alî min kir. Emekê te bêqîmet e.

Êdîson Bîvêr: Bona hostatîya teye rêdaktorîyê û pirsên dijwar ez spas dikim. Bi saya wan pirsê, ev bang diha rast û diha zêde gihîştîye meriva. Ji hemû tiştî zêdetir ez sipasîyê bona bûyîna çawa kurê amin û piştgir elam dikim.

Alan Nîgrên: Bona dîzayîna bi cûrê birqok, ya rûpel û rûyê vê kitêbê, ez sipasîyê elam dikim. Ez bi bi pêşkêşa teva hijmekarim.

Koma "Mêsîncêr întêrnêyşinîlê"-ra: Ji we her kes, bona çêkirina padişatîya Xwedê, xebateke mezin dike. Ezê tevî we wê rojê şa bibim, dema ku em bibînin ku çawa Îsa bona qulixa weye xwepêşkêşkirî heq dide we.

Ruhê Xwedêyî Pîroz: Razîbûna mine here mezin bona Te ye. Ev bang, bêyî rêberîya Te û serwaxtîya Te, wê tu cara nehata stendinê. Ez bêhesab ji Te, Xudanê xwe, bona eyantîya Îsa Mesîh, razîme. Ez bi kûrayî Te hiz dikim, bona min qedir e ku qulixî Te bikim û hevkarîyê tevî Te bikim.

RUHÊ PÎROZ




Şagirtên ewlin tevî Îsa sê sal derbas kirin, tevî Wî gerîyan, guhdarîya wan hemû tişta kirin, çî ku Ewî gerekê bigota wana. Feqet hinek wede pêşîya xaçbûnê, Îsa gote hevalên Xwe yê here nêzîk ku Ew gerekê wana bihêle û here, bona ku Ruhê Pîroz bikaribe bê û wî çaxî bona wana wê hê baştir be. Eger ev yek bona şagirta rastî bû, yê ku her roj tevî Îsa bûn, wî çaxî em bi çiqasîva hewce ne ku îro Ruhê Pîroz tevî emirê me bibe?

Nava vê berbirîbûnê da Con Bîvêrê Ruhê Pîroz raberî we bike. Hûnê derheqa şexsîtiya Wî û qewata Wî da, ösa jî kö çawa Wî diha baþ nas bikin dikarin pê bih'esin. Ew yek grîng nîne ku hûn tevî Xwedê li kîderê ne, kitêba "Ruhê Pîroz: Naverok" wê alî we bike ku diha nêzîkî Xwedê yê Heta-Hetayê bin, Yê ku we bi dil hes dike.

QENCÎ, YAN XWEDÊ?

BONA ÇI QENCÎ BEYÎ XWEDÊ BES NINE?



Eger tişteq qencîye, wî çaxî ew ji Xwedêye, ne usaye?

Nava rojên meda xeberên “qencî” û “Xwedê” tê bêjî sînonîmin. Em bawer dikin, wekî ew çî ku bi tomerî çawa qencî tê hesabê gerekê anegorî xwestina Xwedê be. Merdayî, şikestîbûn, heqîti qencin. Xwehizî, krêti, bexofi xirabin. Tê bêjî ev firqî gelekî sadeye.

Gelo hemû tişt awqas zelale? Eger qencî awqas zelale, bo çî Încîl dibêje, wekî bona naskirina wê pircûretî pêwîste?

Kitêba “Qencî, yan Xwedê?” banga bi sirê ya bona wê yekê nîne ku hûn bi xwe pirsên xwe hel bikin. Ev kitêb wê hîvî ji we neke ku hûn awqasî nêzîkbûn û kirinên xwe biguhêrin. Ewê hê zêdetir bike. Ewê karebûnê bide we, bi kîjanê hûnê tevî Xwedê bighîjine asta heleqetîyên usa, ya ku wê her govekeke jîyana we biguhêre.

EWÊN KU BI HETA-HETAYÊVA DILIVIN

JÎYAN, KEMALA KÎJANÊ ROJA ÎROYÎN Û HETA-HETAYÊ HEYE.



Li ser vê dinîyayê jîyan hulm-gulm e, feqet gelek usa dijîn ku tê bêjî peyî wanra tu tişt wê tunebe. Lê ew yek ku em çawa vê jîyanê dijîn, wê ewê yekê qirar bike, ku emê jîyana heta-hetayê çawa derbaz bikin. Kitêba Pîroz li me eyan dike, wekî bona bawarmenda derecên heqdayîneye cûre-cûre hene:destanînên hineka wê bi temamî wextê dîwanê bişewitin, lê bona yên mayîn jî wê mecala serwêrîkirina tevî Mesîh bê dayîne.

Con Bîvêr anegorî prînsîbên B Korintî 5:9-a tîne bîra me, wekî hemû bawarmend wê li ber Mesîh bisekinin, bona ku wê yekê qebûl bikin, layîqî çî ew bûne nava temamiya jîyana xweda. Ji me gelek meriv wê zendegirtî bimînin, wextê ku pê bihesin, wekî me piraniya wedê xwe li ser tiştên usa xerc kirîye, yên ku wê layîqî heqdayîna heta-hetayê nebin.

Wî çaxî emê çawa bikaribin nava jîyana kardarda bijîn? Kitêba “Ewên ku bi heta-hetayêva dilivin” wê we hîn bike ku hûn xwe eşkere bikin û wî hemû tiştî çendbare bikin çî ku Xwedê daye we. Eger hûn ji aliyê heta-hetayêda li jîyanê binihêrin hûnê qewatê bistînin, bona ku hûn bona meremên qewîn bişuxulin.

KEVIRÊ KRÎPTON BIŞKÊNIN

WÎ TIŞTÎ BIŞKÊNIN ÇI KU QEWATA TE JÎ TE DISTÎNE



Mîna wî Sûpêrmêrxasî, yê ku dikare li ser hemû dijwarîyara banzde û hemû neyara alt bike, usa jî peyîhatîyên Mesîh xweyê qewata altkirina dijwarîyên nava jîyanêda nin, qewata kîjanaye nebînayî heye. Feqet, pirsgirêka him Sûpêrmêrxas, him jî ya me heye: kevirê krîpton heye, yê ku qewatên me ji me distîne.

Bêguman, Sûpêrmêrxas û kevirê krîpton li ber xwe derxistîne, lê kevirê krîptonî ruhanî na.

Ev kitêb bersiva wê pirsê dide, ku bona çî ji me gelek meriv nikarin wê qewata xwedêtiyê bibînin, ya ku nava jîyana mesîhîyên sedsala ewlinda dihate kifşê.

Nava kitêba “Kevirê krîpton bişkênin”-da Con Bîvêr dide kifşê, ku kevirê krîpton çî ye û bona çî ew li civînên me qewtên meriva ji wana distîne, û çawa ji wan girêfûtka azad bibin.

Kitêba “Kevirê krîpton bişkênin” hêsakirina ruhanî nîne, ya ku bona wan meriva têra hatiye dîtîne, dilên kîjana zeyîf in. Ev rastî bona wan peyîhatîyên Mesîh têra hatiye dîtîne, yên ku dixwezin rêya guhartina şexsîye dijwar ra, lê ya kardar ra, derbaz bin.

XWEDÊ, TU LI KÎDERÊ YÎ?!

NAVA QÛMISTANA XWEDA QEWAÊ Û MEREM BIBÎNE



Hûn xwe bîrkirî texmîn dikin nava jîyana xwe ya diyarda, hûn difikirin: “XWEDÊ, TU LI KÎDERÊ YÎ?!” Diqewime berê Xwedê wera xeber dida, lê niha Ew bêdeng e.


Diqewime wekî hûn nava bawarîya xweda pêş diketin, lê niha hûn hazirîya Wî nabînin. Hûn bi xêr hatine qûmistanê, li wî cîhî, yê ku di navbera stendina sozê ji Xwedê û mîyaserkirina wîda ye.

Heyneser, behseke qenc heye: qûmistan cîhekî xwelî û bêmerem nîne. Xwedê qûmistanê dide xebatê, bo ku we hazir û sîlih bike, bo navê we, ew jî wî çaxî, heger hûn rast wê yekêra derbas bibin. Gelek meriv dikarin bifikirin, ku ew evê êtapa jîyana xwera derbas nabin, çimkî hîvîya Xwedê dimînin. Hûn gerekê vê beşa xebata xwe biqedînin, bona ku wêra derbas bibin, û xebata we gelekî mezin e. Heger hûn naxwezîn wede xerc bikin û her dem li ser cîhekî bisekinin, ew yek girîng e ku hûn bizanibin ku qûmistan çi ye.

Nava vê kitêba bi eşkerekirinên vî cûreyîva tijî, xudanê kitêbayî bi nav û deng Con Bivêr we hîn dike, eyantîya û serpehatîyên pîroze girîng û kûrfikir dide xebatê, ên ku wê alî we bikin, ku hûn êtapên jîyanêye dijwar ra derbas bibin û wê yekê bistînin, çi ku Xwedê bona we hazir kirîye.

X MessengerX

Pêşkeftina hînbûnê bona her kesî, li her dera




- **Belaş bona ji 110 zimana zêdetir**
- Çawa zêdekirina berdest û onlayn
- Matêriyalên bona pêşdaçûyîna we
- Dîna xwe bidine lênihêrandinên xwe û rêya hînbûnê



Temamîya imbara matêriyalên
«MessengerX»-ye hînbûnê: kitêbên
êlêktronî, kitêbên aûdîyo, kurtefilm,
hînbûnên vîdêyo, Încil û diha zêde:
temaşê bikin, bixwînin û
guhdar bikin.

MessengerX.com



Li temamîya dinîyayê li «App Store»-ê û «Google Play»-da

"WERIN EM TU TIŞTÎ XWEYÎ NEKIN Û VALA NEMIRIN, BI TEMAMÎ XWE PÊŞKÊŞÎ XWEDÊ BIKIN... HEMA VÎ CÛREYÎ JÎ EMÊ BI RASTÎ SAXBIN Û EMÊ BI CÛRÊ TAM LEZETA JÎYANÊ BIBÎNIN"

— CON BÎVÊR

Gelo usa bûye ku hûn nava Padişatîya Xwedêda xwe çawa dîtindar texmîkin?
Diqewime hûn zanin ku tiştek heye, kîjanê gerekê bikin, lê hûn nikarin bi kutasî wê yekê biryar bikin ku ew yek çî ye. Ji me gelek dixwezin tesîra mezin bihêlin, lê diqewime nava weda pirsên bêyî bersiv hene, mînak:

- Ez çawa hêvîdar bim ku ez nava jîyana xweda xwestina Xwedê têbernadim?
- Pêşkêşên min yên cuda nava padişatîya Xwedê da roleke çawa dilîzin?
- Ez çawa hêvîdarbim, wekî ez qewata ji Xwedê da dayî didime xebatê?
- Gelo navê min hindikî girînge, heger ez nava «qulixê da» nînim?
- Ez çawa di navbera hêsbûna nava kerema Xwedê da û karkirina bona Padişatîya Wî wekehevîyê xweykim?
- Çawa tirsê dûr bixim û pêşda herim, heger nezelalî û qezîya jî hebin?

Nava vê kitêba kûrfkirda, xudanê nivîsarayî navdar Con Bîvêr li ser lêkolîna kitêba Pîroz bîngehê diatîne û serpêhatîyên hukumdar dîde xebatê, bona ku alî we bike, bo ku hûn derheqa navê xweda cûrekî mayîn bifikirin û fem bikin, ku ew yek bo çî bona Xwedê girînge. Bi xwendina rûpelên vê kitêbê, hûnê hîn bibin ku çawa pêşkêşên ji Xwedê da dayî çendbare bikin û çawa qewata xwe bidine xebatê.

Heger hûn hazirin bêkarîyê bi meremê diha mezinva biguhêrin, usaye eva destpêka şuxulkarîya we ye.



CON BÎVÊR dannasînkirekî navnetewîyî eyane û xudanê nivîsarayî navdare, yê ku li ser xwe guman û bêyî berdaxustin, Xebera Xwedê dannasîn dike. Con û jina wî Lîzayê qulixdarîya «Mêsîncêr Întêrnêyşînil»-ê damezirandine, armanca kîjanê ewe ku peyîhatîyên Mesîh hazir bikin, yên ku berbi berdaxustina naçin û vê dinîyayê didine guhartinê. Dema ku ew li malêye, li Koloradoyê, ew tevî her çar kurên xwe listikên kartaye li ser sivirê dilîze, yan jî dicêribîne usa bike ku Lîza tevî wî golfê bilîze.



MessengerX

Bona belaş barkirin û temaşekirina vîdêyoya herine malpera [MessengerX.com](https://messengerx.com)-ê



MESSENGER
INTERNATIONAL
MessengerInternational.org

Ev kitêb jî aliyê xudanê wê da pêşkêşe û
BONA FIROTANÊ NÎNE

Hûn diha zêde dixwezin?
Şikî pêlîkin:

